**T.C.**
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Şeyma ORHAN**

# TOPLUMSAL CİNSİYET VE KÜRT TOPLUMUNDA KADIN (ÜNİVERSİTELİ KADIN ÖĞRENCİLER ÖRNEĞİ)

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MUŞ-2024**

**K.T.**
**ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN**
**ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ**
**ŞAXA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Şeyma ORHAN**

# ZAYENDA CIVAKÎ Û DI CIVAKA KURDAN DE REWŞA JINAN (WEK MÎNAK XWENDEKARÊN ZANÎNGEHÊ YÊN JIN)

**TEZA MASTIRÊ**

**ŞÊWIRMEND**
**Dr. Öğr. Üyesi İkram FİLİZ**

**MÛŞ-2024**

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

**Şeyma ORHAN**

# TOPLUMSAL CİNSİYET VE KÜRT TOPLUMUNDA KADIN (ÜNİVERSİTELİ KADIN ÖĞRENCİLER ÖRNEĞİ)

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ JÜRİ ÜYELERİ**

**Tez Danışmanı : Dr. Öğr. Üyesi İkram FİLİZ**
**Jüri Üyesi : Doç. Dr. Zafer ACAR**
**Jüri Üyesi : Dr. Öğr. Üyesi Semih GEZER**

**MUŞ-2024**

**NAVEROK**

**NAVEROK** ........ **I**

**ÖZET** ........ **III**

**ABSTRACT** ........ **IV**

**KURTE** ........ **V**

**PÊŞGOTIN** ........ **VI**

**KURTEBÊJE** ........ **VII**

**DESTPÊK** ........ **1**

**BEŞA YEKEMÎN**

**ZAYENDA CIVAKÎ**

**1.1. TÊGEHÊN SEREKE** ........ 7

1.1.1. Zayenda Bîyolojîk û Zayenda Civakî ........ 7

1.1.2. Rol û Stereotîpên Zayenda Civakî ........ 10

1.1.3. Newekheviya Zayenda Civakî ........ 13

1.1.4. Teoriyên Zayenda Civakî ........ 14

1.1.4.1. Teoriya Psîkanalîtîkê ........ 14

1.1.4.2. Teoriya Bîyolojîk ........ 14

1.1.4.3. Teoriya Rolên Civakî ........ 15

1.1.4.4. Teoriya Kohlberg ........ 16

1.1.5 Teoriya Queerê ........ 17

**1.2. ZAYENDA CIVAKÎ Û FEMÎNÎZM** ........ 20

1.2.1. Femînîzma Lîberal ........ 21

1.2.2. Femînîzma Radîkal ........ 22

1.2.3. Femînîzma Marksîst ........ 24

1.2.4. Femînîzma Sosyalîst ........ 27

**1.3. QADÊN ZAYENDA CIVAKÎ** ........ 28

1.3.1. Malbat ........ 29

1.3.2. Dibistan ........ 32

1.3.3. Qada Taybet û Qadên Giştî ........ 35

1.3.4. Wêje ........ 41

1.3.5. Medya ........ 44

## BEŞA DUYEMÎN

## DÎN Û SEKULERÎZM

**2.1. TÊKILIYA DÎN Û ZAYENDA CIVAKÎ** ..... 48
2.1.1. Zayendîtî, Beden, Bekaret û Nixumandin ..... 52
**2.2. TÊKILIYA DÎN Û SEKULERÎZMÊ** ..... 56

## BEŞA SÊYEMÎN

## BIDESTXISTINÊN JI LÊKOLÎNA SEHAYÎ DI CIVAKA KURDAN DE REWŞA JINÊN KURD

**3.1. JI PERSPEKTÎFA ZAYENDA CIVAKÎ REWŞA JINÊN KURD** ..... 60
3.1.1. Di Malbatên Kurdan de Newekheviya Zayendî ..... 60
3.1.2. Zext û Tundiya li ser Jinên Kurd ..... 69
3.1.3. Bandora Rolên Zayendan di Parîkirina Karan de ..... 72
3.1.4. Bandora Rolên Zayendan di Tercîhên Pîşeyan de ..... 75
3.1.5. Rewşa Jinên Kurd di nav Nifşên Cuda de ..... 79
3.1.6. Di Rewşa Jinên Kurd de Guherîn ..... 84
**3.2. JI PERSPEKTÎFA DÎNÎ REWŞA JINÊN KURD** ..... 89
3.2.1. Dîndarbûna Jinên Kurd ..... 89
3.2.2. Sergirtin û Nêrîna Jinên Kurd a li ser Dîn ..... 90
3.2.3. Rêçên Sekulerbûnê û Bêqîmetbûna Kevneşopiyê ..... 95
**ENCAM** ..... **103**
**ÇAVKANÎ** ..... **106**
**PÊVEK** ..... **113**

# ÖZET

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TOPLUMSAL CİNSİYET VE KÜRT TOPLUMUNDA KADIN**

**(ÜNİVERSİTELİ KADIN ÖĞRENCİLER ÖRNEĞİ)**

**Şeyma ORHAN**

**Danışman: Dr. Öğr. Üyesi İkram FİLİZ**

**2024, 126 sayfa**

Bu çalışmada, Kürt kadınları ve onların Kürt toplumundaki yeri üzerinde durulmuştur. Çalışma, toplumsal cinsiyet konusu baz alınarak hazırlanmıştır. Kürt kadınları, içinde bulundukları toplumda nasıl bir konuma sahipler? Kürt toplumunun kadına bakışı nasıldır? Cinsiyetin Kürt kadın, erkek ve onların toplumdaki rolleri üzerinde ne gibi bir etkisi vardır? Kürt aile yapısında cinsiyetler arası nasıl bir iş bölümü vardır? Bu ve buna benzer sorular üzerinde durulmuş, çalışma boyunca bu sorulara cevap bulunması için gayret gösterilmiştir. Çalışma için, nitel araştırma yöntemi ve bu yöntemin tekniklerinden görüşme tekniği seçilmiş, bu teknikle üniversiteli Kürt kadın öğrencilerle görüşmeler gerçekleştirilmiştir. Görüşmelerin gerçekleştirilmesi için önceden hazırlanan sorular kadınlara yöneltilmiş, kadınlar tarafından verilen cevaplar titiz bir şekilde kaydedilmiştir. Saha çalışmasından elde edilen bulgular ışığında, Kürt kadınlarının içinde bulundukları toplumda nasıl bir konuma sahip oldukları, ne gibi rol ve sorumluluklar yüklendikleri ve ne tür ayrımcılığa maruz kaldıkları analiz edilmeye çalışılmıştır. Bu çalışma, giriş, sonuç ve kaynakça haricinde, üç bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde, toplumsal cinsiyetin temel kavramları, feminizmle olan ilişkisi ve inşa edildiği kurumlar ayrıntılı bir şekilde anlatılmaya çalışılmaktadır. İkinci bölümde toplumsal cinsiyetin din ile olan ilişkisi ve sekülerizm kavramı üzerinde durulmaktadır. Üçüncü bölümde ise saha çalışmasından elde edilen bulgular geniş bir çerçevede tartışılarak gerekli değerlendirmeler yapılmaktadır.



**Anahtar Kelimeler:** Kadın, Kürt Kadını, Toplum, Toplumsal Cinsiyet, Ataerkillik.

# ABSTRACT

**MASTER'S THESIS**

**GENDER AND WOMEN IN KURDISH SOCIETY**

**(EXAMPLE OF FEMALE UNIVERSITY STUDENTS)**

**Şeyma ORHAN**

**Advisor: Asistant Prof. İkram FİLİZ**

**2024, Page: 126**

This study focuses on Kurdish women and their place in Kurdish society. The study was prepared based on the issue of gender. What kind of position do Kurdish women have in the society they live in? What is the Kurdish society's view of women? What impact does gender have on Kurdish men and women and their roles in society? What kind of division of labor exists between genders in the Kurdish family structure? These and similar questions were focused on, and efforts were made to find answers to these questions throughout the study. For the study, the interview method was chosen from qualitative research methods and interviews were conducted with Kurdish female university students. Pre-prepared questions for the interviews were asked to the women, and the answers given by the women were meticulously recorded. In the light of the findings obtained from the field study, it was tried to analyze what kind of position Kurdish women have in the society they live in, what roles and responsibilities they undertake, and what kind of discrimination they are exposed to. This study consists of three parts, except introduction, conclusion and bibliography. In the first part, the basic concepts of gender, its relationship with feminism and the institutions in which it is built are explained in detail. The second part focuses on the relationship between gender and religion and the concept of secularism. In the third chapter, the findings obtained from the field study are discussed in a broad framework and necessary evaluations are made.

**Key Words:** Woman, Kurdish Woman, Society, Gender, Patriarchy.

**KURTE**

**TEZA MASTERÊ**

**ZAYENDA CIVAKÎ Û DI CIVAKA KURDAN DE REWŞA JINAN**

**(WEK MÎNAK XWENDEKARÊN ZANÎNGEHÊ YÊN JIN)**

**ORHAN, Şeyma**

**Şêwirmend: Dr. Endamê Per. İkram FİLİZ**

**2024, 126 Rûpel**

Di vê xebatê de, li ser jinên Kurd û rewşa wan a nav civakê hatiye sekinandin. Xebat ji perspektîfa zayenda civakî hatiye amedekirin. Jin, di nava civaka xwe de xwediyê cihekî çawa ne? Nêrîna civaka Kurd a li hemberî jinan çawa ye? Bandora zayendê li ser jin û mêrên Kurd û li ser rolên wan ên civakî bi çi awayî ye? Di malbatên Kurdan de, di navbera zayendan de hevpariya kar bi çi rengî pêk hatiye? Li ser van pirsan û pirsên wek van hatine sekinandin û di nava xebatê de ji bo bersivdayîna van pirsan hewl hatiye dayîn. Ji bo pêkanîna armanca xebatê, rêbaza kalîtatîv û teknîka hevpeyvînê hatiye bikaranîn, bi vê teknîkê ve, bi jinên Kurd ên xwendakarên zanîngehê re hevpeyvîn hatine çêkirin. Di van hevpeyvînan de, pirsên ku di pêşiyê de ji bo hevpeyvînan hatine amadekirin, ji van jinan hatine pirsîn û bersivên ku hatine dayîn bi awayekî rêk û pêk hatine qeydkirin. Li gor bidestxistinên ji xebata sehayî, heta ji dest hatiye rewşa jinên Kurd ên nav civakê, rol û berpirsiyariyên wan û mexdûriyeta wan a ji ber cihêkariyê hatine analîz kirin. Ev xebat, ji xeynî destpêk, encam û çavkaniyan, ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de li ser têgehên zayenda civakî, li ser têkiliya wê û fêmînîzmê hatiye sekinandin û qadên ku ev têgeh tê de tê înşakirin bi awayekî hûrgilî hatine ragihandin. Di beşa duyem de, behsa têkiliya zayenda civakî û dîn hatiye kirin û li ser têgeha sekulerîzmê hatiye rawestin. Di beşa sêyem de jî bidestxistinên ji xebata sehayî bi awayekî berfireh hatine nîqaşkirin û li ser van bidestxistinan nirxandin hatine kirin.



**Peyvên Sereke:** Jin, Jinên Kurd, Civak, Zayenda Civakî, Pederşahî.

**PÊŞGOTIN**

Zayenda civakî ew zayend e ku ji aliyê civakê ve ji bo takekesan tê dayîn. Rol û berpirsiyariyên takekesan jî li gorî vî zayendî tên diyarkirin. Ji ber vê yekê, nasnameyên zayendî yên civakî ne wek yên bîyolojîk siruştî ne, herwiha guherbar in û li gor civakan, çandan, zemanan ev rol û berpirsiyariyên ku ji takekesan tên xwestin diguherin, teşeyek nû digirin û dikarin ji nû ve bêne înşakirin. Di vê xebatê de jî em berê xwe didin civaka Kurd. Di nava vê civakê de rolên jin û mêran çi ne, takekes di nav malbatê de xwediyê çi berpirsiyariyan in û hêmanên ku rewşa zayendan a li nav civakê diyar dikin bi çi rengî ne, têgeha dînî bandoreke çawa li ser civaka Kurd û rolên takekesên vê civakê kiriye, bi rêya xebata sehayî ev xal yek bi yek hatine lêpirsîn.

Ev xebat vediqete sê beşan. Di beşa yekem de, heta ji dest hatiye mijara zayenda civakî bi tevê têgehên xwe ve hatine ravekirin. Zayenda bîyolojîk û zayenda civakî du têgehên çawa ne, çi ferqa wan ji hev heye yan jî çiqas dişibin hevdu, dîsa newekheviya zayendan çi ye, kêngî derket holê an jî destpêkeke wê heye yan na û zayenda civakî di kîjan qadan de bi çi awayî tê înşakirin, li ser van xalan hatiye rawestandin. Di beşa duyem de, têkiliya zayenda civakî û dîn hatiye lêpirsîn û têgeha sekulerîzmê hatiye ravekirin. Di beşa sêyem de jî, bidestxistinên ji xebata sehayî hatine nîşandin û li gor bidestxistinan teşeya dawî li xebatê hatiye dayîn.

Ji dema biryardayînê heta dawiya xebatê, ji bo sebr, bawerî û alîkariyê ez spasdarê şêwirmendê xwe İkram Filiz im. Dîsa, ji ber piştgirî û alîkariyê, wekî her demî, ez deyndarê malbata xwe me ku destê wan tim li ser pişta min bûye. Divê spasiyên herî mezin ji bo dê û bavê Hîvayê bin ku wan ji malbata min zêdetir qehra min kişandin û di van herdu salên nivîsandina tezê de rojekî jî rûyên xwe li min tirş nekirin, ez ê heta hetayî deyndarê mazûvaniya wan bim. Ji xeynî vê, ez bi qasî çil û çiya spasiyan dikim ji wan jinan re ku bingeha xebata min ava kirin û ji bo pêkanîna xebata sehayî bi samîmîyeteke ji dil tevgeriyan. Mala hemiyan ava.

**Mûş-2024** **Şeyma ORHAN**

**KURTEBÊJE**

| | | |
|---|---|---|
| hwd. | : | Her wekî din |
| j | : | Jin |
| r | : | Rûpel |
| yd. | : | Yên din |

**DESTPÊK**

Takekes bi zayenda bîyolojîk ve tên dinyayê lêbelê bi zayenda civakî ve mezin dibin. Ev tê çi wateyê? Ango dema însanek tê dinyayê bi zayendekî tê binavkirin, jin an jî mêr. Ev zayend xwezayî ye û bê xwesteka mirov tê dayîn, li vir ji bo zayenda bîyolojîk tercîhek ne mumkin e. Lê belê piştê hatina dinyayê, vêca pêvajoya civakîbûnê dest pê dike, di vê pêvajoyê de zayendeke din derdikeve holê ku ev zayend ji aliyê civakê ve tê dayîn, ango takekes di pêvajoya civakîbûnê de, fêrî jinbûn û mêrbûnê dibin. Ev zayend jî zayenda civakî ye. Bereksê zayenda bîyolojîk zayenda civakî çêkirî û guherbar e. Her takekes li gorî civaka ku tê de ye, fêrî vê zayendê ango rolên ku ev zayend diyar dike dibe û di şexsê xwe de van rolan dicivîne. Her civakek xwediyê taybetî, çand, edet û kevneşopiyan e. Rolên ku ji aliyê civakê ve ji bo jin û mêran tên dayîn, li gorî van taybetiyan têne diyarkirin. Her takekes van rolên civakî wek rolên siruştî dihesibîne û bi vê hişmendiyê ve mezin dibe. Ji zayînê heta mezinbûnê jî hînbûna rolan ango pêvajoya civakîbûnê berdewam dike. Ev rolên civakî herî pêşîn di nav malbatê de têne fêrkirin. Zarok li endamên malbatê dinêre, li cil û bergên wan, li karên wan ên nav malê, li axaftinên wan, tewr li tevgerên wan dinêre û bi saya van çavdêriyan di derheqê zayendan de di hişê xwe de kodan çêdike û bi vî hawî fêrbûna rolên zayendî dest pê dike. Cil û bergên zarokan, pêlîstokên ku pê dilîzin, tewr rengên ji bo amûran, tev li gor zayendên zarokan tên kategorîzekirin û bi saya van, zarok jî di hişê xwe de dest bi katogerîzekirinekî dikin. Piştre, dema zarok mezin dibin hêdî hêdî cihana wan fireh dibe û qadên ku tê de rolên civakî tên fêrkirin zêdetir dibin. Hevalên der û doran jî di hewandina rolên zayendan de xwediyê girîngiyekî ne. Komên hevalan di naskirina taybetiyên zayendan de dibin alîkar. Piştre dibistan, wek mala duyemîn di civakîbûna takekesan de cihê xwe digire û heta demeke dirêj di jiyana takekesan de girîngiya wê berdewam dike. Zarok dema dest bi dibistanê dikin, ew rol û berpirsiyariyên ku di nava malê de, ji malbatê fêr dibin bi heman rengî di dibistanê de, ji mamosteyên xwe, ji rêvebiriya dibistanê û ji hevalên xwe yên dibistanê fêr dibin. Ango dibistan, di pêvajoya civakîbûnê de pêlika duyem e. Gotin û tevgerên mamosteyan, naverok û mînakên di pirtûkên dersan de, cil û bergên ji bo xwendekaran, tewr çente û amûrên din jî di vê pêvajoyê de, di fêrbûna rolên civakî de hêmanên girîng in. Televîzyon û amûrên teknolojiyê, medyaya civakî, qadên giştî û karên di van qadan de têne kirin û hwd. ji wan hêmanên girîng in ji bo fêrbûna rolên civakî û berdewamiya wan.

Pêvajoya civakîbûnê heta hetayî berdewam dike. Takekes, di her serdemên jiyana xwe de vê pêvajoyê bi awayekî cuda dijîn. Çiqas mezin dibin bi rolên xwe yên civakî re ewqas rû bi rû dimînin û helbet nêrîna wan a li hemberî van rolan di her serdemê de ne wek hev e. Temen çiqas mezin dibe, lêpirsîna rolên civakî di hişê takekesan de ewqas zêdetir dibe. Takekes dema ji malê derdikevin dikevin nav civakê dest bi berawirdkirinekî dikin. Tiştên ku ji malbatên xwe fêr dibin û tiştên ku di civakê de dibînin muqayese dikin û ev jî di hewandina rolên civakî de rêyeke din dide ber takekesan. Ango di civakekî de di nav nifşan de yên herî zêde guherînê tîne nav civakê ciwanên wê civakê ne. Lewra temenê ciwaniyê temenê lêpirsînê ye. Ciwanên civakekî dikarin di derheqê guherînên norm û hişmendiya wê civakê de agahiyên berbiçav bide destê mirov. Ji ber vê yekê di vê xebatê de jî em ê berê xwe bidin ciwanên civaka Kurd, ji bo têgihiştina rolên takekesan a civakê û guherînên ku tê de pêk hatine. Ji ciwanan jî em ê bi taybetî li ser jinan bisekinin û rewşa civakê di nêrîna wan de fêr bibin. Lewra armanca me ya sereke xwe gîhandina rewşa jinên Kurd a di nav civaka Kurd de ye. Di fêrbûna rolên civakî de berpirsiyariyên li ser pişta zayenda jinê zêdetir in û jin li gorî mêran zêdetir dibin mexdûrê rolên zayenda civakî. Ev jî di navbera zayendan de newekheviyekê derdixe holê. Ji bo têgihiştina newekheviya zayendan a civaka Kurd, divê bi taybetî li ser têgeha malbatê bê sekinandin. Lewra ji çavkaniyên li ber dest jî em têdigihîjin ku newekheviya zayendan cara ewil di nav malbatê de, bi rêya parîkirina karên malê ve derdikeve holê. Ji ber vê di xebatê de, dê zêdetir li ser rewşa zayendan a nav malê û parîkirina wan a karên malê bê sekinandin. Rewşa jinên Kurd, ji aliyê sosyo-çandî, sosyo-aborî û sosyo-dînî ve dê di derheqê civaka Kurd de encamên zelal bide destê me.

Ev xebat ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem de bi berfirehî dê li ser mijara zayenda civakî, têgehên wê yên sereke, qadên ku tê de tê înşakirin, pêvajoya ku derbas kiriye û têkiliya wê ya bi femînîzmê re bê rawestandin. Zayenda civakî her çiqas wek têgehekî van salên dawî ketibe lîteratura civaknasiyê jî, rol û berpirsiyariyên zayendan digihîje dîroka mirovahiyê, ango hebûna têkiliyên mirovan, derketina têgeha malbatê, newekheviya di navbera zayendan û tahakuma mêran a ku li ser jinan datînin di derheqê vê têgehê de dîrokeke dirêj radixin ber mirov. Têgeha femînîzmê jî ji vî alî ve wek têgeheke jinparêz derdikeve pêş. Li gor îddîaya vê têgehê armanca femînîzmê parastina mafên jinan, pêkanîna wekheviya zayendan û li dijî derketina pergala pederşahiyê ye. Di beşa yekem de wê li ser kurtedîroka femînîzmê jî bête rawestandin. Dîsa, dê bi yek û yek

behsa qadên zayendên civakî jî bê kirin. Ew qadên ku newekheviya zayendan tê de dide der û berdewamiya zayenda civakî pêk tê. Malbat ango qada taybet, dibistan, medya, wêje û qadên giştî di înşakirina zayenda civakî de wek qadên sereke wezîfe dibînin. Di beşa duyem de wê behsa têkiliya zayenda civakî û dîn bê kirin. Lewra dîn jî têgeheke bi qasê derketina mirovahiyê xwediyê dîrokeke dirêj e. Di înşakirina zayenda civakî de jî ev têgeh xwediyê cihekî girîng e. Têgeha din a ku hewce ye li ser bê sekinandin sekulerîzm e. Sekulerîzm têgeheke nû ye ku bi modernîzmê re derketiye holê û lawazbûna hêza dînî ya di qadên jiyanê de dide nîşandin. Ji bo bibe xebateke bikêr divê tesîra dîn û sekulerîzmê ya li ser civaka Kurd bê nêrîn û analîza wê bê kirin. Di beşa sêyem de jî wê li gor encamên ji xebata sehayî, li ser rewşa jinên Kurd a di nav civaka Kurdan de analîzek bê kirin.

**Rê û Rêbazên Xebatê**

Ev xebat ji lêkolîneke sehayî pêk tê. Ji bo pêkanîna lêkolînê me ji rêbaza lêkolîna kalîtatîv sûd wergirt. Lêkolîna kalîtatîv "ew cure ye ku di nav xwe de teknîkên wek çavdêrî, hevpeyvîn û analîza tekstan dihewîne û xebatên ku bi vê rêyê ve tên kirin, di atmosfereke xwezayî de, bi awayekî rasteqînî pêk tên" (Yıldırım û Şimşek, 2011: 39). Ji ber ku ev rêbaza lêkolînê sînorên xwe sist digire û lêkolîner bi vê rêyê dikarin baştir daxilê nav xebata xwe bibin me jî ev rêbaz ji bo lêkolînê hilbijartiye. Ji teknîkên vê rêbazê me teknîka hevpeyvînê tercîh kiriye û xebata xwe jî bi vê teknîkê ve bi rê biriye. "Xêra vê teknîkê ev e ku lêkolîner dikarin mijara ku lêkolîn dikin ji çavên beşdaran bibînin û bibin şahidên pêvajo û rewşa sosyolojîk a beşdaran" (Yıldırım û Şimşek, 2011: 40). Bi rêya vê teknîkê me jî xwest ku em bi jinên Kurd re rû bi rû hevpeyvînan çêkin û bi saya van hevpeyvînan xwe bigihînin encamên şênber û bikêrtir. Ji cureyên teknîka hevpeyvînê me cureya nîvsazkirî hilbijart û ne bi koman re herwiha bi takekesan re me ev hevpeyvîn çêkirin. Wek ku di teknîka hevpeyvînê de jî pêwîst e, ji bo hevpeyvînan me di pêşiyê de, di derbarê mijara xwe de pirs amade kirin. Dema hevpeyvînan me ev pirs yek bi yek ji beşdaran pirsî û em li bendê man ku beşdar bi rehetî van pirsan bibersivînin. Beriya em dest bi hevpeyvînan bikin me bi kurtasî behsa xebata xwe û armanca vê xebatê ji wan re qal kir û ji bo qeydkirina dengê wan me ji beşdaran destûr girt. Ji bo hevpeyvînan me bi 20 xwendekarên jin ên zanîngehan re têkilî danî û van her bîst jinan jî em neşikandin û daxwaziya me ya hevpeyvînê qebûl kirin. Ji xeynî xwendekarên zanîngehan me bi jinên din re hevpeyvîn nekir, ango me ev yek wek sînorê xebata xwe diyar kir. Ev hevpeyvîn di navbera van dîrokan de hatin çêkirin: 20.02.2024-02.04.2024. Ango pêkanîna

hevpeyvînan qedera 40 rojan berdewam kir. Her hevpeyvînek teqrîben di nava 40 deqeyan de hate çêkirin. Herwiha demên ji vê kêmtir an jî zêdetir jî çêbûn lêbelê ti hevpeyvîn ji saetekî zêdetir nedomiya. Herçî kesên ku nexwestin dengê wan bê qeydkirin, bersivên wan bi rêya nivîsandinê ve hatin girtin. Sê beşdaran nexwestin dengê wan bê qeydkirin, xwestin ku em bersivên wan bi nivîskî bigirin, lê 17 beşdarên din hevpeyvîna bi deng qebûl kirin. Ji beşdaran bi 6 kesan re bi zimanê Kurdî hevpeyvîn hatin çêkirin, lêbelê bi 14 beşdarên din re bi zimanê Tirkî hevpeyvîn hatin çêkirin, lewra van beşdaran diyar kirin ku xwe bi zimanê Tirkî baştir îfade dikin. Di pêvajoya vê xebatê de li gorî usûl û qaîdeyên etîk hate tevgerîn û navê beşdaran bi ti awayî di nav xebatê de nehatin diyarkirin. Li şûna navên wan koda jinê bi hejmaran ve hatin bikaranîn, wek mînak: J1, J2, J3… Bersivên ku ji hevpeyvînan hatin girtin, li ser kompûterê hatin deşîfrekirin û bi awayekî rêk û pêk di nav xebatê de hatin bikaranîn.

**Girîngî û Astengiyên Xebatê**

Armanca vê xebatê bi nêrîneke sosyolojîk lêkolînkirina civaka Kurd û ji perspektîfa zayenda civakî ve analîzkirina rewşa jinên Kurd ên nav vê civakê ye. Ji bo xebatê lêkolîneke sehayî hatiye kirin. Bajarê Agirî wek seha hatiye hilbijartin û xwendekarên jin ên zanîngehan wek beşdar hatine diyarkirin. Çima bi taybetî xwendekarên zanîngehê hatine hilbijartin? Lewra di civakekî de nifşa ku hem taybetiyên kevneşopiyê hem jî yên modernbûnê di xwe de dihewînin û ji fikir û nêrînên nû re vekirî ne ciwanên wê civakê ne. Beşdarên me jî ji ber ku xwediyê vê taybetiyê ne wê ji bo gihîştina armanca me zêdetir bibin alîkar. Lewra takekesên ciwan heta astekî ji malbata xwe fêrî rol û berpirsiyariyên xwe yên civakî dibin, lêbelê dema ji malbatê derdikevin daxilê nav qadên civakê dibin, ewçax însanên nû, têgehên nû, fikrên nû nas dikin. Bi vê naskirinê re bivê nevê lêpirsînek di cem wan de dest pê dike û di hişmendiya ciwanan de hêdî hêdî guherîneke berbiçav pêk tê. Wekî ku Giddens (2012: 206) jî dibêje hîç takekesek nîn e ku adet û kevneşopiyên malbata xwe bê lêpirsîn qebûl kiribe. Bi taybetî jî di vê serdema modern de ku her tişt zûtir diguhere, herwiha wateya têgehan jî pê re. Ev yek bêguman di navbera nifşan û nêrînên wan de jî guherînên eşkere derdixe holê. Takekesên ciwan di navbera kevneşopî û modernbûna cîhanî de gelek caran diçin û tên, didin dû wateyan, bi çavekî lêpirsîner li têgehan dinêrin û ji qaîdeyan aciz dibin, doza jiyaneke azadtir û rehettir dikin, di heman demê de li gorî takekesên navsere ango nifşên li beriya xwe dikarin baştir çavdêriya civaka xwe bikin û kêmasî û taybetiyên wê civakê bînin ziman. Beşdarên me yên ciwan

jî temenê wan di navbera 19 û 26an de ne. Hemî xwendekarên zanîngehê ne û zanîngeh ji bo naskirina fikrên cuda dikare bê gotin mekaneke gelekî girîng e. Ji vî alî ve ev xebat xwedî girîngiyekî ye lewra dê di derheqê civaka Kurdan û guherînên di vê civakê de, bi taybetî jî guherînên di rewşa jinên vê civakê de agahiyên zelal bide destê me.

Di lêkolîna lîteraturî de em zêde rastî xebatên Kurdî nehatin ku li ser jinên Kurd hatibin kirin. Zêdetir çend nav derdikevin pêş ku di vî warî de xebat kirine. Rohat Alakom û Mehmet Bayrak du navên girîng in ku li ser civaka Kurdan û rewşa jinên wan lêkolîn û xebat kirine. Xebatên van herdu lêkolîneran hem bi zimanê Kurdî hem jî bi zimanê Tirkî hatine weşandin. Em ji xebatên wan fêrî jiyan, kevneşopî û sosyolojiya Kurdan dibin. Wekî din ji aliyê rêbaza xebatê û mijara zayenda civakî ve çend xebat hatine tespîtkirin, di van xebatan de lêkolîner bi xwe daxilê nav xebatê bûne, bi rêya lêkolîna kalîtatîv, bi teknîka hevpeyvînê ve xebatên xwe pêk anîne û ji deriyên cuda li meseleya jinên Kurd nihêrîne. Xebatên ku hatine tespîtkirin ev in: Lale Yalçın-Heckmann, *Kürtlerde Aşiret ve Akrabalık İlişkileri* (çapa duyem, 2006), Henny Harald Hansen, *Allahın Kızları: Kürdistan'da Müslüman Kadınlar Arasında* (1998), Handan Çağlayan, *Feminist Perspektiften Kürt Kadın Kimliği Üzerine Niteliksel Bir Araştırma* (2006), Naciye Yıldız, *Kadın, Yoksul ve Kürt: Toplumsal Dışlanmanın Boyutları* (2015). Di van xebatan de ji aliyê sosyolojîk, sîyasî, aborî û netewî ve li ser rewşa jinên Kurd hatine sekinandin. Ligel vê, ev xebat tev bi zimanê tirkî hatine amadekirin. Xebata me ji du aliyan ve ji van xebatan vediqete: cudahiya ewil ew e ku ev xebat bi zimanê Kurdî hatiye amadekirin, cudahiya duduyan jî di vê xebatê de ji perspektîfa zayenda civakî ji hêla zayendê ve li ser meseleya jinên Kurd hatiye sekinandin, ango nasnameya wan a netewî li der çarçoveya xebatê maye. Ji vê hêlê ve wek çavkanî xebatek li ber destê me heye ku bi zimanê Kurdî û bi teknîka çavdêriyê ve hatiye amadekirin: xebata Mela Mehmûdê Bayezîdî (1797-1867) ya bi navê *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye* (2019) ye ku çapa di destê me de ji aliyê Jan Dost ve hatiye latînîzekirin û amadekirin. Bayezîdî di sedsala nozdehemîn de li nava Kurdên koçer geriyaye û çavdêriyên xwe yên li ser jiyana wan nivîsiye. Ev berhem hem ji aliyê sosyolojîk ve hem ji aliyê dîrokî ve wek çavkaniyeke sereke û wek numûneyeke girîng derdikeve pêşberî me. Li gel vê, dîsa di nav xebatê de ji perspektîfa dînî ve jî li meseleya jinên Kurd hatiye nêrîn û rêçên sekulerbûnê di nav bersiv û nêrînên jin ên beşdarên vê xebatê de hatiye lêgerîn. Tê dîtin ku xebatên bi vî rengî yên li ser jinên Kurd hatine kirin ji aliyê hejmarê ve kêm in, ev jî ji bo xebata me astengiyek e. Ji ber vê yekê

xebata me hem ji aliyê mijarê ve, hem ji aliyê rêbazê ve hem jî ji aliyê ziman ve cihê xwe di nav xebatên Kurdî de çêdike û hêviya vê xebatê ew e ku ji xebatên dahatû re bi qasê misqalekî jî be bibe alîkar.

# BEŞA YEKEMÎN

# ZAYENDA CIVAKÎ

Di vê beşê de, dê li ser pênase, kurtedîrok û hûrgiliyên zayenda civakî bê sekinandin, têgehên pê re eleqeder dê bi yek bi yek bêne ravekirin, behsa femînîzmê û cureyên wê dê bê kirin. Pişt re, zayenda civakî di kîjan qadên jiyanê de, bi çi awayî cih digire, bi çi şiklî xwe di nav jiyana civakî de dide der, ev xal jî wê bêne vekolîn.

## 1.1. TÊGEHÊN SEREKE

### 1.1.1. Zayenda Bîyolojîk û Zayenda Civakî

Zayenda bîyolojîk û zayenda civakî du têgehên wisa ne ku pênaseyeke sabît ji wan re nehatiye dîtin, her tim guherîne, bûne sedemên nîqaş û gengeşîyan, hin caran hatine tevlihevkirin û gelek caran jî di şûna hevdu de hatine bikaranîn. Pênaseya ku bi gelemperî tê pejirandin wiha ye: "zayend, ji aliyê bîyolojîk ve nîşaneya jinbûn û mêrbûnê ye, zayenda civakî jî ji aliyê civakî ve nîşaneya jinbûn û mêrbûnê ye" (Dökmen, 2021: 19-20). Mirov bi zayenda xwe ya bîyolojîk ve tê nava civakê û di nava wê civakê de fêrî zayenda civakî dibe ango rol û wezîfeyên xwe yên li nav civakê hîn dibe. Lê her çiqas pênaseyeke bi gelemperî hebe jî nêrînên cuda yên li ser van herdu têgehan hene û heta niha ev nêrîn berdewam in û nîqaşên li ser van herdu têgehan hê jî negihîştine encamekî. Ji bo ku ev nêrînên cuda û sedemên van nêrînan baştir bên têgihîştin divê li pêvajoya zayenda bîyolojîk û zayenda civakî bê nêrîn lewra: "pênasekirina jinbûn û mêrbûnê jî xwedîyê pêvajoyekê ye" (Rose, 2018: 16).

Li gor çavkaniyên li ber destan, "zayenda civakî wek têgeh cara ewil ji aliyê Ann Oakley (1972) ve tête bikaranîn" (Marshall, 1999: 98). Ev têgeh bi saya Oakley ve tev li ferhenga civaknasiyê dibe û kesên ku piştê Oakley tên jî heman têgehê bi kar tînin, bi vî awayî ev têgeh cihê xwe digire û diedile. "Oakley dibêje ku zayend wek bîyolojîk hatiye dîyarkirin lê zayenda civakî, ji aliyê civakê ve hatiye înşakirin" (Acar-Savran, 2013: 234). Ji van gotinên wê jî diyar e ku Oakley mirovan wek xwediyê du zayendan pênase kiriye û ferqa van zayendan jî di guherandinê/înşakirinê de dîtîye. Ev tê vê wateyê ku di wê serdemê de xeteke diyarkirî di navbera zayenda bîyolojîk û ya civakî de hatiye kişandin. Femînîsta fransî Simone de Beauvoir, di sala 1949an de, di berhema xwe ya bi navê *Le Deuxieme Sexe* (Zayenda Duyem) de bi awayekî berfireh behsa rewşa jinê ya li nav civakê dike û gotina wê ya "meriv wek jin nayê jiyanê, di nav jiyanê de dibe jin" jî bi demê re

dibe wek sembolekî ji bo zayenda înşakirî. Her çiqas Beauvoir, ew çax têgeha "zayenda civakî" bi kar neanîbe jî, ji wê gotina wê meriv dikare tê derxe ku xwestiye balê bikişîne înşakirina vê têgehê. Herwiha ev têgeh, gotina "bîyolojî qeder e" red dike. Bi kurtasî dikare bê gotin ku bi qasê 20 salan beriya Oakley, bingeha têgeha zayenda civakî ji aliyê Simone de Beauvoir ve hatiye avêtin. "Heta dawiya serdema 20. jî ev nêrîna ji bo herdu têgehan berdewam dike" (Rose, 2018: 17). Lêbelê, ber bi modernbûna cîhanê ve, bi xebatên nû re, fikr û nîqaşên nû derdikevin holê di derbarê zayenda bîyolojîk û zayenda civakî de. Dîrokzan Joan Scott li ser pênaseya zayenda civakî disekine û dibeje: "Ji me re, ji bo zayenda civakî pênaseyeke berfireh a nû divê" (Scott, 2007: 40). Li ser vê pêşniyara Scott, rê li ber nîqaşên nû û nêrînên cuda vedibe û herwiha pirsên nû têne pirsîn: gelo zayenda bîyolojîk û zayenda civakî bi rastî jî du têgehên cuda ne? Meriv dikare herdu têgehan ji hev veqetîne? Gelo zayenda bîyolojîk qet nikare bê guherandin? Pêşiyê zayend hebû yan zayenda civakî? Kîjan têgeh encama têgeha din e? Pirsên bi vî rengî her diçin zêdetir dibin, femînîst û xebatkarên vê qadê jî serê xwe bi van pirsan re diêşînin û dikevin pey bersivan.

Judith Butler, yek ji wan femînîstan e ku bi xebatên xwe yên li ser zayenda bîyolojîk û zayenda civakî ve tête nasîn. Butler, di pirtûka xwe ya navdar a bi navê *Gender Trouble* (Belayek bi navê Zayend) de têgehên zayenda bîyolojîk û zayenda civakî dide ber destê xwe, wateyên wan ên heyî red dike û van têgehan ji nû ve pênase dike. Ev pirtûka wê, yek ji wan berhemên navdar ên teorîya femînîstê ye. Butler, di hemî xebatên xwe de li ser pênasekirina zayenda bîyolojîk û zayenda civakî radiweste û dibêje "heke meriv neguherbûna zayendê red bike, meriv dikare bibêje zayenda bîyolojîk jî wek zayenda civakî tê înşakirin, tewir meriv dikare bibêje ku zayenda bîyolojîk û zayenda civakî du tiştên hemwateyî ne" (Butler, 2019: 52). Li gorî Butler heke herdu têgeh bêne heman wateyê, nexwe meriv zayenda civakî wek şîrovekirina zayenda bîyolojîk nikare pênase bike, mantiqeke bê wate derdikeve holê. Femînîstan ji bo ku li dijî gotina "bîyolojî qeder e" derkevin zayenda bîyolojîk û zayenda civakî wek du têgehên ji hev cuda pênase kirine û xwestine bidin nîşandin ku jinbûn û mêrbûn ne ji ber qederê ye ji ber înşakirina civakê ye. Lê li gorî gotina Butler heke meriv zayenda civakî di pênasekirina zayendên civakî de wek tiştekî sabît qebûl bike, wê çaxê jî çand ê bibe qeder. Ango, Butler dixwaze balê bikişîne ser vê yekê: zayenda civakî jî di înşakirinê de ne xwediyê wateyeke sabît e, çawa tê înşakirin, kî înşa dike, di çi demê de tê înşakirin, ev girîng in lewra li gorî van wateyên

cuda li vê têgehê tê barkirin. Butler, pirsa têgeha zayendê dike û dibêje “zayend çi ye? Tiştekî xwezayî ye, tiştekî anatomîk e, eleqeya wê bi kromozoman heye yan hormonal e, çi ye?” paşê dîsa bersiva vê pirsa xwe bi xwe dide: “zayend ne tiştek e ku xwediyê wê hebe, ne jî tiştekî wisa ye ku neguherbûna kesekî nîşan bide” (Butler, 2014: 8), ango zayend yek ji wan normên çandî ne û “norm ne wekî qanûnê ne, ti carî wateyeke wan a sabît nîn e, carna aşîkar in carna nîn in û di nav pratîkên civakî de wezîfeya normalkirinê dibînin” (Butler, 2020: 62). Butler, bi vî awayî ji bo zayendê têgeha normatîfê bi kar tîne û ji bo zayenda civakî jî dibêje ku ew têgeheke performatîf e. Çi ye ev performatîfbûn? Yanî “zayenda civakî dibe tiştekî termî ango tiştekî laşî, bi bedenê re dibe hemwate û em di encama vê laşîbûnê de zayendê wek tiştekî xwezayî dibînin” (Rose, 2018: 39). Butler ji bo bikaranîna têgeha performatîfê dibêje “armanca me ji nû ve lêkolîn û nîqaşkirina rasteqînîyê ye” (Butler, 2020: 49). Dikare bê gotin ku ev nêrîna Butler peyameke wiha dide me: pênaseyên heyî yên zayenda bîyolojîk û zayenda civakî ewqas jî ne ewle ne, ango rasteqînîya wan cihê munaqaşayê ye. Di derbarê van herdu têgehan de em ji veguhastina Chanter dibînin ku Christine Delphy jî pênaseyeke cuda dike û ji hêleke din li meseleyê dinêre: “Li gorî Delphy binyadên civakî, çand û dîrok li beriya xwezabûn û madeyê tê” (Chanter, 2019: 66). Ango pêşiyê zayenda civakî tê, piştre zayenda bîyolojîk. Ev nêrîn li dijî wê nêrînê ye ku bi gelemperî hatiye pejirandin dibêje zayenda bîyolojîk beriya zayenda civakî tê. Dîsa, ya ku nêrîneke cuda li meselê dinêre femînîst Luce Irigaray e. “Li gorî Irigaray, zayend ne tiştekî bîyolojîk, ne jî tiştekî civakî ye, lêbelê kategoriyeke zimanî ye ku di navbera van herduyan de xetekî ava dike” (Butler, 2020: 63). Hilary M. Lips jî îddîa dike ku ti carî ne mumkin e meriv zayenda bîyolojîk û ya civakî ji hev veqetîne, ango, evan du têgehên lihevalandî ne, lewra dibêje “dema kesek xwediyê laşê mêrekî be ev nayê wê wateyê ku ew kes mêr e, bi heman şiklî kesên ku xwediyê laşê jinê ne, ew laş wan kesan nake jin” (Lips, 2021: 35). Civaknas R. W. Connell jî ji bo vê mijarê dibêje ku “zayenda xwe ya civakî em bi xwe hildibijêrin û tişta ku em jê re dibêjin xwezayî ye, di eslê xwe de, ew ne xwezayî ye, em wê di hişê xwe de wek tiştekî xwezayî înşa dikin” (Connell, 2019: 122-124). Connell, zayenda civakî, wek pêvajoyekî pênase dike, pêvajoyeke înşakirinê. Harun Tunç, nêrînên cuda yên di derbarê zayenda bîyolojîk û zayenda civakî de, tîne ber hev, li gor rewşa îroyîn, di binê çar beşan de rave dike:

*"Nêrîna Bîyolososyolojîk: Ev nêrîn exleb, têgeha zayendê di şûna têgeha zayenda civakî de bi kar tîne û girîngiyê dide fitratê. Xwediyê hişmendiyeke dîndar û muhafazakar e.*

*Nêrîna Sosyobîyolojîk: Ev nêrîn, fikra klasîk a li dijî zayenda civakî dihesibîne. Ew fikra ku dibêje jinbûn û mêrbûn ji aliyê zayenda civakî ve tê înşakirin. Ev nêrîn, ji bo wekheviya zayenda civakî hewl dide.*

*Nêrîna pirrengî ya sosyoînşayî: Kesên xwediyê vê nêrînê, zayenda bîyolojîk, zayenda civakî û nasnameyên zayendî wek têgehên guherbar pênase dikin. Ango dibêjin ji yekî zêdetir zayendên bîyolojîk û civakî û nasnameyîn civakî hene û ev her daîm di nav guherînan de ne. Ev nêrîn, zayenda tayînkirî red dike û dibêje tu kîjan zayendê hilbijêrî, bihewînî zayenda te ew e. Tewir, li gorî vê nêrînê hewce nake ku îllam di navbera zayenda bîyolojîk, ya civakî û nasnameya zayendî de têkiliyek hebe. Ev têgeh dikarin bi serê xwe û bi pirrengî bin.*

*Nêrîna Anarşîst a Dekonstrasyon(deconstruction)ê: Ev nêrîn jî pişta xwe di hemî nêrînan de dike, ango bêzayendbûn û bênasnamebûnê diparêze û hemî pênaseyan serobino dike. Di navenda vê nêrînê de teorîya queerê cih digire" (Tunç, 2022: 31-33).*

Tunç, ji bo herdu nêrînên ewil dibêje munaqaşayên zayenda civakî yên klasîk û modern in. Ji bo herdu nêrînên din jî wek munaqaşeyên nû yên postmodern bi nav dike. Ev kategorîzekirin di derbarê van têgehan de tabloyeke rûniştî di serê meriv de çê dike. Lê tabloyeke wisa ku sînor û naveroka wê her tim di nav guherînê ve. Bi serdema postmodernê re wateya têgehan zûtir diguhere û pir bilez têgehên nû derdikevin der. Hejmara têgehan çiqas zêde dibin, nîqaşên li ser wan jî ewqas zêdetir û xurttir dibin. Bi kurtasî dikare bê gotin ku ti tişt nikare xwe ji bayê guherînê bifilitîne.

### 1.1.2. Rol û Stereotîpên Zayenda Civakî

Her kesek bi wan wesleyên ku rolên zayenda civakî didin diyarkirin ve tê dinyayê. Li gorî van wesleyên cinsî di nav civakê de hêviyên eşkere çêdibin û îdeolojiyên çandî tên sazkirin. Li gorî vê, takekesên ku ji aliyê anatomiyê ve keç bin, hêviyeke weha çêdibe ku ew takekes wek keçan tevbigerin, yên ku wek kur tên pênasekirin jî divê wek kuran tevbigerin. Ji niha ve tê fêhmkirin ku di mijara zayenda civakî de ji xeynî wesleyên cinsî gelek hêmanên din hene ku bi bandor in (Chanter, 2019: 14). Civak, çand, erdnîgarî, kevşenopî û hwd. wek hêman dikarin bêne nîşandin. Lewra civakên ji hev cuda rolên cudatir nîşanî takekesan didin û her takekes bi awayekî xwezayî di nav civakeke çawa de mezin bibe, rolên wê civakê dihesibîne û li gorî wan rolan tevdigere. Lê her çiqas cudahî hebin jî, di navbera civakan de xaleke hevpar heye ku rolên takekesan li gorî zayendên wan têne diyarkirin. Ev rolên zayendî, hê di zarokatiyê de têne fêrkirin. "Zarok, bê hemdê xwe hînê zayendên xwe dibin" (Giddens, 2012: 209), ango dema hê di pêçekê de ne, dê

û bavê wan li gorî zayendên wan miamele nîşanê wan didin, ev miamele di axaftinê de û di tevgerên din de jî bi heman awayî xwe didin der. Bi vî hawî zarok, hê di temenekî biçûk de dikarin tevger an jî rolên jin û mêran ji hev derxin. Bi vî şiklî, pêvajoya civakîbûnê dest pê dike. “Civakîbûn, ew pêvajo ye ku meriv, hînê rolan dibe, normên civakî dihewîne û di nav civakê de dibe wek takekes” (Marshall, 1999: 760). “Ev pêvajo di pitikbûnê de dest pê dike, piştre li dibistanê, bi fêrbûna rolên nû ve didome” (Maybek û Gelmez, 2020: 55). Li dibistanê, ji tevgerên mamosteyan û pirtûkên dersan bigirin heya lîstikên zarokan, tev li gorî rolên zayendî têne înşakirin. “Civakîbûn, di dawiya zarokatiyê de naqede lewra pêvajoyeke wisa ye ku heta hetayî takekes di bin bandora wê de ye” (Lîps, 2021: 24). Mirov çiqas mezin dibe û ber bi takekesbûnê ve diçe, rolên zayendî jî hewqas zêdetir û girîngtir dibin û “herî zêde, di çaxê ciwaniyê de derdikevin der” (Pekel, 2019: 32). Lewra temen çiqas mezin dibe, xwestek û hêviyên civakê yên li hemberî takekesan hewqas zêdetir dibin. Takekes jî bi heman awayî xwe mecbûr dibînin ku xwestek û hêviyên civakê bînin cih. Herî zêde jî di hilbijartina pîşeyan de meriv dikare bandora rolên zayendî yên li ser takekesan bibîne. Lewra civak, ji bo jin û mêran, li gorî zayendên wan pîşeyan kategorîze dike. “Mînak; ji jinê tê hêvîkirin ku him pîşeyên wek mamoste, hemşîre hilbijêre, hem jî bibe kevanî û dayik” (Pekel, 2019: 32). Di heman demê de, ji mêran jî tê xwestin ku li qadên giştî pîşeyên li gorî rolên xwe hilbijêrin û li malbata xwe xwedî derkevin. Li vir, ya ku balê dikişîne mekanên xebatê yên jin û mêran in ku bi awayekî eşkere ji hev hatine veqetandin û mekanên jinê hatine sînorkirin ango jin bi malê ve hatine girêdan. Ji vê yekê, encameke wiha derdikeve holê: nexwe rolên zayenda civakî, di navbera zayendan de newekheviyê ava dike, ango newekheviya zayendî derdikeve holê. Ev newekhevî berî li nav malbatê, di nav zarokan de derdikeve holê. “Dema zarokek kur ‘wek mêran’ tevdigere tê pîrozkirin û malbat pê şa dibe, lê ji zarokeke keç tê hêvîkirin ku ‘wek dayika xwe’ tevbigere” (Lips, 2021: 23). Di vir de xaleke girîng jî heye: zarok dê û bavên xwe ji xwe re dikin mînak û dixwazin wek wan tevbigerin. Di fêrbûn û hewandina rolên civakî de bandora herî zêde ji dê û bavan tê.

Di nav civakê de, “jin exleb wek hestiyar, nazik, bi merhamet, dayik, qels têne binavkirin, mêr jî wek hêzdar, wêrek, serdest, hêrsok têne binavkirin” (Dökmen, 2021: 73). Taybetiyên ku jinan pênase dikin re jinane (feminine), yên ku mêran pênase dikin re jî mêrane (masculine) tê gotin. Bi van taybetiyên ku civakê daye jin û mêran, di her qadên jiyanê de bandorê li takekesan dikin. Lewra wisa tê qebûlkirin ku jin ji ber hestiyariya

xwe nikarin di qadên giştî de cih bigirin, ango nikarin bikevin nav polîtîkayê û nikarin bikevin binê wezîfeyên giran, ji ber ku hestiyariya wan nahêle biryarên baş bigirin. Li gorî civakê jin ne bi hişên xwe herwiha bi hestên xwe ve tevdigerin. Dîsa bi heman awayî mêr, ji aliyê civakê ve bi hişê xwe ve têne pênasekirin, lewra karên giran, mezin û dijwar wek karê mêran hatine qebûlkirin. Ji karên giran bigirin heya polîtîkayê tev wek qadên mêran hatine dîtin. Dema jin û mêr, ji sînorê van rolan derdikevin, ango normên civakî pişt guh diavêjin, gengeşî derdikevin:

> *"Mînak, jineke jîr û di karê xwe de pispor ji aliyê civakê ve nayê hezkirin, civak dixwaze ew jin bizewice, zarokan xweyî bike. Dema jin gotina civakê an jî malbatê nake, bi ya xwe dike, ev yek dibe sebebê pirsgirkêkên mezin. Bi heman awayî, mêrekî ku dixwaze zêdetir bi malbata xwe re, bi zarokên xwe re wext derbas bike, ji ber berpirsiyariya li hemberê malbatê, li hemberê civakê nikare ya dilê xwe bike, bi mecbûrî radibe diçe kar, ji ber debara mala xwe, ev jî rê li ber pirsgirêkan vedike" (Dökmen, 2021: 35).*

Ev mînak dikarin bêne zêdekirin. Jin û mêr gelek caran ji ber ku di bin bandora civakê de dimînin, nikarin bibin xwe; civakê ji bo wan çi rol ava kiribe, li gorî wan rolan tevdigerin. Ev yek jî li ber takekesbûnê astengiyek e. Ji aliyê derûnîya takekesan ve jî rewşeke neyênî derdixe holê. Takekes, xwe tim di binê bandorekî de dibîne, ti carî nikare bibe xwe, nikare ji sînorên normên civakî derbikeve. Jin be mêr be, rolên ku civakê ji bo wan amade kiriye, bê dilê wan be jî dipejirînin û dihewînin. Ev avakirin û pejirandin di navbera civak û takekesan de her daîm didome, li gorî rewş û mercan ji nû ve tê avakirin, carna dijwartir, carna jî nermtir dibe lê ti carî ji holê ranabe.

Stereotîp jî "ew baweriyên rûniştî ne ku ji bo kesekî an jî komekî hatine diyarkirin" (Dökmen, 2021: 96). Ev tîp zû bi zû naguherin, ji xûyên ku civaka di nav de mezin bûne hildidin û li gor vê di nav xwe de dibin kom. Ji aliyê zayendî ve jî jin û mêr wek du komên ji hev cuda tên hesibandin û ji aliyê civakê ve hin rol li wan tên barkirin: "Dema kesek wek jin an jî wek mêr tê kategorîzekirin stereotîp bi xwe derdikevin holê" (Fine, 2018: 31). Jin û mêr nikarin xwe ji kategorîzekirinê dûr bixin, bixwazin nexwazin li gor rolên xwe yên zayenda civakî xwe aîdê kategoriyekî dibînin. Stereotîpên ku tên kom kirin, ji aliyê hestan, wezîfeyan û hwd tên kategorîzekirin û têgihîştineke wisa çêdibe ku wekî ev stereotîp bi van taybetiyên xwe ve ji hevdu cuda bin û wekî ku ev kategorîzekirin rewşeke xwezayî be tê hesibandin. Ev kategorîzekirin jî li gor kar û kirinên jin û mêran yên jiyana rojane pêk tên, ji ber ku jin zêdetir di nav malê de ne, bi karên malê re eleqedar dibin û zarokan xwedî dikin, ev rewş ji aliyê civakê ve wek taybetiya jinê ya xwezayî tê

qebûlkirin. Bi heman awayî mêr jî wekî xwediyê malê xebatkarê karên giran û hwd tên qebûlkirin. Dîsa, di nav civakê de nêrîneke wiha heye ku mêr divê negirîn, girîn wek qelsiyek tê dîtin û ev qelsî jî aîdê jinê tê dîtin ji ber vê yekê, mêrên ku digirîn wek kesayetên qels têne binavkirin û bi tinazî ji wan re tê gotin ku ev mêr wekî jinan e. Mêr ji vê rewşê aciz dibin, ti carî naxwazin bi jinan re bêne berawirdkirin. Ev encama kodên zayendî ne. Jin jî dema bi gogê dilîzin ev yek ji aliyê civakê ve xerîb tê dîtin, lewra lîstika gogê wek mijûlayiya mêran tê dîtin.

### 1.1.3. Newekheviya Zayenda Civakî

Ji aliyê hêz, maf, derfet û statuyê ve xerabûna mêzîna di navbera jin û mêran, keç û xortan de wek newekheviya zayenda civakî tê pênasekirin (Uluocak, 2014: 8). Ji ber ku mêr ji aliyê hêza fîzîkî ve ji jinan xurttir in, jin dibin mexdûrên vê newekheviyê. Ango ji aliyê hêz, maf û derfetê ve jin ji asta wekheviyê dadikevin. Ev newekhevî di nav malbatê de dest pê dike, li hemî qadên jiyanê xwe dide der. Di parîkirina karên nav malê de, di karên qadên giştî de, di bidestxistina mafên mirovî de ev newekheviya zayendî bi awayekî zelal û xurt xwe dide nîşandin. “Ji bo vê têgehê zayendperestî jî tê gotin” (Dökmen, 2021: 117). Kesên ku ji ber zayenda wan, jinan biçûk dibînin û ji ber vê, bertekên neyênî nîşand didin wek zayendperest têne binavkirin. Lewra di vir de zayenda mêr bêqisûr tê nîşandin û wek serdest derdikeve pêş. “Ji ber nasnameya hevjîn û dayikbûnê, newekhevî di nav malbatê de dest pê dike, di perwerdehî, tendurîstî, polîtîka û qadên din de jî berdewam dike” (Kaylı, 2017: 72). Newekheviya fîzîkî bi xwe re newekheviyên din jî aniye û jin ji ber ku wek kesên lawaz, bêhêz hatine pênasekirin ji bona wan karê maqûl wek bermalî hatiye dîtin. Jinên ku tim di nav malê de mane derfet nedîtine ku derkevin qadên din û ji hêz û hunera xwe haydar bibin. Karên cur bi cur nekirine û tecrubeyên wan ên li ser qadên cuda yên jiyanê kêm bûne an jî di hin qadan de qet nebûne xwedî tecrube. Ev yek jî xwe bêhêz û kêmdîtina jinan re bûye sedem. “Di bingeha newekheviya zayenda civakî de wateyên li ser mêbûn û nêrbûnê cih digirin” (Maybek û Gelmez, 2020: 47). Ango rolên ji bo zayendên mê û nêr têne kategorîzekirin dibin sedema derketina newekheviya zayendî. Zarokên ku cara ewil di nav malê de li pêrgî vê newekheviyê tên, piştre di hemî qadên jiyanê de vê yekê ji nû ve tecrube dikin, lewra li ser vê fikra newekhevbûna zayendan digihîjin.

### 1.1.4. Teoriyên Zayenda Civakî

Li ser zayenda civakî teoriyên cur bi cur derketine holê, her teoriyê bi çavekî cuda li vê têgehê nihêriye. "Ev têgeh ne li dijî hev in, her çiqas xalên wan ên cihê hebin jî bi gelemperî hevdu temam dikin" (Dökmen, 2021: 41). Li vir, dê li ser van teoriyên sereke bête sekinandin: Teoriya psîkanalîtîk, teoriya bîyolojîk, teoriya rolên civakî û teoriya Kohlberg.

#### 1.1.4.1. Teoriya Psîkanalîtîkê

Ev teorî ji aliyê Sigmund Freud (1960) ve, li ser fikra 'anatomî qeder e' hatiye avakirin. Li gorî Freud, zarokên keç çavnebariya ezayê cinsî yên zarokên kur dikin. Keç, xwe ji ber anatomiyê, di ber kuran de kêm dibînin. Lewra terîya wan nîn e. Ev pêvajo ji bo 3-5 saliya zarokan e (Lips, 2021: 47). Li gorî Freud elimandina zayenda civakî di sê serdeman de pêk tê: "serdema ewil, di zayînê de tecrubeya keç û kuran a li ser zayendê wek hev e, di serdema duyem de fêrî cudahiyên di navbera zayendan dibin, di serdema sêyem de, ango serdema odipal de, kur ji bavê xwe, keç ji diya xwe dexesîyan dikin" (Dökmen, 2021: 43-44). "Karen Horney jî bereksê Freud îddîa dike ku mêr dexesiya rehîma jinê dikin, ango dexesiya anatomîk ne di keçan de, di kuran de heye û mêr vê dexesiya xwe bi tiştên din ve dixwazin jê bibin" (Lips, 2021: 47). Sosyolog Nancy Chodorow jî ji bo hayjêhebûna zayendê dibêje "dema zarok pê dihese ku ji diya xwe cuda ye, nikare bibe diya xwe, ango nikare bikeve dewsa diya xwe, ewçax tê derdixe ku ew ji diya xwe veqetiyaye û serxwebûna xwe bi dest xistiye; ango ji yên din cuda ye. Helbet ev pêvajo ji bo keç û kuran cudahiyan dihewîne" (Dökmen, 2021: 47). Dê ji ber ku jin e, ev yek, zaroka keç nêzî dê dike û ev pêvajoya naskirina zayendê û serxwebûnê ji bo zarokên kur zehmettir derbas dibe. "Klein jî dibêje zaroka keç di binhişê xwe de fikra potansîyela xwedîzarokan dihewîne û dixwaze ji bavê xwe zarokan çêbike. Herwiha heta zarokan neyîne dinyayê ji tendurîstiya xwe bawer nake, bi welidandinê ve tendiristiya xwe îsbat dike" (Tamerk, 2013: 36).

#### 1.1.4.2. Teoriya Bîyolojîk

Nûnerên vê teoriyê dibêjin sedema tevgerên mirov bîyolojîk e, ango di zayînê de mirov xwediyê tevgerên heyî ne, tevgerên xwe bi xwe re tînin dinyayê" (Keskin û Ulusan, 2016: 51). Ji ber vê nêrîna "bîyolojî qeder e", dibêjin ku cudahiyên di navbera rolên civakî yên jin û mêran de jî bîyolojîk in û nayên guherandin. "Ji bo sedema van cudahiyan jî

zarokanîna jinê mînak didin û dibêjin jin biheml dibin zarokan tînin, lê mêr nikarin vê yekê bikin" (Güldü û Ersoy, 2009: 101). Ji ber vê taybetiya jinê, di şixul û karên jiyanê de jin xwediyê karên nav malê bûye. Lewra ew dayik bûye, bûye berpirsiyara mezinkirina zarokan, mêr jî bi karên derve re, bi pêkanîna debara malê re mijûl bûye. Li gorî vê teorîyê, ev şixul û karên ku bûne para jin û mêran tiştekî xwezayî ye, lewra ji ber xwezaya jin û mêran ev hevparî di navbera herdu zayendan de çêbûne, teorî li ser vê fikrê hatiye avakirin. Hin nûneran ji aliyê derûniyê ve li meselê nihêrîne û teoriya peresanê ava kirine, ev teorî di nav teorîya bîyolojîk de tê nirxandin. "Li gorî vê teoriyê hemî cureyên zindiyan, mirov jî tê da, bi awayekî genetîk ji çaxekî derbasê çaxeke din bûne û jin ji ber vebijêriya xwe, mêr jî ji ber nevebêjeriya xwe peresan bûne" (Lips, 2021: 48). Teoriya bîyolojîk, ji bo cudahiyên di navbera jin û mêran de, xebata mêjî û hormonan wek sedem nîşan dide, teoriya peresanê jî genetîkê, wek sedema cudahiya zayendan dibîne. Teoriya peresanê rêgeza bijartinê ya Darwîn, ji bo ravekirina tevgerên civakî bi kar aniye. Li gorî Darwîn, ev bijartin xwezayî ye û ji bo hewldana jiyînê pêwîst e. Li gorî teoriyê, "mirovan xwestine taybetiyên wan ên genetîk xwe bigihînin nifşên bê û her daîm ev taybetî hebûna xwe biparêzin, lewra ew di bin bandora hêmanên genetîk û pêvajoyên bîyolojîk de mane. Teorî wisa îddîa dike ku rolên zayenda civakî bi vî awayî derketine holê" (Dökmen, 2021: 53).

#### 1.1.4.3. Teoriya Rolên Civakî

Li gorî vê teoriyê, rolên zayenda civakî ji mekanîzmayên fêrbûnê pêk tên (Keskin û Ulusan, 2016: 53). Ango ev rol, ne bîyolojîk in, piştê zayînê di nav jiyanê de bi fêrbûnê re têne bidestxistin. Teoriya bîyolojîk wisa îddîa dikir ku rolên zayenda civakî bîyolojîk in û nayên guherandin, lê teoriya rolên civakî bereksê vê fikrê, bîyolojiyê red dike û li ser bi demê re fêrbûna rolên civakî disekine. Li gorî vê teoriyê, cudahiyên di navbera rolên zayendan de, ji ber cudahiyên civakîbûnê ango sosyalîzasyonê pêk tên. Zayend, di nav civakeke çawa de bêne dinyayê û mezin bibin, dê rolên ku fêr dibin û dihesibînin jî li gorî wê civakê bin. Ev cudahiyên civakî, rolên cuda derdixin holê ji bo jin û mêran û bi vî şiklî meriv dikare behsa cudahiyên di navbera jin û mêran de bike, li gorî teoriyê. Rol, ji aliyê civakê ve têne diyarkirin û ji takekesan jî tê xwestin ku li gorî van rolan tevbigerin. "Dema hin tevger ji aliyê hin koman ve dubare, sêbare têne kirin, êdî ew tevger wek rolên endamên wan koman têne pejirandin. Mînak; çêkirina xwarinê wek karê jinan hatiye dîtin, qezenckirina pereyan jî wek wezîfeya mêran hatiye qebûlkirin" (Dökmen, 2021:

82). Bi vî şiklî jin wek bermal, mêr jî wek kesên ku debara mala xwe dikin têne binavkirin. Ji ber ku mêr li derveyê malê kar dikin û debarê pêk tînin karên mêran ji yên jinan bi qîmettir hatine dîtin. Ev têkiliyên di navbera zayendan di her qadê jiyanê de xwe dubare dikin; di navbera zarokan de, di navbera hevalan de, di navbera dê û bav û zarokên wan de, ev yek jî dibe sedema mayîndebûn û ji nû ve înşakirina rolên civakî.

Teoriyek din heye ku nêzî vê teorîyê ye, ev teoriya fêrbûna civakîbûnê ye. "Li gorî vê teoriyê, dê û bav di çaxa bûyînê de, li gorî zayendên wan li zarokên xwe dinêrin" (Güldü û Ersoy, 2009: 104). Ango zar hê ji diya xwe re nabin, miameleya li gor zayendê dest pê dike. Bi vî şiklî, hê di pêçekê de, pêvajoya civakîbûnê dest pê dike, ev jî bi saya serê dê û bavan dibe. Zarok, dê û bavên xwe ji xwe re wek mînak digirin û li gorî kirin û gotinên wan ji xwe fêrî rolên xwe dibin, wan rolan dipejirînin, dihesibînin û bi wan rolan ve pêvajoya civakîbûnê didomînin. Ne tenê dê û bav, herwiha der û dora zarokan jî ji bo vê pêvajoyê hêmaneke girîng e. Lewra, zarok der û dora xwe dimeyzîne û teqlîd dike, tevgerên der û dorê, bi demê re dibin tevgerên takekes bi xwe. Teqlîdkirin di nav malbatê de dest pê dike û bi mezinbûna zarokan re, li qadên berfirehtir berdewam dike. Li dibistanê, mamoste exleb wek dê û bav têne dîtin, lewra zarok piştî dê û bavên xwe, herî zêde mamosteyên xwe ji xwe re dikin mînak û di bin tesîra kirin û gotinên wan de dimînin. Ji ber vê yekê, dibistan ji bo zarokan mala wan a duyemîn e û xwediyê roleke mezin e. Dîsa, hilbijartina pîşeyan jî di vê hêlê de girîng e. Lewra zarok li gorî zayenda xwe hewl didin pîşeyan hilbijêrin, ev encama hewandina rolên wan e, lewra civak wan mecbûr dihêle di her qadên jiyanê de tercîhên xwe li gorî zayenda xwe bikin. Takekes jî li gorî vê teşwîqkirinê tevdigerin.

#### 1.1.4.4. Teoriya Kohlberg

Angorî vê teoriyê, ji bo di têkiliyên mirovan de nîzamek baş çê bibe divê mirov xwediyê hişmendiyeke lihevgirtî be (Güldü û Ersoy, 2009: 105). Li gorî teoriyê, tevgerên zarokan li gorî nasnameya wan înşa dibe. Dema zarok berefehmê xwe dibin, bi zayendên xwe dihesin, êdî tevgerên xwe li gorî zayendên xwe dikin. "Li gor Kohlberg, sê serdem hene di çêbûna rolên zayenda civakî de: serdema ewil zarok teze zayendan nas dikin, zarokên vê serdemê 2-3 salî ne, serdema duyem, zarok êdî tam zayendên xwe nas dikin, zarên 4-5 salî aîdê vê serdemê ne, di serdema sêyem de zarokên 5-7 salî neguherbûna zayendên xwe qebûl dikin" (Dökmen, 2021: 66). Di serdema ewil de, zarok haj zayendên

xwe hene lê hîna tiştekî  rûniştî tune ye, fikir belawela ne, carna ji aliyê hevduderxistinê ve tevlihevî çê dibe, lê di serdema duyem de êdî zarok bi temamî haj zayendan dibe, dikare bê şik di her rewşê de jin û mêran ji hev derxe. Di serdema dawiyê de jî zarok êdî jê bawer e ku zayend tiştekî neguherbar e.

Teoriya Sandra Bem a bi navê şemaya zayenda civakî ku dişibe ya Kohlberg dibêje "zarok ji bo bikaribin nasnameyeke zayendî bi dest bixin, mecbûr in ku bikaribin jin û mêran ji hev derxin" (Güldü û Ersoy, 2009: 105). Ango li gorî Bem, heke zarok, bikaribin jin û mêran di her qadên jiyanê de ji hev derxin, ewçax ew zarok bûne xwediyê nasnameyeke zayendî. Zarok bi vî şiklî çiqas mezin dibin ewqas fêrî kodên civakî dibin, ango hemî tiştên ku şahidiya wan dikin bi rehetî kategorîze dikin li gorî zayendan. "Şema, pergaleke wisa ye ku bertilên hişên mirov organîze û beralî dike" (Dökmen, 2021: 69). Hemû zanînên kesayetan di vê şemayê de wek kod çê dibin û tê da bi cih dibin. Takekes, fêrbûn û nêrînên li ser zayendan, di vê şemayê de qeyd dikin, ji hev vediqetînin û kategorîze dikin. Li gorî vê şemayê, di hişê takekesan de tevgerên jinane û mêrane, her yek xwe didin aliyekî û di têgihiştinên takekesan de xwe didin der. Ango dema takekes rastî tevgereke zayendî hatin, bi saya vê şemayê dizanin ku ev tevger aîdê kîjan alî ne, demildest tê derdixin ku ew tevgerên jinane ne yan yên mêrane.

Yek ji wan teoriyên ku ji aliyê Bem ve hatiye avakirin, teoriya androjenî ye. Li gorî vê teoriya Bem, "takekesek dikare hem tevgerên jinokî, hem jî yên mêrokî nîşan bide" (Güldü û Ersoy, 2009: 106). Ango, taybetmendiyên ku zêdetir aîdê jinan hatine dîtin û dîsa taybetmendiyên din ên aîdê mêran hatibin hesibandin dikarin heman taybetmendî di yek kesekî de bin û ev kes carinan zêdetir taybetmendiyên jinan carna jî zêdetir taybetmendiyên mêran nişan bide. "Androjenî dikare wek taybetiyeke erênî bê dîtin lewra ew kesên ku androjen in dikarin bi nêrîneke erênî li herdu zayendan binêrin, herwiha heta ji destê van kesan bê, ji newekheviyên di navbera zayendan de dûr disekinin û dikarin empatiyê li hemberî herdu zayendan nîşan bidin" (Dökmen, 2021: 75). Herwiha ew kesên ku rolên civakî bi hişkî diparêzin, kesên androjen bi qasî wan ne hişk in, dikarin bi nêrîneke erênî û nermtir nêzê zayendan bibin.

### 1.1.5 Teoriya Queerê

Teoriya Queerê, dikare bê gotin ku li dijî pênaseya zayendên heyî derketiye holê. Ji ber vê yekê ev teorî wek dijberî teoriya zayenda civakî xuya dike, lewra li gorî zayenda

civakî du zayend hene: jin û mêr. Û meyla zayendan jî tenê dikare li ser zayenda dijber be. Li gorî Judith Butler, ku bi xwe wek avakera teoriya queerê tê binavkirin, zayenda bîyolojîk û zayenda civakî du têgehên wek hevdu ne (Butler, 2019: 52), Butler dibêje: "têgehên wek mê û nêr bi têra xwe guherbar in; her yek dîrokeke xwe heye, wateyên wan li gor sînorên erdnîgariyan û ciyawaziyên çandan diguherin, ji hev cudatir dibin" (Butler, 2020: 27) û "zayend binyadeke îdeal e ku di her demê de metakirina wê mecbûrî bûye" (Butler, 2014: 8). Ev nêrînên Butler, di bingeha teoriya queerê de cih digirin. "Li gorî teoriya queerê zayenda bîyolojîk jî wek zayenda civakî çêkirî ye, ango tê înşakirin. Ev teorî bi çavekî pirsker li cudahiya di navbera zayenda bîyolojîk û zayenda civakî dinêre" (Berghan, 2011: 141). Lewra dikare bê gotin ku teoriya queerê têgihîna zayenda civakî ya li ser zayendan serobin dike. Li gorî vê teoriyê ji duduyan zêdetir zayend hene û meyla zayendî jî li gorî van zayendan dikare bê guherîn. Ev teorî rolên ku ji aliyê civakê ve hatine dayîn red dike û normên civakî yên heyî napejirîne. Civak, kesên ku li dijî normên heyî derdikevin wek kesên ne ji civakê bin, marjînal û dercivakî pênase dike. "Teoriya queerê li dijî kesên ku xwestine nasnameyên marjînal asteng bikin derketiye û ji ber ku carinan wateya zayendan li şûna hev hatine bikaranîn, xwediyê nasnameyeke tevlihev e" (Turan, 2021: 161). Teoriya queerê, dikare bê gotin ku li dijî hemû nasnameyan derdikeve û xwediyê helweseteke rexneyî ye: "Wateya herî girîng a queerê ew e ku ji her cureyê mirov têne ba hevdu û dibin nîşaneya bênasnamebûnê. Queer ne nasnameyek e. Berevajî vê, negengazbûna nasnamebûnê ye. Lêpirsîn û ji rê derketina hemî nasnameyan e" (Durudoğan, 2011: 88).

Peyva "queer"ê, bi eslê xwe peyveke îngîlîzî ye û tê wateya ecêb, sosret, cuda, xiloxarî û hwd. Ev peyv, bi gelemperî ji bo biçûkxistina kesayetên hemcinsî hatiye bikaranîn û derketina vê teoriyê teqabulî salên nodî dike (Özküralpli, 2022: 217). Lê bi demê re "ji aliyê LGBTyên Amerîkayî ve wateya vê peyvê diguhere û hêdî hêdî ji wateya xwe ya ewil dûr dikeve" (Özkazanç, 2015: 91). Ango peyva queerê di destpêkê de ji bo biçûkxistin û vederkirina wan kesên ku ne li gor normên civakî bin tê bikaranîn lê bi demê re ew kesên cuda bi zanayî vê peyvê ji bo xwe bi kar tînin û xwe wek queer bi nav dikin. Herçî kesên xwe "cuda" û "dercivakî" pênase kirine, ji bo diyarkirina vê rewşê peyva queerê bi kar anîne. Ev veguherîna wateya peyvê bi awayekî eşkere dide nîşandin. "Bi kurtasî, wisa xuya dike ku queer ji binavkirinên wan navên wek gey û lezbîyen derketiye holê" (Özkazanç, 2015: 93). "Di sala 1990î de, li zanîngeha Californiayê, ji aliyê Teresa

de Lauretis û hevalên xwe ve konferanseke bi navê ‘Queer Theory’ tê lidarxistin. Ev konferans ji bo nasîn û belavkirina têgeha queerê wek gava ewil tê dîtin” (Turan, 2021: 165). Ango teoriya queerê bi saya konferansa li Californiayê li qadên akademîk û yd. hatiye nasîn û zêdetir deng daye, balê kişandiye ser pratîkên xwe. Ji xebatên piştî xwe re jî bûye mînak û hêz.

Wekî di serî de jî hate behskirin “di salên nodî de kesên trans û hemû kesên ku xwe ji herdu zayendan cudatir bi nav kirine li bin navê queerê kom bûne” (Berghan, 2011: 145). Li gorî van kesan, mirov heta hetayî nikare xwediyê yek zayendekî be, zayend guherbar in û di nav demê de li gorî kesayetan dikarin bêne guherîn. Herwiha ji bo meylên zayendî jî heman tiştî diparêzin û li dijî têkiliyên heteroseksuel derdikevin û dibêjin kesek ji aliyê bîyolojîk ve jin be dibe ku meyla wê li ser jinekê be. Bi heman awayî, zayenda bîyolojîk a kesekî mêr be, dibe ku meyla wî kesî li ser mêrekî be. Dibe ku meyla kesekî li ser hemcinsên xwe be, dibe ku li ser tu zayendan jî meyla wê/wî tune be. Meriv dikare bibêje ku ev teoriya queerê ji hemû meylên zayendî re dibe wek sîwanekî. Lewra hemû kesên ku xwe wek dercivakî, cuda, ecêb û derasayî pênase dikin, di binê navê vê teoriyê de kom dibin. Kesên queer, xwediyê meylên cuda ne û ev kes, ji gotina tercîhên zayendî hez nakin, ji şûna vê, gotina meyla zayendî maqûl dibînin lewra “peyva tercîhê tê wateya guherînê, hemcinsîbûn tiştekî li dijî îradeya mirov e, nayê guherandin û di zayînê de bi mirov re heye. Wekî heteroseksuelbûnê ku pergala heteronormativ wê bi vî şiklî pênase dike” (Özküralpli, 2022: 218). “Pergala heteroseksuel a zordar û meşrûkirî, zayenda civakî wisa înşa dike ku zayendên nêr û mê ji hev bên veqetandin û du zayend derkevin holê.  Lewra wateya hebûna vê pergalê ev e” (Butler, 2019: 74). Kesên ku vê teoriyê dihewînin, li dijî pergala heteronormativê derdikevin û hemû cureyên cihêkariyê red dikin. Ango pirsgirêk heteronormatîv bi xwe ye:

> *“Esil tişta ewil a ku teoriya queerê li dijî derdikeve heteronormatîv e; ango li dijî wek norm pejirandina heteroseksueliyê derdikeve. Lêbelê heteroseksuelî ji meyla cinsî, yanî ji arezûya ku di navbera du zayendên dijberên hev de çêdibe zêdetir e. Ji ber vê, divê hemî normên ku pergala heteronormatîvê ava kirine bên hilşandin. Dema meriv ji tiştekî re bibêje xwezayî ye, tê wê mehneyê ku ew tişt sabît, mecbûrî û neguherbar e. Ji ber vê yekê, di eslê xwe de queer rexneyek e li hemberî pergala heteronormatîv û li ser vê fikrê disekine ku zayenda bîyolojîk, zayenda civakî, meyla zayendî û pratîkên zayendî ne kategoriyên sabît û mecbûrî ne, herwiha dikarin biguherin û ciyawaz bin. Lêgerîna nasnameyê ya teoriya queerê, bi guman, dudil, belawela, bê îstîkrar û guherbar e” (Özküralpli, 2022: 222-223).*

Dema li pênase û mînakan tê nêrîn, tê dîtin ku teoriya queerê têgeheke tevlihev, fireh û bi serê xwe ye. Xwediyê dîrokeke kurt e û tim bi guherîn û rexneyên xwe ve derketiye pêş. Ev teorî, bi taybetî jî li van salên dawî, ji wan kesên ku normên civakî û qaîdeyên zayenda civakî red dikin re bûye wek sîwan û sitar. Herçî kesên xwe ji aliyê nasnameya civakî ve cudatir dîtine û wek dijnormî pênase kirine li binê navê teoriya queerê hatine ba hevdu. Teoriya queerê, bi qasî ji pênaseyan jî tê dîtin ku teoriyeke li dijî nasnameyan e, hemî nasnameyên zayendî red dike û bi xwe jî aîdê tu nasnameyan nîn e. Ev taybetiya wê jî queerê ji aliyê binavkirinê ve zehmettir dike. Ango li gel fikr û pênaseyên cur bi cur, teoriya queerê xwediyê wateyeke sabît nîn e.

## 1.2. ZAYENDA CIVAKÎ Û FEMÎNÎZM

Femînîzma ku ji peyva latînî ya tê wateya jinê "femine" hatîye girtin (Sevim, 2005: 7) tevgereke civakî ye ku di sedsala hijdehemîn de, li Îngîlîstanê, ji bo parastina mafên jinan û pêkanîna wekheviya di navbera zayendan derketiye holê (Marshall, 1999: 240). Armanca femînîstan hewldana bidestxistina mafên jinan e. Ji perwerdeyê heta aboriyê, jin di kîjan qadên jiyanê de rastî neheqiyan hatibin, têkoşîna femînîstan jî herî zêde li ser van qadan bûye. Li gorî agahiyên li ber dest, her çiqas wek tevgereke li dijî mêran xuya bike jî armanca femînîzmê ya sereke wekheviya zayendan e, ne dijmintiya mêran. Bi vê mebestê, gelek cureyên femînîzmê derketine holê. Ev cure hem xwediyê xalên hevpar hem jî xwediyê xalên cuda ne. Lê hemî cure jî bi mebesta têkoşîna li hemberê newekhevîya zayendan û bidestxistina mafên jinan derketine holê. "Ji bo fêmkirina femînîzmê divê serpêhatiya jinê ya di nav dîrokê de bê zanîn. Ne dîroka heyî, herwiha dîroka ku femînîzmê bi xwe daye destpêkirin. Lewra li gorî femînîstan dirok tim di destê mêran de bûye" (Sevim, 2005: 7). Pêvajoya femînîzmê di nava sê pêlan de pêk hatiye. "Pêla yekem di sedsala 19. de dest pê kiriye û femînîstên vê pêlê daxwaziya wekheviya zayendan kirine. Doza mafê perwerdehiyê, mafê bikaranîna reyê, mafê karkirinê. Bi destxistina mafê reyê re ev pêla yekem bi dawî dibe" (Değirmenci, 2017: 19). "Pêla duyem jî di sala 1960î de derdikeve holê û femînîstên vê pêlê zêdetir li ser têgehên malbat û zewacê disekinin" (Değirmenci, 2017: 19). Dikare bê gotin ku bingeha têgeha zayenda civakî di pêla duyem de hatiye avêtin. Lewra femînîstên vê pêlê li rolên jinan lêpirsîne û behsa zayendeke din, zayenda civakî kirine ku ji zayenda bîyolojîk cudatir e û ji aliyê civakê ve tê înşakirin. Simone de Beauvoir wek pêşenga vê pêlê tê qebûlkirin, di heman demê de ji femînîstên piştî xwe re jî dibe mînak. Beauvoir cara ewil behsa jinbûneke

înşakirî dike û bingeha vê înşayê jî di têgeha zewacê de dibîne: "Zewac, tahakuma kêyfî ya mêran didomîne, jinan dixe binê destê mêran. Heta zarok teslîmê jinan, jin jî teslîmê mêran bêne kirin, wê li ser rûyê dinyayê tovê zordestiyê bê avêtin" (Beauvoir, 2010: 81). Beauvoir bi van gotinên xwe ve li hemberê têgeha zewacê derdikeve û dixwaze jin di vê mijarê de azad bin, li ser lingê xwe bisekinin û ji bo rizgariya xwe têbikoşin. "Pêla sêyem jî di sala 1980yan de derdikeve holê. Vê pêla sêyem kêmasiyên pêlên li beriya xwe rexne kiriye û xwestiye têgehên wek nijad, çîn, zayend û çandê bi hev re têkildar bide ber dest û ji hemî cudahiyan re vekirî be" (Değirmenci, 2017: 20). Di pêvajoya femînîzmê de rêbazên cuda derdikevin holê ku ji hin aliyan ve ji hevdu vediqetin. Lêbelê xalên hevpar ên van cureyan jî hene ku ji van xalan ên sereke jî armanca bidestxistina mafên jinan û ji holê rakirina newekheviya di navbera zayendan e. "Hemî cureyên femînîzmê daxwaziya sererastkirina têkiliyên di navbera zayendan dikin û di heman demê de daxwaza guherîna dinyayê û veguherîna têgehên jinbûn û mêrbûnê dikin" (Ramazanoğlu, 1998: 26). Ango hemî cureyên femînîzmê li dijî hevdu derneketine, bereksê vê, wek berdewamiya hevdu, bi heman daxwazê ve derketine holê. Tenê ji aliyê rê û rêbazan ve ji hevdu veqetiyane. Di binê vî serenavî de wê li ser çar cureyên femînîzmê bê sekinandin.

### 1.2.1. Femînîzma Lîberal

Li gorî çavkaniyên li ber destan, rêbaza femînîzmê ya ewil femînîzma lîberal e (Sevim, 2005: 55). Femînîzma lîberal li ser wê fikrê ye ku jin ji ber zayendên xwe li rastê neheqiyan tên û femînîstên lîberal ji ber wekheviya perwerde, tendurustî û mafên mirovan wek rêxistin li hevdu kom dibin (Ramazanoğlu, 1998: 29). "Femînîzma lîberal bi saya ramangêrên wek Wollstonecraft, Wright, B. Antony, Sarah Grimke û J. Stuart Mill derketiye holê û di vê rêbazê de baweriyeke bêhed li hemberî hiş heye" (Sevim, 2005: 55). Berhema Mary Wollstonecraft a bi navê *A Vindication of the Rights of Women* (Parastina Mafên Jinan) wek bingeha vê rêbazê hatiye pejirandin, herwiha yek ji wan metnên sereke yên dîroka femînîzmê ye. Wollstonecraft, di vê berhema xwe de, bi berfirehî li ser mafên jinan, li ser girîngiya perwerdehiya wan û li ser bikaranîna hiş disekine. Li gorî wê "heke mirov bikaribe hişê xwe bi kar bîne, dê zanîn û fezîlet jî bi saya hiş ava bibin" (Wollstonecraft, 2020: 18). Ji ber wê dibêje, jin divê bi bedewbûna xwe nexapin û zêdetir bi bikaranîna hişê xwe re mijûl bibin. Divê jin hem dilê xwe paqij bigirin hem jî ji aliyê têgihîştinê ve xwe pêş bixin, lewra "mêr jinan wek zindiyên bê hiş dibînin û naxwazin li tu qadî fezîletên xwe xurt bikin, heke meriv destûr bide jinê ewçax

dikare hêza jinê bibîne" (Wollstonecraft, 2020: 53). Bi kurtasî, Wollstonecraft xelasbûna jinê di perwerdehî, pêşxistina fezîletê û bikaranîna hiş de dibîne.

Femînîstên Lîberal li ser van xetan teoriya xwe ava kirine:

*"1- Baweriya hiş. Li gorî hin ramangêrên vê teoriyê hiş û Yezdan têne heman wateyê. Takekes di hişê xwe de rêça Yezdan dihewîne; ev jî wijdana takekes e.*

*2- Jin û mêr, ji aliyê ruh û hiş ve wekhev in. Bi awayekî dî, jin û mêr ji aliyê ontolojîk ve wekî hev in.*

*3- Ji bo guherîneke baş di civakê de çê bibe, divê jin û mêr bi awayekî baş û wekhev bêne perwerdekirin. Bi taybetî ji bo meriv bikaribe xwediyê hişekî rexneyî bibe, perwerde pêwîst e.*

*4- Takekes, ji yên din cudatir e, bi serê xwe ye, bi tenê dikare bide pey rastiya xwe û rûmeta takekes bi vê serxwebûnê ve girêdayî ye.*

*5- Bi kurtasî, ramangêrên vê teoriyê li ser mafên xwezayî yên mirovan sekinîne. Teorîsyenên serdema 19. ne tenê li ser mafên sîyasî, li ser hemî mafan sekinîne, bi taybetî jî li ser mafên bikaranîna reyan" (Donovan, 2014: 33-34).*

Femînîzma Lîberal, berê xwe dide wekheviya polîtîk û ekonomîk (Lips, 2021: 53), û di kar û xebatên jin û mêran de wekheviyê diparêze. Li gorî vê teoriyê, beriya her tiştî divê jin berdêla xebatên xwe bikaribin hildin. Hem ji aliyê maddîyatê ve, hem jî ji aliyê maqûlbûna kar ve divê heqê jinan çi be were dayîn, lewra jin di karên giran de bi pereyekî hindik têne şuxulandin, di ser de jî karên malê wek wezîfeya jinan tê dîtin û mal jî wek mekana jinan hatiye pejirandin. Li gorî femînîstên lîberal sedema bindestiya jinan yek jî bermalî ye. "Jina ku sibê heta êvarê nav malê de be nikare dinyaya derve bibîne, ev jî dibe sedem ku jin bibin koleyên malê, xizmetkarên eşyayan. Ji bo rizgariya jinan rêyek heye ew jî xebata li qada giştî ye" (Sevim, 2005: 58). Li gor femînîstên liberal ger jin bikaribin ji malê û ji karên nav malê xilas bibin, li qada giştî di karan de bixebitin û ji girêdayîbûna mêran xelas bibin, ango ji aliyê aboriyê ve bi serê xwe bibin ewçax dê bikaribin rê li ber azadiya xwe vekin.

### 1.2.2. Femînîzma Radîkal

Femînîzma Radîkal, di dawiya 1960an û di destpêka 1970yan de, li New York û Bostonê, ji aliyê koma 'jinên berê' ve hatiye avakirin (Donovan, 2014: 265). Ev rêbaz

dibêje “sedema bindestiya jinê, di rastiyê de, cudahiya bîyolojîk a di navbera jin û mêran de ye” (Pehlivan, 2017: 511). Jin xwediyê taybetmendiya welidandinê ne, zarokan tînin û ev taybetmendî jî di navbera civakê de xwediyê wateyeke cuda ye. Mînak, dema zarokên mêran çê dibin mêr dibin bav, lêbelê ev taybetmendî di nav civakê de ewqas biqîmet nîn e, lewra mêr nikarin zaran bînin, ev taybetmendî bi tenê aîdê jinan in. Ji ber vê yekê, “dayikbûn” bi serê xwe wek rewşeke pîroz hatiye pejirandin di nava civakê de. Ev taybetmendiya dayikbûnê ji aliyê zarokên keç ve jî têne pejirandin û ev zarok gengaz e ku di biçûktiya xwe de, xwe mecbûrê vê rewşa zarokanînê bibînin û rolên xwe yên civakî bi vî awayî bihewînin û bînin cih. Femînîzma Radîkal jî tam di vir de li dijî vê rewşê derdikeve û dibêje ku jin divê bikaribin biryarên li ser bedena xwe bi xwe bidin. Ango jin divê xwe wek mecbûrê vê rewşê nebînin. Divê li gorî daxwaza wan be, kî bixwaze bibe dayik bila ew bibe, kî nexwaze jî divê ji aliyê civakê ve tehdayiyek li ser wan jinan çê nebin û bikaribin li ser rewşa dayikbûnê biryareke cuda bidin. Lewra, li gorî teorîsyenên radîkal, heta bedena jinan azad nebe, jin bi xwe azad nabin. Beriya her tiştî divê bedena wan û biryarên li ser van bedenan, aîdê jinan bi xwe bin.

Di nav teorîsyenên femînîzma radîkal de, du navên girîng derdikevin pêş: Kate Millett û Shulamith Firestone. Herdu femînîst, newekheviya di navbera jin û mêran de bi nêrînên cuda ve şîrove dikin. Kate Millett, têgeha “malbatê” sedema newekheviya jin û mêran dibîne. Millett, li dijî vê têgehê derdikeve û dibêje: “malbat, bingeha pergala pederşahiyê ye. Malbat, eynika civakê ye. Bi gotineke dî, malbat ew tişt e ku takekes û civakê bi hev ve girê dide, li cihê ku polîtîka û faktorên din kêm dimînin, malbat di dewsa wan de pergalê didomîne” (Millett, 1987: 60). Millett, malbatê wek eynika civakê dibîne; ev tê wê wateyê ku rewşa jin û mêran a li nav civakê bi taybetî di nav malbatê de dest pê dike. Jin û mêr beriya her tiştî, di nav malbatê de, ne wek hev in. Herwiha rolên civakî jî di malbatê de dest pê dikin. Ji ber wê femînîstên lîberal, li dijî têkiliyên heteroseksuel ango malbatbûnê derketine, xwestine têgeha malbatê belav bibe da ku newekheviyên di navbera zayendan de ji nû ve neyên înşakirin. Li gorî Shulamith Firestone jî, bindestiya jinê ne ji ber aboriyê herwiha ji ber taybetiya bîyolojîk e. Ew, newekheviya di navbera zayendan de bi bîyolojiyê re ango bi zaranîna jinan re têkildar dibîne û xelasiya jinan jî di bidestxistina kontrola bedenê de dibîne: “Çawa ku ji bo holê rabûna cudahiya çînan serîrakirina karkeran divê, bi heman şiklî ji holê rabûna cudahiya navbera zayendan jî bi serîrakirina jinan ve dikare pêk bê” (Firestone, 1993: 22). Li gorî Firestone divê jin hemî

kiryarên di derbarê zarokanînê de bi dest bixin û teknolojiyê jî bikaribin ji vê hêlê ve ji bo xilasiya xwe bi kar bînin: “Ewçax ew derûniya bindestiyê jî wê ji holê rabe” (Firestone, 1993: 22).

Femînîzma Radîkal, zexta li ser jinê wek bingeha hemû zextan dibîne. Teorîsyenên vê teoriyê wisa dibêjin ku jin di kar û xebatan de, di wergirtina meaşan de wekhevîyekî bi dest bixin jî ev wekhevî dê tim li ber xerabûnê be (Lips, 2021: 57). Ango wekhevî tim ji bo jinan wê mîna xeyalekê be. Jin daxwazên xwe bînin cih jî ev nayê wê wateyê ku ev wekhevî dê heta hetayî bidome. Ji ber vê îhtîmalê jî divê têkoşîna jinan a ji bo wekheviyê tim berdewam bike. Femînîstên vê teoriyê bi gotina “Tişta şexsî polîtîk e” ve tevgerîyane û hemû tiştên ku jinê eleqedar dikin, kirine meseleya polîtîk; anîna zarokan, karê malê, zayendîtî, tundî û tehdayiya mêran a li ser jinan, neheqiyên di kar û xebatan de hatine kirin, tecawiz û hwd hemû xalên ku bûne sedema newekheviya zayendan, wek mijarên polîtîk hatine hesibandin. “Têkiliyên herî mahrem ên mirovan jî ji aliyê femînîstên radîkal ve wek polîtîk têne hesibandin û herwiha zayendîtî bi xwe jî ji aliyê wan ve wek mijareke polîtîk tête dîtin” (Ramazanoğlu, 1998: 32). Ji xeynî van mijaran, femînîzma radîkal, mijara eşqê jî wek sedema bindestiya jinê pênase kiriye û li dijî vê têgehê derketiye: “Femînîstên vê teoriyê eşqê li ber pêşketina jinan wek astengiyekî dibînin, li gor wan eşq, jinan bi mêran ve girê dide û wan bê hêz dihêle” (Donovan, 2014: 270). Femînîstên radîkal, ji bo çareserkirina bindestiya jinan, li ser gelek mijaran rawestiyane, lê pirsîne, rexne kirine û li dijî têgehên heyî derketine. “Ev teorî hemû jinên cîhanê di binê navê ‘xwûşkbûnê’ de kom dike û jinan wek xwûşkên ku bi hev re, li hemberî zilma mêran têdikoşin, bi nav dike” (Ramazanoğlu, 1987: 32).

### 1.2.3. Femînîzma Marksîst

Di dawiya sedsala 19. de li ser tezên femînîzma lîberal minaqaşe dest pê kirine û ev minaqaşe bûne sedema derketina rêbaza marksîstê (Sevim, 2005: 643). Ango di encama kêmdîtina pratîkên rêbaza lîberal de derketiye ev rêbaz. Li gorî femînîstên vê rêbazê, heke di parîkirina kar û şuxulan de, di navbera jin û mêran de wekheviyek bê çêkirin, ewçax cihêkariyên di navbera zayendan jî dê ji holê rabin. Lewra “dema jin di qada aboriyê de li dû mêran dimînin, ev di hemû qadan de dibe sedema paşmayîna jinan li hemberî mêran” (Pehlivan, 2017: 514). Ango, li gorî vê teoriyê ji aliyê aboriyê ve newekheviya jin û mêran bingeha hemû newekheviyan e. Heidi Hartmann (2020: 160),

marksîzmê di nav sê beşan de analîz dike û li gorî wê sê cure marksîst hene: marksîstên ewil, marksîstên nûjen û femînîstên marksîst. Çima ew wiha vediqetîne beşan lewra li gorî gotina wê marksîst ji hev cuda difikirin. Marksîstên ewil hemû jinan tev li kar û xebatê kirine û li ser wê fikirîne ku ev yek, jinan ji newekheviyê rizgar dike. Marks, Engels, Lenîn ji van Marksîstên ewil in. Marksîstên nûjen jî li ser kapîtalîzmê hûr bûne û di vê qadê de li çareseriyekê geriyane. Beşa sêyem, ango femînîstên marksîst, li ser karê malê û têkiliya wê ya bi sermayeyê re sekinîne. Ji vana hinek dibêjin karê li nav malê ji bo berdewamiya kapîtalîzmê ye. Li gorî Hartmann sermaye û milkê taybet, bi tena serê xwe nikarin pirsgirêka jinan çareser bikin lewra bingeha bindestiya wan ne ev e. Hartmann, her sê beşên marksîzmê jî rexne dike û dibêje van beşan, jinan di kategoriya karkeriyê de analîz kirine û zêde li ser têkiliya di navbera jin û mêran de nesekinîne. Ev gotina Hartmann, têkiliya di navbera marksîzm û femînîzmê de bi kurtasî dide nîşandin: “Marksîzm û femînîzm yek tiştek e û ew yekbûn jî marksîzm bi xwe ye” (Hartmann, 2020: 157).

MacKinnon jî marksîzm û femînîzmê dide ber hevdu, berawird dike û ji kîjan aliyan ve dişibin hevdu, an jî ji kîjan aliyan ve ji hev vediqetin, van xalan tehlîl dike û dibêje “ked ji bo marksîzmê çi be, zayend jî ji bo femînîzmê ew e: tişta ku bi temamî aîdê wê ye, lê zêdetir ji wê tê standin” (MacKinnon, 2020: 23). Ji vê gotina MacKinnon jî tê fêhmkirin ku ji bo marksîzîmê bingeha bindestiya jinê çîn e, ji bo femînîzmê jî ev bingeh zayend e. Ango femînîst vê yekê diparêzin û dibêjin jin ji ber jinbûna xwe bûne mexdûrê cihêkariyê. Ji xwe rexneya li dijî marksîzmê jî ev yek e ku marksîst bi vî çavî li jinê nanêrin, ango li gorî wan pirsgirêk ne di zayendan de ye, ew pirsgirêkê di çînan de dibînin, ji ber wê jî çareseriyeke bi bingeh nikarin ava bikin lewra bi yek aliyekî li meseleya newekheviya jin û mêran dinêrin, herwiha çarenûsên ku pêşkêş dikin jî bi heman hawî yekalî û nîvco ne. Qasê ku MacKinnon radigihîne, marksîst û femînîst ji teoriyên hevdu ne razî ne: marksîst ji femînîstan re dibêjin ku ew burjuvazî ne. Ango, femînîst mafên hemû jinan naparêzin, bi taybetî bi jinên burjuvayî re eleqeder dibin, ji bo çîna serdest xebatên xwe pêk tînin. Bi heman şiklî, femînîst jî ji bo marksîstan dibêjin ku ew bi nêrîneke mêrane li meseleya jinan dinêrin. Ango di kirin û gotinên xwe de bi nêrînên mêrane ve tevdigerin û civakê li gorî çînan dinirxînin, ev jî dibe astengî ji nêrîna newekheviya di navbera jin û mêran de re. Bi kurtasî “marksîst û femînîst, herdu alî jî hevdu, di çareserkirina newekheviyê de sûcdar dikin, herdu jî hevdu di teoriyê de kêm

dibînin û hevdu wek reformîst bi nav dikin. Di heman demê de, herdu teorî jî balê dikişînin ser guherîneke bingehîn" (MacKinnon, 2020: 26). Ji van tehlîlan jî diyar dibe ku marksîzm û femînîzm, xwestine ji newekheviya navbera zayendan re çareyekê bibînin û herdu aliyan jî vê çareseriyê di qadên cuda de dîtine û xwestine di van qadan de dawî li cihêkariya di navbera zayendan de bînin. Lêbelê, tê dîtin ku herdu alî jî di kiryarên xwe de qels û kêm mane, herdu aliyan jî bi berfirehî li pirsgirêka bindestiya jinê nenihêrîne û çareyên ku pêşkêş kirine jî yekalî mane, xîtabê hemû jinan nekirine. Dîsa, tê dîtin ku herdu alî ji teoriyên hev aciz bûne û bi çavekî rexneyî û neqayîl li kiryarên hevdu nihêrîne.

Joanne Naiman jî marksîzm û femînîzmê wek du teoriyên ji hev cuda pênase dike û dibêje "marksîzm berê xwe dide têkiliyên mirovan ên di hilberîna civakîbûnê de û ji nû ve hilberînê re eleqeder dibe, femînîzm jî teoriyeke wisa ye ku beriya her tiştî heybera wê têkiliya navbera zayendan e û ji bo wan hemû têkiliyên din ên mirovan piştî têkiliyên zayendan tên" (Naiman, 1988: 64). Naiman jî vê yekê qebûl dike ku marksîzm teoriya mêran e ango bi nêrîneke mêrane hatiye avakirin. Lêbelê, her çiqas wisa be jî li gorî Naiman divê xebat û kiryarên marksîstan ên ji bo jinan li pişt guh neyên avêtin. Naiman, binê vê yekê xêz dike ku teoriya marksîst ne tenê ji aliyê aboriyê ve bi meseleya jinan re eleqeder bûye, divê kiryarên din ên vê teoriyê jî bêne ber çavan. Naiman bi van nêrînên xwe ve, ji aliyekî ve careke din jî cudahiyên di navbera marksîzm û femînîzmê aniye ziman, ji aliyekî din ve jî gotinên neyênî yên li ser markîzmê rexne kiriye. Li gorî Naiman marksîzm ewqas jî teoriyeke ne xirab e ku bibe mexdûrê rexneyên tund. Dikare bê gotin ku Naiman ji van nêrînên femînîstan bi gazin bûye û nexwestiye ku neheqî li marksîstan bê kirin.

Li gor agahî û xebatên li ber destan, tê dîtin ku di nav teoriyan de herî zêde teoriya marksîst û teoriya radîkal xwediyê fikrên berevajî hev bûne û hevdu ji aliyê pratîka teoriyê ve rexne kirine. Lewra femînîstên radîkal ji aliyê bîyolojîk ve li meseleya bindestiya jinê nihêrîne, femînîstên marksîst jî ji aliyê çînî ve li heman meseleyê nihêrîne. Ji ber van xalan, herdu teorî ji aliyê hevdu ve qels hatine dîtin. "Lê her çiqas rêbazên wan cuda bin jî, ji ber ku herdu jî li ser pirsgirêka di navbera zayendan de sekinîne, bi awayekî eşkere herdu alî jî femînîst in" (Ramazanoğlu, 1998: 35).

### 1.2.4. Femînîzma Sosyalîst

Femînîzma sosyalîst jî ji aliyê rêbazê ve zêdetir dişibe femînîzma marksîst lewra bingeha rêbaza xwe ji wir digire. Lêbelê mîna her rêbazê ev rêbaz jî li hemberî fikrên rêbazên li beriya xwe dertê û wana ji hin aliyan ve rexne dike. Femînîstên sosyalîst, li kiryarên femînîst ên li beriya xwe yên li ser meseleya bindestbûna jinê neqayîl in. Ango, ev rêbaz, femînîzma marksîst û ya radîkal ji aliyê teoriyan ve kêm dibîne, dixwaze rêyeke nû ava bike ku ji pirsgirêka newekheviya zayendan û cihêkariya li dijî jinan re bibe çarenûs. Lê dema vê yekê armanc dike, pratîkên van teoriyan li pişt guhê xwe navêje, berevajê wê, bingeha xwe bi pratîkên van teoriyan ve ava dike û rizgariya jinê ya ji bindestiyê ji xwe re dike tekane armanc.

Femînîstên marksîst sedema newekheviya zayendan di aboriyê de dibînin ango ji bo wan newekheviya çînan dibe sedema newekheviya zayendan. Femînîstên radîkal jî sedema vê yekê di pergala pederşahiyê de dibînin û dibêjin newekheviya zayendan ji vê pergalê zaye. Femînîstên radîkal bi israr li ser cudahiyên bîyolojîk disekinin, lewra li gorî wan pergala pederşahiyê xwe dispêre cudahiyên di navbera jin û mêran. Taybetiya bîyolojîk a herî girîng jî zaranîna jinan e ku ev taybetî ji pederşahiyê re bûye melzemeyeke xurt û ji nû ve înşakirina vê pergalê bi saya serê vê taybetiya jinê pêk hatiye, herwiha femînîstên radikal jî herî zêde vê taybetiyê ji xwe re kirine mesele û xwestine biryarên li ser bedena jinan, nexasim anîna zarokan, aîdê jinan bi xwe be, da ku pergaleke wekhev di navbera jin û mêran de çê bibe. Wekî din ne gengaz e ku di nav pergala pederşahiyê de wekheviya jin û mêran pêk bê. Femînîstên sosyalîst jî tam li vir dikevin dewrê û dixwazin hem li dijî kapîtalîzmê hem jî li dijî pederşahiyê derkevin. Ango, li gorî vê teoriyê, azadiya jinê bi têkçûyîna baviksalariya kapîtalîst ve mimkun e. Ji ber vê yekê jî femînîstên vê teoriyê, girîngiyê didin cihê jinan a di hilberînê de û keda wan a di nav malê de. Sosyalîst Anja Meulenbelt, bi taybetî li ser vê xalê disekine û dibêje heke çareseriyek çê bibe divê ji her aliyan ve çê bibe, ango hemû rolên jinan bêne li ber çavan û çareseriyeke bi gelemperî bê bidestxistin: "Heke bi temamî li meseleyê neyê nêrîn ev taybetî dê nikaribin têra azadiya jinê bikin: xwesteka heta nîvê rojê ya kar, kar û mijûlbûnên bi dil û xwesteka parîkirina karên nav malê" (Meulenbelt, 1987: 14). Ev xalên girîng meriv digihînin vê encamê ku pirsgirêka azadiya jinê ji her aliyan ve neyê lêkolînkirin û lêpirsîn, dê teorî û pratîkên heyî têra çareserkirina vê pirsgirêkê nekin û nikaribin wê ji holê rakin.

## 1.3. QADÊN ZAYENDA CIVAKÎ

Zayenda civakî, di gelek qadên jiyanê de bi awayên cur bi cur, xwe dide nîşandin. Ji destpêka têkiliya jin û mêran a di qadên cuda de heya îro meriv dikare behsa vê têgehê bike. Lewra têkiliyên mirovatiyê bi xwe re çandek û teşeya jiyanekî tîne. Zayenda civakî jî di navenda van têkiliyan de cih digire. Bi guherîn û ji nû ve înşakirinan ve ev têgeh hebûna xwe tim diparêze. Di vir de xala girîng ew e ku ev têgeh bi destê çi û bi çi rengî tê înşakirin? Bersiva vê pirsê di têgehên wek pederşahî, dewlet, civak, îktîdar, mêranî û hwd. de xwe dide der. Lewra di bingeha van têgehan de newekheviya zayendan û tehakûma mêran a li ser jinan cih digire. Di nav van têgehan de "pederşahî ji aliyê tehakûma li ser jinan ve dikare bê gotin ku têgeha herî berfireh e, wek sîwanekî ye" (Sancar, 2009: 22). Kate Millett jî ji bo vê têgehê pênaseyeke heman rengî dike: "pederşahî wek saziyekî di avabûna hemî çîn û qadan de xwediyê hêzekî ye" (Millett, 1987: 48). Ango ji malbatê heta polîtîkayê, ji îstîhdamê heta edebiyatê di her qadên jiyanê de, pergala pederşahiyê xwe bi awayên cuda dide nîşandin. Dezgehên ku li jor hatin behskirin jî di navenda xwe de nêrbûnê dihewînin. Îktîdar nêr e, lewra di bingehê de fikra mêranî heye û bi destê mêran tê rêvebirin. "Lê tişta ku îktîdarê dike nêr ne ew e ku bi salan e îktîdar di destê mêran de ye, sedem ew e ku mekanizmaya îktîdarê li ser fikra tehakûmê, vederkirinê, sabîtkirinê û tekparêziyê hatiye avakirin" (Tunç, 2022: 42). Ango dikare bê gotin ku ya pergalê bi rê dibe ji mêran wêdetir hişmendiya mêrane ye. Yanî hemî mêr ne li ser vê hişmendiyê ne, bi heman awayî jinên ku vê hişmendiya mêrane diparêzin jî hene. R. W. Connell jî ji bo tehakûma mêran a li ser jinan têgeha "mêraniya hegemonîk" bi kar tîne:

> *"Têkiliya di navbera jin û mêran de li rastiyeke binyadî, li ser serdestiya gerdûnî ya mêran a li ser jinan hatiye avakirin. Ev rastiya binyadî di civakê de bingeha mêraniya hegemonîk e. Mêraniya hegemonîk, bi qasî ku tim li ser jinan tê înşakirin, bi heman awayî li ser mêrên ku bi awayên cuda hatine vederkirin jî tê înşakirin. Têkiliya di navbera cureyên mêran de perçeyek ji pergala pederşahiyê ye. Lê bi vî şiklî di navbera jinan de meriv nikare behsa têkiliyeke hegemonîk bike. Di têgeha mêraniya hegemonîk de 'hegemonya' ji îktîdara bêmerhemet wêdetir, daxilê nava jiyanên taybet û pêvajoyên çandî dibe. Ew serdestiya ku di pratîkên dînî de, di ragihandin, malbat û polîtîkayê de reh vedaye, hegemonya bi xwe ye. Mêraniya hegemonîk bi saya jin û mêrên îtaatkar ve tê înşakirin" (Connell, 2019a: 267-271).*

Ev têgeha "mêraniya hegemonîk" bi Connell re dest pê dike û di mijara zayenda civakî de wek têgeheke girîng cihê xwe digire, ji aliyê femînîst û xebatkarên zayenda civakî ve tê bikaranîn. Wek ku Connell jî dibêje mêraniya hegemonîk ji tehakumê

derdikeve holê, tehakuma ku mêr li ser jinan dikin. Û dîsa behs dike ku tehakum tenê ne li ser jinan e bi heman şiklî li ser mêran jî ye. Li ser wan mêrên ku nebûne îktîdar û xwediyê tehakumê. Connell ji ber vê, hemî mêran di qada hegemonîk de bi nav nake, wana li gorî kiryarên wan kategorîze dike: mêraniya hegemonîk, mêraniya marjînal, mêraniya alîkar û mêraniya îtaatkar. Mêraniya hegemonîk li gel jinan hukim li ser mêraniyên din jî dike. Li gel vê têgehê Connell têkiliyên zayenda civakî di sê beşan de dinirxîne: Ked, Îktîdar û Kateksîs:

> *"(a) Îktîdar: Mêr di burokrasiyê de xwediyê otorîteyê ne û hemî kadroyên sereke di destê xwe de digirin. Di teşkîlatên polês û eskeran de hema hema bêje hemî hêz di destê wan de ye. Îhtîmala wan a ku li hemberî tecawuz û tundiyê werin angorî jinan pirr kêm e.*
>
> *(b) Ked: Mêr li gorî jinan du qat zêdetir xwediyê qezencê ne û dewlemendbûn di destê wan de ye. Mêr ji jinan zêdetir di îstîhdamê de cih digirin. Mêr, bi taybetî jî hevjîn, ji keda jinan dixwin. Çerxa aboriya modern di bin destê mêran de dizivire.*
>
> *(c) Kateksîs: Mêr ji aliyê têkiliyên cinsî ve ji jinan rehettir bûne. Ji aliyê civaka heteroseksuel ve her tişt li gorî kêfa mêran hatiye amadekirin, di medyayê de jî ev wisa ye. Mêr ji xwe re pergalek ava kirine ku tê de bi rehetî têkiliyên cinsî dijîn, xizmetkaran ji bo van pêdiviyên cinsî bi dest dixin û vê pergalê jî wek tiştekî xwezayî didin nîşandin" (Connell, 2019b: 414-415).*

Bi kurtasî, wek ku bi çavkaniyan jî hate erêkirin tehakuma mêran a li ser jinan destpêka pergala pederşahiyê û destpêka newekheviya hemî qadên jiyanê ye. Ev pergal xwe bi xwe dernakeve holê, ji aliyê dezgehan ve tê înşakirin û berdewamkirin. Malbat, polîtîka, dewlet, medya û hwd. dezgehên sereke ne ku pergala pederşahî konê xwe tê de vedigire. Di heman demê de ev dezgeh di newekheviya zayendan de rola sereke digirin. Pergala pederşahî li gorî qaîde û usûlên malbat û civakan diguhere û di rewşên cur bi cur de xwe dide nîşandin. Xaleke girîng jî ev e ku ev pergal tim bi zordariyê ve rê naçe, bi îknakirinê ve xwe bi rê dibe. Jin bi xwe ji aşê vê pergalê re avê dikişînin lewra "heta destûra jinan tune be ev pergal nikare xwe ava bike" (Sancar, 2009: 38). Ango dikare bê gotin ku di înşakirina têkiliyên pederşahî û mêraniya hegemonîk de her kes bi awayekî cih digire. Ji ber vê yekê divê qadên zayenda civakî yek bi yek, bi hûrgilî bêne lêkolînkirin û ev dezgehên ku ji pergala pederşahiyê re xizmet dikin ji nêz ve bêne analîzkirin da bingeh û sedemên newekheviya zayendan baştir bên dîtin.

### 1.3.1. Malbat

Zayenda civakî di nav jiyanê de, li gorî qadên jiyanê bi awayên cuda tê înşakirin û dubarekirin. Malbat ji bo înşakirina vê têgehê qada sereke ye lewra "ew yekeya herî biçûk

a civakê ye” (Akkaş, 2019: 106). Jiyana mirovekî di malbatê de dest pê dike. Mirov çavê xwe di nava pergaleke çêkirî û amadekirî de li jiyanê vedike, li gorî wê pergalê perwerde dibe, digihîje û dibe yek ji endamê wê pergalê. “Zarok, wateya mêbûn û nêrbûnê cara ewil ji endamên malbatê fêr dibin û tecrubeyên xwe yên ewil ên di derbarê zayenda civakî de, di nav malbatê de dijîn” (Hanks, 2020: 43). Dê û bav, xwûşk û bira kesên ewil in ku mirov ji wan perwerdeya jiyanê digire, herwiha zanînên li ser jinbûn û mêrbûnê jî cara ewil ji endamên malbatê tên standin. Dabeşkirina karên malbatî, gotin û bilêvkirinên li hemberî zayendan, pêlîstokên zarokan, bertekên dê û bavan ên li hemberî zarokan yek bi yek bingeha hişmendiya li ser zayendan û profîla malbatekî di hişê zarokan de ava dikin. Ev zanînên di nav malbatê de di hemî qadên jiyanê de ji nû ve derdikevin pêşberî takekesan. Ji ber vê yekê, heke têgeha malbatê baş bê lêkolîn dibe ku sedemên derketina newekheviya navbeyna zayendan û pêkhatina rolên civakî yên li gor zayendan baştir bêne xuyakirin û bi nêrîneke rasteqînî bên ravekirin. Kate Millett (1987: 60) malbatê wek bingeha pergala pederşahiyê bi nav dike û dibêje malbat eynika civakê û prototîpa dewletê ye. Millett malbat, civak û dewletê wek sê têgehên ku bi hev ve girêdayî ne pênase dike û wan wek çavkaniya pederşahiyê dibîne.

Têgeha malbatê çawa derket holê, ewilî bi çi hawî bû, çi guherîn pêk hatin, an jî guherîn pêk hatin yan na, di pêvajoyeke çawa re derbas bû. Ji bo bersiva van pirsan divê li rabûrdiyê bê nêrîn. Yek ji wan çavkaniyên ku behsa dîroka herî kevin a malbatê dike pirtûka Friedrich Engels a bi navê *Der Ursprung der Familie des Privateigentums und des Staats* (Koka Malbat, Xwedaniya Taybet û Dewletê) e ku di sala 1884an de nivîsiye. Engels, di pêşgotina berhema xwe de rave dike ku zanînên wî xwe dispêrin fikr û xebatên Antropolog Lewis Morgan (Engels, 2021: 11-13). Morgan wek kesê ewil tê pênasekirin ku keşfa gens an jî klanên ku xwe bi qanûnên dayikî ve rê dibirin kiriye (Reed, 2012: 32). Bi xebat û bidestxistinên Morgan re zanînên li ser pergala malbatê ya pederşahî têk diçin. Ango “dîroka malbatbûnê bi pederşahiyê dest pê nake” (Reed, 2014: 91). Nexwe çi cudahiyên maderşahiyê hebûne ji pergala pederşahiyê? Bersiva vê yekê dîsa ji aliyê Engels ve tê dayîn: “Engels li ser wê fikrê ye ku di civatên bi qanûnên dayikê ve rê diçûn de, di kar û baran de wekheviyek hebûye di nava zayendan de” (Mitchell û Oakley, 1992: 137). Gelo ev pergal kêngî û çawa xera dibe ku pergala pederşahiyê bi temamî hakimê qada malbatê û hemî qadên jiyanê dibe? Bersiva vê pirsa me jî dîsa ji Engels tê. Li gor

nêrînên Engels, bi derketina xwedaniya taybetî re qanûnên dayikî cihê xwe ji qanûnên bavî re dihêlin:

> *"Dema di nava malbatan de xwedaniya taybetî dest pê kir û hey çû zêdetir kir, ev yek derbeke mezin li qanûnên dayikî xist. Serweta di nav malê de çiqas zêdetir dibû, di heman demê de girîngiya mêran a di malbatê de ji ya jinan zêdetir dibû. Di serî de ji ber ku zarok di binemaliya dayikê de bûn, qanûnên bavî derbasdar nedibûn ji ber vê jî diviyabû ewilî mîrasa zarokan derbasî bavan bûya, wisa jî bû. Ev şoreş ewqasî bi dijwarî çênebû, bereksî wî bihêsanî pêk hat. Bi rêya mîrasê ve binemalî û qanûnên ku ji aliyê jinan ve dihatin rêvebirin ji holê radibe, di dewsê de binemalî û qanûnên bavî tên avakirin. Ev şoreş tam di kîjan çaxî de pêk hatiye nayê zanîn, tenê ya tê zanîn ew e ku ev bûyer beriya zayînê pêk hatiye"* (Engels, 2021: 66-68).

Ji agahiyên ku Engels bi me dide zanîn encameke wiha tê derxistin: beriya mêr di malbatê de bibin serdest qanûnên ku jinan rê birine hebûne. Lê ji bo vê rêvebirinê meriv nikare bigihîje vê encamê ku serdestiya jinê di wan malbatan de hakim bûye. Evelyn Reed jî balê dikişîne ser vê xalê û dibêje di serdema maderşahiyê de ne newekheviya navbera zayendan ne jî newekheviya civakî tune bûye (Reed, 2012: 173). Ji bo xwedaniya taybet jî Reed dibêje ku ew ji ber zêdebûna milk û mijûlbûna bi çandinê re derdikeve holê (Reed, 2014: 177). Bi çandinê re karên di ba û baxçeyan de zêdetir dibin, bivê nevê malbat erdên xwe ji hev diqetînin, ev jî dibe sedema erd û debara taybet. Derketina xwedaniya taybet dikare bê gotin ku serdemekî digire û serdemeke nû vedike ji bo têkiliyên navbera zayendan û di têgeha malbatê de. Engels vê bûyerê wek têkçûyîna jinê pênase dike: "Di nav malê de jî rêveberî bi temamî kete destê mêran; jin hatin biçûkxistin, hatin bendekirin, bûne amûra kêfa mêran û makîneya zarokanînê" (Engels, 2021: 69).

Bi kurtasî hate behskirin ku di nav malbatê de serdestbûna mêran çawa dest pê kiriye û danûstandineke bi çi rengî di navbera zayendan de hebûye. Lê gelo têgeha malbatê xwediyê guherîneke çawa bûye, an jî bi rastî jî pêvajoyeke guherînê heye yan heta roja îroyîn bi hemû şêwaza xwe ve bûye ev têgeh. "Malbat, têgeheke guherbar e dibêje Morgan, ti carî wek xwe namîne; civak dema ji asta jêr ber bi asteke jor ve diçe, malbat jî ji teşeya jêr derbasê ber bi teşeyeke jor dibe" (Engels, 2021: 38). Antropologê Îngîlîz Bronislaw Malinowski diyar dike ku di têgeha malbatê de heta îro guherînên mezin çêbûne û bi giştî behsa çend malbatan dike: "Malbatên ku wek kom di nav xwe de zewicîne, malbatên li ser hemxwîniyê ava bûne, malbatên ku di nav klanan de pêk hatine û malbatên ku wek yekhevjînî hatine pênasekirin" (Malinowski, 1989: 15) Ev cureya malbatê ya dawî, di serdema îroyîn de, di nav civakê de wek şêwaza îdeal a malbatê tê qebûlkirin. "Di bingeha malbata yekhevjînî de qanûna mîrasê cih digire ku ji bav derbasî

zarokan dibe" (Engels, 2021: 74), ango piştî ku qanûna mîrasê ji dayikan derbasî bavan dibe, mêr ji bo ku jê êmin bin ew zarokên wan in yan na, bi demê re dev ji zewaca komî berdidin û zewaca bi yek jinan re dest pê dike. Ji zewacên di navbera koman de derbasî zewaca bi şexsan re her çiqas ji aliyê wekheviya zayenda civakî ve wek xaleke erênî xuya bike jî Engels vê teşeya malbatê dîsa wek têkçûyîna jinê dibîne:

> *"Zewaca yekhevjînî ti carî nebûye encama eşqa di navbera takekesan de, zewac berî çawa bûye dîsa bi heman şiklî ji aliyê mezinên malbatan ve gihîştine qerarekî, tê de hezkirineke şexsî tune bûye. Herwiha di dîrokê de zewaca yekhevjînî bi ti awayî wek lihevkirina jin û mêran a ji bo zewacê pêk nehatiye û meriv nikare vê zewacê wek cureya herî maqûl bibîne. Bereksê vê, di encama vê zewacê de ji herdu aliyan yek dikeve binê serdestiya aliyê din û di navbera herdu zayendan de pozberiyek derdikeve holê. Di dîrokê de pozberiya çînî cara ewil ji nav zewaca jin û mêran derketiye û zexta çînî jî cara ewil ji zexta mêran a li ser jinên xwe derketiye. Zewaca jin û mêran pêşketineke dîrokî ye lê di heman demê de li gel koletî û xwedaniya taybet destpêka serdemeke paşketî ye ku tê de tim aliyek serdest û şad, aliyek jî bindest û bi êş e" (Engels, 2021: 77-78).*

Li gor agahiyên ku hatine bidestxistin, şêwaza malbata îroyîn xwediyê dîrokeke kevin e û yek ji wan cureyên malbatê ye ku mirovahiyê ew ceribandiye. Malbata yekhevjînî îro di serdema modern de cih girtiye, pênaseya îroyîn a malbatê jî li gorî vê cureya malbatê tê kirin. Hat dîtin ku têgeha malbatê ne têgeheke sabît e, ew xwediyê dîrokeke guherbar e. Ev yek jî vê xala girîng ji nû ve dide nîşandin ku zayenda civakî têgeheke çêkirî û guherbar e, ji têkiliyên mirovatiyê ve dest pê dike û heta îro bi tim înşakirinan ve di têkiliyên mirovan de cihê xwe digire. Dîroka têgeha malbatê û têkiliyên di navbera zayendan de vê xalê piştrast dike. Hat dîtin ku serdestiya mêran a di nav malbatê de bûyereke ne xwezayî ye herwiha piştî guherînên di qanûn û rêveberiya nav malbatê de ev yek pêk hatiye, îro jî ev rewş berdewam e. Xaleke din a girîng jî ev e ku têkiliyên malbatî di heman demê de bûne destpêka newekheviya di navbera zayendan de. Li gorî Engels (2021: 88), tekane çareseriya rizgarbûna jinan ew e ku jin ji nû ve berê xwe bidin xwedaniya civakî û dawî li îktîsadîbûna malbatê bînin.

### 1.3.2. Dibistan

Dibistan, piştî malê qada herî girîng e ku tê de perwerdehiya zarokan li gorî qaîdeyên zayenda civakî pêk tê û zarok ji bo civakîbûnê têne amadekirin. Ango ji bo zarok bibin perçeyek ji civakê, rol û wezîfeyên civakî ewilî ji aliyê malbatê ve pişt re jî li dibistanan têne nîşandin. Zarok, di temenekî biçûk de dest bi dibistanê dikin û dibistan ji bo wan dibe wek mala duyemîn. Mamosteyên xwendekaran ji bo wan dibin wek dê û bav,

ji ber vê yekê tesîra mamosteyan bi qasî dê û bavan li ser xwendekarên wan çêdibe û xwendekar dikarin bêtir di bin bandora gotin û kiryarên mamosteyên xwe de bimînin. Lewra dibistan û perwerdehiya li vir tê dayîn ji bo civakîbûna zarokan xwediyê roleke girîng e:

> *"Perwerdehî, nirxên civakî, fikir û pratîkên civakî fêrî nifşan dike û bi vî awayî di nav nifşan de berdewamiya çanda civakî pêk tîne. Xwendekarên keç û kur divê çawa tevbigerin, kîjan kincan li xwe bikin, hilbijartina kîjan pîşeyan ji bo wan baştir e, civak ji wan çi hêvî dike, ev rolên zayenda civakî tev ewilî ji aliyê malbatê ve tên nîşandin, piştre jî li dibistanan têne dubarekirin, berdewamiya van rolan bi vî awayî têne dabînkirin. Herwiha zarok li dibistanê bi hevalên xwe re dide û distîne, bi vî şiklî fêrî rolên xwe dibe û van rolan di hişê xwe de qeyd dike" (Akkaş, 2019: 107).*

Nirx, rol û pratîkên civakî, wek Akkaş jî behs dike, bi saya perwerdehiyê di nava nifşan de digerin û her nifşek perwerdehiya ku dibîne fêrî nifşên nû dike, bi saya vê çerxa di nav nifşan de zayenda civakî tê înşakirin û berdewamkirin. Ji vê encamê jî diyar e dibistan yek ji wan qadan e ku tê de zayenda civakî tê înşakirin û pireyeke ji çanda civakî di navbera nifşan de tê avakirin. "Dibistan veguhêziya çandî û tevlêkirina civakî ya bona takekesan bi alîkariya hêman û materyalên cur bi cur ve pêk tîne" (Kırbaşoğlu û Eyüp, 2011: 131). Pirtûkên dersan yek ji van materyalan e û ev materyal di pêvajoya perwerdehiyê de xwediyê roleke girîng in, "lewra dewlet, bi rêya pirtûkên dersan bîrdoziya xwe digihîne wan zarokên ku dê bibin mezinên pêşerojê û dîsa di pirtûkan de teşe dide hemwelatiyên xwe û wan li gorî xwe diafirîne" (Helvacıoğlu, 1996: 15). Wêne û nivîsên di van pirtûkan de têne amadekirin rol û wezîfeyên zayendan ên civakî nîşanî xwendekaran didin û di hişê wan de profîlên civakî yên jin û mêran çêdikin. Xebatên ku li ser pirtûkên dersan hatine kirin (Helvacıoğlu: 1996, Kırbaşoğlu û Kılıç: 2011, Sayılan: 2012) didin nîşandin ku di van pirtûkan de newekheviya zayenda civakî bi awayekî eşkere tê xuyakirin. Naverokên pirtûkan ji têkiliyên nav malbatê dest pê dikin heya pîşeyên ku piştî pêvajoya perwerdehiyê têne hilbijartin li gorî qaîdeyên zayenda civakî têne amadekirin. Di pirtûkan de yên ku ji bo dibistanên seretayî hatine amadekirin rol û wezîfeyên jin û mêran ên li nav malê bi vî awayî hatine amadekirin: "Karên jinan ên nav malê paqijiya malê, çêkirina xwarinê û mezinkirina zarokan e; karên mêran jî temîrkirina amûran, danûstandina bona malê, ajotina erebeyê û pêkanîna debara malê ye" (Kırbaşoğlu û Eyüp, 2011: 141). Di hin dîmenan de yên ku tê de hemî endamên malbatê hene jî bav rojnameyê dixwîne, kurik bi erebokên xwe re dilîze, dê xwarinê amade dike û keçik jî alîkariya diya xwe dike. Bi vî awayî çarçoveyek ji bo têkiliyên malbatî tê

çêkirin. Zarokên ku di nav malê de çavdêriya karên dê û bavên xwe dikin, ewilî wan rolên nav malê di hişê xwe de kod dikin, piştre ku dest bi dibistanê dikin û di pirtûkên ber xwe de jî rastî heman dîmenan tên ew rolên jin û mêran ên nav malê zêdetir di hişê wan de tên bicihkirin. Ev rolên nav malê wekî ku xwezayî bin têne têgihiştin û jin wek bermalî, mêr jî wek berpirsiyarê malê di nav pirtûkan de cih digirin, herwiha di hişên zarokan de jî. Di wêneyan de ne tenê dayik herwiha keçên wan jî di karên nav malê de têne nîşandin, "keçên 6-7 salî jî êdî di mitfaxê de, bi pêşokê ve têne xêzkirin, di destê wan de reçelên çêkirî, dayika wan jî li kêlekekê kincan utî dike" (Helvacıoğlu, 1996: 23). Dema xwendekarên keç van dîmenan di pirtûkan de dibînin, bivê nevê bi wan re hewesek çê dibe, kêfa wan ji karên nav malê re tê, ev keçik xwe di wan rolan de xeyal dikin û xwe wek berpirsiyarên pêşerojê yên van karan dibînin.

Di materyalên dersan de jin û mêr ne tenê bi kar û mijûlbûnên xwe ve herwiha bi hest û taybetiyên karakterî ve jî cih digirin. "Di van pirtûkan de jin wek karakterên lawaz, mêr jî wek karakterên xurt hatine nîşandin" (Kırbaşoğlu û Eyüp, 2011: 142). Wek mînak jin, hestiyar, şermok, narîn, fedakar, dilzîz û cî bi cî jî tirsonek, qels, bêbiryar û xeberxweş têne nîşandin. Mêr jî wek qewîn, micîd, bi hêz, wêrek, xwediyê malê, bi biryar û hwd têne nîşandin. Ev kategorîzekirin dema ji aliyê zarokan ve, ji aliyê xwendekaran ve têne pejirandin, di hişê wan de jin wek karakterên lawaz, mêr jî wek karakterên xurt têne kodkirin. Ev cihêkirin encameke wiha derdixe holê ku jin ji ber ku kesayetên lawaz in, bi kêrî xwe nayên, mihtacê alîkariya mêran in û mêr jî ji xwedîderketina jinan berpirsiyar in, lewra ew bi hêz in, diparêzin.

Di pirtûkên dersan de, ji hêla newekheviya zayendan ve yek ji xalên ku derdikevin pêş pîşe ne. Civak pîşeyan jî li gorî zayendan kategorîze dike û ji takekesan hêvî dike ku pîşeyên li gorî zayendên xwe hilbijêrin. Di heman demê de pîşeyên ku ji bo jinan guncav hatine dîtin ji yên bona mêran kêmtir in, ango mêr dikarin di gelek qadan de wek pispor bişixulin lêbelê pîşeyên ji bo jinan bi sînor in. Ev jî bûye sedema wê fikrê ku dibêje jin nikarin her karî bikin. Endezyarî, avahîsazî, karên li ser wesayîtan, dikandarî û hwd. wek karên mêran; mamostetî, hemşîretî, sekreterî, pîrekî û hwd. jî wek karên jinan di nav civakê de hatine pejirandin. Ev yek bi sînorekî teqez ve nehatiye diyarkirin, ango bi guherîna cîhanê re û serdestbûna modernîteyê ve sînorên pîşeyan ên di navbera jin û mêran de guherîne û ji bo jinan ev sînor berfirehtir bûye lêbelê newekheviya zayendan ji holê ranebûye. Lewra îro her çiqas jin di qada giştî de cih bigirin û di pîşeyên cuda de

bişixulin jî pêrgî dîwarekî razber tên ku ev dîwar ji aliyê mêran ve hatiye çêkirin. Ango bi gelemperî, ew karên ku jin û mêr bi hev re dikin di wan karan de jî mêr li asta jor, jin jî di binê asta wan de, carinan jî wek alîkarên wan cih digirin. Mînak; jin exleb sekreter in, mêr jî patron, jin hemşîre ne, mêr bijîşk, jin asîstan in, mêr pispor, jin mamoste bin, mêr dibin rêvebir. Ji ber ku jin zarokan tînin û di malê de jî bi xweyîkirina zarokan re mijûl dibin mamostetî, bi taybetî jî mamostetiya pêşdibistanê wek pîşeya jinan tê qebûlkirin: "Li gorî îstatîkan mamosteyên pêşdibistanê ji sedî nod û pênc jin in" (Sayılan, 2012: 43). Ev jî di nav civakê de dibe sedema vê fikrê ku ji bo jinan pîşeya herî maqûl mamostetî ye û jin herî baş dikarin vî karî bikin, lewra di malên xwe de bûne xwedî tecrube. Helbet ev ne tabloyeke teqez e, lêbelê bi gelemperî ji bo pîşeyan di civakê de kategorîzekirineke bi vî şiklî heye.

Rolên zayenda civakî her çiqas herî zêde bi rêya materyalên dersan ve bêne nîşankirin jî li dibistanan ev ne yekane mînak e. Ji xeynî dersan, di gotin û tevgerên mamosteyan de, di bername û lîstikên dibistanan de, di lîstikên nav xwendekaran de, di cil û bergên xwendekaran de jî rêça van rolên ku ji aliyê civakê ve hatine dayîn bi awayekî eşkere têne xuyakirin. Di heman demê de ji aliyê paqijiya nav polê, paqijiya lênûskên dersan, biaqilbûn, bêdengbûn û ji aliyê guhdarîkirina dersan ve barê xwendekarên keç zêdetir e, lewra paqijî û milayîmbûn yek ji wan kodên zayenda civakî ne ku zêdetir ji bo zayenda mê têne bikaranîn. Rêvebirên dibistanan jî di van mijaran de zêdetir balê dikişînin ser xwendekarên keç lewra li gor nêrîna wan çi hebe zarên kurîn nehs in, ji paqijiyê nizanin û meyla wan li ser tundiyê ye.  Ango dibistan ji her alî ve qadeke girîng e ku tê de zarok, di temenekî biçûk de perwerdehiya civakîbûnê dibînin û hemî zanînên xwe yên li malê, ji nû ve li dibistanan dubare dikin, herwiha di pratîkê de jî ev zanîn xwe nîşan didin. Bi derketina tevgerên femînîst re newekheviya zayenda civakî ya li dibistanan zêdetir hatiye ser ziman û bûye yek ji wan mijarên rexneya femînîst.

### 1.3.3. Qada Taybet û Qadên Giştî

Newekheviya zayenda civakî, di qadên jiyanê de jî jin û mêr ji hev veqetandiye, qada taybet ango mal bûye para jinê, ji xeynî malê hemû qadên jiyanê wek qadên mêran hatine dîtin. Sedema vê yekê, "dabeşkirina karan a di navbera zayendan" (Urhan, 2022: 120) e ku di encamê de karên malê û berpirsiyariyên endamên malê bûne para jinan, karên li derveyî malê jî wek karên mêran hatine pejirandin. "Mal, ji bo hin jinan mekanek e ku

tê de berdewama nifşan pêk tê, ji bo hin jinan cihê kedê ye. Êdî ji bo jinan ne 'mal' herwiha 'hêlîn' e ku tê de wateya kedê ji nû ve tê sazkirin" (Acar-Savran, 2013: 112). Bi vî awayî civak dibe xwediyê wê nêrînê ku mal cihê jinê ye. "Ev nêrîna 'mal cihê jinê ye' di nav xwe de biçûkxistinekî dihewîne. Ev, wekî ku jin nikaribe şixulên derveyî malê bike tê nirxandin. Bawerî bi jinê û bi kapasîteya wê nayê anîn. Li gorî vê fikrê qeweta jinê tenê têra şuxulên nav malê dike" (Kümbetoğlu, 1999: 63). Muameleyên wek kêm feraset û nîv meriv li jinan tên kirin û derketina qada giştî mîna rewşeke ku ji qeweta wan zêdetir be tê dîtin û di nav civakê de tê meşrûkirin. Li gorî nêrîna heyî, ji bo jinan karê herî guncav xwedîkirina zarokan û miqatbûna mala xwe û mêrê xwe ye. Dîsa li gorî heman nêrînê, berpirsiyariya mêran ew e ku li qada giştî bişuxule û debara mala xwe peyda bike. Vê nêrînê, newekheviya zayendan ji nû ve înşa kiriye û hevveqetandina qada taybet û qada giştî wek hebûneke xwezayî daye nîşandin.

Parîkirina karan a cara ewil di heman demê de bûye sedema derketina serdest û bindestan, herwiha ev parîkirin cara ewil di navbera jin û mêran de pêk hatiye (Mitchell, 2006: 20). Ev serdestî û bindestiya di navbera zayendan de bi pêşketina kapîtalîzmê re veguheriye teşeyeke nû, lê ti carî ji holê ranebûye:

> *"Kapîtalîzm, jiyîn û çandina xwe bi xwe ya mirovan ditewişîne. Nahêle mirov bi awayekî azad bike û biçine. Lê di heman demê de rê li ber kirina karên ku qeweta mirov têrê nake vedike. Di civakên kapîtalîst de, ji bo fêhmkirina hilberandina jinê divê bê fêhmkirin ku ji keda kedkaran çawa tê xwarin. Kapîtalîzm ne tenê midaxaleya jiyana karkeran, herwiha midaxaleya hemî kesên ku li derveyî hilberandinê mane jî dike. Midaxaleya zarokan, pîrekan, nexweşan û jinan. Jin hem di nav hilberandinê de cih digirin hem jî di nav karên malê de. Bi awayekî neyênî ev herdu karên jinan tevlihev bûne. Li gorî kevneşopiyê nava malê cîhana jinê ye, ji ber wê jî ti carî bi temamî nikarin tev li qada giştî û endustriyê bin. Di pergala kapîtalîst de nakokiyên di navbera mal û endustrî, taybet û giştî, şexsî û ne şexsî, bûne sedemên serîhildana jinan"* (Rowbotham, 1987: 18-20).

Pergala kapîtalîzmê hem rê li ber xebata jinan a li qada giştî vekiriye hem jî ji keda wan xwariye û hê jî dixwe. Ne tenê ji keda jinan herwiha ji keda mêran jî dixwe. Lê jin hem wek karkerekî ji aliyê pergalê ve hem jî wek bermalekê ji aliyê mêran (hevjîn) ve tên paşxistin. "Jin ne tenê di nav malê de û li derveyî malê dişixulin, di heman demê de, di nav malê de wek dayik kedkarên pêşerojê tînin dinyayê û mezin dikin. Bi vî şiklî ji kapîtalîzmê re dibin alîkar" (Ramazanoğlu, 1998: 111). Ango civakîbûna zarokan bi destê jinan pêk tê. Ji pergala kapîtalîst re kedkar divê û ev kedkar jî li malê, li ber destê jinan digihîjin. Jin, zarokan xwedî dikin, qehra wan dikişînin, mezin dikin û berê wan didin qada giştî. Di ser de jî ev pêvajo wek karê jinan ê xwezayî tê pejirandin. Bi kurtasî

kapîtalîzm hem di nav malê de, hem li derveyî malê midaxaleya jiyan û hilberîna jin û mêran dike û wana di nava vê çerxê de wek kedkarên daîmî dizivirîne.

Bi derketina teoriyên femînîzmê re meseleya qada taybet û qada giştî wek pirsgirêk hatiye dîtin û femînîstan ev hevveqetandin wek meseleyeke polîtîk dîtine û bi fikra "tişta taybet polîtîk e" li hemberî vê hevveqetandinê derketine. "Fikra 'tişta taybet polîtîk e' ji aliyê femînîstên pêla duyem ve, di salên 1960î de derketiye holê. Meqseda vê şîarê, di her qadê de, bidestxistina azadiya jinê ye" (Adak, 2022: 28). Jin vê yekê qebûl nakin ku cihê jinan tenê mal be û dixwazin sînorê navbera qada taybet û qada giştî ji holê rakin, meseleyên qada taybet jî wek meseleyên giştî bidin qebûlkirin. Ji ber vê yekê jî bi taybetî li ser meseleyên wek keda bêpere, heqê reyê, heqê kurtajê, hebûna li qada giştî û hwd. sekinîne. Li gorî femînîstan qada taybet li hemberî jinan astengiyek e û divê ji holê rabe: "Ji bo jinan pîvana mesafeyê bûye pîvana tundiyê. Ji ber vê yekê ye ku femînîzm li ser qada taybet disekine. Ji ber hindê ye ku tişta taybet wek polîtîk dibîne. Li gorî kesên li ser vê fikrê, tişta taybet di eslê xwe de giştî ye" (MacKinnon, 2020: 223). Femînîzm, balê dikişîne ser rewşa jinan a li nav malê û keda wan a razber û bêpere. Bi têgeha "keda bêpere" re femînîstan xwestine karên ku jin di nav malê de dikin lê li beramberî wê tiştekî şênber (wek pere) bi dest naxin raxin ber çavan û keda jinan a ku nayê dîtin û wek kar nayê hesibandin vegerînin ser karê ku beramberî wê têne dayîn. Bi kurtasî keda bêpere ew tişt e ku "di pîyaseyê de qîmeta wê tune ye, li derveyî sînorê aboriya metayê dimîne, bi gelemperî ji şuxulên nav malê pêk tê û raste rast nebe jî bi awayekî tesîr li rewşa aboriyê dike" (Urhan, 2022: 122). Gülnur Acar-Savran têgeha "keda bêpere" li hemberî azadiya aborî ya jinan wek astengiyekî pênase dike û vê kedê wiha kategorîze dike:

> *"Ev astengiya li ber jinan ji xeynî zewacê ti rê li ber wan nahêle û jinan dubare mehkûmê keda bêpere dike. Meriv dikare keda jinan a bêpere ya di nav malê de dikin veqetîne sê kategoriyan. Di kategoriya ewil de paqijî, çêkirina xwarinê, şûştina kincan, danûstandina bazarê û hwd cih digirin. Di kategoriya duduyan de, di nav endamên malbatê de herçî yên ku nikarin li xwe binêrin, ji keda xwe mehrûm in, miqatbûna van endaman cih digire: Miqatbûna zarokan, pîrekan, nexweşan, xizman û hwd. Di kategoriya sêyem de jî jinên ku bê heq di karên çandin û hilberînê de dixebitin cih digirin. Herdu kategoriyên ewil mirov bi temamî nikare ji hev veqetîne. Di xwedîkirina zarok, pîrek û nexweşan de hem ji aliyê fîzîkî ve hem jî ji aliyê derûnî ve kedek tê dayîn. Tişta ku van herdu kategoriyan ji hev vediqetîne ew e ku ji bo kî ew ked tê dayîn. Ji ber ku ev rexneyên li ser keda jinê bêne dîtin divê têgeha kedê berfirehtir bê şîrovekirin. Dema meriv berê xwe ji têkiliyên jin û mêran ên nav malê dizivirîne keda li nav civakê, ewçax meriv ji nû ve hilberînê dibîne. Mal û karên li navê, ji bo kapîtalîzma pederşahî bingeha hilberînê ji nû ve ava dike. Herwiha kapîtalîzm ji bo bingeha xwe ya veşartî ava bike xwe dispêre pederşahiyê"* (Acar-Savran, 2020: 12-15).

Mêr ji ber ku li derveyî malê dixebitin, debara malê pêk tînin, kiryarên wan li ber çav e lêbelê ji ber ku şuxulên nav malê wek kar nayên qebûlkirin, bermalî jî wek kedkarî nayê dîtin. Di encama vê çerxê de tenê kedek tê dîtin ew jî keda mêran e ku ji bo malbata xwe dikin. Bona ku ev nakokî ji holê rabe û keda jinan a nav malê jî bê dîtin û ji kar were hesibandin, femînîstan xwestine karên jinan ên nav malê bila wek karên li qadên giştî bi peretî be. "Kampanyaya ji bo karên malê bi peretî bin di sala 1972yan de li Paduayê, ji aliyê komek jinên Emerîkî, Fransî, Îngîltereyî, û Îtalî ve ligel femînîstên navnetewî hate destpêkirin" (Federici, 2014: 20). Ev kampanya û xebatên ji bo karên malê ji aliyê jinan ve wek şoreşekî hatiye dîtin lewra femînîstan fikra heyî ya li hemberî keda jinan a li nav malê guherandine û ji têgeheke razber zivirandine ber bi karekî şênber û xwestine ev karên malê ne ji kîsê jinan bin herwiha wek karên li dezgehên civakî bi heqê xwe werin kirin. Bi xebatên femînîstan re jin jî hay ji keda xwe ya nav malê bûne qe nebe van xebatên femînîst, rê li ber minaqeşeyên li ser newekheviya navbera keda jin û mêran vekiriye.

Jin ji aliyekî ve ji bo parastina keda nav malê têkoşiyane, ji aliyekî din ve jî ji bo wekheviya heqê xebatê ya li nav pîyaseyê. Bi derketina endustriyê re her çiqas jin li qada giştî, ligel mêran wek karker di nav karan de cih girtibin jî newekheviya li hemberî wan ji holê ranebûye û her çiqas bi mêran re di heman karan de şuxulîbin jî heqê keda wan bi temamî nehatiye dayîn, ango ji mêran kêmtir qezenca wan çêbûye. Ji aliyekî ve jî di endustriyê de bi çavên karker li wan nehatiye nêrîn û hebûna wan a li qada giştî zû bi zû ji aliyê mêran ve nehatiye qebûlkirin. "Mêr li dijî tevlibûna jinan a li nav pîyaseyê derketine, li qanûnên ku rê li ber xebata jinan bigirin geriyane û jinên karker ji tevlibûna sendîkayan dûr xistine" (Urhan, 2022: 130). Herwiha tevlibûna jinan a li endustriyê newekheviya zayendan ji holê ranekiriye, bereksê wê jin dubare hatine qewirandin ji mafên xwe û "ji ber kêm qezencê jin û feqirî bûne mîna têgehên hemwate" (Federici, 2014: 100). Jin ji bo ku navê feqiriyê ji ser xwe biavêjin û ji aliyê aboriyê ve bigihîjin astekî da rêya azadiyê ya li qada giştî li ber xwe vekin, di herdu qadan de bi hemdemî têkoşiyane. Hem li pîyaseyê ji bo wekheviyê li ber xwe dane, hem di nav malê de ji bo wekheviyê bi hevjînên xwe re ketine nav minaqeşeyan. Ji çavkaniyên li ber destan ev encam derdikeve holê ku di her qadî de newekheviya navbera zayendan ji tehakuma mêran a li ser jinan derdikeve holê. Ev tehakum li nav malê dest pê dike, li hemî qadên jiyanê belav dibe û newekheviya zayenda civakî bi vî awayî her ji nû ve înşa dike. Xebatên femînîstan ên ji bo mafên jinan encam dide û "di salên 1970yî de êdî ji bo heqê

kar behsa wekheviyê tê kirin. Ji bo vê yekê di qanûnan de jî gavên nû tên avêtin lê sînorên van gavan nediyar in" (Rowbotham, 1987: 157). Bi wekheviya heq re her çiqas dîwarek yek ji wan dîwarên heyî yên li pêşiya jinan hilşiyabe jî pirsgirêk û kêmasiyên qadên jiyanê ji holê ranebûne, lê jinan jî dev ji têkoşina xwe bernedane, mafên ku bi dest xistine bêtir hêz daye wan.

Ji qadên jiyanê yên ku tê de newekheviya zayenda civakî tê înşakirin yek jî polîtîka ye. "Polîtîka, qadeke pederşahî ye ku li ser newekheviya jin û mêran ava bûye. Ji dewletên ewil bigirin heta pergalên demokratîk ên îroyîn polîtîka, dewlet û burokrasî wek qadên ku aîdê mêran bin hatine dîtin" (Adak, 2022: 18). Mîna qadên din di qada polîtîkayê de jî sedema tunebûna jinan ew e ku jin wek bermalî hatine qebûlkirin û karê sîyasetê ji ser fehm û feraseta wan re hatiye dîtin. Cihê jinê mal e, ew ji bo kar û berpirsiyariyên nav malê hatiye afirandin; lewra ew dayik e, zarokan tîne. Ev, wek taybetiyeke xwezayî hatiye pejirandin. Lewra aqilê jinan li polîtîkayê nabire, polîtîka karê mêran, dewlet jî qada wan e. Ev fikrên heyî yên bi sedan sal berdewam kirine li ber pêşketin û xweîsbatkirina jinan bûne astengiyên mezin. Lêbelê, bi guherîna dinyayê û pêşketina teknolojiyê re kêm zêde hin dîwar hatine hilweşandin, hin fikir cihê xwe ji fikrên nû re danîne û bi derketina rêxistinên jinan re jî jin, ji bo mafên xwe sînorên qada taybet derbas kirine, li qada giştî dane dû mafên xwe, ji bo vê têkoşiyane, herçî mafên ji wan hatine standin ji nû ve dewa bidestxistina wan kirine û pirsgirêkên newekheviya navbera zayendan kirine rojeva hemî qadan. Ji ber ku parîkirina karan û tehakuma mêran a li ser jinan ji malbatê dest pê kiriye, berî her tiştî jinan fikra 'mal cihê jinê ye' red kirine, qada taybet û qada giştî wek hev dîtine, xwestine sînorên di navbera van qadan rakin û tiştên ku di malbatê de pêk hatine wek meseleyên qada giştî dîtine. Ji ber van sedeman jî jinan, di her qadê de dewa demokrasî û wekheviyê kirine. "Hebûna demokrasiyê wekî hemû qadan di qada taybet (malbat) de jî girîng e, lewre li wir îktîdareke ne wekî hev mewcûd e. Wekheviya di malbatê de bingeha civakeke demokratîk ava dike" (Phillips, 1995: 132). Ji ber vê ye ku xelasiya jinê girêdayî têkiliyên malbatî ye. Malbat bingeha hemî qadan e û îktîdar di malbatê de dest pê dike, di hemî qadên jiyanê de bi rêya newekheviya zayenda civakî, ji nû ve tê înşakirin. Jin di qada polîtîkayê de jî li hemberî îktîdara pederşahî û newekheviya zayenda civakî derketine; ji bo bidestxistina mafê bikaranîna reyê û hemî mafên sîyasî, rêyên cuda yên bidestxistina mafên xwe ceribandine:

*"Polîtîka, yek ji wan qadan e ku jin tê de dewa mafên wekheviyê dikin. Ji bo mafên sîyasî, jin bi navê 'Sufraj' tevgerekî didin destpêkirin. Sufraj, ji peyva 'suffragium' tê ku ev peyv bi latînî tê wateya reyê. Tevgera Sufraj, navê têkoşîna hevpar a wan jinan bû ku li dehan welatan, bi dehan rêxistinan û bi hezaran endamên van rêxistinan ve, bi dehan salan, bi tevger, mîtîng, konferans û weşanan ve doza mafên hilbijartin û hilbijêrînê kiribûn. Ji jinên ku di vê tevgerê de cih girtine re 'sufrajîst' hatiye gotin. Yek ji wan welatên ku tevgera Sufraj lê xwediyê bandor bûye Îngîlîstan e. Îngîlîstan ji welatên din re jî bûye mînakek girîng. Li vir, di sala 1897an de, jin komeleya bi navê 'Yekîtîya Neteweyî ya Mafê Reyê' ava dikin. Di bin navê vê komeleyê de jinan kovar derxistine, konferans dane, civîn lidarxistine. Bi rêya van, xwestine dengê xwe bidin bihîstin. Di sala 1903yan de jî femînîstan bi navê 'Yekîtiya Jinan a Sosyal û Polîtîk' komeleyek ava kirine. Van femînîstan xwestine ku derkevin kolanan û dengê xwe zêdetir bidin bihîstin. Jinên ku wek 'Sufrajet' hatine binavkirin, zêdetir serî li rêyên radîkal dane. Ev jin, ketine greva birçîbûnê, xwe bi parapetan ve zincîr kirine, li ser dîwaran dirûşm nivîsîne, carinan jî agir berê avahiyên vala dane. Jinan, girtin û ketina zindanan dane ber çavên xwe, ji bo mafên hilbijartin û hilbijêrînê têkoşiyane"* (Adak, 2022: 21).

Têkoşînên jinan ên li welatên cuda encamên erênî derxistine holê û hêdî hêdî li wan welatan mafên jinan ên bikaranîna reyê hatine dayîn. Jinan "li Awistraylayê di 1902yan de, li Almanyayê di 1919an de, li ABDyê di 1920an de, li Swîsrê, bi awayekî derengmayî, di 1971î de" (Phillips, 1995: 82) mafê bikaranîna reyê bi dest xistine. Bi vî awayî jinan astengiya li ber azadiya xwe ya di polîtîkayê de bi rêya tevger û xebatên rêkxistinî, ne bi sedî sed be jî rakirine û bi awayekî çalak di polîtîkayê de cih girtine. Ev nayê wê wateyê ku newekheviya di navbera zayendan de ji holê rabûye, lewra bi salan polîtîka di bin destê mêran de bûye, xwediyê ziman û hişmendiyeke mêrane bûye. Lê bi tevlêbûna qada polîtîkayê re, bi cih girtina di parlamentoyê de re jinan derfeta guherandina vî ziman û hişmendiyê bi dest xistine. Lê gelo jin di parlementoyê de dikarin çi bikin? Bi rêya hebûna parlementoyê re "jin dikarin li ser meseleyên di derheqê jinan de rawestin, pirsgirêkên jinan bînin ziman û mafên wan biparêzin" (Acar-Savran, 2013: 332). Pirsgirêkên jinan ger raste rast ji aliyê jinan ve û bi nêrîneke jinane werin ziman dibe ku encamên baştir bên bidestxistin. Di roja îroyîn de jî di nav polîtîkayê de zêdetir mêr cih digirin û astengiyên li ber jinan hê jî berdewam in. Jin gelek caran ji bo ku di polîtîkayê de bikaribin bêne xuyakirin û dengê xwe bidin bihîstin "mecbûr mane ku wek mêran tevbigerin, bertekên mêrane nîşan bidin, zimanê mêrane bi kar bînin û di hin cihan de xwe sînordar bikin" (Adak, 2022: 25). Her çiqas pirsgirêkên bi vî rengî berdewam bikin jî jin dev ji polîtîkayê bernadin, bereksê wê, zêdetir hewl didin ku bi awayekî çalak di qada polîtîkayê de cih bigirin û werin xuyakirin.

Bi yekitiya jinan re û têkoşîna wan a ji bo mafan bi xwe re gelek mesele kirine rojevê ku di navenda wan de kontrola jinan a ji aliyê îktîdarê ve cih digire. Bûyîna kurtajê yek ji wan meseleyan e. Jinan xwestine kontrola bedena wan di destê wan de be û herçî jinên ku naxwazin xwediyê zarok bin bila mafê xwe yê kurtajê bi kar bînin. “Divê biryarên li ser bedena jinê ji aliyê wê ve bê dayîn, nexwe jineke ku nikaribe li ser bedena xwe biryaran bide ti ferqa wê û koleyekî ji hev tune ye” (Phillips, 1995: 139). Ji ber vê yekê jinan bi taybetî jî piştî derketina femînîzmê û têkoşîna ji bo mafên xwe, xwestine ji wê dirûvê koletiyê derkevin û biryarên têkiliyên cinsî û anîna zarokan bi destê xwe bidin. Femînîzm, kurtajê wek mafekî şexsî dibîne û vê yekê diparêze dibêje biryarên şexsî divê ji aliyê şexsan bi xwe were dayîn, ne ji aliyê kesekî din ve: “Malzarok ne xaniyek e ku bê kirêkirin, ne jî ew tişt e ku tê de ji aliyê dadgêrekî ve biryara hebûn an jî nebûna cenînê bê dayîn” (Phillips, 1995: 142). MacKinnon (2020: 217) qedexekirina mafê kurtajê bi hebûna “îktîdara cinsî” ve eleqedar dibîne û dibêje mêr hebûna zarokan wek berdewamiya îktîdara xwe dibînin û ji bona hakimiyeta xwe ya li ser rûyê dinyayê hebûna zarokan wek ewletiyekî dibînin. Lewra ji bo mêrên ku ji aliyê têkiliya cinsî ve qels dimînin gelek caran wek “bêîktîdar” têne binavkirin. Ji ber vê “îktîdara cinsî” jinên ku nexwestine têkiliyeke cinsî daynin gelek caran tenê ji bo daxwaziya mêran vê têkiliyê danîne û carinan jî mêran bi darê zorê ev têkilî bi jinan re danîne. Ji xeynî tecawizê di têkiliyên zewacê de jî biryara têkiliya cinsî bi gelemperî ji aliyê mêran ve tê dayîn û jinan nexwazin jî xwe mecbûrî vê têkiliyê dîtine. Ji ber vê jî herçî jinên ku nexwestine têkiliya zayendî daynin an jî xwedî zarok bin, gelek caran xwe avêtine bextê kurtajê. Ji ber vê divê kurtaj wek têgeheke bi kêfî neyê hesibandin. Jin, ji bo kontrola bedena wan di destê wan de be têkoşiyane û li qada giştî, li malê û li her deverên jiyanê li dijî îktîdara mêrane derketine. Di encama vê de “di sala 1973yan de, qedexekirina kurtajê ji aliyê dadgeha bilind a Amerîkayê ve wek îhlalkirina mafê taybet ê mirovane hate qebûlkirin” (MacKinnon, 2020: 217). Ev, ji bo jinan, bi taybetî jî ji bo femînîstan bûye serketineke mezin. Îro her çiqas jinan heqê kurtajê bi dest xistibin jî “ji ber ku kontrola zayînê û kurtajê, di bin kontrola saziyên pederşahî de pêk tên, hê jî mafên jinan ên daxwaza zayîn û kurtajê sînordar in” (Ramazanoğlu, 1998: 213).

#### 1.3.4. Wêje

Jinan, hema bêje mîna hemî qadên jiyanê, di wêjeyê de jî bi salan cih negirtine, an jî tê de kêm hatine xuyakirin. Bi dilê xwe nexwendine, nenivîsîne, encax bi destê mêran

bûne mijarên edebiyatê û bi nêrîneke mêrane hatine temsîlkirin. Heman normên civakî yên jinan di wêjeyê de jî cih girtine. Jin bi kodên wek dayik, bermal, gul, narîn, dilzîz, cazû, fîtne û hwd. hatine nîşandin. Bêparbûna ji perwerde û aboriyê, bûne du astengiyên mezin li hemberî daxilbûn û pêşketina jinan a li qada wêjeyê. Piştî ku tevgerên cuda yên jinan derketin holê, ji gelek welatan jin hatin ba hev, gotin û biryarên xwe kirin yek û ji bo mafên xwe têkoşiyan; teoriyên femînîzmê berbelav bûn, gelek encamên erênî hatin bidestxistin û rêya qada giştî li ber jinan vebû. Bi cihgirtina di endustriyê de û dîtina perwerdeyê re jinan berê xwe dane wêjeyê, bi nêrîneke femînîst tunebûna jinan a di wêjeyê de dane ber rexneyan û pê re rexneya femînîst a wêjeyî pêşket. Maggie Humm armanca rexneya femînîst a di wêjeyê de wiha tîne ziman:

> "*Rexneya femînîst, di edebiyatê de li ser çar xalan disekine. Ya ewil, lêkolînkirina metin û dîroka edebî ya mêrane ye. Rexneya femînîst dixwaze têgehên mêrane yên di van metnan de derxe holê û jin di van metnan de çawa hatine temsîlkirin, bi kîjan norman ve tê de cih girtine, van xalan yek bi yek eşkere bike. Di heman demê de li ser zexta li ser jinê ya di wêjeyê de disekine. Xala duduyan, nexuyakirina jinên nivîskar a di nav wêjeyê de ye. Rexnegirên femînîst, xwestine li ser berhemên jinan ên bê xwedî û li ser çanda wan a dewlemend bisekinin û çarçoveya wêjeyî ji nû ve ava bikin. Xala sêyem, metnên wêjeyî yên dibistanan e. Ya dawiyê jî xwe gihandina xwînerên femînîst e" (Humm, 2002: 26).*

Rexneya femînîst bi çavekî rexneyî li wêjeyê, li metnên wêjeyî nihêriye û xwestiye ji aliyê wekheviya zayendan ve di edebiyatê de kêmasî û şaşiyan raxe ber çavan. Bi vî hawî, jinan hewl dane zêdetir di qada edebiyatê de cih bigirin û berê edebiyatê bidin aliyekî din. Jinên wek Virginia Woolf, Kate Millet, Mary Wollstonecraft û George Eliot bi berhemên xwe ve ji bo pêşketina wêjeyî bûne mînakên ewil. "Dikare bê gotin ku berhema Virginia Woolf a bi navê *A Room of One's Own* (Odeyek ji bo Xwe) mînaka ewil a rexneya femînîst e. Ev pirtûk cudabûna jinê ji aliyê civakî, çandî û edebî ve bi awayekî micîd dinirxîne" (Humm, 2002: 18). Woolf, di vê berhema xwe ya navdar de, di serî de balê dikişîne ser du xalan: "eger jinek bixwaze berhemên honakî binivîse, divê pere û odeyeke ji bo xwe hebe" (Woolf, 2021: 8). Pere û odeyeke ji bo xwe, di jiyana jinan de wek du kêmasiyên mezin derdikevin pêşberî wan. Lewra jin heta ji aliyê aboriyê ve bi serê xwe nebin, an jî piştî ku karê malê qedandin odeyeke ku derbas bibinê û tê de bêhna xwe vedin, xwe bi xwe re bimînin ji bo wan tune be, nikarin bi hişekî zelal rûnin bihizirin, binivîsin. Jin divê xwediyê hişekî zelal û mekaneke aram bin da bikaribin bihûnin. Woolf dikeve pey newekheviya jin û mêran, bi israr li ser xizaniya jinan disekine, "Çima mêran şerab vedixwar lê jinan av? Çima zayendek ewqas dewlemend bû lê ya din

ewqas xizan? Haya we jê heye gelo di derbarê jinan de salê çend kitêb tên nivîsîn? Haya we jê heye gelo çend ji wan ji aliyê mêran ve tên nivîsîn?" (r. 29-30). Woolf, bersiva vê pirsa xwe dîsa bi xwe dide:

> *"Ji bo min tişta meriv xemgîn dike ew e ku berî sedsala hijdehemîn, derbarê jinan de tu tişt nayê zanîn. Ez hatime li vir dipirsim ka çima di serdema Elizabeth de jinan şi'r nedinivîsîn, baş nizanim çawa perwerdehî didîtin; gelo fêrî nivîsandinê dihatin kirin, odeyên xwe yên rûniştinê hebûn an na; çend jinan zarok anîbûn berî bîst û yek saliya xwe; bi kurtayî, ji heştê sibehê heta heştê êvarê çi dikirin. Eşkere ye ku qet pereyên wan nebûn. Min li refên vala dinêrî û difikirîm ku bo jinan ev zehmetî pirr dijwartir bûn. Beriya her tiştî, heta destpêka sedsala nozdehemîn jî, eger dê û bavê wê ne mirovên pirr esîl an pirr dewlemend bûna, odeyeke bêdeng an yeke ku deng tê re neçin li aliyekî, ji bo jinekê ne mimkun bû ku odeyeke ji bo xwe hebe" (Woolf, 2021: 52-58).*

Wekî ku Woolf jî dibêje jin, di her serdemê de ji wêjeyê bêpar mane, di nav xizaniyê de bûne, derfeta wan a nivîsandinê tune bûye lewra ne ji bo xwe, zêdetir ji bo silametiya der û dora xwe hebûne. Herçî malbatên wan dewlemend ji jinên din bi siûdtir bûne lê ew jî di bin baskên malbatên xwe de bûne, ne bi serê xwe. Lewra azadiya jinan bi rewşa wan a aboriyê ve girêdayî ye. Woolf, behsa wê xalê jî dike ku jin çawa ji ber neçariyê di nivîskariyê de navên mêran bi kar anîne, nikaribûne nasnameyên xwe eşkere bikin. Currer Bell, George Eliot, George Sand ji wan jinan in ku navên mêran bi kar anîne û bi wî hawî berhemên xwe nivîsîne. Woolf, her bi dubare behsa newekheviya jin û mêran û zexta li ser jinan a bi destî mêran dike, behsa wê yekê dike ku jin çawa tim di bin siya mêran de mane û wan dişibîne eynikekê ku tê de mêr xwe bilindtir dibînin:

> *"Bi sedan sal e jinan peywira eynikekê pêk anîne ku bi hêza xwe ya bisêhr û nuwaze, fîgura mêr ji ya rastî du qat mezintir dide der. Di civakên medenî de çawa tên bikaranîn bila be, ji bo kiryarên bişidet û lehengane eynik pêwîst in. Ji ber vê ye ku Napoleon û Mussolini herdu jî li ser nizmiya jinan wisa bi israr disekinin, çimkî eger jin ne nizm bûna, ew bi xwe wê mezintir nebûna. Ev tişt, pêdiviya mêran a bi jinan -pirî caran wisa ye- qismen rave dike. Herwiha rave dike ku li hember rexneyên jinan çi dilnerihet in; ku ji bo jinan qet ne mimkun e ji wan re bibêjin ev kitêb ne baş e, ev resm qels e an her çi be, bêyî ku bêhtir biêşînin an hêrs bikin ji mêrekî ku heman rexneyan bike. Çimkî, eger jin dest bi gotina rastiyan bike, fîgura di eynikê de diquncife, piçûk dibe; lihevkirina mêr û jiyanê kêm dibe. Eger mêr di dema taştê û şîvê de xwe herî kêm du qatê xwe yê rastî mezintir nebîne, wê çawa biryarên dawîn bide, hovan medenî bike, qanûnan dayne, kitêban binivîse, cilûbergan li xwe bike û li xwarinên fermî xwe bi nav axaftinê re berde?" (Woolf, 2021: 39-40).*

Woolf, balê dikişîne ser serdema bîstemîn ku çawa di vê serdemê de jinan hema bêje bi qasê hejmara berhemên mêran berhemên cur bi cur nivîsîne. Herwiha sedemên vê pêşketiyê jî bidestxistina mafên jinan re eleqedar dibîne. Her çiqas jin di serî de di bin bandora hişê mêrane de mabin û berhemên xwe li gorî vî hişî nivîsandibin jî bi demê re,

bi zêdebûna hejmarên nivîskar ên jin re, bi zêdetir cihgirtina di nav edebiyatê de û xwendinên femînîst re jinan ne bi temamî be jî xwe ji hişê mêrane rizgar kirine, berhemên cudatir afirandine û derfeta temsîliyeta xwe ya di nav edebiyatê de bi dest xistine. Woolf, ji ber vê pêşketinê hestên xwe yên erênî tîne ziman û baweriya xwe ya ku rojekî ewê jin bi temamî bibin "xwe" wiha tîne ziman: "fikirîm ku her tişt dê mimkun be dema jinbûnî êdî nebe mijûlayiyeke parastî" (Woolf, 2021: 45).

### 1.3.5. Medya

Zayenda civakî, bereksê zayenda bîyolojîk ne têgeheke xwezayî, herwiha têgeheke înşakirî ye ku di bingehê de qaîde û normên civakî cih digirin. Newekheviya di navbera zayendan de jî di encama van qaîde û norman de derdikeve holê. Di destpêkê de li nav malbatê, piştre hemî qadên jiyanê ev newekheviya di navbera jin û mêran de bi awayên cuda xwe dide der, dîsa bi destê jin û mêran, tim ji nû ve tê înşakirin. Medya jî yek ji wan qadan e ku tê de newekheviya zayenda civakî tê înşakirin. "Medya di civakîbûna takekesan de, di fêrbûna nirx û normên civakî de û di teşegirtina nasnameyan de xwediyê roleke girîng e" (Şener, 2022: 163). Di vê serdema teknolojiyê de takekesên ku bi medyayê re têkildar nebûne û di bin bandora wê de nemane hema bêje qet tune ne. Lewra kêm zêde di her malê de qet înternet tune be jî televîzyonek heye. Di heman demê de rolên zayenda civakî cara ewil di malbatê de têne fêrbûn. Ango takekesek di zarokatiya xwe de bi medyayê re, bi taybetî jî bi televîzyonê re rû bi rû dimîne. Bi vî awayî tiştên ku di televîzyonê de fêr dibin li ser rolên takekesan tesîreke mezin dihêlin. Zarok, çiqas ji malbata xwe fêrî rolan dibin ewqas ji televîzyonê jî fêr dibin û piştê mezin dibin, ji mal derdikevin jî bandora televîzyonê ya li ser takekesan berdewam dike. Zarok fîlm, xêzefîlm û rêzefîlmên li ser malbatan di televîzyonê de dibînin, rolên dê û bavan, xwûşk û brayan ji nû ve di hişê xwe de kod dikin: "Di reklamên televîzyonan de malbat tim dilşad in. Hemû bav li derve dixebitin, dayik jî bi rastî gelekî ji karên malê hez dikin. Hemû keçikên ciwan ên li ser ekranê, xwediyê çîpên dirêj, diranên spî û goreyên tenik in. Ev hemî hêmayên fêrkirî ne" (Connell, 2019: 351). Televîzyon bi rêya reklam fîlm û hwd. tabloyeke bê qusûr a malbatê bexşê takekesan dike. Bi vî hawî rolên zayenda civakî ji aliyê medyayê ve careke din têne înşakirin. Di heman demê de televîzyon, di navbera çand û civakan de wek pireyekî cih digire. Herçî televîzyonê temaşe dikin ji civakên cuda û çandên wan jî haydar dibin. Bi vê haydarbûnê re takekes dikarin çanda xwe û çandên dîtir bidin ber hevdu û berawird bikin.

Di medyayê de jî wek jiyana rasteqîn, jin û mêr ji nû ve têne teswîr kirin û bi rolên kodkirî ve têne nîşandin. Bi vî awayî di navbera medya û civakê de danûstandineke razber pêk tê. Medya ji civakê sûd digire û zayendan ji nû ve teswîr dike, civak jî bi rêya medyayê wan rol û stereotîpên zayendan di hişê xwe de bi cih dike û dihewîne. Rolên jin û mêran li ser medyayê jî li gorî zayendên wan têne diyarkirin. Di medyayê de jin di nav malê de ne, mêr li derveyê malê ne. Jin "bedew", "bişox", "nazik", "fedakar", û "dayik", "qels"; mêr "egît", "merd", "qewîn" "wêrek", "bihêz", "şerger" û "awirtûj" in. Bi vî hawî stereotîpên zayenda civakî ji aliyê medyayê ve ji nû ve têne înşakirin û li ber çavê civakê tim zindî dimînin. Herwiha di medyayê de nasnameyên marjînal nayên nîşandin lewra li gorî civakê tenê du zayend hene: jin û mêr. Û her zayend bi rol û peywirên xwe yên civakî têne nasîn li ser medyayê. Ev jî ji vê fikrê re bingehekî ava dike ku rolên zayendan xwezayî ne û naguherin.

Di medyayê de xaleke din a girîng heye ku ew jî objebûna (tişte) jinê ye. Di çavê medyayê de jin objeyek e ku bi tevgerên cinsî ve derdikeve pêş, lewra jin bi gelemperî bi profîleke wiha derdikeve ber ekranê: "Çavên xwe diqirpîne, porê xwe ba dike, dibe wek rawirekê ku tenê ji lêv, qalçe û memikan pêk tê û mîna ku armanca wê tenê balkişandina mêran û hesûdiya hemcînsan be tê nîşandin" (Vatandaş, 2020: 765). Ev, meriv digihîne vê encamê ku bedena jinê wek metayekê, bi rêya medyayê tê bazarkirin, lewra armanca ewil a medyayê bidestxistina qezenceke xurt e, ev jî encax bi rêya bazareke xurt dikare pêk bê. Bedena jinê dibe tişteya ku mêraniya hegemonîk hebûna xwe li ser ava dike. Lewra yek ji rêyên avakirina mêraniya hegemonîk zayendîtî ye: "Bi rêya denetîma zayend û bedena jinê mêr hegemonyaya xwe îsbat dikin, li jinan bi çavekî cinsî dinêrin û bi vê rêyê pesnê hebûna xwe ya serdest didin" (Sancar, 2009: 196). Ji ber vê ye jin di medyayê de wek ku ji tatmînkirina mêran berpirsiyar bin têne nîşandin. Ne tenê di reklam û rêzefîlman de, herwiha di nûçe û çapemeniyê de jî ev mêraniya hegemonîk û objekirina jinê bi eşkere tê xuyan. Ji aliyekî din ve jî "ji xebatên ku hatine kirin ev encam derdikeve" (Şener, 2022: 169) ku jinan di medyayê de ji mêran hindiktir cih girtine. Herçî cih girtine jî bi nêrîneke mêrane hatine teswîr kirin. "Di kovar û rojnameyan de wêneyên jinan mexsûs bi awayekî mezin û di rewşeke ku zayendîtiyê bîne bîra mirov de hatine bikaranîn" (Vatandaş, 2020: 777). Ji ber ku medya jî bi pergaleke pederşahî ve hatiye rêvebirin zimanê medyayê zimanekî mêrane bûye. Nûçeyên ku tê de behsa jinan hatine kirin jî herwiha bi vî zimanî ve hatine ravekirin. Di heman demê de jinan bi qasî mêran

wek xebatkar di xebatên medyayê de cih negirtine. Lewra karê çapemeniyê bi gelemperî wek karekî mêran hatiye hesibandin. Ev jî bûye yek ji wan sedemên newekheviya zayenda civakî di qada medyayê de.

Medya wek amûrekê di qada polîtîkayê de jî cihekî girîng digire. "Di têkiliya medya û polîtîkayê de, hêza nûçeyên medyayî nayê piştguhkirin. Namzetên polîtîk di pêvajoya hilbijartinê de, ji bo îmajeke cuda û qanihkirina mirovan divê di nûçeyan de cih bigirin" (Çağlar, 2014: 68). Lê di vir de newekheviya zayenda civakî çawan derdikeve holê? Ji ber ku medya bi gelemperî di destê mêran de bûye, zimanê medyayî zimanekî mêrane bûye, jin hem wek xebatkar hem jî wek cihgirtina di nûçeyan de bi qasî mêran di qada medyayê de xuya nekirine. Ev tev ji xweîfadekirina namzetên jin ên ku di polîtîkayê de cihgirtinê re dibin asteng û namzetên jin bi qasê namzetên mêr nikarin medyayê bi awayekî çalak ji bo pêvajoya hilbijartinê bi kar bînin. "Di avakirin û cihgirtina nûçeyan de zayendperestiyeke li ber çav heye. Nûçeyên zayendperestiyê bandorê li ser tevger û biryarên gel dihêlin û midaxaleya fikrên gel dikin" (Çağlar, 2014: 69). Hemû qadên jiyanê têkildarê hev in û bi awayekî bandorê li ser hev dihêlin, ji ber wê heta zimanê zayendperestî û hişmendiya pederşahî ji nav hemû qadên jiyanê venekişe, ne gengaz e ku mirov behsa wekheviya di navbera jin û mêran de bike.

Wek ku di serî de jî hate vegotin medya, yek ji wan qadan e ku tê de newekheviya zayenda civakî bi awayekî nepen an jî eşkere tê xuyakirin, jin hem ji aliyê karên medyayî ve, hem jî ji aliyê cihgirtina di medyayê de bûne mexdûrên vê newekheviyê. Rolên zayendan ên civakî careke din bi rêya medyayê ve têne dubarekirin û ev rol ji aliyê takekesan ve têne hewandin. Ligel taybetiyên neyênî yên medyayê taybetiyên wê yên erênî jî hene û hêjayê behskirinê ne.  Di vê serdema teknolojiyê de televîzyon, înternet û medyaya civakî rasterast an jî bi awayên dî di jiyana mirovan de cih digirin. Nasîn, agahdarkirin û belavkirin bi saya teknolojiyê hêsantir û leztir bûne. Mirov, bi saya pêşketina teknolojiyê û derketina hesabên medyaya civakî re hem zûtir dikarin ji agahî û nûçeyên heyî agahdar bibin hem jî dikarin fikir û nêrînên xwe bînin ziman. Di encama vê de meriv dikare alîgirî û kombûnê, li ser medyaya civakî, bi rehetî bibîne. Ev yek, ji bo jinan, bi taybetî jî ji bo jinên bi rêxistin taybetiyeke erênî ye. Lewra jin bi rêya medyayê hem dikarin dengê xwe bilindttir bikin, hem jî dikarin ji hev agahdar bibin û werin cem hev. Jin, ligel kolan û qadan, êdî li ser medyaya civakî jî dikarin çalakiyan pêk bînin, xwe bigihînin zêdetir kesan û encamên bi bandor ji van çalakiyan bi dest bixin. Ji vê yekê re

“çalakvaniya dîjîtal tê gotin û di vê serdema teknolojiyê de ev cureya çalakvaniyê xwediyê cihekî girîng e” (Odabaş û Hatiboğlu, 2020: 35). Tundî û neheqiyên li dijî mirovan jî bi saya medyayê zêtedir û zûtir tên xuyakirin û di nûçeyan de cih digirin, ev yek jî rê li ber jinan vedike, jin dema li qada taybet an jî li qadên giştî rastî tundiyê hatin, an jî heqê wan hate xwarin, dikarin bi rêya medyayê dengê xwe bigihînin saziyan.

# BEŞA DUYEMÎN

# DÎN Û SEKULERÎZM

Di vê beşê de wê li ser du serenavan bê sekinandin. Serenavê yekem derheqê têkiliya dîn û zayenda civakî de ye. Di înşakirina zayenda civakî de dîn roleke çawa nîşan daye bi alîkariya çavkaniyên ku hatine bidestxistin ve ev mijar wê bête tehlîlkirin. Serenavê duyem têgeha sekulerîzmê ye. Di binê vî serenavî de, dê li ser pênaseya sekulerîzmê, têkiliya wê ya bi dîn re bê rawestin.

## 2.1. TÊKILIYA DÎN Û ZAYENDA CIVAKÎ

Dîn û dîroka mirovahiyê xwediyê heman demê ne, ango bi destpêka mirovahiyê re dîn jî derketine holê. Ji ber vê yekê di dîroka mirovahiyê de hema bêje ji bo her civakê, wekî gelek hêmanên sosyal, dîn jî hêmaneke girîng bûye (Açıkgöz, 2010: 17). Ji ber vê yekê di çand û kevneşopiyên civakan de rêça dînan bi awayên cuda dikarin bêne dîtin. Lê gelo têkiliya dîn û zayenda civakî bi çi karî ye? Zayenda civakî ew nasname ye ku ji aliyê civakê ve ji bo takekesan tê diyarkirin. Hêmanên cur bi cur ên wek çand, kevneşopî, norm û hwd. di teşegirtina vê nasnameyê de xwedî bandor in. Ji van hêmanan yek jî dîn e. "Dîn, berpirsiyarî, qaîde û qanûnan tîne nav civakên ku tê de ye, dixwaze bi van qaîdeyan ve civakan têke nav pergalekî û bi rê bibe. Herwiha ev qaîde ji bo têkiliyên di navbera zayendan de jî derbasdar in" (Açıkgöz, 2010: 7). Ango dîn bi giştî civakan, bi taybetî jî takekesên wan civakan li gorî qaîdeyên xwe dixe nav şêwazekî. Bi vî hawî takekes, qaîdeyên dînî di nav xwe de dihewînin, wan qebûl dikin û li gorî wan tevdigerin. Tesîra dîn a li ser takekesan li gorî zayendên wan diguhere: "Bandora dîn li ser her du zayendan bi heman awayî nayê xuyakirin. Bi taybetî jî tesîra wê ya li ser jinê tim bûye mijareke tevliveh, bi nakokî û gengeşî" (Berktay, 2019: 8). Sedema vê gengeşiyê jî têkiliya dîn û pergala pederşahiyê ye, lewra "dîn xwe dispêre hişmendiya pederşahiyê, ji ber vê yekê jin di nêrîna dînî de zayenda duyem e" (Köysüren, 2013: 11). Herwiha ev hişmendî, di demên cuda de, di nav gotin û kiryarên dînî de, bi awayên cuda derketine der.

Di dînê Totemîzmê de mêr li ser jinan re, îxtiyar jî li ser ciwanan re tên dîtin. Li gor baweriya vî dînî ger nasekî jinekî bimire ew jin divê porê xwe jê bike, xweliyê li xwe wer ke û di wextê şînê de bi ti awayî dengê xwe dernexe, neaxive (Gürhan, 2010: 63). Tê dîtin ku jin û mêr li gor dînê Totemîzmê ne wek hev in û ev dîn wek rîtuel hin berpirsiyariyan dide ser milê jinan. Ev yek di dînên Hîndîstanî de jî tê xuyakirin: "li gor Hînduîzmê zext

û tundiya li dijî jinê wek kiryarên pîroz têne dîtin. Mafên jinan ên milk tune ne û jinên ku wek karker dixebitin mecbûr in wê qezenca xwe bidin mêrên xwe û heqê wan ê biryardayinê tune ye" (Gürhan, 2010: 64). Li gor vî dînî jin ne wek meriveke çalak herwiha wek meriveke di bin siya mêrê xwe de ye. Ti qezencên aîdê wê nîn e, nikare li ser xwe biryar bide an jî di mijarekî de fikra xwe bîne ziman. Hetta li gor gotina Gürhan, jin nikarin pirtûkan an jî metnên pîroz ên Hînduyan bixwînin. Lewra jinên ku dikevin kincan wek "qilêr" an jî "heram" têne dîtin. Ji ber wê jî jineke heram nikare metnên pîroz bixwîne. Dîsa "di metnên pîroz ên Budîzmê de jî jin wek nankor, rezîl, xayîn û pejmurde hatine şayesandin, di hin cihan de jî jin wek mar hatiye teswîrkirin, wek mareke bi jehr û bi nefret" (Gürhan, 2010: 64). Mar wek ajaleke neyênî tê dîtin, lewra xwedî jehr e, bi talûke ye û wexta meriv haj xwe tune be dikare zirarê bide meriv. Jin jî mîna ku xwediyê van taybetiyan bin hatine nîşandin. Dîsa, "di serdemên berê de mêrên Aryenî, dema jinên wan bê xebera wan ji mal derketena, di derekî de biçûna, heqên wan hebû ku poz û guhên jinên xwe jê bikin" (Gürhan, 2010: 64). Ji van agahiyan diyar e ku jin di berê de wek kesayet nehatine hesibandin, fikrên wan qîmet neditîne, xwedî biryar nebûne û cihê herî guncav ji bo wan wek mal hatiye diyarkirin. Û ev hişmendî xwe di gotin û kiryarên dînî de jî daye nîşandin.

Di dînê Mûsewî de jî jin wek sedema gunehê ewil ango sedema êş û elema ser rûyê dinyayê tê dîtin (Tunç, 2021: 52). Li gor vê nêrînê Hawa, Adem dixapîne û dibe sedema binpêkirina qedexeya Yezdanî. Di heman demê de "li gor metnên pîroz ên Mûsewî, Hawa ji parxanê Adem hatiye afirandin" (Berktay, 2019: 55). Li gor vê baweriyê jin kêmmirov in, lewra ne wek mirovek tam herwiha ji parxanê mêrekî hatine afirandin. Mêr wek mirov, jin jî wek nîvmirov hatine pênasekirin. "Li gor baweriya vî dînî mêr temsiliyeta hiş dikin, jin jî ya madeyê. Ji ber vê tehakuma mêran a li ser jinan wek pêdiviyekî hatiye dîtin. Mêr berpirsiyarên temamkirina kêmasiyên jinan in" (Köysüren, 2013: 31). Lewra jin ji aliyê mewcûdiyetê ve kêm û nîvco hatine teswîrkirin. Ligel vê, "meriv nikare bibêje jinan ji aliyê mûsewiyan ve qet hurmet nedîtiye. Di Ahîta kevn de gelek caran behs dike ku dayik jî bi qasê bavan bi qedr in" (Berktay, 2019: 95). Dayikbûna jinê hema bêje ji aliyê hemû dînan ve wek pîroziyek hatiye dîtin, lewra jin berdewamiya mirovahiyê pêk tînin.

Ev nêrîna li hemberî jinê di dînê Xirîstiyanî de jî berdewam kiriye lewra ev dîn zêdetir di bin bandora dînê Mûsewî de maye. Meriv dikare bibêje Xirîstiyanî wek berdewamiya dînê Mûsewî derketiye holê lêbelê hin qaîdeyên Mûsewî red dike, hinekan

jî dihewîne (Berktay, 2019: 101). Ji ber vê, li gor Xirîstiyanan jî Hawa ji parxanê Adem hatiye afirandin, ango ji aliyê mewcûdîyetê ve jin ji mêran kêmtir in. Dîsa li gor vî dînî jî Hawa sedema gunehê ewil e, mêweya heram bi Adem dide xwarin û dibe sedema qewirandina ji bihuştê:

> "*Di baweriya Xirîstiyanî de jî Hawa sedema gunehê ewil e, ji ber vê jî sancûya ji ber zayînê, pirsgirêkên di navbera jin û mêran de, zilm, êş, elem, xela û birçîbûna li ser rûyê dinyayê wek encamên vî gunehî hatine pejirandin. Di vî dînî de jî jin bi hin rolên diyarkirî ve hatine sînorkirin. Li gorî vê baweriyê jin xwedî şerm û qebahatê ne û xwedî taybetiyeke wisan in ku meriv ji rê derdixin. Dîsa, jin mecbûr in li hemberî mêran îtaatkar bin lewra mêr ji ser jinan re hatine dîtin. Jin wek mexlûqatên heram hatine hesibandin ji ber vê demeke dirêj Xirîstiyanan nehîştine ku jin biçin îbadetxaneyan" (Gürhan, 2010: 67-68).*

Ji wan qaîdeyên ku Xirîstiyanî red dikin yek jî di zewacê de pirjinî ye, ev ji bo jinan xaleke girîng e. Ev dîn bi qasê jinan ji mêran jî dixwaze ku sadiq bin û bi yek jinekî re bizewicin, di heman demê de rê li ber jinberdanê jî digire û ewlehiya jinê ya di zewacê de xurt dike (Berktay, 2019: 101). Ango mêr li gorî kêfa xwe nikarin jinên xwe berdin an jî li ser jinên xwe re bizewicin. Ev qaîde di dînî Mûsewî de hene lêbelê dînê Xirîstîyanî van qaîdeyan red dike. Ev jî yek ji wan cudahiyên di navbera herdu dînan de ye. Lê ligel vê jî zarokanîna jinan wek berpirsiyariyeke dînî tê dîtin, di zewacê de.

Îslam, dînê dawî yê Îbrahîmî, ji aliyê qaîdeyan ve hem rêçên her du dînên din (Mûsewî û Xirîstiyanî) di xwe de dihewîne hem jî bi qaîdeyên nû ve gelekî ji dînên beriya xwe cudatir e. "Cudahiya herî girîng tunebûna hêmaya Hawayê ye ku wek keseke meriv ji rê derdixe hatibû teswîrkirin. Di Quranê de navê Hawa derbas nabe, ji Adem û hevjîna wî tê behskirin, ew herdu bi hev re ji aliyê Îblîs ve têne xapandin" (Berktay, 2019: 72). Ji naveroka Quranê tê derxistin ku jin li gorî dînê Îslamê sedema gunehê ewil nayên dîtin. Ji bo vê mînakê meriv dikare ji bo her du zayendan behsa wekheviyekê bike. Lêbelê divê li têgehên wek zewac, mafê mîrasê û hwd jî were nêrîn ku rewşa jinê ya di dînê Îslamê de baştir bê dîtin û tehlîlkirin. Ji bo vê mijarê Harun Tunç wiha dibêje:

> *"Ji bo rewşa jinê ya di dînê Îslamê de, du nêrînên cuda hene: Li gor nêrîna ewil, Quran û Pêxember qîmet nedane jinê, wê biçûk dîtine û xistine dewsa koleyan. Kesên li ser vê nêrînê hewl dane ku fikrên xwe îsbat bikin. Ji ber vê jî li ser meseleyên wek şahidiya du jinan li beramberî mêrekî, di parîkirina mîrasê de newekheviyê, kontrola li ser bedena jinê û hwd sekinîne. Li gorî nêrîna duyem jî Îslam jin û mêran wekhev girtiye, qîmeta herî mezin daye jinê, heq û azadiyeke berfireh bexşî jinê kiriye" (Tunç, 2021: 54-55).*

Wek Tunç jî diyar kiriye cihê jinan a di dînê Îslamê de mijareke bi nîqaş e. Dikare bê gotin ku dema bi dînên beriya xwe re tê muqayesekirin di Îslamê de cudahiyeke erênî

ya berbiçav heye. Lêbelê Berktay (2019: 111) vê cudahiya erênî wek xapandinekê dibîne û dibêje bi temamî di dînê Îslamê de rolên jinan di binê yên mêran de ne. Berktay jî mîna nêrîna ewil a li jorê, mijarên wek şahidî, mîras û hwd ji newekheviya jin û mêran re wek mînak dide nîşandin. Yên ku Îslamê ji aliyê wekheviya jin û mêran de erênî pênase dikin, li ser wê fikrê ne ku peyamên vî dînî bi awayekî çewt têne fêhmkirin û şîrovekirin: "kevneşopiya ku jinê biçûk dixe û di binê mêran re dibîne di eslê xwe de rastiya wehiyê nîşan nade, ev nêrîn ji ber civaka pederşahiyê ye" (Tunç, 2021: 56). Ango, li gorî vê fikrê di eslê xwe de Îslam jin û mêran wekhev digire û hemû mafên jinan dide wan, lêbelê kesên ku wehiyê şîrove dikin li gorî civaka di nav de ne li meseleyan dinêrin û bi vî hawî şîrove dikin, ev jî dibe sedema nêrînên çewt li ser jinan û cihê wan ê di Îslamê de. Li gorî dînên Mûsewî û Xirîstiyanî Hawa ji parxanê Adem hatiye afirandin, ji ber wê jî li gor van dînan jin û mêr di xuliqandinê de ne wekhev bûne lewra li ser rûyê dinyayê jî nikarin bibin wek hev, herwiha jin di ber mêran de nîvmirov in. Lê dînê Îslamê di vê mijarê de ji herdu dînan cudatir e. Li gorî vî dînî jin û mêr ji nefsekî hatine afirandin: "Gelî mirovan! Gotina wî Rebbê xwe bikin ku we ji yek nefsekî xuliqandiye, hevserê wê jî ji wê afirandiye û ji wan herduyan jî gelek jin û mêr afirandiye. Bona hûn ji hev re bibin sitar têkiliya eqrebatiyê di navbera we de çêkiriye. Bêguman Xweda li ser we çavdêr e" (Quran, 4/1). Wek ku di ayetê de jî hatiye diyarkirin, ji aliyê xuliqandinê ve wekheviyek heye, ango jin jî mêr jî ji heman tiştî hatine afirandin. Dînê Îslamê ji vî alî ve, nêrînê li ser jinê (Hawa) yên neyênî pûç dike. Ango jin ne sedema gunehê ewil e ne jî ji parxanê mêran hatiye afirandin.

Ji van mînakên jor encameke wiha dikare bê derxistin ku di serdemên cuda de di nav çand û civakên cuda de, hem dînan xwe spartiye pederşahiyê hem jî pergala pederşahiyê metnên dînî ji kiryarên xwe re wek referans nîşandaye. Lewra "dîn, ji nav civakên pederşahiyê derketine û belav bûne. Kiryar, tevger, berpirsiyarî û îbadetên ji bo jin û mêran jî di bin tesîra vê encamê de hatine dîyarkirin" (Yapıcı, 2020: 15). Herwiha xuya dike ku di navbera dîn û civakan de di berê de bandorkirineke eşkere hebûye. Lêbelê meriv nikare rewşa jinan an jî newekheviya di navbera jin û mêran tenê li ser dîn şîrove bike. Herwiha çand, civak, norm, edet û gelek babet hene ku nasnameya zayenda civakî li gorî wan teşe digire. Lê dîsa jî bandora dîn a li ser çand û civakan meriv nikare pişt guhê xwe biavêje lewra ji çavkaniyên berdest jî diyar dibe ku ji destpêkê heya îro, ji bo têkiliyên mirovahiyê dîn wek dîyardeyeke xurt derketiye pêş. Ji aliyekî din ve jî meriv

nikare di mijara newekheviya zayendan de tenê dînan wek yekane mînak nîşan bide. Herdu nêrîn jî wê encamên xelet bidin destê mirov, lewra di teşegirtina rol û qalibên zayendî de ti carî tenê yek hêmanekî bandor nekiriye.

### 2.1.1. Zayendîtî, Beden, Bekaret û Nixumandin

Dîn, her çiqas carinan ji bo ku jin bikaribin xwe îfade bikin derfet dabe jî bi gelemperî wan wek nîvmeriv û hewcedar pênase kiriye, lewra bi sedan sal jin bona îsbat bikin ku ew ne nîvmeriv in û dikarin hişê xwe bi temamî bi kar bînin, tim li ber xwe dane (Berktay, 2019: 209). Jin, di nav vê pêvajoyê de, ji ber zayenda xwe mexdûriyetên cuda jiyane, dijîn. Di serî de zayendîtî, pê re jî mijarên wek beden, namûs, bekaret û hwd. bûne sedemên vê mexdûriyetê. Ev mijar ji nêz ve bi dîn, civak û îktîdarê re eleqeder in: "Bedena jinê ketiye binê tehakuma dîn, qanûn û qaîdeyên exlaqî, wek tişte hatiye pênasekirin. Kategoriyên wek normal/nenormal, biexlaq/bêexlaq, paqij/qirêj, xwedînamûs/bênamûs li ser bedenê têne çêkirin" (Saygılıgil, 2022: 11). Li gorî Berktay pêvajoya zexta li ser bedena jinê ya ji aliyê pergala pederşahiyê pêk hatiye, bi taybetiya wê ya zarokanînê re eleqedar e: "Ji ber ketina kincan, bizarbûn, zarokanîn û mijandinê, bedena jinê wek talûkeyekê, hetta wek tiştekî li dijî aqil hatiye dîtin" (Berktay, 2009: 58-59). Ango bedena jinê wek madeyeke ku bibe sedema neyênî û xerabiyan hatiye dîtin û li gel vê, kontrola bedenê wek li dijî derketina xerabî û encamên neyênî hatiye pejirandin. Ji ber vê yekê kontrola li ser bedena jinê carinan wek wezîfeyeke civakî, carinan mîna qanûneke dînî carinan jî wek qaîdeyeke exlaqî hatiye dîtin û pêkanîna vê kontrolê li ser civakê wek ferzekî hatiye pejirandin. Li gorî Foucault (2007: 42-66) li ser beden û zayendîtiyê îktîdarek ji aliyê civakê ve hatiye lidarxistin û ev îktîdar dixwaze qaîdeyên xwe yên li ser zayendîtiyê bi zorê bide qebûlkirin, ango zayendîtî ji aliyê îktîdarê ve tê rêvebirin. Ango beden û zayendîtî du têgehên ne bi serê xwe, herwiha di bin kontrola îktîdarê de ne, li gorî dayîna îktîdarê dikarin xwedî teşeyekî bin. Lêbelê bedena jinan li gorî bedena mêran zêdetir hatine kontrolkirin, jinbûn û zayendîtî zêdetir bi hev re hatine binavkirin, Foucault jî vê yekê erê dike: "Bedena jinê, ji serî heta binî bûye zayendîtî, ango beden û zayendîtî bi hev re bûne yek û ev beden bûye wek objeyekî, hatiye pasîfkirin" (Foucault, 2007: 79). Tişta pasîf jî her tim mihtacê kontrolê ye, lewra nikare xwe bi rê bibe. İlkkaracan (2018: 14) dibêje îro, di sedsala 21. de beden û zayendîtiya jinan hîn jî di bin kontrola mêran û pergala pederşahiyê de ne. Mekanîzmayên ku kontrola zayendîtî û zarokanîna jinan ji xwe re kirine armanc hê jî amûrên herî mezin in ku hebûna

pergala pederşahiyê pêk tînin. Ev kontrol bi qasî ku bi zextî û tundiyê ve tê rêvebirin, bi rêya mekanîzmayên tevlihev ên wek polîtîka, aborî, çand, civak û hwd. ve jî pêk tên.

Kontrola li ser bedena jinê, di baweriyên dînî de jî cihekî girîng digire, bi taybetî jî di dînên Îbrahîmî de. Li gorî Berktay, xalên hevpar ên her sê dînên Îbrahîmî ev in: "kategorîzekirina jin û mêran, pergala zewacê ya ku mêr tê de serdest in û kontrola bedena jinan" (Berktay, 2019: 26). Li gorî vê çavkaniyê dîn, jin û mêran ji hev vediqetîne û ji hev cudatir dide nîşandin, denetîma li ser bedena jinan wek ferzeke dînî dibîne; ji ber ku di zewacê de tehakumek ji bo mêran hatiye dayîn dikare bê gotin ku ev kontrola li ser bedena jinan herî pêşîn di nav malê de, ji aliyê mêrê wan, bavê wan an jî malbata wan ve pêk tê. Jin nikarin li ser bedena xwe biryaran bidin ango kontrola bedena wan ji destê wan derdikeve: "Di gelek civakên misilman de, beden û zayendîtiya jinan ne aîdê wan, herwiha aîdê malbat û eşîreta wan e, an jî aîdê wê civakê ye ku tê de dijîn. Ev nêrîn di kevneşopiyan de, di qaîde û polîtîkayên dewletî de jî tên xuyakirin" (İlkkaracan, 2018: 11). Wekî ku Foucault jî dibêje bedena jinê bi zayendîtiyê re bûye yek, lewra kontrola bedenê, di eslê xwe de kontrola zayendîtiyê ye, bi vê armancê parastina bedena jinê di rastiyê de dibe parastina namûsê. Ango jin wek namûsa malbata xwe, mêrê xwe, eşîra xwe û civaka xwe tê hesibandin. Di vir de du berpirsiyarî bi hev re li ser wan jinên ku di vê rewşê de ne dibin ferz. Ew jin hem ji parastina bedena/namûsa xwe dibin berpirsiyar, mecbûr dimînin xwe binixumînin; hem jî ji bo silametiya malbat û civaka ku tê de ne mecbûr in ku bi baldarî tevbigerin. Ji ber ku zayendîtî wek mijareke ku behskirina wê şerm be hatiye pênasekirin, jinan nikaribûne li ser vê mijarê zêde biaxivin û hestên xwe diyar bikin. "Ji zarokatiyê bigirin heta salên navsere jin ji zayendîtiyê bêhay têne mezinkirin; destûr nayê dayîn ku jin beden û zayendîtiya xwe nas bikin" (Saygılıgil, 2022: 11). Ev rewş bivê nevê li ser derûniya jinan jî tesîreke neyênî dihêle, lewra jin nikarin di derheqê zayendîtiyê de xwedî zanînekî bin, nikarin bi rehetî hestên xwe bijîn, di encamê de herçî jinên di vê rewşê de ne, dikare bê gotin ku gelek caran ji arezûyan bêpar mane.

Di kontrolkirina bedena jinê de ji jinê tê xwestin ku li bekareta xwe xwedî derkeve, lewra di nêrîna civakê de bekaret "paqijbûn"a jinê temsîl dike. Paqijbûna bedena jinê jî nîşan dide ku namûsa civakê di ewlehiyê de ye. Bi vî hawî beden, zayendîtî, bekaret û namûs wek mijarên bi hev ve girêdayî, zêdetir bi zayenda mêbûnê re hatine bilêvkirin. Bekaret jî wek têgehên din di bin bandora dîn, çand, civak û hwd. de derketiye holê û li

gorî van hêmanan di demên cude de ji nû ve hatiye înşakirin, wateyên cuda girtiye. Hanne Blank li ser vê têgehê wiha dibêje:

> *"Hûn bi çi ve dipîvin bipîvin, di eslê xwe de bekaret nîn e. Ne di terazûyan de tê kişandin, ne jî giyayek e di erdê de hêşîn were. Wek edelet û merhametê bekaret jî tenê bi encamên ku derdixe holê re dikare bê behskirin. Me bekaretê bi destê xwe nûvand, me bi xwe pêşxist. Bekaret, fikrek e ku di çandên me, dînên me, qanûnên me, berhemên me û xebatên me de belav bûye. Bekaret, di nav civakê de her daîm xizmeta heman armancê nekiriye û nehatiye heman wateyê. Di dîrokê, di gelek wateyên cuda de hatiye bikaranîn, ango yek wateyeke bekaretê nîn e. Ger em dixwazin ji bekaretê fêhm bikin, ne tenê li zemanê xwe herwiha divê em li rabirdûya xwe jî binêrin, lewra bi guherîna çandan re wate û wezîfeya bekaretê jî guheriye. Bekaret di berê de di nav çandan de wezîfeya sazkirina civakê dîtiye û bi xwe têgeheke heteroseksuel e. Ango ji bo têkiliyên di navbera jin û mêran de derbasdar e. Di heman demê de bekaret mê ye, ango ev têgeh zêde bi mêran re eleqedar nehatiye dîtin. Ji bo jinan bakîre hatiye gotin lê ji bo mêran zêde peyva bakîr nehatiye bikaranîn" (Blank, 2008: 45-55).*

Wek Blank jî behs dike bekaret ne têgeheke sabît e, ew jî wekî hemû têgehên çêker bi destê çand û civakan hatiye afirandin, lewra bi xwe peyveke guherbar e ku di her serdemê de li gorî çand û civakên tê de xwediyê wateyekî bûye û li gorî wan teşe girtiye. Ji bo parastina zayendîtî ango bekareta jinan ji aliyê civakê ve kiryarên cuda têne nîşandin, jin bi awayekî tên sînorkirin; ev bi rêya lixwekirina cil û bergan, sînorkirina derdora wan, bertengkirina tevgerên wan û hwd. ve têne pêkanîn. "Tewr carinan ji bo vê parastinê jin têne sinetkirin an jî ji ber sedema namûsê têne kuştin" (İlkkaracan, 2018: 13). Sinetkirina jinan vê yekê baştir dide nîşandin ku di nêrîna civakê de heqê jinê tune ku têkiliyên zayendî dayne an jî xwediyê arezûyan be. Bi awayekî dî dikare bê gotin ku armanca sinetê xesandina jinan e. Fatima Mernissi jî li ser xaleke dî disekine û dibêje beriya zewacê jin nikarin bi mêrekî re têkiliya zayendî daynin lê mêr vê qaîdeyê naynin ser xwe, ew beriya zewacê têkiliyeke bi vî awayî datînin, Mernissi vê yekê rexne dike û dibêje têgeha bekaretê divê ji bo herdu zayendan jî bi heman awayî girîng be. Bi qasî ku Mernissi behs dike di dîn de jî parastina bekaretê hem wek berpirsiyariya jinan hatiye diyarkirin hem jî wek ya mêran, lêbelê mêr vê berpirsiyariyê pişt guhê xwe diavêjin:

> *"Mêr di beriya zewacê de dixwazin bi jinan re têkiliya zayendî daynin lê dema biryara zewacê didin dixwazin bakîreyeke ku ti mêrî ew qirêj nekiribe bibînin. Ji aliyekî ve dema dinêrî wî jî dema têkiliya zayendî, bekareta qîz û xwûşkên hinekan qirêj kiriye, ango di rastiyê de zirar daye namûsa hin mêrên din. Di hişmendiya mêrên wiha de zayendîtî qirêjkirin û qirêjbûn e. Heke mêr bi rastî jî hurmetê nîşanê bekaretê didin, divê li hemberî xwe durust bin: Divê xwe ji têkiliyên beriya zewacê dûr bixin. Dîn ji her du zayendan jî dixwaze ku hetanî wextê zewacê wek bakîr û bakîre bimînin, lêbelê ev rastiyek e ku mêr vî qaîdeyî dîn naynin cih, binpê dikin" (Mernissi, 2018: 102-105).*

Di hin civakan de jin tenê bedenê dinixumînin ango lixwekirina cil û bergan ve vê yekê pêk tînin. Di hin civakan de jî jin ji serî heta binî, mecbûr in xwe binixumînin, tewr di hin civakan de tê dîtin ku jin serçavê xwe jî digirin tenê qulikên çavên wan têne xuyakirin. Di hin civakan de serpêçandin têgeheke girîng e û bicihanîna wê pêdîviyek e, lêbelê di hin civakan de ev girîngî bendê xwe sist dike û ewqas bi hişkî nayê bikaranîn. Ev pêçandina ser û bedena jinê bekareta jinê hildide bin garantiyê, civakê ji fîtneyê diparêze û karên mêran hem ji aliyê dînî ve hem jî ji aliyê civakî ve hêsantir dike. Li gorî Mernissi pêçandina jinan sembola qada taybet e: "Bona jin ji qadên giştî bêne dûrxistin û mehkûmên malê bin, bona ji mekanên aîdê mêran werin derxistin û bona ji holê werin rakirin pêçandin wek amûrekî hatiye bikaranîn" (Mernissi, 2018: 109). Di vir de tê dîtin ku veqetandina qada taybet û qada giştî ji aliyekî ve jî xwe dispêre qaîdeyên dînî. Lê ne tenê dînê Îslamê, ji xwe bi awayekî hemî dîn di bin tesîra hevdu de mane û di erdnîgariyên nêzî hev de derketine holê. Li gorî Berktay (2019: 84), nixumandin gelekî beriya dînê Îslamê derketiye holê. Herwiha di dînê Mûsewî û Xirîstîyanî de jî ev têgeh hebûye. Antropolog Germaine Tillion di encama xebata xwe ya sehayî de diyar dike ku têgehên wek namûs, heysîyet, şeref xwediyê dîrokeke kevn in. Tillion demeke dirêj li devera Behraspî dimîne û çavdêriya însanên vê deverê û kevneşopiyên wan dike. Li gorî gotina Tillion "peyva namûsê ne tenê ji bo kontrolkirina bedena jinê herwiha ji bo kontrolkirina hemî endamên wê deverê bûye wek diyardeyekî" (Tillion, 2006: 27). Bi heman awayî Tillion ji bo nixumandina jinê jî dibêje ku "edeteke kevnar a beriya Îslamê" (Tillion, 2006: 92) ye. Tillion balê dikişîne ser biçûkxistina jinan û zexta li dijî wan û dibêje ku ev zexta li ser jinan ji dînan wêdetir xwediyê dîrokekê ye, di berê de heye, piştî dînê dawî, Îslamê jî hebûna xwe domandiye.

Ji çavkaniyên berdest meriv dikare vê encamê derxe ku zexta li ser jinan û paşdamayîna wan a dîrokî tenê bi yek hêmanê, bi yek dîrokê, bi yek bûyerê û bi yek mînakê ve nikare bê ravekirin. Çandên cuda, civakên cuda, bûyerên dîrokî, baweriyên ji hev cuda û guherînên gerdûnî di înşakirin û berdewamkirina vê zextê de cih girtine. Di hin mijaran de xalên wan ên hevpar, di hin mijaran de jî xalên ji hev cuda hebûne lêbelê nêrîna wan a li hemberî zayendan, bi taybetî jî zayenda jinê, tim bi nîqaş bûye. Ji aliyekî ve jî hat dîtin ku ev hêman ne bi temamî bi serê xwe bûne, ango di navbera hemî hêmanan de têkiliyek heye ku ev têkilî carinan qels carinan jî bi awayekî xurt xwe daye nîşandin. Pergala pederşahî bi van hêmanan ve girêdayî bûye, di bin tesîra wan de teşe girtiye û di

heman demê de tesîr li wan kiriye. Dîsa hat dîtin ku peyvên wek namûs, bekaret û hwd, bi rêya van hêmanan derdikevin holê, wate digirin û diguherin. Ango ev têgeh ne sabît in û bi yek wateyekî ve nayên bikaranîn. Ev têgehên çandî, bi guherîna çandan re diguherin û ji nû ve têne înşakirin. Ligel vê, zanînên li ser zayendan, li ser rol û cihê wan ên civakî jî pê re diguherin. Herwiha newekheviya zayenda civakî xwediyê dîrokekê ye, tehakuma ku mêr li ser jinan pêk tînin ne xwezayî ye, herwiha çêker û çandî ye.

## 2.2. TÊKILIYA DÎN Û SEKULERÎZMÊ

Dîn, ew koma bawerî, sembol û pratîkan e ku xwe dispêre fikra pîrozbûnê û bawermendan di bin sîwaneke sosyo-dînî de tîne ba hevdu. Pîrozbûn, tam li dijî bêdînbûnê disekine lewra di pîrozbûnê de nefsbiçûkî heye (Marshall, 1999: 156). Ango di bingeha vê têgehê de pîrozbûn û serî tewandina li hemberî vê pîrozbûnê cih digire. Lewra ev fikra pîrozbûnê ji baweriya hêza serxwezayiyê tê. Ev hêza serxwezayî ji dîn jî wêdetir bi baweriyê re têkildar e, an jî bi komên cuda yên baweriyê re. Mîna gotina Marshall baweriya ji vê hêzê bi rêya sembol û pratîkan ve xwe dide der. Rîtuelên ku têne kirin teceliya wê hêza serxwezayî ne. Dîsa ji pênasekirina Marshall jî tê derxistin ku dîn wek sîwanekî ye, li herî jor radiweste û mirovan kom bi kom di binê wê sîwanê de bi cih dike. Mirov li gorî hewcedariyên xwe bi awayên cuda di binê vê sîwanê de xwe bi rê dibin, ango ji bo xwe bi rê bibin mihtacê dîn in. An jî mihtacê hêzeke ku ji ser hemî hêzan re ye. Ev, tesîra dîn a li ser mirovan, a li ser civakan baştir dide nîşandin. Dîn, ne têgeheke nuh e herwiha "ew wek diyardeyekê bi qasî dîroka mirovahiyê kevn e. Ji civakên herî kevn bigirin heta yên modern, ev dîyarde bi awayekî şexsî û civakî derketiye pêşberê mirovan" (Açıkgöz, 2010: 6). Ji ber vê kevnariyê dikare bê gotin ku têkiliya dîn û civakê têkiliyeke tim xurt û edilandî bûye. Ango di civakîbûnê de dîn xwediyê bandoreke mezin bûye, lewra "di pêvajoya civakîbûnê de, dîn yek ji wan têgehên herî xurt e ku di fêrbûna rolên zayendî de cih digire. Dîndarî û zayend her yek perçeyek ji civakîbûna dîn in" (Açıkgöz, 2010: 7).

Sekulerîzm, bereksê dîn, têgeheke nuh e ku pêvajoya wê bi modernbûnê re paralel e. Li gorî gotina Talal Asad (2024: 36) peyvên wek "sekulerîzm" û "sekulerîst" di sedsala 19. de ji aliyê hin ramangerên serbixwe ve tev li zimanê Îngîlîzî bûne. Li gor Asad ev ramangêr ji bo ku xwe ji gotinên wek "ateîst" û "kafir" biparêzin, ev têgeh derxistine lewra di civakeke Xirîstîyanî de têgehên ateîst û kafir wek bêexlaqbûn dihatine

pênasekirin. Asad diyar dike ku armanca van ramangêran ew bûye ku di nav vê civaka dînî de bikaribin fikrên xwe bi rehetî bînin ziman. Li vir derketina holê ya sekulerîzmê li hemberî fikrên sabît ên dînî wek nîşandina bertekekî dikare bê şîrovekirin. Nilüfer Göle ji bo sekulerîzmê dibêje "tenê yek modeleka wê nîn e. Li gorî dîn, çand û neteweyên cuda sekulerîzmên cur bi cur derketine holê" û vê têgehê wiha pênase dike: "Sekulerîzm hem teşeya rêvebirina dewletê ye, hem jî li gorî nirxên exlaqî rêvebirina takekesan a xwe bi xwe ye. Sekulerîzm jiyana civakî bi rê dibe, dikeve nav pratîkên rojane, di bingeha polîtîkaya zayendî û azadiyê de cihê xwe digire" (Göle, 2017: 11-19). Li gorî Charles Taylor jî sekulerbûn terkkirina bawerî û pratîkên dînî, dûrketina ji Yezdan û neçûyîna kîlîseyê ye (Taylor, 2014: 5). Taylor balê dikişîne ser vê yekê ku bi derketina sekulerbûnê re baweriya mirovan a li hemberî Yezdan û tiştên din êdî wek berê ne bêguman dibe, dikeve şikê, ango mirov dest bi lêpirsîna hebûna Yezdan û hebûna rêyên din dike. Di vir de encameke wiha tê bidestxistin: Dîn têgehek wisa ye ku bê lêpirsîn û bê guman mirov baweriya xwe pê tîne, sekulerbûn jî ew têgeh e ku gumanê dixe nav wê baweriyê, deriyê lêpirsînê vedike, li dijî sabîtbûna fikran derdikeve û mirovan ji yek rêyekê digire ber bi rêyên dîtir dibe. Ango pêvajoyeke ji yekparêziyê ber bi piranîparêziyê derdikeve holê.

Li gorî pêşengên pozîtîvîzmê di nav civakê de bi pêşketina zanistê re dîn, wek diyardeyeke şaş, zû an jî dereng wê ji holê rabe. Lê bi demê re û bi bûyerên sosyolojîk re hatiye xuyakirin ku dîn ne paş de maye ne jî ji holê rabûye (Kökce, 2021: 72). Talal Asad jî li hemberî vê fikra pozîtîvîstan derdikeve û dibêje: "Îro tevgerên dînî yên li çar aliyên dinyayê bi awayekî eşkere didin nîşandin ku dîn bi ti hawî ji holê ranebûye. Herçî yên vejîna dînî li hemberî pirsgirêkên sekuler wek temamkirina kêmasiyan dîtine, bi erênî nêzî vê têgehê bûne" (Asad, 2024: 11). Li gorî Asad dîn ji holê ranebûye, bereksê vê yekê, ev dîyarde ji nû ve wek têgeheke li dijî sekulerîzmê vejiyaye û belav bûye. Lê ji aliyekî ve jî Asad diyar dike ku ev rewşa xurtbûna dîn ji aliyê hin kesan ve wek derhişî û nexweşî hatiye dîtin. Herwiha ev rewş, li hemberî sekulerîzmê wek talûkeyekê jî hatiye dîtin. Lê her çiqas dîn, mîna gotina Taylor ji wan serdemên ku baweriya bê guman a li hemberî Yezdan derbasî serdemên piranîparêziyê bûye jî, ango hêza wê di ber lêgerînên nû de lawaz ketibe jî, xaleke ku ji sedî sed mirin an jî ji holê rabûna vê têgehê bide nîşandin nehatiye bidestxistin.

Jose Casanova sekulerîzmê di binê sê beşan de dinirxîne: 1. Bi cudahiyên civakî re vekişandina dîn a ji nav polîtîka, aborî, zanist û hwd. 2. Vegera dîn a di nava xwe. 3.

Kêmbûna baweriya dînî û ewlehiya saziyên civakî (Asad, 2024: 217). Steve Bruce jî di xebatên xwe yên li ser sekulerîzmê de ji aliyê fikirî ve nêzî Casanova ye. Bruce jî sekulerîzmê vediqetîne sê beşan û wiha pênase dike: "Beşa ewil kêmbûna bandora dîn a li ser saziyên der-dînî yên wek dewlet û aboriyê. Ya duduyan, kêmbûna girîngiya rol û saziyên dînî. Ya sisêyan jî kêmbûna pratîkên dînî û baweriya li ser jiyana mirovan e" (Kökce, 2021: 72). Ji pênaseya herdu ramangêran diyar dibe ku sekulerîzm di bin yek navekî de nayê pênasekirin û tenê di qadekî de xwedî bandor nîn e. Derketina sekulerîzmê re, hêza dînî di qadên cuda de qelsî nîşan daye û dikare bê gotin ku dîn wekî berê wezîfeya sîwanê nekiriye. Dîsa, ev şîrove jî dikare bi rehetî bê kirin ku dîn ji qada giştî ber bi qada taybet ve vekişiyaye. Ligel vê, hêza dînî a li ser dewletê jî bi sekulerbûnê re kêmtir bûye. Bi gelemperî di qada giştî de, di nav saziyan de, têgeha dîn bi temamî ji holê ranebe jî paş de ketiye û hêza xwe ya berê winda kiriye. Her çiqas ji pênaseyên li jor sekulerîzm wek têgeheke li dijî dîn xuya bike û wisa bê şîrovekirin jî Volkan Ertit li dijî vê pênaseyê derdikeve û dibêje, "ji bo têgihiştina sekulerîzmê divê ne dîn bi xwe, herwiha têgeha 'serxwezayî'yê di navendê de cih bigire. Têgeha serxwezayiyê ji dîn berfirehtir e û dîn bi xwe jî di nav vê têgehê de cih digire. Sekulerîzm encax bi vî hawî dikare bê ravekirin" (Ertit, 2019: 69). Ango sekulerîzm ne rasterast têgeheke li dijî dîn e, ew bi xwe li dijî hemî baweriyên serxwezayî ye. Ertit vêya jî diyar dike ku di nav baweriyên serxwezayî de ya herî xurt dîn bi xwe ye. Lêbelê "ev nayê wê wateyê ku sekulerbûn bêdînbûn e" û "bi sekulerbûnê re têgeha serxwezayî ji holê ranabe, tenê hêza wê ya civakî kêmtir dibe" (Ertit, 2019: 76-77). Têgeha sekulerîzmê gelek caran di şûna laîkbûnê de jî hatiye bikaranîn lê belê Ertit dibêje ku ev herdu têgeh ji hev cuda ne meriv nikare di şûna hev de bi kar bîne: "lewra laîkbûn têgeheke sîyasî ye û bi têkiliya dîn û dewletê re eleqedar e. Sekulerbûn jî têgeheke sosyolojîk e, têkiliya civak û serxwezayiyê dide nîşandin." (Ertit, 2019: 79). Sekulerbûn û laîkbûn her çiqas du têgehên ji hev cuda bin jî "ji bo herduyan xaleke hevpar heye ew jî têkçûna pîrozbûnê û serketina hiş e" (Kökce, 2021: 71).

Volkan Ertit, sekulerbûnê bi pêvajoya modernîzmê re eleqedar dibîne û bi giştî wek sedem, pêşketinên zanistî, kapîtalîzm û bajarîbûnê dide nîşandin: "Di civakekî de pêşketinên zanistî heta nava jiyana rojane hatibin, kapîtalîzm wek şêwaza serdest a aboriyê cih girtibe û bajarîbûn li gorî serdemên berê zêdetir bibe, di wê civakê de sekulerbûn wê pêk bê" (Ertit, 2019: 121). Ertit diyar dike ku ev her sê bûyerên serdemî pêşiyê li Ewrûpayê, piştre li erdnîgariyên din hêdî hêdî belav dibe, bi vî hawî sekulerbûn,

di demên cuda de, di civakên cur bi cur de bi awayekî ji hev cuda pêk tê. Ango sekulerbûn li hemî deveran bi heman awayî nayê xuyakirin, her erdnîgarî di nava xwe de sekulerbûnê li gorî qaîdeyên xwe dijî. Ger meriv li gorî pênaseya Ertit biçe, dikare bê gotin ku li deverekî zanist çiqas pêş bikeve sekulerbûn jî dê ewqas zûtir bê xuyakirin, ango "hiş" wê zêdetir şûna "baweriyên serxwezayî" bigire. Di heman demê de bi pêşketina zanistê re "şêwaza fikra rasyonel belav dibe, tiba modern pêş dikeve, xweza dikeve bin kontrola mirov, înternet û medyaya civakî derdikeve holê" (Ertit, 2019: 133). Dîsa li deverên ku kapîtalîzm an jî piyasaya serbest bi awayekî xurt cih digire, hêza dîn a li ser aboriyê li gorî berê kêmtir dibe: "Di civakên kevneşoger de pergala kapîtalîzmê wek çavbirçîbûnê dihatine pênasekirin, lê di civakên modern ên ku bi pergala piyasaya serbest ve aboriya xwe pêk tînin de xwe ewqas zêde naspêrin baweriya dînî" (Ertit, 2019: 166-171). Dîsa di mijara bajarîbûnê de jî ji gotinên Ertit diyar dibe ku sekulerîzm li gorî deverên gundewarî, li bajaran zêdetir pêş dikeve û bandora wê zêdetir tê hîskirin. Bi bajarîbûnê re perwerdehî zêdetir tê dîtin, têkiliyên nav mirovan xurttir dibin û mirov di nav demeke kurt de dikare mirovên nû nas bike û têkiliyan dayne. Bi van têkiliyan mirov dibe xwediyê fikrên nû, edetên nû û hwd. Bi van pêşketinan re, yekbûn an jî yekparêzî li bajaran kêmtir xuya dike, herwiha takekesî zêdetir derdikeve pêş. Dîsa li gorî Ertit bi pêşketina teknolojiyê re derfetên cuda ji bo kar derdikevin holê, makîne û amûrên nû têne îcadkirin, ev jî jiyana bajarî hêsantir dike û dibe sedema barkirina ji gundan a ber bi bajaran. Ji van hemî mînakan tê derxistin ku sekulerbûn di vê serdema modern de bi guherîna dinyayê û pêşketina teknolojiyê re, bi awayên cur bi cur, di qadên cude de xwe dide der.

# BEŞA SÊYEMÎN

# BIDESTXISTINÊN JI LÊKOLÎNA SEHAYÎ DI CIVAKA KURDAN DE REWŞA JINÊN KURD

Di herdu beşên ewil de bi gelemperî li ser teoriyan hate sekinandin. Di vê beşe de jî wê li ser encamên lêkolîna sehayî bê rawestin. Li sehayê, bersivên ku ji aliyê beşdaran ve hatine dayîn têgehên wek newekheviya zayendan, tehdayiya li ser jinan, tesîra dîn û modernîteyê, girîngiya perwerdehiyê, edetên civakî û hwd. derdixin pêş. Analîzkirina rewşa jinên kurd, dê li gor van bersiv û têgehan, di bin serenavên cuda de bêne pêşkeşkirin.

## 3.1. JI PERSPEKTÎFA ZAYENDA CIVAKÎ REWŞA JINÊN KURD

Civaka Kurd îro wek civakeke pederşahî tê hesibandin, bandora mêran an jî bavan, di civatê de ji jinan zêdetir e. Di malbata Kurdan de her çiqas giranî, desthilatî û serdestiyeke jinan hebe jî, malbata Kurd gorî saziya xwe ji aliyê lêkolîneran ve wek malbateke pederşahî tê hesibandin (Alakom, 1995: 18). Civakeke ku xwedî pergala pederşahiyê be ne gengaz e ku di wê civakê de meriv behsa wekheviya zayendan bike lewra ev pergal li ser newekheviya zayendan û bi rêya tehakuma mêran a li ser jinan tê avakirin. Ev pergal wekî ku di beşa duduyan de jî hate behskirin, beriya her tiştî di nav malbatê de dest bi avakirinê dike. Bi rehetî dikare bê gotin ku têkiliyên jin û mêran ên nav malbatekî di rastiyê de rolên jin û mêrên wê civakê dide nîşandin. Di binê vî serenavî de rewşa jinên Kurd wê ji perspektîfa zayenda civakî, hem ji aliyê qada taybet ve hem jî ji aliyê qadên giştî ve bête analîzkirin.

### 3.1.1. Di Malbatên Kurdan de Newekheviya Zayendî

Dema ji beşdaran hatiye pirsîn gelo di nav malbatê de, di navbera xwûşk û birayan de cihêkariyek heye, ango di kiryar û helwestên endamên malbatê de meriv dikare rêça newekheviyekî bibîne, ji beşdaran zehfî wan bersiva vê pirsê re gotine erê. Li gor bersivên wan, di hin malbatan de newekheviyeke eşkere heye ku xwe bi xurtî dide der, di hin malbatan de ne ewqas zêde be jî di gotin û kiryarên endamên malbatê de, bi taybetî jî di yên dê û bavan de newekheviyeke li ber çav tê heye:

> *"Erê tabîî cihêkariyeke mezin heye di navbera me û birayên me de. Mînak birayên min ji min û xwûşka min azadtir in, kîjan wextî dilê wan bixwaze ji malê derdikevin ku da bixwazin diçin û dikarin heta derengiyê jî neyên malê çimkî ew kur*

*in dikarin bikin, lê ji bo me tiştekî wiha ne mumkin e. Mesela bona karê nav malê jî dîsa eynê tişt heye. Zarên kurîn ti carî destê xwe nadin karê nav malê, ev kar wek karê qîzan tê dîtin. Wexta birayên min wan bêjin em birçî ne, em qîz mecbûr in xwarina wan çêkin, sifra wan daynin, vê yekê ew bi xwe nakin. Ew xwarina xwe dixwin, sifrê li erdê dihêlin û diçin, tovkirina sifrê jî şûştina firaqan jî dîsa aîdê me ye. Mesela ez gelekî ji ajotina erebeyan hez dikim, min ji malbata xwe re got ez dixwazim ji xwe re ehlîyetê bistînim lê malbata min hema yekser vê daxwaza min red kirin, gotin çi hewce ye hinekî din jî sebir bike; lê birayê min hîn nebû hijdeh salî malbatê bi xwe jê re got gere tu zûtirê ehliyetê bistînî. Nezera wan de standina ehliyetê tenê bona kuran e, qîz hilnedin jî dibe. Çimkî civaka me wiha ye, naxwaze jin li ser lingê xwe bisekine, bi serê xwe be" (J12, 22, Mûzîk).*

Ji beşdaran J12, newekheviya di nava malbata xwe de bi van rêzikan ve tîne ziman. Ji ragihandinên wê em têdigihijin ku di malbata wê de zarên kurîn zêdetir dikarin bi dilê xwe bixwin, bigerin û xwestekên xwe bînin cih. Di bersivên beşdaran de xalên hevpar ên ku zêdetir derdikevin pêş, şuxulên nav malê û gera li derve ye. Beşdar zêdetir ji vê yekê bi gazin in ku şuxulên nav malê wek şuxulên jinan têne qebûlkirin û kirina mêran a van şuxulan wek rewşeke derasayî têne dîtin: "Di mala me de mêr ti carî sifrê tov nakin, ev wek ecêbek tê dîtin" (J7, 24, Îlahîyat). J11 jî di vê mijarê de heman gazinan dike lêbelê ew diyar dike ku van salên dawî di kirina şuxulên nav malê de guherînek heye, êdî birayên wê jî kêm caran be jî destê xwe diavêjin şuxulan: "Piştî ku min îtîraz kir, min got çima tenê em qîz şuxulên malê dikin bila kur jî alîkariya me bikin, piştî çend cara ku min got êdî min dît guherînek çêdibe, wexta ji birayê xwe alîkariyê ji bo şuxulekî bixwazim nabêje na" (J11, 23, Mamostetiya Pêşdibistanê). Di vir de her çiqas guherîneke erênî xuya bike jî di rastiyê de ew hişmendiya "karê malê aîdê jinê ye" neguheriye, peyva "alîkariyê" vê yekê dide nîşandin. Wateya vê peyvê ev e ku karên nav malê aîdê jinan e mêr jî ji bo barê wan sivik bibe carinan ji wan re dibin alîkar. Lê ev, wekheviyekî dernaxe holê. J14 jî yek ji wan beşdaran e ku newekheviya zayendan bi heman mînakan ve tîne ziman:

*"Malbata me de rewşa xwûşk û bira wekî hev nîn e helbet. Yanî ez nabêjim malbat vêya mexsûs dike, dê û bavê min jî ji mezinên xwe, ji dê û bavên xwe wisa hîn bûne. Ji wana çi dîtibûn eynê wê miameleyê li me dikirin. Qîz û kur wek hev nebûne ti carî malbata me de. Mînak ez birçî bim radibim diçim xwarina xwe hazir dikim, dixwim, lê birayê min wexta birçî be diya min hema radibe hazir dike yan jî ji min re dibêje zû rabe birayê te birçî ye nanê wî hazir ke. Vira de meriv nikare bêje qîz û kur wek hev in. Lêbelê hezkirinê de pirsgirêk tune ye, ez dizanim dê û bavên min ji me tevan jî hez dikin, gotinê de nabêjin em zêdetir ji kuran hez dikin filan lê hereketên wan de mixabin ev tişt heye, malbat bê hemdê wan be jî vêya dikin" (J14, 20, Mamostetiya Polê).*

J14 newekheviya di navbera xwûşk û birayên xwe de wek rewşeke berdewamî dinirxîne û tevgerên dê û bavê xwe jî bi vê rewşê ve girêdide. Wek beşdar jî bi bersivên xwe tînin ziman, di malbatên wan de karên nav malê aîdê keçan an jî jinan in, karên derveyî malê jî wek karên mêran têne hesibandin. J18 jî vêya bi hevokekî ve erê dike: "Karên malê jin dikin, karê zeviyan jî mêr dikin" (J18, 24, Derûnnasî). Ev beşdar du mînakên din li van mînakan zêde dike û dibêje:

> *"Aliyê xwendinê ve jî aliyê evîndariyê ve jî malbata min tim min û birayê min muqayese dikir. Aliyê xwendinê ve îmkanên ku bona birayê min didan bona min nedidan yanî ça bêjim çavê wan de ez bixwînim nexwînim ewqas muhîm nebû çimkî min nexwenda jî piştê wextekî ez ê biçûma mêra, lê gereka birayê min bixwenda. Mijara evînê de jî digotin tu nikarî bi evînê re mijûl bibî an jî hevalên te yên mêr gere tune bin, tu qîz î eyb e. Lê wexta min bigota hûn çima ji birayê min re tiştekî nabêjin ewçax bersiva wan hazir bû, ew kur e dikare bike" (J18, 24, Derûnnasî).*

Beşdar J1 bereksê van bersivên li jor bersiveke cuda dide û dibêje di malbata me de, di nav jin û mêran de newekheviyek tune ye, sedemê vê yekê jî wiha rave dike: "Zêdetir gotina diya min derbas dibe di nav malê de, ew jî vê hêzê ji malbata xwe digire, malbata diya min li pişta wê ye, ji ber vê bavê min nikare tiştekî bibêje ji me re jî, ji wê re jî" (J1, 24, Matematîk). Bersiva beşdarê, vê gotina Alakom tîne bîra mirov: "Di nav karên malbatê de mirov dikare bêje ku mafê jinan yê biryardayînê qasî yê mêran xurt û bandorhîşt e. Carcar hin lêkolîner ji ber vê rewşa jinên Kurd, civaka Kurdan wek 'civakeke maderşahî' jî bi nav kirine" (Alakom, 1995: 19). Ji gotina Alakom jî diyar dibe ku civaka Kurdan her çiqas wek civakeke pederşahî bê pênasekirin jî rewşên ku tê de jin xwedî gotin in jî di vê civakê de diqewimin. Alakom, ji bo vê yekê ji dîrokê mînakan dide ku jin di zemanê şerê nav eşîran de navçitî kirine û bi saya wan jinan, şer bi dawî bûne û Kurd ji mirin û kuştinê filitîne. Ji bo baştir bê fêhmkirin da îro di malbatên Kurdan de fikrên jinan jî bi qasî yên mêran bi qîmet in, an jî dema di malbatê de biryarek tê dayîn ji jinan jî tê şêwirîn yan na, jinên malbatê bi tena serê xwe gelo dikarin ji mal derkevin biçin çarsûyê an jî cihekî din, ev pirs ji beşdaran hatine pirsîn. Ji beşdaran zehfî wan wek erê bersivandine vê pirsê, hin beşdaran jî gotine na. J3 dibêje berê kesî di derheqê van meseleyên malê de fikra me nedipirsî lê piştî ku me xwend em derketin derve êdî bavê min bi me jî dişêwire. Ji bo derketina derve û ger û seyranê J3 wiha dibêje:

> *"Bavê min hê jî ji me xeber dide lê bona çi, bona navê mala me. Mala me bi navê mala meleyan tê nasîn bona wî bavê min her daîm şîretan li me dike dibêje hûn qîz in biaqil bin wexta hûn derketin derve bi pakî derkevin, kincên pak li xwe kin bira xelk nebêje hela qîzên mala mele bi çi karî digerin. Ji ber van şîretên bavê min ez her daîm bi dîqet hereket dikim, zêde dernayêm derve, derkevim jî derengî nakevim*

*çimkî ditirsim dibêjim yek min li çarsûyê bibîne wê bêje ev qîza filan malbatê ye te dî ça digere filan, yanî ew navê mala mele giraniyeke vî navî ser min û ser xwûşkên min heye. Dîsa me xwendiye em hinekî rehet bûne lê diya min bê îzna bavê min ti carî nikare ji mal derkeve yan jî bi serê xwe nikare qirarekî bide, em angorî wê zehf rehet in çimkî me xwendiye, em ji mal derketine, wexta em cihekî de biçin em dikarin angorî diya xwe bi rehetî îznê ji bavê xwe bistînin. Lê dîsa jî îro ez zanîngehê jî dixwînim lê nikarim her saetê derkevim derve yan jî biçim gerê, ew tirs her daîm bi min re ye" (J3, 24, Îlahîyat).*

Beşdar J3 bi van gotinên xwe ve balê dikişîne ser du xalan: yek bi xwendinê re rehetbûna wê û xwûşkên wê, ya din jî girîngbûna navê malbata wê. Ji bersivên wê diyar dibe ku xwendin bi awayekî erênî dikare têkiliyên nav malbatê biguherîne û bibe sedema rehetbûn û azadbûna jinan. Ji aliyekî din ve jî girîngbûna "navê malbatê" derdikeve pêş. Ji bersivên dayî meriv têdigihije ku Kurd qîmetê didin têgeha malbatbûnê û parastina navê wê. Lewra çend beşdarên din jî behsa vê girîngiyê û berpirsiyariya ku bi xwe re tîne kirine. J16 yek ji wan beşdaran e ku behsa vê gîringiyê dike. Dema jê tê pirsîn gelo tu bi rehetî dikarî derkevî derve û bi dilê xwe digerî an jî karên xwe yên derve bi serê xwe pêk tînî yan na, beşdar yekser bersiveke neyênî dide:

*"Na, ez nikarim, va anka jî pênc sal e zanîngehê dixwînim hîn jî heta derdikevim çarşûyê diya min sed carî dibêje tu yê çawa tena serê xwe biçî, bila birayê te jî bi te re were, dibêje zû biçin, zû vegerîn, zêde negerin, nava çend saetan de li malê bin. Ez ti carî bi serê xwe bi rehetî derneketime derve. Malbata me malbateke pirr mezin e, tê naskirin yanî tu ji kî bipirsî wê bibêje ez wê malbatê nas dikim. Min avantaja wê jî dîtiye dezavantaja wê jî. Çimkî çavê xelkê li ser te ye, dibêje ev qîza filankesê ye ji filan malbatê ye va derketiye sûkê an jî ez rahijim telefonê wê bêjin va qîza filankesê bi telefonê xeber dide, gelo bi kî re xeber dide filan. Bona wî gerek ez pirr dîqet bikim. Ez niha li zanîngehê me, ji malbata xwe dûr im, lewra hînkî bi rehetî dikarim derkevim derve lê dîsa jî ne bi tena serê xwe, bi hevalên xwe re diçim, dîsa bi hevalên xwe re vedigerim, gerek ez beriya tarî bikeve erdê li wargehê bim" (J16, 22, Îlahîyat).*

Beşdar J16 jî girîngiya aîdbûna malbatekî bi van rêzikan ve tîne ziman. Ji van beşdaran hate pirsîn gelo malbat van şîretan li birayê we jî dike yan jî birayên we jî bi baldarî tevdigerin ji bo navê malbatê, beşdaran bersiva na dane. Li gor gotinên wan birayên wan di vê mijarê de gelek rehet in, kes ji wan tiştekî naxwaze an jî sînoran danayne ber wan. Ji van bersivan ev encam derdikeve ku parastina navê malbatê di rastiyê de parastina nav û namûsa jinên wê malbatê ne. Lewra jin malbata ku tê de ne temsîl dikin û kiryar û tevgerên jinên malbatekî di derheqê wê malbatê de fikran dide mirov. Ji ber vê yekê dikare bê gotin ku jinên Kurd ji bo parastina navê malbatê, ango parastina namûsa malbatê têne şîretkirin û di bin kontrola malbat û civakê de dimînin. Li ser van bersivan ji beşdaran hate pirsîn gelo tenê di mijara derketina derve de midaxaleya malbatê heye

yan di mijarên dîtir de jî malbat ji wan xeber dide. Ji beşdaran bersivên nêzî hev hatin: bi gelemperî di xwekirina cil û bergan de, di têkiliyên hevaltiyê de, heta di rabûn û rûniştina nav civatan de jî malbatan ji ber zayendên wan, midaxaleya wan kiriye. Li gor gotinên hin beşdaran ev midaxale hîn jî berdewam e, lê li gor gotina hinên din jî ev midaxale piştî xwendina zarokan kêmtir bûye; dema jin ji bo xwendinê ji mal derketine û ji bo xwendina zanîngehê çûne bajarekî din, xwe rehettir û azadtir hîs kirine:

*"Min van gotinên malbata xwe heta niha jî bihîstiye dibêjin tu qîz î zêde nepeyive, bi dengekî bilind nekene, dengê xwe nizm ke, wexta em suhbetekî de bin dibêjin giran be, zêde xeber nede bila bêjin çiqas qîzeke giran e filan wisa nahêlin dengê me zêde derkeve. Mesela nav malbatê de jî mijarek çêbibe nahêlin em qîz derheqê mijarê de fikrên xwe bibêjin. Diçin tên dibêjin qîz xeber nadin ev îşê qîza nîn e, aqilê we ji van meseleyan nabire. Pîrekên me ji dê û bavê me zehftir ji me re van gotinan dikin. Tu li cem wan çiqas giran bî ewqas baş î, çiqas xeber nedî ewqas baş î, gerek tu bi dengekî hur nekenî, dema tişkî wisa bibe bi çavekî din li meriv dimêzînin, mîna ku tiştekî xirab hatibe kirin" (J16, 22, Îlahîyat).*

Di van bersivan de tesîra civakê ya li ser malbatan û sînorên ji bo zayenda jinan hatine dayîn bi awayekî eşkere xuya dikin. Tê dîtin ku jinên Kurd, di bin kontrola endamên malbatê de û li gor qaîdeyên civakî digihîjin, têne şîretkirin û perwerde dibin. Bi xwendinê re her çiqas ji mal derkevin û li bajarekî din zanîngehê bixwînin jî ew tesîra ku di biçûktiya wan de li ser wan çêbûye nikarin ji binê wê tesîrê derkevin û bi fîzîkî ji malbatê dûr bin jî, bi awayekî derûnî çavên malbatê an jî civakê tim li ser wan e, ji ber wê ew di ku de jî biçin mecbûr in sînorên ku ji bo wan hatine diyarkirin îhlal nekin û li navê malbata xwe xwedî derkevin. Beşdara J12 ku di navçeyeke biçûk de mezin bûye, behsa xurtbûna tesîra civakî dike ku malbata wê çiqas di bin vê tesîrê de mane û di bin vê tesîrê de midaxaleya jiyana wê kirine:

*"Malbata min pirr guhê xwe dide civakê berê de û her daîm ji min re gotine tu filan tiştî bikî an jî filan kincî li xwe kî xelk ê çi bêje. Bona xelk tiştekî nebêje malbata min tim ji kirinên min, ji qirar û tercîhên min xeber dane, hê jî xeber didin, ez tim bûme mexdûrê vê rewşê, ji vê heyatê pirr aciz im, dixwazim êdî ev civak biguhere" (J12, 22, Mûzîk).*

Ji beşdaran J20 hinekî ji yên din cudatir dibersivîne û dibêje di malbata me de diya min ji bavê min zêdetir ji me xeber dide û tesîra gotinên wê li ser hemî endamên malbatê ye, serdestî destê wê de ye. Beşdara J1ê jî bi vî awayî ji bo diya xwe behsa serdestiyekî kiribû lêbelê di navbera herdu serdestiyan de cudatî tê xuyakirin. Li gor gotina J1ê, ji ber ku di nav malê de zêdetir gotina diya wê derbas dibe bavê wê nikare zêde ji wê xeber bide, lewra diya wê vê rêyê li ber bavê wê digire. Lêbelê di bersiva J20ê de ragihandineke

bereksê wê heye, erê dê serdest e lê bi hişmendiya mêrane nêzî keça xwe an jî zarên xwe dibe:

> *"Diya min ji her tiştê min xeber dide, ji pirtûkên ez dixwînim bigire heta gora ez dikim lingê xwe. Ne dikarim tenê derkevim derve, ne dikarim tenê derkevim rêwîtiyekî, min hê qet tiştên wisa tecrube nekiriye. Zayenda min tim wek pirsgirêkekî derketiye pêşiya min, bifikire diya min ji min re dibêje wexta rê de dimeşî li kêlekî rê re bimeşe, serê xwe têxe ber xwe, bi telefonê xeber nede, berguhkê nede ber guhê xwe, berguhk çi ye, lê ji wê jî xeber dide" (J20, 19, Ziman û Edebiyata Tirkî).*

Ev rêzikên başdarê yên derheqê midaxaleya diya wê de teoriya Connell a bi navê "mêraniya hegemonîk" dîsa tîne bîra mirov. Connell bi me dide zanîn ku ev hegemonya ne ji ber mêran herwiha ji ber hişmendiya mêrane heye. Angorî gotina wî herçî jin û mêrên xwediyê vê hişmendiyê ne, berdewama vê hegemonyayê pêk tînin. Ango pergala pederşahiyê ne ji mêran herwiha ji jin û mêrên xwediyê vê hişmendiyê pêk tê. Hin jin hene aşê vê pergalê digerînin, hin mêr jî hene qet di vê pergalê de cih nagirin. Diya beşdar J20ê jî ji bo vê hişmendiyê mînakeke şênber e. Zayend mê ye lêbelê hişmendî mêrane ye.

Du beşdar, J9 û J14, di bersivên xwe de balê dikişînin ser gotinên malbatên xwe ku tê de şopên newekheviya zayendî û zayendperestî cih digirin. Li gor bersivên beşdaran, ev gotin di zimanê malbatên wan de edilîne û wek gotinên normal têne bikaranîn. J9 vê yekê wiha tîne ziman:

> *"Gelek caran ji dêvla bibêjin Xwedê ji te razî be digotin Xwedê kurê te xweyî ke, Xwedê birayê te bihêle. Min carek jî nedît kesekî got Xwedê zarê te bihêle an jî keçê te. Ev gotin pirr bala min dikişandin. Di piçûktiya xwe de ez şahidê van gotinan bûme, hem di malbatê de hem di gundê me de devê her kesî de ev gotin hene. Min çiqas aciziya xwe anîye ziman jî ji min re gotine ê em çi bikin berê de em wisa hîn bûne. Mesela tiştekî pirr bi qîmet hebe ji bona wê dibêjin ew bi xwîna mêrekî ye. Yan jî jinek serê xwe dayne zarokekî bîne, beriya wê da dibêjin Xwedê wan şa bike, yanî Xwedê kurekî bide wî dê û bavî" (J9, 20, Bîyolojî).*

Di pêvajoya civakîbûnê de wek nirx û normên çandî, yên derheqê zayenda civakî jî bi saya ziman ji nifşên berê derbasê nifşên nû dibin. Ziman rastiya herî girîng e ku vê pêvajoyê nû dike û zindî digire (Kaval, 2012: 153). Li gorî vê yekê, di civakekî de gotinên li ser zayendan ên di nav ziman de nêrîna wê civakê ya li hemberî zayendan dide nîşadin. Ji gotinên rojane bigirin heta biwêj û gotinên pêşiyan di derheqê vê nêrîna li hemberî jin û mêran de agahiyan didin mirov. Bersiva beşdarê jî di derheqê zimanê axaftinê ya civaka Kurd de hin zanînan dide destê mirov. Ji vê bersivê dikare ev şîrove bê derxistin ku di vê civakê de hebûna zarên kurîn ji yên qîzîn bi qîmettir e. Ango herdu zayend di vê civakê de xwediyê heman girîngiyê nîn in, zayenda nêr ji ya mê zêdetir tê hebandin. Hamit

Baldemir di vê mijarê de diyar dike ku ev newekheviya di navbera zayendan, di civaka Kurdan de hê di zayînê de dest pê dike:

> *"Jiyana kevneşoger a ku jinên Kurd di nav de ne îro jî berdewam e. Bi awayekî rast û eşkere jinên Kurd ji mafên xwe bêpar in. Ev bêparbûn bi hatina wan a li dinyayê re dest pê dike. Zarên qîzîn çavên xwe di nav civakeke newekhev de vedikin. Ligel vê, hatina wan nabe sedema kêfxweşiyê bereksê wê wek qedereke reş tê hesibandin. Wexta zaroka kurîn tê dinyayê, di wê malê de şahî û kêfxweşî kêm nabe lê ji bo zara qîzîn heman tişt derbasdar nîn e. Dema zara qîzîn tê dinyayê di nav malê de tu dibê qey şîn çêbûye. Dayik xwe sûcdar hîs dike, bav jî mecbûr e ji qedera xwe razî be. Di ser de jî eger jinek qet zarên kurîn neyne ew jin di nav malbatê de bêqîmet dibe, wek bêyom tê binavkirin. Di vê rewşê de mêrê wê dikare hêwiyekî bîne ser wê. Lê jina ku zarên kurîn bîne ew jin di nav malbatê de pirr bi qîmet dibe, lewra li gor hişmendiyê berdewama nifşên jin û mêran encax bi anîna zarên kurîn ve mumkin e" (Baldemir, 1994, 45).*

Baldemir balê dikişîne ser vê yekê ku civaka Kurd civakeke kevneşoger e, ji ber vê yekê jinên Kurd di destpêka jiyana xwe de dibin mexdûrê vê kevneşopiyê, ji mafên xwe yên mirovî bêpar dimînin, bi qasî mêran qîmetê nabînin û di mijara zarokanînê de jî li gorî zayendên zarokên xwe miameleyên cuda dibînin. Bi qasî ku Baldemir radigihîne tê dîtin ku di civaka Kurdan de malbatên xwediyê zarokên kurîn biqîmettir û bihêztir têne hesibandin, lewra mêr qîmetê didin berdewama dola xwe, ev jî li gorî hişmendiya vê civakê bi anîna zarokên kurîn ve gengaz e. Alakom sedema vê yekê wiha şîrove dike: "Sedemên vê zîhnîyeta kurparêz bêguman gelek in. Bi baweriya me sedema herî mezin sedema aboriyê ye. Ji bo ku aborî û debara xwe hildin bin temînanetê malbatên Kurd, bûyîna zarokên kurîn xwestine" (Alakom, 1995: 22). Ji gotina Alakom jî diyar dibe ku Kurd zarokên qîzîn wek mêvan dîtine lewra piştî temenekî qîz dizewicin û ji malê derdikevin; lêbelê zarên kurîn li ser malê dimînin û ji debara malê berpirsiyar dibin. Ne tenê ji bo debarê, berpirsiyariya dê û bavê xwe jî hildidin ser milê xwe. Her çiqas bi demê re ev rewşa kuran a mayîna li ser malê hindiktir bibe û endamên di nav malekî de ji hev cihê bibin jî ew şopa kurparêziyê îro hîn jî li ser zimanê civakê ye. Ango di rastiyê de dibe ku êdî zarên kurîn wek temînata aboriyê nayên dîtin lê ew girîngiya hebûna wan berdewam e lewra di bersivên beşdaran de jî ev xal bi zelalî xuya dike. J14 jî di bersiva xwe de gotineke bi vî rengî kiriye:

> *"Mesela pîrka min zehf ji kuran hez dike, yanî malbata me giş wisan in lê pîrka min de min ev zêdetir dîtiye. Ez biçûktiya xwe de şahidê diayên pîrka xwe me ku bona nebîyên xwe yên kurîn dike. Pîrka min her tim ji bo birayên min digot ev her sê kurik nebûna halê kurê min ê çi bûya, digot şikir ji Xwedê re ku wî sê kur daye kurê min, îllam wexta paletiyê de digot ev her sê talên kurê min nebûna îşê vê malê bi çi karî rê biçûya. Pirr baş tê bîra min ez donzdeh salî filan bûm pîrka min tevê*

*diya min bûbûn yek çûbûn cem mele ji her sê birayên min re nivişt dabûn çêkirin bona ji nezerê û qeza belayan biparêze. Min rojekî nedît pîrka min bona hebûna min û xwûşka min şikir kir an jî kêfxweşiya xwe anî ziman. Çavê wan de em dara şikestî bûn, em ê rojekî biçûna mala xelkê. Me ji endamên malbatê say nedikirin. Îro kalik û pîrikên min mirine lê ew hişmendî di dê û bavê min de heta di hemî malbata me ya fireh de dewam dike. Nav malbatê de qîzan newêribûn fikrên xwe bigotana, apekî min heye kêngî behsa fikrên jinan bihata kirin qayîl nedibû û digot hişê heft jinan xistine serê mirîşkê, axirî mirîşkê çûye rêx nikul kiriye, digot meriv qe bi aqilê jinan ve îşan dike. Ez bi van gotinan ve mezin bûm, malbateke wisan de" (J14, 20, Mamostetiya Polê).*

Ji gotinên beşdarê diyar dibe ku malbata wê jî malbateke kurparêz e û xwe zêdetir bi hebûna zarên kurîn ve girêdane. Ji bersivên J9 û J14 ev yek bi eşkere xuya dike ku keç di nêrîna malbatên wan de wek mêvan in, kur jî wek xwediyê malê ne, mayînde ne. Ji ber ku qîz dizewicin û ji malê derdikevin diçin, malbatên Kurdan nikarin wan wek temînata debara malê bibînin. Û wek J14 jî dibêje zarên qîzîn di civaka Kurdan de wek dara şikestî têne binavkirin. Dara şikestî tê wateya bêhêzbûn, kêmbûn û mihtacbûnê. Ji gotinên J14ê diyar e ku di malbata wan de jin ji aliyê hiş ve kêm tên dîtin û fikrên wan nayên hesibandin, bi wan nayê şêwirîn û hişê wan bi hişê mirîşkekî ve tê muqayesekirin. Ev gotinên ku di zimanê civaka Kurd de cih digirin hişmendiya vê civakê radixîne ber çavan. Jin ji aliyê hêzê ve qels têne dîtin û wek darên şikestî têne binavkirin, ji aliyê hiş ve jî dîsa heman awayî kêm têne dîtin û hişê wan bi hişên ajalan re têne muqayesekirin. J14, di malbateke wiha de bi van nêrîn û gotinan ve mezin dibe û ev rewş dibe sedema lêpirsîna zayenda xwe. Ev mînak ji bo civaka Kurdan wek mînakên giştî nikarin bêne şîrovekirin lêbelê bersivên beşdaran şîroveyeke wiha bi me dikarin bidin kirin ku di vê civakê de, di roja îroyîn de kurparêzî û newekheviya zayendî berdewam e.

Dema beşdaran behsa malbatên xwe kirine, ji wan çend beşdar li ser firehbûna malbatên xwe û neyêniyên ku vê firehbûnê bi xwe re aniye sekinîne. Alakom jî behsa vê taybetiya malbatên Kurdan dike: "Ji aliyê hejmara endamên malê ve çawa em dibînin gelek malbatên Kurd wek malbatên fireh in; dê, bav, zarok, kalik, pîrik, carcar ap û zarokên wî jî di vê malbata fireh de dikarin bi hev re bijîn" (Alakom, 1995: 24). Ji beşdara J2 jî em van gotinan û tesîra vê taybetiyê wiha dibihîzin:

*"Em malbateke qelebalix in. Neh xwûşk û bira, dê û bav û bi pîrika min ve em donzdeh kes in. Bi saya malbata bavê min têgeha malbatê li cem min xwediyê wateyeke cuda ye. Çimkî bavê min gelekî guh dida gotinên malbata xwe, bi wan ve girêdayî bû. Ji ber vê em malbateke xwe bi xwe nebûn, di her meseleyên me de di her qerarên malbatê de gotina apên min wan di mala me de derbasdar bûn. Bavê min her tim bin tesîra apên min de dima, beriya jina xwe, zarên xwe, bi birayên xwe dişêwirî û li gorî gotina wan biryarên li ser me hildida. Tişta ku li zora min diçe ev*

*e ku piştê wextekî êdî ji bavê min zêdetir apên min an jî endamên malbatê yên din li ser me qerar dida, em mecbûrî gotinên wan diman, gotinên wan zêdetir li ser jiyana me, li ser pêşeroja me tesîr dikirin. Ev di hemî malbatên Kurdan de derbasdar in yan na ez nizanim, lê ez vêya baş dizanim di herçî malbatên wiha qelebalix de ev pisgirêk hene û dê û bav nikarin bi rehetî li ser zarokên xwe xeber bidin. Bavê min jî qet dengê xwe rojekî dernexist, destûr da apên min wan ku ewqas ji me ji biryarên me xeber bidin û li ser me biryaran bidin. Ev rewşa hanê jî helbet herî zêde bandoreke neyênî li ser me qîzan dihîşt. Bavê me li aliyekî, apên me li aliyekî, me nikaribû li ser xwe biryar bida, li hemberî wan xeber bida" (J2, 26, Bernamekariya Kompûterê).*

Ji gotinên beşdarê tê fêmkirin ku ev forma malbatê di nav Kurdan de hîn berdewam e û ev jî li ser gotin û biryarên endemanên malbatê bandoreke mezin dihêle û dîsa ji gotinên beşdarê ev encam derdikeve ku zarokên malbatê bi taybetî jî yên keç ji ber midaxaleyên endamên malbatê nikarin bi rehetî li ser xwe û jiyana xwe biryaran bidin. Beşdar J7 jî wiha behsa malbata xwe dike:

*"Ez di malbateke qelebalix de mezin bûm. Em yanzdeh xwûşk û bira ne. Bi dê û bav, bi tevê kalik û pîrikên me ve em panzdeh kes di malekî de, li gundê me dijiyan. Niha kalik û pîrik mirine, zarok jî çend kes zewicîne çûne, ji me tenê mane çend kes niha li cem dê û bavê min. Neyêniyên malbatên fireh gelek in, mesela tiştek, xwarinek bihata malê têra her kesî nedikir, hinekan dixwar hinek jî diman. An jî ji yekî re tiştek bihata standin ji yên din re nedihat, îmkanên me ewqas tune bûn. Her daîm çavên hinekan li tiştan dima mixabin. Ji me zarokan tenê min xwend, yên ji min biçûktir bi riza xwe nexwendin. Xwûşkên min ên ji min mezintir pirr dixwestin bixwînin lêbelê ji ber malbatê nexwendin. Bavê min pirr dixwest keçên xwe bide xwendin lê ew çax apên me hê bi tevê me bûn û em hê ji vî zemanî qelebalixtir bûn. Apên min wan jî ji bavê min re gotin keçên xwe nedin xwendinê karên malê gelek in em pê re nagihînin, tu keçên xwe bişînî xwendinê kî şuxulên nav malê bike. Ji ber van gotinên apên min, bavê min mecbur ma her sê xwûşkên min neşand mektebê. Lê birayê min xwend, kesî jê re negot nexwîne, karên malê dimînin. Kesî qîmet nedida xwendina keçan, em jî biçûk bûn me zêde fehm nedikir lê şikir heta em mezin bûn dinya guherî, me mala xwe ji yên apên xwe cihê kir, îro jî ez dixwînim û bavê min jî diya min jî li pişta min in, êdî ti tesîra apên min jî li ser bavê min nemaye" (J7, 24, Îlahîyat).*

Li vir careke din newekheviya di navbera zarokên keç û kur de bi eşkere xwe dide nîşandin. Ji bersiva beşdarê diyar e ku firehbûna malbatê ji gelek aliyan ve rewşeke neyênî derxistiye der. Hem ji aliyê aboriyê ve, hem ji aliyê bidestxistina heqan ve û hem jî ji aliyê xwedî gotinê ve. Di malbata beşdarê de, dema hemî malbat bi tevê hev in, zarokên qîzîn nikarin biçin dibistanê, wek berpirsiyarên şuxulên malê tîne dîtin û gotina apên wan ji ya bavê wan bi bandortir e. Ji aliyekî ve jî ev bersiva beşdarê dikare bê gotin ku di derheqê rewşa Kurdan a sosyo-aborî de agahiyan dide destê meriv. Hejmara endamên malbatê zêde be, debar jî zêde dibe karên malê jî, bi vê re qezenca serê merivê bereksê van hindiktir dibe, ev jî bivê nevê dibe sedema pirsgirêkên dîtir. Ji beşdarê hate pirsîn gelo çima xwîşkên te nikaribûn biçûna xwendinê lê îro tu dikarî bixwînî. Beşdarê, sedemên vê yekê hem wek cihêbûna mala apên xwe, hem jî guherîna der û dora xwe û tesîra vê yekê

ya li ser malbata xwe dide nîşandin. Li gorî wê bavê wê wekî berê guhê xwe nedaye birayên xwe an jî negotiye gelo xelk dê çi bêje, ji bo xwendina zarokên xwe yên mayî çi ji destê wî hatibe kiriye. Qelebalixbûna malbatê ne tenê xwedî encamên neyênî bûye herwiha ji aliyê beşdaran ve hatiye ravekirin ku aliyê wê yê erênî jî hebûye. Li gor gotina J14 heta van salên dawî jî malbateke qelebalix bûne. Li gel zarok, dê û bav, kalik û pîrika wê û ap û meta wê jî bi wan re di nav heman malê de bûne. Bi qasî ku J14 radigihîne ev qelebalixbûn ji aliyê coş û kêfxweşiyê ve gelekî rewşeke erênî di nav malbatê de çêkiriye. J14 lê zêde dike û dibêje niha ew malbateke biçûk in, di malê de her kes bi xwe re mijûl e, ew muhebbet û coşa berê nemaye di nav mala wan de. Lê vê yekê jî tîne ziman ku bi taybetî ji bo rewşa jinan ne ewqas erênî bûye lewra dema malbat firej bûye kar û barên malê jî ewqas zêde bûne û bi van karan re jî tenê jin eleqeder bûne, mêr ji xeynî çûyîna zeviyan di nav malê de kar nekirine. Ji bersiva beşdarî jî diyar e ku cureya malbatê guherî be jî ew hişmendiya “karê malê aîdê jinê ye” neguheriye.

Ji beşdaran zehfî wan diyar dikin ku berê gelekî qelebalix bûne lê niha wek malbatên biçûk dijîn, ev beşdar herdu cureyên malbatê didin ber hev û li gorî wan piştê ku hejmara endamên malbatê kêm bûne, di nav malê de gotinên zarokan bi taybetî jî yên zarokên qîzîn zêdetir bi qîmet bûne û hatine guhdarkirin. Ango meriv dikare bêje takekesî zêdetir xuya kiriye. Dîsa li gor gotina van beşdaran zarên kurîn dema dizewicin êdî li ser malê nasekinin, yan ji xwe re xaniyekî din ava dikin yan jî koçî bajarekî din dikin. Ev yek jî di civaka Kurdan de guherîna şêwaza malbatê dide nîşandin. Civaka Kurdan ji malbata fireh derbasê şêwaza malbata biçûk bûye.

### 3.1.2. Zext û Tundiya li ser Jinên Kurd

Ji beşdaran hate pirsîn gelo heta niha li malê, li dibistanê, li sikakê, bi kurtasî li hemî qadên jiyanê ji ber zayenda xwe li pêrgî gotin, sixêf, zextî û tundiyê hatine yan na. Zehfî beşdaran wek erê bersivandine û ji wan çend kes bi mînakan ve bi berfirehî bersivên xwe ragihandine. Hin beşdaran jî wek na bersiva vê pirse dane. Ji beşdaran J12 wiha bersiv dide:

> *“Erê. Mixabin rastê hin pirsgirêkan hatim. Min ji ber zayenda xwe di van herdu salên xwe yên zanîngehê de gelek tengasî kişand. Ez xwendekara beşa mûzîkê me, niha divê min li hin mekanan dest bi mûzîkê bikira hem ji bo xwe di mûzîkê de pêşbixim hem jî ji bo ku bikaribim ji niha ve debara xwe pêk bînim. Lê mixabin ez nikarim bi rehetî li kafeyan filan stranan bêjim û karê mûzîkê pêk bînim. Hem bi awirên xwe hem bi dijûn û sixêfên xwe ve mêrên li wan mekanan ji kirina karê min re dibin asteng. Lê ji bo hevalên mêr astengiyeke bi rengî tune ye kêngî li kîjan*

*mekanê bixwazin derdikevin ser sehnê. Min carek du caran ceriband lê mixabin ez pirr aciz bûm û mecbûr mam ku dev ji karê xwe berdim. Carekî çima ku min strana ku dixwazin nestra çend mêrên li maseyekî rûniştibûn dest bi qîrîn û sixêfan kirin û ber bi min hatin lê hevalên li wir nehiştin ku tiştekî bikin. Ew roj ez pir tirsiyam, ji xwe piştê wê jî êdî derneketim ser sehneyê. Niha li zanîngehê carinan koro çêdibin, beşdarê koroyan dibim" (J12, 22, Mûzîk).*

Beşdar J12 wiha tengasiyên ku ji ber jinbûnê di xwendina xwe de jiyaye rave dike. Di vir de newekheviya zayendî di derfetên perwerdehiyê de jî bi vî rengî xwe dide der. Jin xwe di ewlehiyê de hîs nakin û nikarin bi rehetî karên xwe pêk bînin. J1, ji aliyê lixwekirina cil û bergan ve pirsgirêkên ku lê rast hatiye bi vî şiklî tîne ziman:

*"Ez herî zêde di mijara cil û bergan de rastê vê yekê hatime. Gelek caran di sikakan de ez bûme mexdûra awir û gotinên mirovan. Dema ez li gorî nêrîna wan hinekî kincên vekirî li xwe bikim, yan min didin ber sixêfan, yan awirên nexweş didin min yanî îllam divê ji min xeberdin aciziya xwe bînin ziman. Gelek caran jî min dîtiye ku hin mirovan ji min re gotine tu şerm nakî bi van cilan ve derdikevî derve. Ez baş dizanim ku çavê wan de ez yeke nebaş im, çimkî ez li gorî daxwaza wan na li gorî dilê xwe cilan li xwe dikim lê civak ji jinên wisa hez nake" (J1, 24, Matematîk).*

Li vir mexdûriyeta ku beşdar J1 dijî di rastiyê de pirsgirêka civakê ye ku çareseriya wê bi ji holê rakirina newekheviya zayendan ve girêdayî ye. Civak ji takekesan re rolan diyar dike û li bendê dimîne ku takekes li gor van rolan di nav civakê de tevbigerin. Herçî takekesên li gor rolên civakî tevnegerin ew wek kesên ku pergala civakê xera dikin têne pênasekirin. Di bersiva beşdarê de jî em vê yekê dibînin. Jin dema ne li gor civakê herwiha li gor dilê xwe tevdigerin li dijî gotin û awirên neyênî tên, xwe nerehet hîs dikin û di sikakan de bi dilê xwe nikarin bimeşin. Mînakeke bi vî rengî jî ji J2 tê. Ev beşdar jî diyar dike ku gelek caran di navbera malbat û civakê de asê dimîne û ji aliyê herduyan ve jî tê îkazkirin û sînorkirin:

*"Gotinên bavê min jî yên apên min jî tesîreke gelekî mezin li ser min û xwîşkên min dihîşt. Dema em li derve di sikakan de dimeşiyan jî divê em gelekî bi baldar bûna lewra bi dest re diçû guhê bavê min digotin keçên te li filan derê bi van tevgeran ve hatine dîtin an jî filan kinc li xwe kirine. Bavê min pirr dixwest ku hukma wî li ser me hebe, pirr dixwest ku xelk bibêje keçên filankesê qet ji gotina wî dernakevin. Di vê mijarê de me ti carî li hev nekir. Ji aliyekî ve jî bivê nevê, tesîra civakê min li ser xwe hîs kir tim, niha belkî wekî berê nîn e lê dîsa jî ez nikarim gotin û awirên der û dora xwe li pişt guh biavêjim. Ev hest rehetiyê nade min mixabin ji ber vê gelek caran kincên ku jê hez dikim nikarim li xwe bikim, nikarim bi hevalên xwe re bidim û bistînim, ne di malê de ne di sikakan de. Çavên hukumdar tim li ser min in dibê qey" (J2, 26, Bernamekariya Kompûterê).*

Jinên Kurd di nav malbata xwe de, di nav civaka xwe de rastî pergala pederşahî, nêrînên mêrane û awirên xirab tên. Ji bersivên wan diyar e ku ew zexta gelemperî ya ku

mêr li ser jinan dikin, di nav Kurdan de jî bi eşkereyî heye. Beşdar J5 jî behsa zext û tundiyê dike ku ji aliyê hevalê wê ve hatiye kirin:

> *"Hezkiriyekî min hebû, bi demê re me li hev nekir, min xwest ez jê veqetim lê wî çi nema anî serê min, hem bi gotin, çêr û dijûnên xwe ve hem jî bi lêdanan ve. Çend caran min tehdît kir got ez ê te bikujim, tu nikarî terka min bikî biçî filan. Gelekî zor bû lê şikir dawiyê de bi awayekî min xwe ji wî xelas kir. Piştê wê bûyerê demeke dirêj ez nehatim ser hemdê xwe û min bi ti mêrî re têkiliya hevaltiyê daneynî" (J5, 23, Mamostetiya Pêşdibistanê).*

Xebatên ku li ser tundiya li dijî jinan hatine kirin dane nîşandin ku jin herî zêde bûne mexdûrên zext û tundiya hevalên xwe yên mêr (Uluocak, 2014: 18). Ango hevalên mêr ên ku têkiliya taybet bi wan re tê danîn. Dema tundî tê gotin her çiqas tenê wek tundiya fîzîkî were fêhmkirin jî "cureyên wek tundiya derûnî, tundiya aborî û tundiya cinsî jî hene" (Uluocak, 2014: 18) ku li dijî jinan tên pêkanîn. Li vir tê dîtin ku beşdar J5 ji aliyê hevalê xwe yê mêr ve, hem rastê tundiya fîzîkî hatiye hem jî ya derûnî. Dema li bersivên din ên beşdaran tê nêrîn encameke wiha tê bidestxistin ku jinên Kurd herî zêde bûne mexdûrên tundiya derûnî. Em ji J16ê guhdariya serpêhatiyeke din dikin:

> *"Evê bûyerê pirr ez êşandim. Ez panzdeh salî bûm diçûm lîseyê, apê min hat ji lawikê xwe re ez xwestim. Gotin dilê me ser keçka we heye em dixwazin hûn bidin me. Bavê min jî got ji xwe dilê min hebû ku ez keçeke xwe bidim birayê xwe, got temam. Bavê min hîç ji min nepirsî rizaya min hilneda ji apên min wan re got ez ê malbateke ji we çêtir ji ku bibînim. Mala apê min got em ê nîşanê bikin heta keçik xwendina xwe temam dike pişt re em ê dawetê bikin. Di ser re hê salek derbas nebû malbata apê min got em ê îsal dawetê bikin. Ji xwe min nedixwest ku wisa ecele jî kirin ez pirr li ber xwe ketim. Bavê min dît ku malbat cîddî ye hate cem min got keça min di serî de ez bi te neşêwirîm lê niha tu çi bêjî ez ê wê bikim, got tu dixwazî ev dawet çêbibe yan na. Min got na bavo ez naxwazim. Piştê ku me ew gustîlk li apê xwe vegerand heyata min li min bû zehir, her kesî digot te çawa lawikê apê xwe vegerandiye, digotin vê keçikê kesin ji xwe re li mektebê yek dîtiye lewma kurê apê xwe nexwestiye filan. Lê min got ez ê bixwînim biçim zanîngehê bona bikaribim biryarên xwe bi xwe bidim. Ez pirr xebitîm min zanîngeh jî qezenc kir, îsal wê biqede û ez niha bi hezkiriyê xwe re dergistî me piştî mezûn bûn em ê dawetê bikin" (J16, 22, Îlahîyat).*

Ji gotinên J16 du encamên wiha derdikevin holê: yek di civaka Kurdan de pirsgirêka zewaca bê dilê ciwanan e ya din jî girîngiya zewaca hundurîn (endogamy) e di vê civakê de. "Zewaca hundurîn ji pismaman hatiye pêkanîn, pêwendiyên xwînê û pismamtiyê di vê zewacê de roleke mezin dilîze. Ev zewacên pismamtiyê di nav Kurdan de pir in" (Alakom, 1995: 24). Tê dîtin ku berê de ev forma zewacê di nav civaka Kurdan de cih digire û heta roja îroyîn jî qîmeta vê formê dewam dike. Bira an jî pismamên hev xwestine zarokên xwe bi hev re bidin zewicandin ku malbata wan firehtir û ewletir bibe. Ji aliyekî din ve jî dema li bersiva beşdarê tê nêrîn dikare bê gotin ku ev bûyera hatiye serê wê

mînakeke tundiyê ye, lewra “bi zorê zewicandin dikeve nav cureya cinsî ya tundiyê” (Uluocak, 2014: 21). Ji ber ku rizaya beşdarê di vê zewacê de tune bûye û bê gotina wê li ser avakirina jiyaneke nû biryar hatiye dayîn. Dema li bersivên din ên beşdaran tê nêrîn bi gelemperî encameke wiha tê bidestxistin ku jinên Kurd herî zêde bûne mexdûrên tundiya derûnî. Ji beşdaran bersiveke wiha nehatiye ku ji aliyê endamên malbatê ve lêdan xwaribin. Ev jî dîsa ji bo têkiliyên malbatî yên Kurdan agahiyekî dide destê meriv. Dikare bê gotin ku di nav malbatên Kurdan de her çiqas ji aliyê derûniyê ve tehdayiyek hebe jî lêdan, kutan an jî mînakên dîtir ji beşdaran nehatiye bihîstin. Alakom ji bo meseleya lêdana jinên Kurd wiha dibêje: “Her çiqas Kurdan heta niha li ser jinan qira hev aniye jî, di şerê navxwe de, ew tu car jinan nakujin, li hemberî wan hurmeteke mezin tê nîşandin. Kurd ji bo hezkiriyê xwe dimire, ji bo ku bijî jî dikuje, vê realîteyê, bingeha fîlozofiya jiyîna Kurdan pêk aniye” (Alakom, 1995: 19). Bayezîdî jî vê yekê erê dike û dibêje: “Gelek êl hene ku hergav digel hevdu dijmin in. Lê jin di nêva wan de murexxes in û kes nêzîkî wan nabe. Ew destê xwe li jinan hilnagirin û dijminahiyê digel jinan nakin û pir zêde xatirên jinan di çav re dikin. Jin biçe rica xwînê jî, didin xatirê wê” (Bayezîdî, 2019: 151). Ev çavkanî bi me didin zanîn ku di civaka Kurdan de her çiqas zext û tehdayî hebe ewqas jî qedr û qîmeta jinan li gel civakê heye.

### 3.1.3. Bandora Rolên Zayendan di Parîkirina Karan de

Rolên zayenda civakî ew hêviyên zayendî ne ku civak wan pênase dike û li bendê dimîne ku takekes li gor wan pênaseyan tevbigerin (Dökmen, 2021: 29). Rolên ku ji bo jin û mêran têne pênasekirin ji hev cuda ne. “Parîkirina karan jî li gorî van rolan têne kirin. Ji bo jinan zêdetir karên nav malê maqûl tên dîtin ji bo mêran jî zêdetir karên di qadên giştî de” (Pekel, 2019: 31). Em dê li gor bidestxistinan binêrin gelo parîkirina karan di civaka Kurdan de çawa ye. Mela Mehmûdê Bayezîdî dema li ser jinên Kurd analîzan dike bi vî hawî behsa kar û mijûltiya wan dike: “Jin û keçên wan pir çalak û karsivik in û cesûr û xwedî huner in. Kulav û berr û xalî têrran çêdikin. Herçî karê malê bibe jin dikin, heta hespên mêrê xwe jî, jin xwedî dikin. Mêr ji bilî şer, zêde têkelî tu karekî din nabin” (Bayezîdî, 2019: 145). Bayezîdî jinên Kurdan wek jinên çalak û jêhatî teswîr dike, radigihîne ku ew zêdetir ji karên malê berpirsiyar in. Dîsa, Mehmet Bayrak jî li ser vê mijarê wiha dinivîse: “Jinên Kurd zêdetir bi îfetî, bi rûkenî û di karên nav malê de bi jêhatîbûna xwe ve tên nasîn. Ji sibê heta êvarê, hem di hundirê konan de hem li derveyê konan dixebitin, li zarokan dinêrin û xwarinê çêdikin” (Bayrak, 2002: 120). Em ji van

ragihandinan têdigihijin ku jinên Kurd ne tenê di dema niha de herwiha di berê de zêdetir di nav malê de, bi karên malê re mijûl bûne. Lêbelê ev nayê wê wateyê ku qet ji mal derneketine û karên derve nekirine. Herwiha jinên Kurd ligel karên malê bi karên derve re jî mijûl bûne: "Jina Kurd rûyê xwe nagire, rûvekirî ye, ne tenê hundirê malê de, li der malê jî kar dike, mirov dikare dema kar û xebatê li bestan, li çolan, zeviyan û li serê çiyan jî rastê jinan bê, di mal de girtî nîn in" (Alakom, 1995: 14). Tê dîtin ku jinên Kurd her çiqas zêdetir bi karên nav malê re mijûl bûbûn jî di karên derveyî malê de jî ligel mêran xebitîne. Rolên jinan ên di karan de, li gor rewşa malbata di nav de ne diguhere. Di bersivên beşdaran de jî ev yek hatiye dîtin. Li gor bersivên wan di hin malbatan de jin tenê karên nav malê dikin, mêr jî bi karên derve re mijûl dibin, di hin bersivan de jî jin û mêr bi hev re karên zevî û bostanan dikin, lêbelê li gor bersivên beşdaran jin di karên derve de alîkariya mêran dikin lê mêr di karên malê de alîkariya jinan nakin. Bersivên wek mêr karên malê dikin, jin jî li karên derve dinêrin ji aliyê beşdaran ve nehatine vegotin. Di vir de dîsa tê dîtin ku di civaka Kurdan de karên malê wek karên jinan têne hesibandin. Çend bersivên beşdaran wek mînak dikarin bên nîşandin:

> *"Hemû karên malê aîdê jinan e mala me da, raxistina sifrê, şûştina firaqan, dagirtina sobê, paqijkirina derî paceyan yanî hemû karên nav malê. Tenê wê çaxa ku karekî pir giran be qeweta jina têrê neke ewçax mêr tên aliyê me dikin. Bavê min û birayên min jî karên derve dikin; dara dişkênin, diçin ber golikan, diçin paletiyê. Lê wexta lazimî hebe ez jî diçim paletiyê aliyê bavê xwe wan dixebitim. Wexta têm malê dîsa karên malê jî dikim. Pîrka min jî diçe bostan aşêf û avdana bostan dike. Diya min û xwûşka min jî tim mal de ne karên nav malê re mijûl dibin. Tiştekî wiha jî heye, wexta li malê xwarin dereng çêbe, sifre dereng were erdê bavê min dixe şer ji ber wê jin mecbûrî karên xwe zûtir dikin, lê mêr wisa nîn in bi bîneke fireh ji xwe re karên xwe dikin" (J14, 20, Mamostetiya Polê).*

> *"Bavê min berê cotkar bû, niha naxebite êdî, li malê ye, diya min jî bermal e. Niha zarokên wan tev bela bûne li malê nemane, hinek zewicîne çûne, hinek jî dixwînin. Lê wexta ez biçûk bûm em giş bi hev re bûn, ewçax jinan îşê malê dikir, mêra jî li heywana dinêrîn, diçûn zeviya. Wexta êvarê dewar dihatin malê diya min didot, hasila malê aîdê diya min bû me jî alîkariya wê dikir. Birayên min diçûn derve, bajarên cuda înşeatan da dixebitîn, ez û xwûşkên xwe jî em mal da bûn, me şuxulên malê dikir" (J7, 24, Îlahîyat).*

> *"Bavê min înşeatan de dixebite, diya min jî karên nav malê dike. Kalikê min êdî nikare bixebite ji xwe, em zarok jî tev dixwînin li derve. Havînan em diçin gund, ez û herdu xwûşkên xwe em aliyê diya xwe karê malê dikin, li heywan mêze dikin; birayê min jî aliyê bavê min diçe zeviyê. Em xwarina wan dibin nav zeviyê ew nayên malê bona navrojê, carinan jî karê wan neqede ez û xwûşka xwe ya mezin jî em aliyê wan giha tov dikin. Lê karê patosê tenê mêr dikin" (J3, 24, Îlahîyat).*

> *"Mala me da her kes karekî wî heye. Bavê min mêşvan e, diya min xanima malê ye, birayekî min mamoste ye ew li cihekî din dijî, birayekî min jî karmendê dewletê ye ew jî li cem malbatê namîne. Birayekî min nexwendiye ew jî diçe ber pêz.*

*Diya min temenê wê derbas bûye destên xwe nade karên malê, hemû karên nav malê xwûşkên min dikin, ji xwe wan nexwendiye, ez dema diçim malê alikariya xwûşkên xwe jî dikim, alîkariya bavê xwe jî. Hin karên malê em tev bi hev re dikin mînak ji bo zivistanê dar lazim bin em giş bi hev re diçin daran" (J17, 25, Mamostetiya Tirkî).*

*"Wexta em li gund bûn karên jinan ji yên mêran zehftir bûn. Çimkî mêr tenê bi karê zeviyan re mijûl dibûn lê jin hem bi wan re diçûn zeviyan, hem diçûn nava baxan hem karê nav malê dikirin hem jî bi zarokan re mijûl dibûn. Piştê ku me mala xwe bir bajêr, jin tim mal de bûn mêr jî li derve karên cuda da dixebitîn. Jin dîsa bi karên xwe yên malê re, bi zarokên xwe re mijûl dibûn. Mêran nedixwest jin li derve karekî de bixebitin, diya min carinan diçû paqijiya malan dikir lê ew bi dizî diçû haya bavê min jê tune bû, wekî din ne mumkun bû diya min ji mal derketa" (J2, 26, Bernamekariya Kompûterê).*

*"Em heywan xweyî dikin, hem pez hem jî dewarên me hene. Wexta dibistan hebin dê û bavê min tenê dimînin, em xwûşk û bira tev dixwînin. Lê wexta dibe havîn em giş têne gund çimkî karê malê havînê gelek in. Em karê paletiyê dikin havînê. Mêrên malê diçine paletiyê diya min û qîzê malê jî li heywana dinêrin heta havîn diqede, piştê paletî diqede bavê min wan îcar bi heywan re mijûl dibin heta havîneke din" (J9, 20, Bîyolojî).*

Bersivên beşdaran ên ku di derheqê parîkirina karên nav malê de agahiyan didin me, di heman demê de di têgihiştina rolên jin û mêrên civaka Kurd de jî encamên zelal didin ber destê me. Wekî ku ji gotinên beşdaran jî diyar in di civaka Kurdan de, karên nav malê bûne para jinan, karên derveyê malê jî wek karên mêran hatine hesibandin. Ev tê vê watayê ku ew nêrîna li ser zayendên jin û mêran di civaka Kurdan de jî derbasdar e. Jin her çiqas ji xeynî karên malê di bax û bostanan de jî bixebitin ev yek wek serkeftinek nayê dîtin lewra jin dîsa ji qadên giştî û xebatên li van qadan bêpar in. Dîsa ji gotinên beşdaran ev encam dertê ku barê li ser pişta jinan girantir in, ew hem bi karên malê re, hem bi xwedîkirina zarokan re mijûl dibin hem jî di karên derveyê malê de bi mêrên malê re dixebitin. Ev mijûltî jinan zêdetir bi malê re girê didin û ji derketina qada giştî re dibin asteng. Ji beşdaran zehfî wan li gundan dijîn, bi karê cotkariyê re mijûl dibin û heywanan xweyî dikin, ev yek jî di derheqê aboriya Kurdan de agahiyan dide mirov. Rewşa malbatên ku li bajêr dijîn jî meriv dikare bibêje ne di asteke baş de ye, lewra mêrên malê exleb di înşeatan de, di karên demborî de dixebitin. Jinên li bajêr, zêdetir bi malê re girêdayî dibin lewra li bajêr karên bax û zeviyan tune ne ku bikin, di karên li derveyê malê de jî qasê ku em ji beşdaran hîn dibin ji ber mêrên malê nikarin bixebitin. Dikare bê gotin ku ev rewş, li hemberî xwenaskirin û pêşketina jinên Kurd astengiyeke mezin û berdewam e. Ji aliyê perwerdehiyê ve jî tabloyeke neyênî derdikeve der. Tê dîtin ku di malbatên beşdaran de kesên xwendî û yên karmend gelekî hindik in, hema bêje hemî dê û bavên beşdaran xwediyê pîşeyekî nîn in tenê di nav zarokan de em dibînin yên xwendî

derketine ew jî piranî dîsa mêr in, jin di vê mijarê de jî li paş mane. Lêbelê ger rewşa zarok û dê û bavan bê miqayesekirin, dikare bê gotin ku di nav Kurdan de xwendin zêde bûye, lewra di hemî bersivên beşdaran de em dibînin ku zarokên kur jî keç jî dixwînin, ev jî nîşaneya guherîna erênî ya civaka Kurdan e.

### 3.1.4. Bandora Rolên Zayendan di Tercîhên Pîşeyan de

Ji beşdaran hate pirsîn gelo zayenda we di tercîhên we yên ji bo zanîngehê de bi bandor bû yan na, piranî beşdaran ev pirs wek erê bersivandine. Ji bersivên beşdaran tê dîtin ku malbatên wan exleb pîşeya mamostetiyê ji bo wan guncav dîtine û beşên ku beşdar dixwînin vê yekê baştir dide nîşandin ku takekes wek tercîhên din ên jiyanê, di tercîhên xwe yên pîşeyan de jî di bin tesîra rolên zayenda civakî de mane:

> *"Erê, bandora wê hebû. Bi taybetî mamê min gelek bandor li tercîhên min kir. Wî got zanista siyasî ji bo jinan ne baş e û ji min xwest ku ez beşa derûnnasîyê binivîsim. Kekê min jî got tu wek jin bi tena serê xwe nikarî li cihekî dûr bixwînî, ewî jî xwest ez cihê herî nêzîk binivîsim" (J18, 24, Derûnnasî).*

Beşdar J18 bi van rêzikên li jor ve tîne ziman ku endamên malbata wê di dema tercîhên wê yên bo zanîngehê de midaxaleya wê kirine, ne hiştine beşa ku dixwaze binivîse, ne jî destûr dane ku biçe bajarekî dûr bixwîne û wek sedem jî jinbûna wê nîşandane. Derûnnasî ji aliyê malbata beşdarê ve ji bo jinan wek beşeke guncav hatiye dîtin û wek ku beşdar bi xwe jî tîne ziman endamên malbata wê polîtîkayê ji bo wê wek beşeke guncav nedîtine. Ev yek, rolên ku ji bo jinan hatine diyarkirin baştir radixe ber çavan. Polîtîka wek karên mêran tê dîtin û beşeke bi vî rengî di nêrîna malbata beşdarê de encax ji aliyê mêran ve dikare bê xwendin. Dîsa ji aliyê xwendina li bajarekî din ve jî tê dîtin ku zayenda beşdarê di tercîhan de xwedî bandoreke mezin bûye. Li gor malbatê jinek bi tena serê xwe nikare ji malbata xwe dûr bikeve û li bajarekî dûr bixwîne, dikare bê gotin ku li gorî malbata beşdarê, jin muhtacê parastinê ne û nikarin bi tena serê xwe di nav ewlehiyê de bijîn, ango wek takekesên serbixwe tevbigerin. Ev yek, di bersivên beşdarên din de jî bi zelalî derdikeve pêş. J14 jî di vê mijarê de bersiveke nêzî J18ê dide:

> *"Xwendina vê beşê biryara min nebû ya rastî biryara malbata min bû. Malbatê digot tu qîz î ev beş xwendina wê jî karkirina wê jî ji bo te yê rehet be, ji ber vê min mamostetî tercîh kir. Mixabin ev bajêr jî ne tercîha min bû, ji ber ku nêzîkî me bû malbatê got li vî bajarê bixwîne ku em bikaribin xwe bi rehetî bigihînin te, li bajarê mezin talûke zêde ne fîlan yanî bi şiklekî her tişt bi jinbûna min ve dihate girêdanê. Min dixwest ez beşeke din bixwînim ku xwe tê de pêş bixim lê li gorî malbatê îro ez beşa herî baş dixwînim" (J14, 20, Mamostetiya Polê).*

Wek tê dîtin J14 jî mîna J18ê li gorî pîvanên rolên civakî tercîhên xwe yên bo zanîngehê daye. Ji ber zayenda xwe beşeke ku nexwestiye tercîh kiriye, di ser de jî bajarê ku lê bixwîne dîsa ne tercîha wê herwiha ya malbata wê bûye. Ji bersivên van herdu beşdaran diyar dibe ku takekes ji sînorên ku civakê ji bo wan diyar kiriye nikarin derkevin, ji bo zayendên wan tişta maqûl ji aliyê malbatê ango ji aliyê civakê ve tê diyarkirin û ji wan tê hêvîkirin ku takekes jî li gorî van rolan di nav civakê de cih bigirin. Ji beşdaran J5 jî bi heman rewşê re rû bi rû dimîne, ew dixwaze beşa mûzîkê bixwîne lêbelê malbata wê ji ber maqûlbûna mamostetiya pêşdibistanê wê dişîne vê beşê: "Min dixwest ez bibim mûzîkjen lê malbata min li dijî vê biryara min derket. Li gorî wan mûzîkjenî pîşeyeke bêkêr bû, ez jin bûm û gerek ez bibûma mamoste, li gorî wan karê herî baş ev bû ji bo min" (J5, 23, Mamostetiya Pêşdibistanê). J12 jî dixwaze beşa mûzîkê bixwîne û her çiqas der û dora wê jê xeber bide jî ew vê daxwaza xwe tîne cih, vê beşê dixwîne. Lêbelê midaxaleyên malbat û eqrebayên wê di tercîhên bajêr de bi bandor bûne:

> *"Bi min gere her kes angorî daxwaz û qebîlîyeta xwe pîşeyan hilbijêre. Min dixwest ez beşa mûzîkê li zanîngeha Egeyê bixwînim lêbelê malbata min yekser destê xwe dane ser vê xwesteka min, gotin neçe cihê dûr, tu qîz î, tiştek were serê te em nêzî te nîn in, gotin yan bajarê xwe yan jî bajarekî nêzîk tercîh bike. Ne tenê malbatê, der û dor jî mîna ku heqê wan hebe li ser qirara min xeber didan. Werhasil ez mecbûr mam min bi ya wan kir, tercîha xwe da vir. Mixabin hîn tiştên wiha hene. Birayên min jî pismamên min jî dilê wan ku xwest tercîhên xwe dane wir, lê çima em qîz nikarin eynî tiştî bikin, min vêya ji xwe re gelekî kire derd, gelekî li ber xwe ketim. Lê dîsa jî hewl didim ku bikaribim angorî dilê xwe bijîm" (J12, 22, Mûzîk).*

Di bersivên hin beşdaran de em dibînin ku ev tercîhên zanîngehê dîsa li gorî zayendan tên dayîn lêbelê tê dîtin ku di biryarên van beşdaran de midaxaleya malbatê nîn e, beşdaran bi xwe biryarên wiha dane, lewra li gorî wan tercîhên ji bo zanîngehê dikin di pêşeroja wan de dê ji bo zayenda wan biryara herî maqûl be. J11 yek ji wan beşdaran e ku di tercîha pîşeya xwe de li gorî rolên civakî tevgeriyaye:

> *"Ez mamostetiya pêşdibistanê dixwînim û erê bi rastî jî dema tercîhên zanîngehê, min got teqez ez ê biçim vê beşê lewra ev beş beşa jinan e. Çimkî ez ê bibim dayik û zarokan mezin bikim, ger ez bikaribim mamostetiyê bikim ez ê dayiktiyê jî ewqas baş bikim û min ji niha ve perwerdehiya vê tiştê dîtiye, yanî zarokek çawa tê xweyîkirin ez vêya dizanim û ev min baştir ji pêşerojê re amade dike" (J11, 23, Mamostetiya Pêşdibistanê).*

Bersiva J11ê nîşaneya vê yekê ye ku takekes rolên ku ji aliyê civakê ve têne dayîn, di nava xwe de dihewînin, di hişê xwe de bi cih dikin û van rolan bi demê re wek rolên siruştî qebûl dikin. Xwedîkirina zarokan jî yek ji wan rolan e ku aîdê jinan tê qebûlkirin. Takekes di zarokatiya xwe de bi fêrbûna van rolan mezin dibe, van rolan wek taybetiyên

xwezayî yên zayenda mê di hişê xwe de kod dikin. Herwiha ev kod di her qada jiyana takekesan de, ji nû ve û bi awayên cuda derdikevin pêşberê wan. Ev ne tesadif e ku malbatên beşdaran bi gelemperî ji bo jinan karê mamostetiyê wek karekî maqûl dibînin. Di bersiva J3ê de jî em rastê heman kodan tên:

> *"Belê hebû tabîî. Min dixwest ez bibim mamosteya polê lewra mamostetî tam li gorî min e yanî ez xwe herî zêde bi vî karî re eleqedar dibînim, lêbelê pûanê min têra mamostetiya polê nekir min jî îlahîyat nivîsî min got çi hebe ev jî mamostetî ye û ji bo jinekî dîsa ev jî karekî gelekî baş e. Ji bo me jinan pîşeya herî maqûl mamostetî ye lewra ji bo mêran pîşe gelek in, ew ji me bi şanstir in dikarin gelek karên cuda de bixebitin lê em jin ne wisan in mixabin ew derfet bo me nîn e. Vê mijarê de malbata min jî wek min difikire, wan digot li cihekî nêzî me, beşeke maqûl de bixwîne hem ji bo pêvajoya xwendinê baş derbas bibe hem jî piştê te qedand bila tu bikaribî zûtir biçî ser karê xwe. Ji ber vê min jî bajarê nêzî me hilbijart û wek beş jî îlahîyat nivîsî" (J3, 24, Îlahîyat).*

J3 mamostetiyê ji bo jinan wek karê herî guncav dibîne, lewra wisa bawer dike ku jin li gor taybetiya vî karî hatine afirandin. Ji civaka ku tê de mezin bûye wisa dîtiye û ji aliyê malbata xwe wisa hatiye qanihkirin. Cureya mamostetiyê biguhere jî di bingeha vî karî de xwedîkirina zarokan cih digire, ji ber vê jî tercîha jinan ji aliyê vê beşê ve dibe exleb. Ji beşdaran J16 jî bersiveke nêzî van bersivan daye:

> *"Belê tesîra zayenda min çêbû li ser tercîha zanîngehê. Min bi xwe ji xwe re got ez jin im, karekî wek mamostetiyê tam li gorî min e, piştî ku min qedand ez ê karibim bi rehetî bixebitim loma li pêşiya min zewac heye, mamostetiyê de meriv dikare bi rehetî destûr bigire hem dema zarokanînê de hem jî wekî din. Di tercîha îlahîyatê de jî min ji xwe re got hem dinya hem axîret, yanî min got ez ê ji bo herdu dinyayan jî karibim bixebitim, karibim tiştekî fêrî zarokan bikim" (J16, 22, Îlahîyat).*

Tê dîtin ku J16, têgehên wek zewac, pîşe û xwedîkirina zarokan bi hev re girêdayî dîtiye û tercîhên xwe jî li gorî vê têkiliya nava têgehan kiriye. Ev têkiliya nav têgehan a di hişê takekesan de ji rewşa dayikbûnê tê, taybetiya jinan a zarokanînê di diyarkirina rolên wan ên nav malê û di nav civakê de gelekî bi bandor e. Li gel vê, beşdarên ku ne li gorî xwesteka malbatê, her wiha li gorî xwestekên xwe beşên xwe tercîh kirine hene. Ev beşdar, ji ber tercîhên xwe hem ji malbatê piştgirî nedîtine hem jî ji aliyê der û dor ve hatine rexnekirin:

> *"Beşa ku ez dixwînim exleb ji aliyê mêran ve tê tercîhkirin ji ber vê di nav civakê de jî nêrîneke wiha heye ku jin nikarin vê beşê bixwînin, an jî ev beş ne li gorî jinan e, wisa lê dinêrin. Dema ez hatim zanîngehê hevalên ji polê digotin çi îşê te li vir heye tu jîn î, te yê ji xwe re mamostetiyek bixwenda" (J6, 26, Tendiristî û Ewlehiya Karan).*

Ji bersiva beşdarê careke din tê dîtin ku beşa mamostetiyê û jin wek du têgehên ji bo hev, du têgehên rastênhev di hişê civakê de bi cih bûne. J6 diyar dike ku kesên di pola

wê de, bi wê re dixwînin jî beşa wê wek beşa mêran dibînin, li gorî van kesan karê jinan di van beşan de nîn e, jin divê bi mamostetiyê re mijûl bibin. Takekes bi vê hişmendiyê ve mezin dibin lewra jin bi rehetî nikarin her beşê tercîh bikin. Di vê mijarê de beşdara J2 jî pêrgî heman tengasiyan hatiye:

> *"Ji xwe di nav malbata me de xwendina keçikan zêde girîng nebû, kesî qîmet nedidayê, ji ber wê serî da bigire heta ez hatim zanîngehê jî min tengasî kişand ji aliyê malbatê ve jî ji aliyê civakê ve jî. Min ewilî zanîngeheke bi bûrs qezenc kir, tabîî apên min wan yekser rabûn ji bavê min re gotin tu didî xwendinê ne bes e îja tu yê ser da pere jî bidî. Bavê min helbet guhê xwe da gotina wan, nehîşt ez bixwînim. Piştre ez dîsa xebitîm û min beşa kompûterê qezenc kir, li bajarekî din ji aliyekî ve xwendin, ji aliyekî ve bona debarê kar, ji bo min gelekî zehmet bû. Ji ber gotin û tevgerên der û dorê, niha jî carinan dibêjim gelo ev beş ne li gorî me, li gorî mêran e, bivê nevê tu bin nêrîna civakê de dimînî. Îro dema li jiyana xwe dinêrim, dibînim ku ev hişmendiya mêrane di her qadên jiyanê de ji min re bûye asteng" (J2, 26, Bernamekariya Kompûterê).*

Pîşeyên ku li gorî zayendan têne kategorîzekirin, rasterast bi vê yekê re eleqedar in ku rolên ji aliyê civakê ve ji bo zayendan tên diyarkirin wek taybetiyên siruştî têne pejirandin. Ji beşdaran zehfî wan mamostetî tercîh kirine, hin kesan bi dilê xwe hinekan jî bê dilê xwe, li ser xwesteka malbata xwe van tercîhan dane. Lê di herduyan de jî xala hevpar ev e ku mamostetî wek beşa jinan hatiye dîtin û ev nêrîn wek rewşeke siruştî di nav civaka Kurdan de jî cihê xwe girtiye. Herçî yên mamostetî tercîh kirine, vê pîşeyê bi dayikbûnê re eleqedar dîtine û ji bo xwe, herî zêde ev beş maqûl dîtine. Dîsa li gorî ragihandinan tê dîtin ku beşdaran xwestine beşên polîtîkayê bixwînin lêbelê pêrgî midaxaleya malbatê hatine û mecbûr mane ku beşeke dî tercîh bikin. Ev, ji aliyê daxilbûna jinan a polîtîkayê ve nêrîn û helwesta civaka Kurd derdixe der. Jin û polîtîka ji aliyê kodkirina rolên zayendan ve du têgehên ji hev dûr in, lewra li gor hişmendiya vê civakê polîtîka karê mêran e. Ji aliyekî ve jî beşdarên ku ne li gor hêviyên civakî herwiha li gor xwestekên xwe pîşeyên xwe hilbijartine, bûne mexdûrên tehdayî û midaxaleyên malbat û civakê. tewr bûne mexdûrên rexneyên neyênî yên hevalên xwe yên heman beşê. Dikare bê gotin ku ev beşdar, li gorî wan beşdarên ku mamostetî tercîh kirine, kêmtir di bin bandora rolên civakî de mane û tercîhên xwe yên zanîngehê zêdetir li gor qebîlîyet û eleqeyên xwe dane. Ji ber vê jî ji malbatê alîkarî nedîtine, ji aliyê der û dorê ve hatine rexnekirin, lewra di nezera civakê de van takekesan helwestên dercivakî nîşandane. Ev yek mirov digihîne encameke bi vî rengî ku ji beşdaran zehfî wan li gor rol û heviyên civakî pîşeyên xwe tercîh kirine.

### 3.1.5. Rewşa Jinên Kurd di nav Nifşên Cuda de

Ji bo rewşa jinên Kurd di nav malê de û di serdemên cuda de çawa bûye û çi guheriye, çi wek xwe maye bê têgihiştin, ji beşdaran hatiye xwestin ku xwe bi dayika xwe û bi pîrika xwe re bidin ber hevdu, berawird bikin û di rewşa wan a nav malê de, di rol û taybetiyên wan de, di berpirsiyariyên wan de cudahiyek heye yan na, agahiyekî bidin destê me. Bersivên hemî beşdaran vê yekê dide destê me: di navbera sê nifşan de cudahiyên mezin hene û bi gelemperî ji bersivên wan em dibînin ku guherîneke erênî di rewşa jinan de heye. Hin beşdaran ew derfet nedîtine ku bi pîrikên xwe re bijîn û şahidiya rewşa wan bikin, hin beşdar jî gelek salan bi herdu nifşên beriya xwe re, ango bi diya xwe û bi bapîra xwe re jiyane, ji wan hin beşdar hîn jî bi wan re dijîn. Beşdar J1, yek ji wan e ku pîrika xwe nedîtiye, ew li gorî rewşa nav malê behsa ferqa xwe û diya xwe dike:

> *"Di navbera min û diya min de gelekî ferq heye. Ez xwe zêdetir azad dibînim, dikarim li ser xwe biryaran bidim lêbelê derfeteke wisa ji bo diya min tune bûye. Diya min di temenekî biçûk de bê dilê xwe zewiciye. Heft zarok aniye, pirr tengasî kişandiye. Malbata diya min dikarim bibêjin modern bûye, ji diya min re baş bûye lê wexta zewiciye hatiye mala xwezîrê xwe heman miamele nedîtiye. Lê diya min di pêvajoya xwendina min de gelekî ji min re bû alîkar, ew bi xwe nikaribûye bixwîne lê ji bo ez bixwînim pirr fedakarî nîşan da. Li gorî diya min, min xwe baştir nas kir, wê xwe nas nekir" (J1, 24, Matematîk).*

J1, xwe û diya xwe dide ber hev, muqayese dike û di encamê de xwe azadtir dibîne. Li gorî wê diya wê nikaribûye xwe nas bike, nikaribûye bixwîne an jî zewaceke bi dilê xwe bike, lêbelê beşdar radigihîne ku ew îro van hemûyan dikare bike, ji ber wê jî ew angorî diya xwe dikare xwe nas bike. Beşdarek din J7, pîrika xwe qet nedîtiye, dema ew biçûk bûye herdu pîrikên wê jî mirine, lê ew bi awayekî zelal rewşa xwe û ya diya xwe berawird dike û behsa cudahiyên herdu jinan dike:

> *"Teqez ferqeke gelek mezin heye di navbera min û diya min de. Mesela ez bi mînakeke wiha behsa rewşê bikim, diya min hevsera bavê min e lêbelê li cem bavê min nikare bi rehetî biaxive, ji bavê min şerm dike, nikare fikrên xwe bibêje an jî ji îşê bavê min xeber bide. Lê ez ne wisa me, ez pirr bi rehetî îro mal de dikarim di her mijarê de fikrên xwe bînim ziman, li cem bavê xwe jî bêminet diaxivim, qet nabe pirsgirêk, bi min cudahiya herî mezin ev e, yanî xweîfadekirin e. Bavê min di mijarekî de biryarekî bide bi diya min naşiwêre, diya min jî vê rewşê normal dibîne û naxwaze ji biryara mêrê xwe xeber bide, lêbelê ger biryareke bavê min nekeve serê min, ez fikrên xwe tînim ziman, şaşî û kêmasiyan dibêjim, bavê min jî guhê xwe dide gotinên min. Wekî din mesela heta bavê min destûr nede diya min nikare ji mal derkeve, nikare here çarsûyê, heta bê destûra bavê min nikare biçe mala cînaran jî. Lêbelê îro ez kêngî bixwazim derdikevim derve. Bavê min destûr nede jî ger ez ji xwe bawer bim, karê min jî hebe yan jî ez bizanibim ez ê zû vegerim malê, ez derdikevim derve. Yan jî em bibêjin kesên xerîb li mala me hebin diya min li ber wan naaxive, devê xwe bi laçika xwe digire, heta ji destê wê bê li cem wan nasekine li gorî wan jin li ber*

*mêrên xerîb nikarin biaxivin, şerm e, lê ez diaxivim îro, tewr mêvanek filan hebe ez bi rehetî pê re eleqedar dibim, sihbet dikim, jê re xizmet dikim" (J7, 24, Îlahîyat).*

J7 bi awayekî eşkere ji cudahiyên di navbera du nifşên cuda de, ango cudahiyên di navbera xwe û diya xwe de bi mînakên zelal dide ragihandin. Tê dîtin ku J7, li gorî diya xwe di navbera malê de xwedî rolekî ye, fikrên xwe bi rehetî tîne ziman, daxwaziyên xwe dikare bîne cih û tevgerên wê jî bi qasê yên diya wê sînorkirî nîn in. Ev yek, di rol û stereotîpan de guherînekî dide nîşandin. Dîsa, tê dîtin ku beşdar J7, bi rehetî dikare ji mal derkeve, tewr dikare bê destûra bavê xwe jî vê yekê bike, lêbelê ji gotinên wê diyar dibe ku diya wê nikare tiştekî wiha bike. Bi heman awayî li gorî ragihandina beşdarê tê dîtin ku diya wê li ber mêrên xerîb devê xwe bi laçika serê xwe ve digire û xwe ji axaftinê dûr digire. Ev yek, di derheqê çanda Kurdan de agahiyê dide destê mirov. "Stereotîpên zayenda civakî li gorî çandan diguherin. Hin stereotîp hene di her çandî de wek hev in, lê hinek ji wan jî li gor çanda di nav de bi awayekî cuda didin der" (Dökmen, 2021: 109). Tê dîtin ku di çanda Kurdan de ji bo jinan dev girtin heye, jin ji xeynî helalên xwe, li ber mêrên xerîb devê xwe digirin. Ev mînak, têkiliya stereotîp û çandê radixe ber çavan. Di bersiva J14ê de jî em rastê vê têkiliyê tên:

*"Ez vê ferqê dixwazim bi sembolekî ve bidim nîşandin. Wextê pîrka min de laçika pîrka min heta ber çavên wê dihat, wextê diya min de ew laçik hat binê pozê wê, li ser devê wê sekinî, wextê min de jî bi temamî ji ser çavê min rabû ev laçik. Ez bi saya vê girêdana laçikê vê guherîna navbera me her sê jinan de baştir dibînim. Xuyakirina devê jinan wek eybekî, tewr wek gunehekî dihat dîtin, lê ev nêrîn bi demê re guherî, îro ez laçika xwe wek ya diya xwe, yan jî wek ya pîrika xwe girênadim" (J14, 20, Mamostetiya Polê).*

Cudahiyên di navbera keç û dayikên xwe de em di gotinên gelek beşdaran de dibînin. Xala hevpar a di van bersivan de digihije ber destê me ev e: jinan berê di nav malê de zêde nikaribûne dengê xwe derxin, li wan nehatiye şêwirîn û di dayîna biryaran de xwedî gotin nebûne. Bersiva beşdareke din, J8 vê yekî dide erêkirin: "Ferqeke zehf mezin heye di navbera rewşa me de, lewra di berê de dengê diya min di vê malê de derneketiye û diya min ji ber jinbûna xwe tim hatiye huşkirin. Lê îro kes nikare ji min re bêje huş" (J8, 24, Îlahîyat). Tê dîtin ku îro jinên Kurd li gorî dayikên xwe, li gorî jinên beriya xwe, azadtir in ji aliyê kiryar û biryarên xwe ve. Ew bi xwe jî wê ferqa di navbera xwe û nifşên beriya xwe bi eşkere dibînin û bi xwe jî behsa guherînê dikin. Beşdara J16 ya ku dapîra wê bi wan re dijî, behsa ferqa sê jinan, ango sê nifşan dike:

*"Pirr ferq heye, hem de pirr ferq. Mesela dapîra min bi dilê xwe nezewiciye, hîç jê pirs nekirine biçûktî, bê dilê xwe zewiciye. Gelekî zilm lê kirine, tengasî*

*kişandiye. Rewşa diya min angorî dapîra min hebekî baş bûye lê mixabin ew jî bin baskê zilamê xwe de bûye, tim li destê wî nihêriye, nikaribûye bi tena serê xwe tiştekî bike an jî qirarekî ser xwe bide. Lê aniha ez hatime bi rizaya xwe dixwînim, ez ê bibim xwedî mesleg, ez ê karibim heqê xwe biparêzim. Angorî wan ez pir bi avantaj im. Dapîra min hîna îro jî nikare bi dengekî bilind xeber bide, diya min qasê wê nebe jî eynê rewşê de ye. Lê îro ez bi rehetî dikarim fikr û xwestekên xwe bînim ziman, dikarim li dijî gotinên bavê xwe jî bertekan nîşan bidim. Va çend sal e diya min zewiciye, zarokên wê mezin in lê dîsa jî rojekî bi tena serê xwe neçûye çarsûyê, nikare biçe. Ger mecbûr bimîne jî ji bavê min îzin dixwaze, bavê min bêje erê, ewçax diçe" (J16, 22, Îlahîyat).*

Bersiveke bi heman rengî em ji J9ê dibihîzin ku behsa guherîneke li ber çavan dike:

*"Wexta ez xwe, diya xwe û dapîra xwe didim ber hev, ez ferqeke gelek mezin dibînim di rewşa jinê ya di nav malê de. Ew hişmendiya kevneşoger û bi zext bi temamî nebe jî li gor zemanê berê hinekê kêmtir bûye. Jin hinekî zêdetir nêzîkî bidestxistina mafên xwe bûne lêbelê hê jî ew kêmasî berdewam dikin. Rewşa civakê û îmkanên mirovan guherîn, ev yek jî rê li ber pêşketina jinan vekir û wê hîn zêdetir veke bi min" (J9, 20, Bîyolojî).*

J2 jî pêşiyê herdu pîrikên xwe bi diya xwe re muqayese dike, piştre jî xwe û diya xwe dide ber hev û behsa ferqa rewşa di navbera jinan û serdemên wan de dike:

*"Dema ez diya xwe dinêrim, tevgerên wê û bertekên ku li hemberî bûyeran nîşan dide li gorî pîrika min zêdetir jinane ye. Pîrika min hinekî çawa bêjim jineke mêrane bû, yanî fikrên wê jî tevgerên wê jî wisa bûn, Bi guherîna demê re helbet rewşa jinan jî ber bi başbûnê diçe, lê dema ez li zemanê herdu pîrikên xwe dinêrim, bi min li gorî wê serdemê ew, ji jinên serdema xwe bi şanstir bûne, her tim wek du xwîşkên hevdu karên malê parî kirine, ji hev re bûne alîkar, lêbelê ji aliyê hişmendiyê ve ew jî li gorî civaka xwe xwediyê fikrên pederşahî bûne. Dema diya xwe bi wan re muqayese dikim, bi rastî jî gelek cudahiyan dibînim. Mesela li gorî wan diya min zêdetir hay ji jinbûna xwe heye, yanî ew fikra mêrane ewqas zêde bi wê re tune ye. Yanî civaka me Kurdan civakeke mêrperest e, ji ber wê nava civakeke wiha de bi min rewşa diya min baş e, yanî karibûye bi jinbûna xwe bihese. Ev jî bi awayekî erênî derbasê me bûye, di rewşa me ya nav malê de jî xwedî bandor dibe. Niha ez li gorî van her sê jinan azadtir û rehettir im, lêbelê vêya jî bibêjim diya min gelekî ji me re bû alîkar bo em karibin bibin xwe" (J2, 26, Bernamekariya Kompûterê).*

J2 bi vî şiklî rewşa jinên beriya xwe û ya xwe berawird dike; xwe li gorî wan azadtir û rehettir dibîne. Beşdarê, di gotina xwe de zêdetir behsa hişmendiya mêrane û bandora wê ya li ser fikrên jinan kiriye. Bi ragihandina J2ê em pê derdixin ku kalikê wê du jin anîne, ev ji aliyê şêwaza malbatî de jî agahiyan dide destê me. Lê beşdar vê yekê jî diyar dike ku herdu pîrikên wê ne wek du hêwiyan, herwiha wek du xwûşkan bi hev re jiyane di heman malê de. Di zewaca bavê xwe de behsa du jinan nake, ango bavê wê carekî tenê zewiciye. Di derheqê zewac û jinanîna Kurdan de Mela Mehmûdê Bayezîdî wiha dibêje: "Piraniya Kurdan jinekê tenê tînin. Pir kêm ji axayên wan bi du û sê jinan re dizewicin. Û jinberdan di nav wan de zêde kirêt û şerm e. Kêm kêm diqewime" (Bayezîdî, 2019:

157). Em di çavdêriyên Bayezîdî de jî dibînin ku di nav Kurdan de herdu formên zewacê jî hene lêbelê Kurd zêdetir bi jinekî re zewicîne. Rohat Alakom jî dema behsa formên zewacê dike, wiha dibêje: "Di nav Kurdan de forma zewacê ya bingehîn zewaca yekjinî (monogamy) ye. Angorî hejmara jinan, tehrekî mayîn yê zewacê jî pirjinî (polygamy) ye" (Alakom, 1995: 24). Ji van çavkaniyan ev encam derdikeve ku anîna hêwiyan di civaka Kurdan de rewşeke heyî ye lê belê forma berbelav, zewaca yekjinî ye. Bersivên beşdaran bi gelemperî li ser heman mînakan e, ev yek jî rewşa jinên Kurd wek tabloyekî radixîne ber çavan. Ji ragihandinên beşdaran tê dîtin ku guherîneke berbiçav di nav civaka Kurdan de heye. Jinên Kurd zêdetir berê xwe dane xwendinê, di nav malbata xwe de xwediyê rol û gotinan bûne, li gor nifşên berê zêdetir dikarin xwe îfade bikin û xwestekên xwe bînin cih. Em ji gotinên J16ê têdigihijin ku dapîra wê zêdetir di bin tesîra pergala pederşahiyê de maye û vê yekê di gotin û tevgerên xwe de jî nîşan daye: "Dapîra min hîn jî di civatekî de ji me re dibêje huş bin, bi dengê bilind xeber nedin, hûn qîz in. Wexta ez hatim bo zanîngehê dapîra min digot qîz e bila neçe, digot ev çi ye hûn edetên nuh derdixin" (J16, 22, Îlahîyat). Ev yek, nîşaneya hewandina rolên civakî ye di nav nifşên berê de. Nifşên îro li gorî yên berê dikare bê gotin ku kêmtir di bin tesîra rolên civakî de mane, li gor dapîr û dayikên xwe kêmtir di bin zexta pergala mêrane de mane. Di bersiva J2yê de jî behsa hişmendiya mêrane hebû ku li ser fikir û helwestên jinan tesîr kiribû. Herwiha di gotinên J11ê de jî em ji aliyê hewandina rolên civakî ve heman mînakê dibînin:

> *"Wexta pîrka min de tê bîra min, bavê min wan bihatana malê, pîrka min qiyamet radikir, ji me re digot zû rabin mêrên malê hatine, xwarina wan bînin, çaya wan dagirin, hema wisa digot yanî bila her xizmetê mêran bê kêmasî were kirin. Yanî diya min de jî ez dibînim parastina zayenda mêr heye, lê ez dibêjim ji ber xwendinê ye ku ev tişt di min de tune ye, ev hişmendiya mêrane derbasê min nebûye. Pîrika min yeke bi mala xwe ve girêdayî bû, diya min jî hinekî wisa ye lê êdî hin tişt diguherin, jin êdî ji malê derdikevin, azadtir dibin" (J11, 23, Mamostetiya Pêşdibistanê).*

Ji beşdaran J5 jî dema behsa cudahiyên di navbera xwe, diya xwe û dapîra xwe de dike, balê dikişîne ser tundiya li hemberî jinan û bi demê re kêmbûna vê tundiyê:

> *"Belê cudahiyên mezin hene di navbera me de. Mînak dapîra min di wextê xwe de gelekî kutan xwariye, bûye mexdûrê tundiyê, tewr ji ber vê tundiyê ji tendurîstiya xwe bûye. Lê mesela diya min qet heyata xwe de rastî tundiyê nehatiye, ê ji xwe min ne ji bavê xwe ne jî ji mêrekî din sîleyek jî heta niha nexwariye. Ez vê guherînê di mêran de jî dibînim, êdî wekî berê xwe nadin ber lêdan û kutanê, li jinên xwe naxin. Xwendin kete nava me, hişmendiya me guherî" (J5, 23, Mamostetiya Pêşdibistanê).*

Dikare bê gotin ku wekî mijarên din ên li jor hate behskirin, di mijara tundiyê de jî di civaka Kurdan de guherîneke erênî heye. Beşdar wexta behsa vê guherînê dike, balê dikişîne ser vê yekê ku ne ew tenê, diya wê jî di heyata xwe de lêdan ji mêran nexwariye, ango rastê tundiya fîzîkî nehatiye. Wek sedem jî em dibînin ku beşdar xwendinê û bi xwendinê re guherîna hişmendiyê dide nîşandin. Ev, bandora xwendinê ya li ser civakê bi zelalî dide nîşandin. Mînakeke bi vî rengî em di bersiva beşdareke dî de jî dibînin: "Pîrika min pir belengazî dîtiye, zemanê wan de lêdana jinê gelek zêde bûye, kalikê min jî yekî bînteng bûye gelekî zilm û heqaret li pîrka min kiriye, heta dibêjin carekî hindik mabûye pîrika min bikuje" (J17, 25, Mamostetiya Tirkî). Careke din tê dîtin ku jinên Kurd li ber lêdanê, ji ber tundiya fîzîkî, ji tenduristiya xwe bûne û carinan jî hindik mane ji canên xwe bibin. Lê ji bersivên beşdaran em dibînin ku ev tundî ji holê ranebibe jî angorî zemanê berê kêmtir bûye. Beşdareke din J6 jî balê dikişîne ser erdnîgariyê û pirsa me wiha dibersivîne:

> *"Helbet ferq heye. Ji xwe erdnîgariya me ji bo jinên me erdnîgariyeke gelekî bi zehmet e. Ji ber wê pîrka min wan gelekî zehmetî kişandine, wexta ez rewşa me didim ber hevdu, li gorî jinên berê ez xwe pirr azad dibînim. Mesela pîrka min wan nexwendine, bi dilê xwe nezewicîne, negeriyane, ji xeynî gundê xwe tu der nedîtine, lê îro ez van hemiyan dikarim bi rehetî bikim. Sedema vê yekê helwesta mêran e, yanî mesela kalikê min mêrekî zehf bi hêrs û micîd bû, lê bavê min ne wek kalikê min e, dinya dîtiye û guheriye, ji ber wê jî dikarim bibêjim ez ji diya xwe azadtir im, diya min jî ji pîrika min azadtir e" (J6, 26, Tendiristî û Ewlehiya Karan).*

Di civakekî de ji bo ku di rewşa jinan a civakî de guherîneke erênî pêk bê, divê beriya her tiştî hişmendiya mêrên wê civakê û jinên ku bi hişmendiya mêrane perwerde bûne bêne guherîn. Beşdar J6, di bersiva xwe de jî vê yekê rasterast tîne ziman. Wê bi xwe jî çavdêriya vê yekê kiriye ku mêrên malbata wê ji aliyê hişmendiyê ve bi awayekî erênî guherîne lewra ew dikare îro behsa guherînekî bike di rewşa jinên malbata xwe de. Ev tê vê wateyê ku guherîna rewşa di navbera jinan de, di rastiyê de guherîna hişmendiya di navbera mêran de dide nîşandin. Ango nêrîna li hemberî jinê çiqas biguhere rewşa wê ya civakî jî ewqas diguhere. Em ji mînaka beşdarê jî dibînin ku ew bavê xwe û kalikê xwe berawird dike û bi vî şiklî di rewşa jinan a malbatî de behsa guherînê dike. Ev guherîna malbatî, di heman demê de guherîna civakî jî dide nîşandin. Ev berawirdkirina di navbera bav û kalan de di bersiva xwendekara îlahîyatê J3yê de jî xwe dide der. Pîrik û kalikên beşdarê heta çûne ber rehma Xwedê, bi wan re di heman malê de jiyane:

> *"Yanî wexta ez pîrika xwe tînim ber çavê xwe ez dikarim bibêjim wê qet rehetî nedît çimkî kalikê min yekî bi hêrs bûye, pîrka min re şer dikir, tewr carinan lê jî*

*dixist, ji ber wê pîrika min ji bo kalikê min hêrs nekeve tim li pey wî bû, nedixwest gotineke wî cara duduyan were gotin, loma dizanibû wê dawî yan pirs û gilî be yan jî lêdan be. Lê wexta ez li diya xwe dinêrim angorî pîrka min rewşa diya min pir baş e, yanî bavê min mîna kalikê min nîn e, piştî ku bavê min çû derve xebitî dinya nas kir zêdetir guherî, hem li hemberî diya min hem jî li hemberî me. Yanî em dibînin dinya diguhere, civak diguhere, ku însanên me jî li wan dinêrin bivê nevê di hişmendiya wan de jî guherîn çêdibe" (J3, 24, Îlahîyat).*

Di bersivên beşdaran de yek ji wan xalên ku li ser hatiye rawestin ev e: guherîna nifşa nû bandoreke mezin li ser nifşên berê kiriye, ango rewşa dayikan jî li gorî rewşa zarokên wan guherî ne. Wek mînak meriv dikare li bersiva J17ê binêre: "Diya min berê nikaribû ji mal derketa lê îro bi tena serê xwe dikare biçe çarsûyê. Bi min ev guherîn bi saya me zarokan çêbû, zarokên diya min xwendin, ji mal derketin, dinyayeke din dîtin û helbet diya min jî bavê min jî binê tesîra vê yekê de man" (J17, 25, Mamostetiya Tirkî). Ev rewş me digihîne vê encamê: çawa ku nifşên nû di bin bandora nifşên berê de dimînin, rol û wezîfeyên wan ên civakî dihewînin û berdawamiya wan pêk tînin, bi heman awayî nifşên berê jî dikarin di bin bandora nifşên nû û guherînên ku bi xwe re anîne de bimînin û bi saya wan ji aliyê hişmendiyê ve biguherin. Bi gelemperî dema li bersivên beşdaran tê nêrîn, tê dîtin ku di navbera sê nifşan de, ango di navbera sê serdeman de di rewşa jinan de guherîn pêk hatine. Ev guherîn dikare bê gotin ku ji her alî ve pêk hatiye, lê herî zêde ji aliyê perwerdehî û xwe îfadekirinê ve guherîneke erênî pêk hatiye û dîsa dikare bê gotin ku jinên Kurd li gor jinên beriya xwe pêşketinek bi dest xistine.

### 3.1.6. Di Rewşa Jinên Kurd de Guherîn

Ji bo baştir têgihiştina rewşa jinên Kurd a civakî ji beşdaran hate pirsîn gelo hûn rewşa jinan a di nav civakê de çawa dinirxînin. Beşdaran bi gelemperî di rewşa jinan a nav civakê de guherîneke erênî dîtine. Li gor hin beşdaran jin êdî wek berê di malên xwe de nîn in, derketine qadên giştî û di van qadan de dikarin di karên cuda de bixebitin. Li gorî wan jin ji berê azadtir bûne û gelek mafên xwe bi dest xistine. Dema ji beşdaran hatiye pirsîn gelo sedema vê guherînê çi ye, zehfî beşdaran zêdebûna perwerdehiyê û derketina medyaya civakî wek sedem nîşan dane. Bersivên ku ji beşdaran hatine girtin bi kurtasî wiha ne:

*"Jinên me baştir pêşketin bi min. Niha em li zemanên berê dinêrin jinan tenê eziyet dîtine, hîç dengê xwe dernexistine, ji mêrên xwe, ji bavên xwe, ji xwezîrên xwe tehdayî dîtine, tenê malên xwe de bi zarokên xwe re mijûl bûne. Lê îro bi xêra xwendin û zanebûnê mafên xwe diparêzin, nahêlin tehdayî li wan bê kirin, tiştek nekeve serê wan dikarin bibêjin na. Berê jinan li destê mêran dinêrî, ger mêrek ji jina xwe qayîl nebûya dikaribû bişanda mala bavê wê, gelek caran mala bavê jî ew*

*jin xweyî nedikir. Lê aniha xwendin heye, ji aliyê aboriyê ve bi serê xwe ne jin, bê minet in, nekeve serê wan dikarin ji mêrên xwe veqetin" (J16, 22, Îlahîyat).*

Wek tê dîtin J16, behsa pêşketinekî dike di rewşa jinên civaka xwe de û vê pêşketinê jî bi perwerdebûn û zanebûnê ve girêdayî dibîne. Li gor nêrîna wê, piştî ku xwendin kete nav civaka Kurdan, jinên Kurd bi xwe hesiyan, di bin mineta mêrên xwe derketin û ji aliyê aboriyê ve bi serê xwe bûn. Xwendekarên derûnnasiyê û Îlahîyatê J4 û J7 jî guherîneke erênî di rewşa jinan de dibînin:

*"Tabîî ji aliyê erênî ve gelekî guheriye. Mesela berê jin tenê nav malê de bûn, lê îro dikarin li her derê bin û her karî bikin, dikarin bibin mamoste, dikarin bibin hemşîre, mesela dikarin xwe li gorî dilê xwe perwerde bikin û pêşbixin, bi min êdî astengiyên wisa mezin nemane li hemberî pêşketina jinan" (J4, 20, Derûnnasî).*

*"Helbet guherînek heye. Em nikarin behsa azadiyeke teqez bikin lê angorî zemanên berê rewşa jinên me pir baş e. Herî zêde jî mijara zewacê de serbestiyek heye. Berê kesî ji zarokên xwe nedipirsî û bê dilê wan, bê qirara wan, wan dizewicandin, lê îro ev qerar destê me de ye. Mesela xwûşka min wexta zewicî du sê caran xeber dan, bi hev şêwirîn piştre biryara xwe da. Lê berê heta roja dawetê jî hevdu nedidîtin. Mesela ji aliyê xwendinê ve jî pir pêşketin heye, îro ez li zanîngehê dinêrim xwendekarên jin zêdetir xuya dikin, di pola me de hejmarên xwendekarên jin ji yên mêran zêdetir in. Piştî xwendinê dikarin di karan de jî bixebitin" (J7, 24, Îlahîyat).*

Li gorî J4ê jin di roja îroyîn de gihîştine azadiya xwe, li pêşiya wan astengiyek nemaye ku nehêle jin xwe pêş bixin. Li gor nêrîna wm jin di qadên giştî de dikarin karên cur bi cur bikin û bibin xwedî pîşe. J7 jî behsa guherîna edetê zewacê dike û diyar dike ku berê di civaka wan de zewac bê şêwirîna keçan dihate kirin lê îro ev edet ji holê rabûye û jin heta kesekî nas nekin, pê re xeber nedin dikarin biryara zewacê bi wî kesî re nedin. J7 balê dikişîne ser xwendina jinan û dibêje îro di zanîngehan de, di fakulteyan de hejmarên jinan gelek zêde bûne. Mijara zêdebûna hejmara jinan ên xwendekar em di bersiva beşdareke din J9ê de jî dibînin:

*"Ger em li zemanê berî û yê niha binêrin erê guherîneke erênî heye rewşa jinan de. Bi taybetî jî di mijara xwendinê de guherîneke baş çêbûye. Ew hişmendiya ku digot bila zarokên qîzîn nexwînin êdî wek berê nemaye, hindiktir bûye. Ji aliyê xebatê ve jî guherîn heye. Jin êdî di karên cuda de dixebitin û ji aliyê aboriyê ve bi serê xwe dibin. Lêbelê di nav malê de hîn jî ew newekhevî, ew pirsgirêkên di navbera jin û mêran de berdewam dikin. Angorî berê nêrîna civakê ya li hemberî jinan bi awayekî erênî bi temamî nebe jî hinekî guheriye. Sedema wê ya herî mezin jî perwerdehî ye bi min. Yanî ne tenê perwerdehiya li dibistanan. Jin êdî xwe nas dikin, hay ji xwe hene, hay ji dinyayê hene, têne ba hevdu, bi hev re xebatan dikin, dikarin doza mafên xwe bikin, ji bo mafên xwe têbikoşin. Ev tev bi saya perwerdehiyê pêk hatin" (J9, 20, Bîyolojî).*

J9 behsa girîngiya perwerdehiyê dike lêbelê ne tenê perwedehiya ku li dibistanan tê dayîn, herwiha behsa perwerdehiyeke berfireh dike û dibêje jin xwe bi xwe perwerde

dibin, têne ba hev, dibin rêkxisitin di encama vê de jî ji aliyê hêzê ve xurttir dibin. J10 jî li ser derketina qadên civakî disekine û vê yekê ji bo jinan wek pêşketinekî bi nav dike:

*"Bi min pir pir pêşketin heye di rewşa jinan de çimkî jinên me yên berê di nav çar dîwaran de asê mabûn, nikaribûn bi kesî re têkiliyek an jî axaftinek daniyana. Heta têkiliyên wan û mêrên wan jî wiha bû, nikaribûn li ber mêrê xwe xeber bidana, jinên berê dema xeber bidana mîna ku eybeke mezin kiribin an jî gunehek kiribin dihatin şermezarkirin. Lê îro di qadên giştî de jin bi her kesî re mihatab dibin, meriv bi vî hawî hînê vê rewşê dibin, êdî qebûl dikin" (J10, 25, Mamostetiya Pêşdibistanê).*

Li gorî nêrîna beşdarê jin berê di nava çar dîwaran de bûne lê îro derketina qadan, wê şerma ji aliyê axaftinê ve ji ser xwe avêtine û diyar dike ku civakê jî vê rewşa jinê qebûl kiriye. Beşdareke din J7 jî behsa erêniya rewşa jinên Kurd dike û ew jî wek beşdarên din sedema vê erêniyê wek perwerdehiyê nîşan dide, li gel vê behsa xêra medyaya civakî jî dike:

*"Aliyê erênî ve bêtir guheriye rewşa jinan. Berê fikrên jinan tune bû, qîmet nedidan fikrên wan, nikaribûn li ser xwe biryar bidana, cil û bergên bi dilê xwe nikaribûn li xwe bikirana, tenê roleke wan hebû ew jî ji mêrên xwe re jintiyê bikin. Lê piştî ku perwerdehî kete nav civaka me, êdî hişmendî guherî, jin êdî bi xwe varqilîn, xwe naxin binê destan, dibêjin em jî hene, em jî li vir in, fikrên me jî hene, em jî şexsîyetek in. Wekî min got di vê guherînê de tesîra xwendinê gelek e. Ji xeynî vê, sosyal medya jî pirr bi bandor bû bi min. Berê me zêde vê platformê de jin nedidîtin lê îro êdî zehfî jinan sosyal medyayê dizanin û bi kar tînin. Çawa ku jinên welatên din êdî dikarin xwe îfade bikin, eynî wisa jinên me jî dikarin vê yekê bikin" (J17, 25, Mamostetiya Tirkî).*

J17 balê dikişîne ser sosyalbûna jinên Kurd û xweîfadekirina wan a li qada sanalê. Li gorî wê medyaya civakî jî bi qasê perwerdehiyê di xwenaskirin û îfadekirina jinan de bi bandor bûye. Em vê nêrînê di bersivên beşdarên din de jî dibînin:

*"Rewşa jinê bi min baştir bûye îro. Sedema vê xwendin û medyaya civakî ye. Berê jî zext hebû, destdirêjî hebû lê nedihat xuyakirin, îro medyaya civakî heye, her tişt zûtir tê bihîstin. Wekî din xwendin zêde bû jin zêdetir derketin nava civakê. Berê zewac tiştekî mecbûrî bû lê îro bûye tercîhek. Jineke hijdeh salî ya zemanê berê û ya zemanê niha ne wekî hev e" (J1, 24, Matematîk).*

Beşdar J1 jî wek J17ê li ser girîngiya perwerdehiyê û medyaya civakî disekine. Li gorî wê bi derketina medyaya civakî re êdî zext û tehdayiya li ser jinê veşartî namîne û jin dikarin dema astengiyekî hatin zûtir dengê xwe derxin. Li gel vê J1, behsa bûyera zewacê dike û di vê de jî guherîneke erênî dibîne, li gorî wê zewac êdî ne bûyereke ku bi zorê tê kirin e, herwiha êdî li ser tercîhên ciwanan pêk tê ev bûyer. Giddens jî dema behsa guherînên civakî dike ji bo vê mijara zewacê wiha dibêje: "Zewac êdî ne bi gotina dê û bavan herwiha bi xwestek û tercîhên takekesan ve tên lidarxistin. Ev jî ji bo takekesan zêdebûna azadiyê nîşan dide" (Giddens, 2012: 217). Bersiva beşdara J19ê jî ji bo vê

çavdêriya Giddens mînakeke şênber e: "Berê jinan nikaribûn ji mêrekî hez bikirana yan jî ev hezkirin bianiyana ziman, bi çavekî xirab li wan dihat nihêrîn. Lê îro jinên me kê re bixwazin bi wî re dizewicin, ji vê hêlê ve dikarim bibêjim jin êdî xwedî gotin in" (J19, 25, Civaknasî). Beşdar J5 bereksê bersivên li jor, hebûna medyaya civakî wek neyêniyekî dibîne û tîne ziman ku jin peyva azadbûnê şaş fêhm dikin:

> *"Yanî ez dikarim bibêjim guherîneke hem erênî hem jî neyênî heye. Ji aliyê erênî ve mesela em hîna azadtir bûne, êdî gotinên me tên guhdarkirin û rêzgirtinek heye li hemberî biryarên me. Lê ji aliyekî ve tiştekî wiha neyênî ez dibînim, jin vê azadbûnê bi awayekî şaş fêhm dikin û şaş dijîn, pişt re pir rewşeke nexweş derdikeve holê lê ji vê re jî dibêjin azadbûn. Mesela li ser medyaya civakî gelek însan têne naskirin, ev jî carinan bandorên neyênî li ser jinan dihêlin, yanî bûyerên nexweş di serê wan re derbas dibin, têne tehdîtkirin, têne xapandin, dibin mexdûrê tundiya derûnî" (J5, 23, Mamostetiya Pêşdibistanê).*

J5, di rewşa jinan de guherîneke erênî dibîne lêbelê vêya jî lê zêde dike ku ev guherîn ji aliyekî ve jî tesîreke neyênî li ser jinan çêdike, ango jinan azadîyek bi dest xistine lê nizanin vê azadiyê bi awayekî rast bi kar bînin. Beşdar, hebûna medyaya civakî jî rexne dike û dibêje ev qad dibe sedemên bûyerên nexweş ku ji serê jinan re derbas bibe û ji nû ve mexdûriyetekî derxe holê. Li ser bidestxistin û bikaranîna azadiya jinan rexneyek din jî ji aliyê beşdaran ve hatiye kirin:

> *"Jin êdî zêdetir di qadên giştî de, di nav karan de cih digirin, lê sankî rewşeke neyênî jî di vê guherînê de heye. Jinan ji ber ku mafên xwe pir dereng bi dest xistin bi min nizanin van mafan bi kar bînin. Mesela dibêjin em di biryarên xwe de azad in kes nikare ji cil û bergên me xeber bide lê vê carê jî şilf û tazî digerin. Yanî çawa bêjim bêpergalbûnek çêdibe vê carê jî" (J11, 23, Mamostetiya Pêşdibistanê).*

Wek tê dîtin ku azadiya jinan bi dest xistiye ji aliyê hemî beşdaran ve wek bûyîneke erênî nayê dîtin. Beşdar J5 jî J11 jî anîne ziman ku vê azadiyê encameke neyênî jî di rewşa jinan de derxistiye holê. Herdu beşdar jî vê yekê anîne ziman ku jin nizanin vê azadiya ku bi dest xistine bi kar bînin. Li gorî beşdarên din jî di rewşa jinan de guherînên hem erênî hem jî neyênî hene:

> *"Bi min jin aniha rehettir xwe dikarin îfade bikin, berê şerm dikirin nikaribûn di nava civatekî de xeber bidana lê aniha jin dixwînin li ser nigê xwe disekinin, yanî dizanin îro mêr tune bin jî wê bikaribin îdara xwe û zarokên xwe bikin, yanî meaşên wan jî hene, êdî li destê mêrên xwe nanêrin. Lê mesela tiştekî wiha jî heye, bi min angorî berê tehdayiya li ser jinê zêdetir bûye, yanî erê jin êdî xwende ne, her tiştê wan jî hene lê mixabin hê jî tehdayî dibînin, berê ewqas zêde jin nedihatin kuştin, me nedibihîst tiştên wisa lê îro em dibînin jin çiqas îmkanên wan jî hene dîsa têne kutanê, heta têne kuştinê" (J3, 24, Îlahîyat).*

> *"Ez nikarim bibêjim rewşa jinê niha baştir e an jî xirabtir e, aliyê wê yê erênî jî heye aliyê neyênî jî. Ez nikarim bibêjim li gorî berê dema niha de zêdetir qîmetê didin jinan, lêbelê dikarim bibêjim ku ew hukma mêran a li ser jinan hinekî sist bûye,*

*lê tabîî bi temamî ji holê ranebûye, mesela mêr bixwaze hukmê xwe li ser jinê pêk bîne dikare serî li qetilkirinê bide. Erê îro jin dikare here çarsûyê, dikare kincên li gorî dilê xwe li xwe bike, lê dîsa jî ji cihekî şûn de li astengiya mêran diqelibe, ji cihekî şûn de jin nikare ji wê astengiya mêran xelas bibe. Xebata jinan a li qada giştî jî bi saya xwendinê pêk hatiye. Êdî xwendin li rûyê dinyayê belav bû, xwendin êdî bû edetek kete nav civaka me jî. Êdî hate qebûlkirin ku qîz jî dikarin bixwînin û bibin xwedî mesleg. Dema ku jinan xwend û xwedî meaş bûn, rêzgirtina li hemberî wan zêdetir bû, êdî bi çavên însanan li wan hate nihêrîn. Di vir de em dibînin ku aborî jinan azad dike û ji girêdayîbûna bi mêran rizgar dike" (J14, 20, Mamostetiya Polê).*

*"Bi min hem ji aliyê erênî ve hem jî ji aliyê neyênî ve guherîn çêbû. Aliyê erênî ev e ku jin êdî xwedî gotin in yanî dikarin xwe bi rehetî îfade bikin, êdî dikarin jiyaneke sosyal bijîn, êdî dikarin di gelek qadan de cih bigirin, berî sînordar bûn tiştên wiha. Lê aliyê neyênî jî ev e, pirsgirêkên nav malbatê hey çû zêdetir bû bi min. Her kes bû meraqdarê azadiya xwe ji ber vê jî têgeha malbatê guherî, yanî qasê ku ez dibînim ew hezkirin, ew hurmeta berê êdî nemaye. Bi min têgeha azadiyê jî xwediyê sînorekî, xwediyê çarçoveyekî ye, îro ew çarçove hatiye şikestin" (J15, 21, Derûnnasî).*

*"Wexta ez wiha bi awayekî berfireh li civaka me dinêrim, ez guherîneke wisa mezin nabînim. Li vî bajarî dinêrim, carinan diçim bajarên din jî, li gorî çavdêriya min jin hê jî bi temamî dernakevin derve, yanî carinan ez li çarsûyê rastî jinekî jî nayêm. Piştî ku zanîngeh filan hatin çêkirin, jinan êdî xwendin, perwerde dîtin, guherîn çêbû, yanî hinekî din azad bûn, lê mixabin perwerde tenê ji bo me jinan heye lewra hê jî ew fikrên mêrane yên di serê hin mêran de neguherine" (J6, 26, Tendiristî û Ewlehiya Karan).*

Xala hevpar a ji bersivên beşdaran hatiye girtin ev e: di rewşa jinên Kurd de guherîneke erênî, dikare bê gotin ku pêşketinek heye. Jinên Kurd li gor zemanê berê, di roja îroyîn de xwe nas kirine, dengê xwe derxistine, hin edetên berê ji ser xwe avêtine, mafên xwe bi dest xistine, ya herî muhîm jî xwendine û bûne xwediyê karan. Jinên Kurd îro ji qada taybet ango ji malê derketine û di qadên giştî de cihên xwe girtine. Bi pêşketina teknolojiyê û derketina medyaya civakî re jinên Kurd zêdetir ketine nav jiyaneke sosyal, mirovên cuda naskirine, rêyên cuda ji bo çalakbûnê û xweîfadekirinê dîtine, ev yek jî di cihê wan ê civakê de encameke erênî derxistiye holê. Ango jin îro di nav civaka xwe de dikarin wek takekesekî bêne dîtin û zêdetir di nav civakê de bi çalak tevbigerin. Lêbelê em ji çavdêriyên beşdaran pê derdixin ku sedî sed guherîneke erênî tune ye. Mirov nikare ji bo jinên Kurd di nav civakê de behsa azadiyeke teqez bike, an jî bibêje hemî mafên xwe bi dest xistine. Ligel pêşketinê pirsgirêk, kêmasî û newekhevî jî bi awayên cuda bin jî, wek berê zêde nebin jî hîn berdewam in û li pêşiya wekheviya zayendan wek astengên mezin disekinin. Tê dîtin ku newekheviya nav malbatê, tehdayiya li ser jinê, pirsgirêkên qadên civakî hîn jî li gel guherînan ve, di nav civaka Kurdan de heyî ne û li hemberî guherînan li ber xwe didin.

## 3.2. JI PERSPEKTÎFA DÎNÎ REWŞA JINÊN KURD

Dîn yek ji wan dezgehan e ku li ser civakan, li ser takekesên civakan û li ser rol û berpirsiyariyên takekesan xwediyê roleke mezin bûye. Îro jî ev rol berdewam dikin û bi awayên cuda xwe didin der. Bi taybetî jî ev rol ji aliyê jinbûn û mêrbûnê ve midaxaleyê watedayîna zayendan kiriye. "Di dîroka mirovahiyê de, di înşakirina zayenda jinê de, hêmanên dînî û exlaqî wek rolên sereke cihê xwe girtine" (Tunç, 2022: 202). Herwiha tê dîtin ku tesîra dîn li ser herdu zayendan hebe jî, li gorî pêvajoya dîrokî herî zêde li ser zayenda jinê çêbûye ev tesîr. Lêbelê di vê tesîrê de tenê dîn û têgehên dînî tune ne herwiha "di civakeke dînî de, dema cih û rewşa jinê tê nirxandin, divê ligel qaîdeyên dînî, ji aliyê aborî, sîyasî û çandî ve jî ew civak bête nirxandin" (Berktay, 2019: 15). Ev hêman bi tevahî rewş û cihê jinan a civaka ku tê de ne, didin nîşandin. "Ne tenê ji aliyê çandî, aborî, hiqûqî û sîyasî ve, helbet ji aliyê midaxaleya qada taybet ve jî bandora dînî li ser jinan heye" (Çağlayan, 2006: 69). Ango di têkiliyên nav malbatê de, di têkiliyên cinsî de û di kontrola zayenda jinê de jî bandora dînî bi awayekî xurt xwe dide nîşandin. Herwiha ev rewş ji bo civaka Kurdan jî derbasdar e. Di tevger, rabûn û rûniştandin, cil û berg, berpirsiyarî û cihê jinên Kurd a civakî de ev bandora dînî bi eşkere tê xuyakirin. Ji bo têgihiştina vê bandorê, di xêbatê de jî ji beşdaran çend pirs di vê derbarê de hatine pirsîn û analîza bersivên wan jî li gorî hêmana dînî û hêmanên din hatine kirin.

### 3.2.1. Dîndarbûna Jinên Kurd

Dîndarbûna jinê ji bo têgihiştina veguherîna civakê xaleke girîng e. Lewra cihê jinê ji aliyê veguherîna civakî ve hêmaneke girîng e (Açıkgöz, 2010: 8). Herwiha veguherîna civakê di rol û cihê jinê de jî guherînên berbiçav derdixe holê. "Xebatên li ser dîndarbûna jin û mêran hatine kirin du encaman derdixin holê: encama ewil dibêje mêr li gorî jinan zêdetir dîndar in, lê encama dî dibêje jin zêdetir dîndar in. Lêbelê dema li qebûlên civakî û çavdêriyên jiyana rojane tê nêrîn, tê dîtin dîndarbûna jinan ji ya mêran zêdetir e" (Tunç, 2022: 203). "Sedemên sosyolojîk û psîkolojîk ên vê dîndarbûna jinan hene. Jin gelemperî bi jiyana nav malê re girêdayî, ji hilberîna qada giştî û xwedîbûna pîşeyan bêpar mane" (Açıkgöz, 2010: 9). Ger li gorî vê çavkaniyê li meselê bê nêrîn dikare bê gotin ku ev rewş bivê nevê eleqeya jinan zêdetir biriye ser dîn û kiryarên dînî. Lewra tiştekî ku di nav malê de pê re mijûl bibin kêmtir in, îbadet û çalakiyên dînî di vê rewşê de dibe ku zêdetir bala jinan kişandibin. Di nav malan de bi jinan re xwendina miqabeleya quranê dikare ji van

mijûltiyan re wek mînak bê nîşandin. Lê helbet mumkin e ku sedemên dîtir jî hebin. Ji aliyekî din ve dikare bê gotin qaîdeyên dînî ji aliyê jinan ve zêdetir têne pêkanîn. Ev yek di mijara cil û bergan de ango nixumandinê de xwe dide der. Wekî din, axaftin û tevgerên jinan de jî meriv dikare tesîra qaîdeyên dînî bibîne. Li vir jin li gorî mêran zêdetir xwe berpirsiyarên pêkanîna emrên dînî dibînin. Em di bersivên beşdaran de jî vê tesîrê dibînin. Kurd zêdetir li ser dînê Îslamê ne: "Jiyana Kurdan li gor usûlên Îslamî teşe girtiye û civaka Kurd civakeke feodal e, zêdetir jiyana eşîretiyê di nav wan de heye" (Çağlayan, 2006: 70). Ji ber vê meriv dikare bêje jinên Kurd jî wekî jinên civakên din ên ku bin tesîra dînekî de mane, jiyana wan bivê nevê li gorî dînên ku dihewînin teşe girtiye. Ji bo bête fêhmkirin di nav jin û mêrên Kurdan de kîjan zêdetir dîndar in, hem di gotinên xwe de, hem di tevgerên xwe de, hem jî di helwestên xwe yên li hemberî zarokên xwe de. Dema beşdaran behsa malbatên xwe, behsa dê û bavên xwe kirin, hat dîtin ku dîndarbûn di herdu aliyan de jî bi awayekî xurt heye, lêbelê ji aliyê hejmaran ve ger meriv binêre, beşdarên ku gotine diya me li gorî bavê me dîndar e zêdetir in. Ji vegotinên beşdaran çend xal derdikevin pêş: jinên Kurd li rûyê mêran nakevin, bi laçikên xwe ve devê xwe digirin, bi dengê bilind nakenin, bi tevê mêran xwarinê naxwin û sifra xwe li cihekî dî radixin, dema mêrek ji derve ve tê li ber radibin pîya. Ev tev ji ber baweriyê ne, lewra di nav civakê de wisa hatiye qebûlkirin ku dengê jinê biçe mêrekî guneh e, an jî divê mêr devê jinan nebînin. Jin hem bi xwe van qaîdeyan dihebînin hem jî dixwazin bi keçên xwe bidin kirin. Ji aliyê îbadetan ve jî xalên wiha derdikevin pêş. Mînak jin nikarin li pêşiya mêran nimêj bikin, ger wisa bikin ew nimêj qebûl nabe. Ev bawerî jî xwe dispêre hedîsên dînî. Ji aliyekî din ve jî tevlihevbûna têgehên dîn û çandê heye ku xalên li jor hatin vegotin dikare bê gotin îro ji gunehbûnê derketine wek eyb hatine binavkirin. Ango devgirtina jinên Kurd her çiqas xwe bispêre emrê dînî jî îro wek edetekî di nav civakê de hatiye bicihkirin. Ango peyvên "eyb" û "guneh" sînorên baweriya dînî û edetên civakî tevlihev kirine. Em ê vê rewşê di mijara sergirtinê de jî bibînin.

### 3.2.2. Sergirtin û Nêrîna Jinên Kurd a li ser Dîn

Gotin û kiryarên Îslamî cudahiyê dixin navbera zayendan û nifşan, bi vî hawî wan mihafaza dikin. Nediyariyên di navbera zayendan de, bi taybetî jî lixwekirina jinan a wek mêran mîna gunehekî tê dîtin, ji ber wê nixumandina jinan bona parastina îfetê wek pêwistiyekî tê dîtin (Göle, 2014: 37). Ango bi rêya nixumandina jinê re bedena jinê tê kontrolkirin û ev jî wek parastina namûsê ango zayendîtiyê tê dîtin. Bi vî hawî, bi

gelemperî bêexlaqbûna civakî bi taybetî jî ya jinê tê astengkirin: “Exlaqê civakê ji aliyê qanûnên dînî ve tê rêvebirin û li ser kontrolkirina zayendîtiya jinê hatiye înşakirin” (Göle, 2014: 76). Em ji gotinên Göle careke din têdigihijin ku têgehên wek exlaq, îfet, namûs, kontrolkirin û nixumandina bedena jinê û girtina serê wê tev bi hev ve girêdayî û di bin rêveberiya qaîdeyên dînî de hatine sazkirin. Jin bi xwe jî van qaîdeyan qebûl dikin û dihebînin. Li gorî vê çarçoveyê, ji beşdaran hatiye pirsîn gelo ew di derheqê nêrîna dîn a li ser jinê çi difikirin, li gorî wan gelo cihê mêr û jinan di dîn de wekhev e ji aliyê maf û rolên xwe ve. Ji beşdaran bersivên erênî jî neyênî jî hatine girtin. Beşdarên serê wan girtî zêdetir bersivên erênî gotine, li gorî fikrên wan jin û mêr di dîn de wekhev in, newekheviyek di navbera wan de tune ye, heta hin beşdaran gotiye ji aliyê dînî ve qîmeta jinê zêdetir e, ji ser mêran re ye. Exleb beşdarên ku serê wan vekirî jî bi awayekî neyênî bersiv dane. Li gorî wan sedema bindestiya jinê dîn bi xwe ye, jin û mêr di dîn de ne wekhev in, behsa serdestbûn û azadbûna mêran kirine û li gorî wan berpirsiyariyên ku dîn dide ser milê jinan ji yên mêran zêdetir û girantir in. Bersivên beşdaran bi kurtasî bi vî rengî ne:

> *“Bi min civak vê neheqiyê dixe navbera jin û mêran. Dema em tên dinyayê Xwedê nabêje mêr ji ser jinan re ne, yan jî jinek nikare di karekî de bixebite, li gorî dîn jin û mêr wekhev in. Lê li gorî civakê wisa ye divê jin nexebite, cihê wê mala wê ye, yanî dîn zêdetir qîmet dide jinê, lê civak neheqiyê li jinê dike” (J3, 24, Îlahîyat).*

J3 ku bi xwe xwendekara îlahîyatê ye sedema newekheviya jin û mêran ne di dîn de herwiha di civakê de dibîne, li gorî wê dîn zêdetir qîmetê dide jinê ango jin ji aliyê dînî ve ji ser mêran re ne, lê li gorî fikra wê civak wek gotinên dînî tevnagere, jinê bêqîmet dibîne û nahêle derkeve qada giştî, di karan de bixebite. Dema ji beşdarê hate pirsîn gelo li ser daxwaziya xwe serê xwe girtiye yan ji ber tiştekî din, bersiva beşdarê wiha bûye:

> *“Di serî de dilê min tune bû ez serê xwe bigirim, ji ber malbatê min serê xwe girt. Ez diçûm dibistana seretayî, gotin serê xwe bigire min nedixwest lê ez mecbûr bûm lewra min dema îtîraz dikir digotin li der û dora xwe binêre her kesî serê xwe girtiye, qîzên apên te yek servekirî tune ye, nava xelkê de eyb e, em mala meleyan in. Yanî hinekî bi zorê bû lê îro ez bi dilê xwe serê xwe digirim, ez dizanim ku êdî ji bo rizayê Xwedê ez serê xwe digirim, ew hişmendî bi min re çêbûye, lê dîsa jî dibêjim xwezî ne bi zorê bûya, min xwe nas bikira, dînê xwe nas bikira wisa bi rizaya xwe min serê xwe bigirta” (J3, 24, Îlahîyat).*

Ji bersivên J3yê em dibînin ku ne bi dilê xwe herwiha bi zora malbata xwe serê xwe girtiye. Li vir bandora dîn a li ser malbata beşdarê tê dîtin. Xaleke din derdikeve holê ew jî ev e ku malbata beşdarê di bin tesîra gotinên civakê de jî mane, ne tenê ji ber emrê dîn e herwiha ji ber ku sergirtin di nav civakê de wek qaîdeyekî civakî derketiye pêş û li der

û dora malbatê jî zêde jinên servekirî tune bûne, ev rewş di biryardayîna malbatê de bandor kiriye. Li vir meriv nikare tenê behsa hêmanekî bike. Ligel tesîra dîn, tesîra civakîbûnê jî bi awayekî xurt xwe dide nîşandin. Şîroveyeke wiha bê kirin dê ne gotineke mezin bibe, carinan mirov ji emrê Xweda zêdetir ji ber emrê civakê hin qaîdeyan tîne cih, an jî xwe di bin wê mecbûrîyetê de dibîne. Bersiveke ku van gotinên me piştrast dike ji beşdara J14ê tê:

> *"Ji ber daxwaza malbatê min serê xwe girt. Min nedixwest serê min girtî be ji ber vê jî navbera min û diya min de tim minaqaşe derdiket. Diya min digot wexta tu şarê nadî serê xwe ez eyb dikim, serqot li erebeyan dibî diçî çarşîyê niha dibêjin qîza filankesê serqot digere. Diya min nedigot bona Xwedê şarê bide serê xwe, kêmasî di vir de bû, her tim digot xelk ê çi bêje, filankesê ji me xeber de nizam çi. Ev tirsa civakê tim dilê diya min û bavê min de bû, herî zêde jî diya min dianî ziman. Min ji xwe re digot ku ez çûm zanîngehê ez ê şara serê xwe daynim malbatê nikaribûya êdî tiştek ji min re bigota, lê wexta ez hatim zanîngehê min ferq kir ku ez naxwazim serê xwe vekim, êdî hînê vê sergirtinê bûbûm" (J14, 20, Mamostetiya Polê).*

Tê dîtin ku J14 jî wek J3yê bê dilê xwe, li ser daxwaziya malbata xwe serê xwe girtiye. Dikare bê gotin ku jinên Kurd ji aliyê mijarên dînî ve, bi taybetî jî ji aliyê cil û bergan û serpêçandinê ve xwediyê azadiyekî nîn in û nikarin di van mijaran de biryaran li ser xwe bidin. Ev biryar ji aliyê malbata wan ve têne dayîn, ji wan re jî dimîne pêkanîna vê yekê. Careke din hat dîtin ku têgeha dîn çawa daxilê nav çanda Kurdan bûye û bandoreke mezin li ser jiyana wan a rojane jî kiriye. Diya beşdarê ti carî jê re negotiye ji bo rizayê Xweda serê xwe girtiye, ango ne ji ber gunehbûnê herwiha ji ber şermbûnê vê tiştê jê daxwaz kiriye, şerma li hemberî civakê. "Çand, fêrbûna agahî, bawerî, huner, exlaq û kevneşopiyê ye" (Marshall, 1999: 442). Em ji pênaseya çandê tê derdixin ku tişta J14 jiyaye normal e lewra çand di encama gelek hêmanan de derdikeve holê. Dema ji J14ê tê pirsîn gelo jin û mêr li gorî dîn wekhev in yan na, ev beşdar jî wek J3yê sedema bindestiya jinê wek civak dibîne, li gorî wê pirsgirêk ne dîn bi xwe ye, pirsgirêk di wan kesên ku bi navê dîn midaxaleyên jinan dikin de ye: "Astengiya li hemberî jinê ne dîn e, mirov bi xwe ye. Mirovan ji dîn nizanin baş serwext nebûne ji ber wê şaş dizanin û di kiryarên xwe de jî bi şaşî tevdigerin, esil astengî ev e" (J14, 20, Mamostetiya Polê). Li gorî Göle (2014: 139) ev nêrînên ku dibêjin pirsgirêk ne di dîn de, di pratîkên dînî de ye, nêrîneke nû ye, ango bi modernbûnê ve meriv dikare bibêje zêdetir bûne, kesên ku li ser vî fikrî ne li dijî fikra ku dibêje jin di nezera dînî de kêm e derdikevin û di vê mijarê de wekheviya jin û mêran a dînî diparêzin. Dikare bê gotin ku di nav nifşên nû de jî ev nêrîn heye lewra bi guherîna dinyayê û pêşketina teknolojî û perwerdehiyê ve di qebûlên dînî

de guherîn çêbûne. Ev guherîn dikare bê gotin di ciwanan de, nêrînên wan ên li ser dîn de jî pêk hatiye. Hemî beşdarên me bi zora malbatê serê xwe negirtine, ji wan hin kes di bin bandora der û dora xwe de mane û wisa biryara sergirtinê dane. J7 yek ji wan beşdaran e:

> *"Ya rastî nikarim bibêjim ji ber dîn min serê xwe girt. Yanî min qet negot guneh e, emrê dîn e, divê ez teqez serê xwe bigirim. Dema ez diçûm lîseyê min nihêrî hemî hevalên min, keçên der û dora min yek û yek serê xwe girtin, min jî çav da wan, kêfa min jê re hat, min got ya baş ez jî serê xwe bigirim. Serê meriv vekirî be tiştekî nebaş nîn e helbet lêbelê wê demê hemî keçikan serê xwe girtibû, min xwe di nav wan de ecêb hîs dikir" (J7, 24, Îlahîyat).*

Em ji bersiva J8ê têdigihijin ku ew jî wek J7 di serî de li der û dora xwe dinêre, di bin tesîra jinên girtî de dimîne, lêbelê diyar dike ku pişt re ku diçe lîseya Îmam Xetîbê û di zanîngehê de jî beşa Îlahîyatê dixwîne wateya sergirtinê zêdetir ber bi aliyê dînî ve diguhere. Ne tenê malbat herwiha takekes bi xwe jî di bin tesîra civakê de dimînin, xwe di pêkanîna kiryaran de mecbûr hîs dikin, ev yek ji bo rîtuelên dînî jî derbasdar e, vegotinên beşdaran mînaka vê yekê dide nîşandin. Lê ev bandor her daîm ji derve ve nayê, ango takekes bi xwe jî dikarin xwe mecbûrê pêkanîna emrên dînî bibînin. Ji beşdaran J16, ne bi zora malbatê ne jî ji ber tesîra der û dor, herwiha ji ber xwesteka xwe serê xwe girtiye: "Kesî ji min re negot serê xwe bigire. Min got ez êdî mezin im, sergirtin jî emrekî Xwedê ye, ez ê serê xwe bigirim" (J16, 22, Îlahîyat). Li gorî vê beşdarê jî jin di dîn de xwediyê cihekî taybet e. Ger em li gorî bersivên beşdaran encamekî derxin em dikarin bibêjin ku bi gelemperî di bin bandora dîn de mane. Di mijara sergirtinê de jî hem mecbûrîyeteke hundirîn bi wan re çêbûye hem jî midaxaleyeke ji derve ve heyî bûye. Beşdarên ku bi zora malbatê serê xwe girtine bi demê re hînê vê rewşê bûne û êdî nexwestine serê xwe vekin. Ev di rastiyê de qebûlkirina rolên civakî jî dide nîşandin. Sergirtin dikare bê gotin ku ji têgeheke dînê derketiye wek qaîdeyeke civakî di nav civakê de hatiye pejirandin. Beşdarên ku bi dilê xwe, ji ber emrê dîn serê xwe girtine li gorî yên din xwediyê hejmara herî kêm in. Ev tê wê wateyê ku bi gelemperî beşdar ji aliyê dîn ve xwediyê hişmendiyekî nîn in, zêdetir agahiyên nav malbatê û civakê teşe dane kiryarên wan. Ligel vê, li gorî van beşdaran jin û mêr ji aliyê dînî ve wekhev in lêbelê di nav civakê de ev wekhevî xera bûye.

Beşdarên ku serê xwe negirtine, ji wan hate pirsîn gelo ev tercîha wan bûye yan ji ber midaxaleyan negirtine. Beşdaran tevan diyar kirine ku ev yek tercîhên wan bûne. Ji van beşdaran yên ku dîn dihewînin jî hene yên ku tenê behsa baweriyekî dikin jî. Ligel

vê, li gorî van beşdaran jin ji ber qaîdeyên dînî paş mane, tehdayî dîtine û li gorî wan jin û mêr di dîn de ne wekhev in, herwiha serdestiyek ji aliyê mêran ve heye li gorî fikrên wan. Ji beşdaran J1 serê xwe negirtiye, fikrên wê yên derbarê dîn û sergirtinê de wiha ne:

> *"Min serê xwe negirt, ev tercîha min bû, malbatê di vê mijarê de tiştek negot, bi temamî qirara min bû. Bi min nixumandin û serpêçandin bi baweriyê re eleqedar nîn in, ev edetên civakî ne. Bi fikra min jin û mêr di dîn de ne wekhev in. Jin di rûyê dîn de tim paş da mane, li gorî dîn jin ji aliyê wekheviyê ve di binê mêran re ne, ango wekheviyek tune ye di navbera wan de" (J1, 24, Matematîk).*

J1, dîn wek sedema bindestiya jinê nîşan dide û li gorî wê sergirtin bi dîn re eleqedar nîn e, ew vê rewşê bi edetên civakî re girêdayî dibîne. J9 jî bersiveke nêzî vê bersivê dide me:

> *"Serê min girtî nîn e, ev jî tercîha min e, midaxaleyek çênebû ji derve ve. Bi nêrîna min jin û mêr di dîn de wekhev nîn in, jin di asta jêr de ye û bûye zayenda duyemîn. Ger em qaîdeyên dînî binêrin ev newekhevî bi zelalî xwe dide der. Mesela di mijara mîrasê de newekheviyeke eşkere heye. Dîsa, rewşa jinê ya nav malê, berpirsiyariyên wê û ferzbûna sergirtinê hemî nîşaneyên newekheviya zayendan dide nîşandin" (J9, 20, Bîyolojî).*

J9 jî wek J1 behsa newekheviyê dike û sedema wê jî dîsa wek dîn nîşan dide. Li gorî beşdarê, mijarên dînî yên ku zayendan eleqedar dikin wekhev nehatine diyarkirin, ev mijar jinan di asteke binê mêran re nîşan didin. Dîsa rewşa jinan a nav malê û berpirsiyariyên wan ên civakî li gorî J9ê encama newekheviya zayendan e û sedem jî dîsa wek dîn hatiye bilêvkirin. Beşdar J4 û J6 ku herdu beşdar jî servekirî ne bersivên bi vî rengî dane: "Bi min mêr bi saya dîn ji jinan azadtir in. Dîn jinan hildide dixe nava qefesekî, wê dipêçe nahêle azad be" (J4, 20, Derûnnasî). "Helbet jin û mêr ne wekhev in di dîn de. Beriya her tiştî, berpirsiyariyên ku dîn dide ser milê jinan ji yên mêran zêdetir in, dîn ji jinan zêdetir tiştan hêvî dike" (J6, 26, Tendiristî û Ewlehiya Karan).

Bi gelemperî bersivên beşdaran du nêrînên cuda derxistiye der. Li gorî nêrîna hin beşdaran jin û mêr di dîn de ango li gorî qaîdeyên dînî ne wekhev in, mêr ji ser jinan re hatine dîtin û paşdamayîn û bindestiya jinê jî li gorî van beşdaran xwe dispêrên qaîdeyên dînî. Li gorî nêrîna beşdarên din jî jin û mêr di dîn de wekhev in, ango ji aliyê maf û azadiyê ve herdu zayend di heman astê de ne, heta li gor hin beşdaran jin di dîn de ji ser mêran re ne, dîn zêdetir qîmetê dide jinan û wan ji ser mêran re digire. Di nav beşdarên ku serê wan vekiriye, kesên ku bi zorê serê xwe vekirî hiştine tune ne, herwiha ev tercîha wan bûye, qasê ku ji bersivên wan jî tê xuyakirin di vê mijarê de midaxaleya malbatê jî çênebûye. Malbatê negotiye serî negre, an jî bereksê wê ji endamên malbatê kesî negotiye

serê xwe bigire, em dibînin ku di dayîna vê tercîhê de ev beşdar azad bûne. Lê ji bo beşdarên ku serê xwe girtine em nikarin behsa heman azadiyê bikin. Ji van hin beşdaran bê dilê xwe, bi zora malbatê serê xwe girtine. Lê tiştekî wiha jî heye ku van beşdaran bi demê re ev sergirtin qebûl kirine û ji bo vekirina serê xwe tu hewl nîşan nedane. Vê rewşê em dikarin wek qebûlkirina rolên civakî bi nav bikin. Dîsa ji van hin beşdar jî em dibînin ku bi dilê xwe serê xwe girtine lêbelê di vir de jî sedema sergirtina wan ne qaîdeya dînî herwiha nêrîna civakê û tesîra der û dorê bûye. Ji bersivên wan diyar e ku di atmosfereke dîndar de mezin bûne, sergirtina hevalên wan, dotmamên wan û der û dora wan bivê nevê mecbûriyetek di rewşa wan de çêkirine, ev jî bûye sedema sergirtina wan. Di nav beşdaran de tenê J16 ji bo rizaya Xweda, ji bo emrê dînî serê xwe girtiye, ango bandoreke ji derve ve tune ye di biryardayîna wê de. Di nav 12 beşdarên sergirtî de tenê beşdarek ji ber emrê dîn serê xwe digire. Ev tablo encameke wiha dide nîşandin: Civaka Kurd civakeke dîndar e û takekesên di nav vê civakê de mezin dibin beriya ku lêpirsînek dest pê bike, bi zanînên jiber têne mezinkirin. Ango tiştên derheqê dîn de cara ewil ji malbata xwe fêr dibin û van tiştan wek rastiyê qebûl dikin, di pratîkê de jî li gorî van zanînan tevdigerin. Ji xwe dema ji beşdaran hatiye pirsîn, hema bêje hemî beşdaran gotiye ku wan ewilî û heta demeke dirêj dîn û tiştên di derheqê dînî de ji malbata xwe fêr bûne. Ji ber vê jî her çiqas nirxandineke gelemperî meriv nikare bike jî, ji ser beşdarên vê xebatê dikare bê gotin ku dîndarbûna jinên Kurd zêdetir ji teqlîd, teşegirtin, jiberkirin û kevneşopiyê pêk tê.

### 3.2.3. Rêçên Sekulerbûnê û Bêqîmetbûna Kevneşopiyê

Dîn bikeve nava kîjan civakê bi xwe re hin qaîde û prensîbên teqez tîne nava wê civakê (Açıkgöz, 2010: 13). Lê têgeha sekulerbûnê vê teqeziyê hildişîne. Ango bi gotina Taylor (2014: 279) tiştên ku berê nehatine fikirînê êdî bi derketina Sekulerîzmê re têne fikirîn û hebûna Yezdan tê lêpirsîn. Ev jî nîşaneya qelsbûna hêza bawerî û pratîkên pîroz in. Volkan Ertit pêvajo û sedemên sekulerbûnê di binê sê beşan de dinirxîne û van beşan jî li gorî taybetiyên wan vediqetîne serenavên cuda:

> *"Pêşketinên Zanistî: Fikrên rasyonel, Pêşketina Tiba Modern, kontrolkirina xwezayê, înternet û medyaya civakî.*
>
> *Kapîtalîzma Endustruyî: Dûrbûna ji dîn a aboriyê, veguherîna kevneşopiya malbatê, qelsbûna hêza dewletê, berzbûna rehetiya jiyanê.*
>
> *Bajarîbûn: Zêdebûna qadên taybet ên jiyanê, zêdebûna derfetên perwerdehiyê, dûrketina ji mekanên pîroz, zêdebûna çavkaniyên li ser agahiyên pîroz, zêdebûna tehamula li dijî fikrên cuda" (Ertit, 2019: 122).*

Sekulerbûn ne bêdînbûn e, ev têgeh rasterast bi nûbûnê re, bi lêpirsîna teqezê ve eleqedar e. Di vê pêvajoya guherînê de bivê nevê her civak li ber bayê nûbûnê dikeve û di her civakê de aliyek heye ku kevneşopiyê û qaîdeyên teqez ên dînî dikole û lê dipirse. Sekulerbûn di heman demê de, bi heman awayî nakeve nava civakan. Sekulerbûna her civakê di dem û rewşên cuda de pêk tên û di hin civakan de bi awayekî lezgînî tesîrê li civakê, li edet û baweriyên civakê dike, di hin civakan de jî hêdî hêdî bi giranî tê xuyakirin. Helbet di civakekî de hemî endamên civakê jî bi heman helwestê ve nêzî sekulerbûnê nabin, hin kes li ber nûbûnê li ber xwe didin, ji guherînan re girtî ne, hin kes jî zûtir di bin tesîra wê de dimînin, ji aliyê hişmendiyê ve diguherin û ji fikrên nû re vekirî digirin hişê xwe. Lê gelo di civaka Kurdan de sekulerbûn bi çi rengî derketiye holê, sedem û pêvajoyeke çawa di vê civakê de pêk hatiye, mijara ku dê li ser bê sekinandin ev e.

Mîna gotina Göle (2012: 11), tenê modeleke sekulerbûnê tune ye, ango sekulerbûn li gorî civakan, çandan baweriyên civakan diguhere. Herwiha ev rewş ji bo civaka Kurdan jî derbasdar e: “Civaka Kurdan, ji ber çepên Kurd, ji ber koçkirin û bajarîbûnê, ji ber kadîbûnê, kapîtalîzmê, perwerdehiya modern û teknolojiyê sekuler bûye” (Ekinci, 2022: 23). Ango ji bo sekulerbûna vê civakê nîşandina tenê sedemekî dê kêm bimîne. Li gor fikra Ekinci (2022: 21), çepên Kurd di nav civaka Kurdan de xwediyê hegemonyayekî ye, ji ber vê jî bêyî vê mijarê meriv nikare behsa sekulerbûna civaka Kurd bike. Halime Kökce (2021) jî di xebata xwe de behsa sekulerbûna Kurdan dike û ew bi xwe jî tevgerên çep ên ku nav Kurdan de derketine yek ji wan sedemên sekulerbûnê dibîne. Di vir de xala girîng fikra çep bi xwe ye, ango dikare bê gotin fikra sosyalîzmê ya ku tevgerên Kurd wê dihewînin bandor li ser sekulerbûna civakê kiriye. Cemil Gündoğan jî yek ji wan kesan e ku li ser sekulerbûna Kurdan sekiniye. Li gor Gündoğan (2016: 43) sekulerbûna Kurdan bi entagrasyonê, bi perwerdehiya kemalîst û bi sosyalîzmê re eleqedar e. Gündoğan, sekulerbûna Kurdan wek bêqîmetbûna kevneşopiyê pênase dike. “Kevneşopî ew pratîkên civakî ne ku ji tevgerên sembolîk, ji rutuelan pêk tên û norm û nirxên civakî didin pejirandin, bi awayekî xeyalî an jî rastî bi rabirdûyekî re girêdayî ne” (Marshall, 1999: 258). Ev pratîk û rutuel di navbera nifşan de digerin û berdewamiya xwe didomînin. Ev pratîk û norm, “ji bo bibin kevneşopî divê herî kêm di navbera sê nifşan de berdewam bikin” (Gündoğan, 2016: 46).

Di vê xebatê de, li gorî pênaseya Ertit a sekulerbûnê, di bersiv û vegotinên beşdaran de rêçên sekulerbûnê hatine dîtin. Lê di heman demê de girêdayîneke bi kevneşopiyê re

jî hatiye dîtin. Ango jinên Kurd ên di vê xebatê de cih girtine di navbera modernbûn û kevneşogeriyê de mane. Dema ji wan hatiye pirsîn hûn xwe çawa pênase dikin, modern, dîndar an jî wekî din, beşdaran ji bo xwe nikaribûne tam behsa pênaseyekî bikin. Mînak J1 û J17 vê pirsê wiha bersivandine: "Ez ne dîndar im, di dilê min de baweriyek heye lê bi dîn re eleqedar nabînim. Ez xwe wek modern pênase dikim lêbelê nikarim xwe bi temamî ji edet û kevneşopiyên civaka xwe bişom, di navbera herduyan de mame" (J1, 24, Matematîk). "Yanî wek dîndar na lê baweriyeke min jî heye. Jê re dixwazî bibêje Xweda, dixwazî tiştekî din bibêje, ew bawerî bi min re heye, lê dîndarbûn tiştekî din e bi min" (J17, 25, Mamostetiya Tirkî). Hewce ye em dîsa bi bîr bînin ku sekulerbûn bikeve nav kîjan civakê, nûbûnê bi xwe re tîne û di wê civakê de lêpirsîn dest pê dikin. Ji bersiva beşdaran jî diyar e ku bi awayekî rexneyî li dîn dinêrin, ango qebûlkirinek di vir de naxuyê, xwediyê baweriyekî ne lêbelê naxwazin vê baweriyê bi têgeha dîn a ku civak dijî re têkildar pênase bikin. Tê dîtin ku J1, hem dixwaze xwe wek modern pênase bike, ev bi serê xwe nîşaneya sekulerbûnê ye, hem jî naxwaze destê xwe ji edetên xwe vekişîne. J17 jî di vê çarçoveyê de bersiveke eşkere nade destê me, xwe ne wek modern, ne wek dîndar ne jî bi awayekî din pênase nake. Di bersivên beşdarên din de jî hema hema vegotinên wek yên van herdu beşdaran hene, ango ti beşdarî ji bo xwe pênaseyeke teqez nekiriye, ne ji xwe re tam gotine modern, ne dîndarbûnê qebûl kirine, ne jî bi awayekî din xwe pênase kirine. Li gorî Gündoğan (2016: 50) ne hêsan e ku meriv xeteke teqez di navbera kevn û nû de bikişîne. Ji vegotinên wan diyar e ku beşdaran jî nikaribûne xeteke wiha bikişînin navbera têgehên dîn û modernê. Dema heman pirs ji bo malbata wan hatiye pirsîn, ji beşdaran zehfî wan malbata xwe wek nêzî dîndarbûnê pênase kirine, hin beşdaran jî nêzî modernbûnê dîtine malbatên xwe. Lêbelê beşdarên ku malbatên xwe wek dîndar pênase kirine dîndarbûna wan zêdetir bi edetan ve girêdayî dîtine, ango li gorî wan dînê ku malbata wan dijî dînekî teqlîdî ye, bi edetan re girêdayî ye, zêdetir ji aliyê civakê ve tê rêvebirin. Bersiva J14ê bi kurtasî vê nêrînê dide nîşandin:

> *"Gorî min malbata min ne dîndar e ne jî modern, belkî navbera herduyan de, lê dikarim bibêjim hinekî nêzîkê dîndarbûnê ye. Erê mêjên xwe dikin, rojiya xwe digirin lê hinek tişt kêm in. Çimkî wan jî ev dîn ji mezinên xwe, ji kalik pîrikên xwe hildane lê dema hildane hin tişt kêm bûne. Erê pratîk heye, pratîkê de dikin lê ti carî bingeha vê pratîkê nepirsîne, negotine em filan tiştan bona çi dikin, mantixa wan çi ye" (J14, 20, Mamostetiya Polê).*

J14, malbata xwe wek dîndar pênase dike lê ne bi awayekî teqez. Hem di navbera herdu pênaseyan de dibîne malbatê hem jî dixwaze hinekî nêzî dîndarbûnê behsa wan

bike. Li gorî wê, dîndarbûna malbata wê tiştekî edetî ye, ango di berê de ji mezinên xwe ji aliyê pratîkê ve çi fêr bûne wan pratîkan anîne cih. Li vir J14 malbata xwe rexne dike ji ber ku bê lêpirsîn ew pratîk qebûl kirine û li ser nefikirîne. Dema ji bo wê jî ev pirs tê pirsîn ew ji bo xwe jî tam behsa pênaseyekî nake, “nikarim ji xwe re bibêjim modern an dîndar, dikarim wiha bibêjim qîmetê didim edet û toreyên xwe lê ev nayê vê mehnê ku wan bê lêpirsîn dihewînim. Tiştek li gorî min ne rast be rexne dikim tişta ku rast be jî ez qebûl dikim wê tiştê” (J14, 20, Mamostetiya Polê). Tê dîtin ku J14 pişta xwe edetên xwe de nekiriye lêbelê ji malbata xwe cudatir ew bi lêpirsîn nêzî wan dibe. Di vir de, di nav endamên malbatê de cudahiyeke berbiçav heye ji aliyê hişmendiyê ve. Takekesên ji nifşa nû li gor nifşên berê, ango li gor mezinên xwe bi awayekî rexneyî nêzî têgehan dibin, di heman demê de li cem vê nifşê teqezî tune yanî sînorên têgehan sist digirin. Tê dîtin ku beşdar J6 xwe rasterast wek modern pênase dike û li gorî gotinên wê ew kîjan kincan bixwaze dikare li xwe bike ango kêngî bixwaze dikare ji mal derkeve û heta derengiyê venegere malê. Beşdar, modernbûnê bi van re eleqedar dibîne û wisa pênase dike. Ango ji bo wê, modernbûn ji aliyê xwestek û kiryaran ve azadbûn e. Pênaseyeke cuda jî ji beşdara J11ê tê. Ew jî xwe wek dîndareke modern pênase dike. Tê dîtin ku ew jî wek beşdarên din di navbera herdu têgehan de maye, lêbelê beşdarên din wek wê ji xwe re pênaseyek negotine, J11ê ji bo xwe pênaseyek gotiye, dîndara modern. Ji beşdaran J3 ku bi xwe xwendekara îlahîyatê ye, wekî beşdarên din xwe di navbera herdu nifşan de dibîne lêbelê ji bersiva wê diyar dibe ku zêdetir nêzî modernbûnê dibîne xwe:

> *“Yanî ez nikarim xwe tam wekî dîndar an jî modern pênase bikim, ez xwe di navbera van herduyan de dibînim. Vê dinyaya ku bi lezgînî diguhere de ne gengaz e meriv li ber bayê modernbûnê nekeve, hemî tiştên li dora me pêk tên tesîrê li me jî dikin, bivê nevê em jî bi saya van tesîran diguherin û tevna xwe li gorî lezgîniya dinyayê digerînin, yanî ev dinya me mecbûrê modernbûnê dike. Ligel vê, ji aliyekî din ve jî bi edetên xwe ve girêdayî me, tiştên ku min dikin ‘ez’ ev edet û baweriyên min in ku ez pê mezin bûme” (J3, 24, Îlahîyat).*

J3 jî xwe nêzî modernbûnê dibîne û vê yekê jî bi guherîna dinyayê û tesîra ku li ser takekesan dike re eleqedar dibîne. Ji aliyekî ve jî li gorî wê edet û baweriyên wê bi hebûna kesayeta wê re girêdayî ye lewra nikare xwe ji wan cudatir bifikire. Em di bersivên beşdaran de dibînin ku modernbûna dinyayê, guherîna der û dora wan bandor li hişmendiya wan kiriye, tovê modernîzmê reşandiye nava jiyana wan. Lê ji aliyekî din ve jî tê dîtin ku ev beşdar hîn di bin bandora kevneşopiyê, di bin bandora edet û toreyên xwe de ne, ji ber vê nikarin xwe bi awayekî zelal pênase bikin. Ev yek jî hem wek sekulerbûna

beşdaran dikare bê şîrovekirin hem jî dijwarbûna terikandina kevneşopiyan derdixe der. Ew xeta zirav a di navbera kevn û nûbûnê de careke din di bersivên beşdaran de derdikeve pêşberî me. Di hin bersivên beşdaran de meriv çiqas rastî sekulerbûnê were jî, di hin bersivan de rêça kevneşopiyê an jî dîndarbûnê tê xuyakirin. Ango sekulerbûna beşdaran ne ji bo hemî mijaran e, ango meriv nikare bêje ku ev jinên Kurd ji her alî ve bûne xwediyê nasnameyeke sekuler. Mînak dema ji beşdaran hatiye pirsîn, hûn ji bo têkiliya cinsî ya derzewacî çi difikirin, di bersivên wan de hem rêça dîndarbûnê, hem jî ya sekulerbûnê hatiye tesbîtkirin. Em bi kurtasî di çend bersivên beşdaran de van nêrînên cuda bibînin:

> *"Yanî têkiliya cinsî ya derzewacî ez teqez qebûl nakim lê wekî dinê di navbera jin û mêran de hezkirinek hebe dikarin di çarçoveyeke mantiqî de hevdu nas bikin, bi hevdu re biaxivin. bona zewacê meriv divê hevdu nas bike ev normal e, ji ber wê ez têkiliya flortê maqûl dibînim lê ya cinsî na, teqez wêya maqûl nabînim, çimkî ew ne exlaqî ye bi min" (J8, 24, Îlahîyat).*

> *"Ez têkiliya cinsî qebûl nakim lê ez flortê jî durust nabînim. Di têkiliyên cîddî de malbat hevdu nas dikin, ciwan diaxivin ger li hev bikin biryarekî didin. Ger her kes sînorên xwe bizanibe têkilî maqûltir dibin. Lê em di civakeke misilman de dijîn, têkiliya cinsî ya derzewacî qedexe ye, rasterast zîna ye, em jê re dibêjin heram. Lê ji xwe ez vê yekê ji bo xwe jî nakim, yanî ez ne misilman dînekî din de jî bûma min ê qebûl nekira lewra beriya her tiştî ev li kesayetiya min nayê. Ez dixwazim ev têkilî tenê di navbera min û wî kesî de be ku ez ê pê re heyatekî ava bikim" (J16, 22, Îlahîyat).*

> *"Yanî ji bo meriv ji yekî bawer bike divê meriv pêşiyê wî nas bike wisa bi wî re dest bi rêyekî bike, ev tiştekî bi mantiq e li gorî min, lê tiştekî wiha jî heye yên niha vê têkiliyê şaş bi kar tînin, yanî ne ji bo naskirinê bi yekî re têkilî datînin ev jî bi min zirarê dide meriv. Têkiliya cinsî ez bi ti awayî napejirînim, hem ji aliyê exlaqî ve hem jî ji aliyê civakî ve, çimkî meriv ji civakê re dibe mînak, ji aliyê dînî ve jî ne durust e ji xwe" (J7, 24, Îlahîyat).*

> *"Ger meriv ji însanekî hez bike, hestên meriv hebin li hemberî wî ewçax flort tiştekî rast e bi min, lê însanên niha bi her însanî re têkiliyên hevaltiyê datînin, ji her kesî re behsa hestan, behsa hezkirinê dikin, ev tiştekî nexweş e gorî min, yanî hestên hezkirinê li hemberî her kesî çênabin ji ber wê jî divê têkilî bi her kesî re neyê danîn, ji ber vê tevliheviya roja me ez têkiliya flortê jî durust nabînim, ji xwe têkiliya cinsî qet durust nabînim. Ger min heta îro xwe parastibe, bi xwe karibûye, divê ew kesê ez pê re dizewicim jî wisa be, ger heta îro ez paqij mame divê ew jî eynî wisa paqij mabe." (J3, 24, Îlahîyat).*

> *"Ez têkiliya cinsî ya derzewacî teqez qebûl nakim, normal nabînim, ew kesên ku normal dibînin jî ez li dijî fikrên wan derdikevim, o zeman çi wateya zewacê dimîne. Her tişt wextekî xwe yê maqûl heye, ger ev têkilî beriya zewacê pêk bên îxtîmala jihevsarbûna mirovan heye, ji ber wê her tişt di wextê xwe de bê kirin, aciziyên wiha jî çênabin" (J14, 20, Mamostetiya Polê).*

> *"Bi min beriya zewacê divê jin û mêr hevdu nas bikin, ew zewacên ku bê hezkirin û bê naskirin têne kirin ez erênî nabînim, kesekî ku meriv nas nekir divê meriv pê re nezewice, bi xwe jî naxwazim zewaceke wiha bikim, lê têkiliya cinsî ez durust nabînim. Çimkî di encama têkiliyê de îhtîmala hebûna zarokan pirr zêde ye.*

*Ji bo zarokan malbat divê, dê û bav divê, pergalek divê. Ji ber vê jî têkiliya cinsî ya derzewacî, neheqiyeke mezin e li hemberî zarokan" (J13, 24, Dîrok).*

*"Bi min flort tiştekî durust e, di vir de şaşiyekî nabînim ez, lêbelê têkiliya zayendî, hem ji aliyê dînî ve hem ji aliyê wijdanê ve ez maqûl nabînim. Bê têkiliya cinsî, di navbera meriv de têkiliyeke ku li ser hezkirinê hatiye avakirin hebe, ev baştir e ji bo meriv" (J20, 19, Ziman û Wêjeya Tirkî).*

*"Ez herdu têkiliyan jî normal dibînim, heta bi min ev têkilî wek hewcedariyekî ne. Zewac tiştekî mezin û cîddî ye, ji ber wê beriya ku ev biryar bê dayîn ji bo baştir hevdu nas bikin divê ev têkilî di navbera jin û mêran de bêne jiyîn" (J9, 20, Bîyolojî).*

*"Fikra zewacê bi min re tune ye, ji ber wê jî ez herdu têkiliyan jî durust dibînim. Kî çawa dilşad dibe bila wisa bike, heqê me tune ye em tiştan bi zorê bi însanan bidin kirin, an jî ji kirina wan re bibin asteng. Lê mixabin em dibînin di nav civakê de fikrên li ser van têkiliyan teqez in, hêvî dikim rojekî ev biguhere" (J2, 26, Bernamekariya Kompûterê).*

Me bi rêya van bersivên beşdaran ve xwe gihand fikrên cuda yên li ser têkiliyên jin û mêran ên derzewacî. Tê dîtin ku bi gelemperî beşdaran têkiliya flortê normal dîtine lêbelê têkiliya cinsî ya derzewacê ligel sedemên cuda red kirine, durust nedîtine. Ger bi pirsa li jor re bê muqayesekirin dikare bê gotin ku ew beşdarên ku xwe nêzî modernbûnê didîtin û wisa pênase dikin, di bersivên ji bo têkiliyan de dîmeneke cuda radixin li ber çavan. Di bersivên pirsa ewil de zêdetir rêçên sekulerbûnê hatibû tesbîtkirin, lê di van bersivan de zêdetir rêçên kevneşopî û dîndarbûnê hatine dîtin. Ango sekulerbûn û dîndarbûn ne ew têgehên in ku bi xetên teqez ve ji hev veqetiyabin. Dîsa, ne gengaz e ku takekesek bi temamî bertekên sekulerbûnê an jî dîndarbûnê nîşan bide. Lewra takekes, bi taybetî jî takekesên ciwan, wek beşdarên me ku xwendekarên zanîngehê ne, ji têgeha dîndarbûnê hêdî hêdî ber bi têgeha sekulerbûnê diçin. Ev jî xwediyê pêvajoyekî ye û ji nişka ve pêk nayê. Di nav beşdaran de yên ku zêdetir rêçên dîndarbûnê nîşan dane hene ku wan, têkiliya cinsî wek guneh, heram, bêexlaqî pênase kirine û hinek ji wan têkiliya flortê jî durust nedîtine, li dijî herdu têgehan jî bi awayekî hişk bertek nîşan dane. Di bersiva J3yê de em rastî parastina namûse û "paqijbûna" tên lewra li gorî beşdarê beriya zewacê nedanîna têkiliya cinsî nîşaneya paqijbûnê ye. Lê ev jî heye ku beşdar vê paqijiyê ji bo herdu aliyan jî pêwîst dibîne, ango parastina namûsê tenê ne ji bo jinan herwiha ji bo mêran jî derbasdar e. Dîsa tê dîtin ku parastina vê namûsê ji qaîdeyên dînî wêdetir, wek qaîdeyeke exlaqî hatiye dîtin. Ango li gorî gotina beşdaran ger dînê wan ne Îslam jî bûya wan ê dîsa ji bo exlaq û kesayeta xwe ew namûs biparasta û bêzewac destûr neda têkiliya cinsî. Di heman demê de, di nav wan de her çiqas wek hejmar ji yên din hindiktir bin jî yên ku zêdetir rêçên sekulerbûnê dane nîşandin jî hene. Ev jî wek nîşaneya şkestina normên civakî dikare bê xwendin. Tewr beşdar J2 bi nêrîneke cuda li têgeha zewacê

dinêre, ango zewac ji bo wê xwediyê wateyeke girîng nîn e, ji ber vê yekê li gor fikra wê têkiliyên jin û mêran divê li gor dilê wan û xwesteka wan be, ne li gorî zewacê. Di vir de, guherîneke ji bo têgeha zewacê jî tê dîtin.

Ger bi berfirehî li bersivên beşdaran ên di pirsên mayî de jî bê nêrîn, tabloyeke wiha derdikeve holê: Sekulerbûn, wekî her civaka ku ji guherînan re vekirî ne, ketiye nav civaka Kurdan jî. Dîsa, ji bersivan diyar dibe ku ev têgeh herî zêde bi rêya xwendinê ve xwe di nav civakê de daye der. Beşdaran bandora erênî ya ku xwendinê li ser malbata wan û civaka ku tê de dijîn hiştine, bi mînakên zelal ve anîne ziman. Xwendin, yek ji wan sedemên derketin û belavbûna sekulerbûnê ye. Ya herî girîng ew e ku bi rêya xwendinê civak fikrên nû dinase û bivê nevê li ber bayê wan fikran dikeve. Bi vî hawî bendê fikrên rûniştî jî sist dibe û lêpirsîn şûna teqeziyê digire. Medyaya civakî û înternet jî sedemên berbiçav in di guherîna civaka Kurd de. Bi rêya van herduyan, herçî jinên ku derneketine qada giştî, bi rêya vê cîhana ferazî, li gelek deveran digerin û gelek mirovên cuda nas dikin. Ev jî ferqa di navbera qada taybet û ya giştî kêmtir dike. Jin bi vê rêyê hay ji zayendên xwe jî dibin, bi nasîna jinên li civakên cuda hay ji rolên xwe dibin û ev jî rêya lêpirsînê ya rolên civakî li ber wan vedike. Beşdarên vê xebatê, xwendekarên zanîngehê ne û ji bo xwendinê ji bajarên xwe derketine, ji malbata xwe, ji hevalên xwe veqetiyane, li bajarekî din mirovên nû, fikrên nû, edetên nû nas kirine. Ev naskirin dikare bê gotin guherîneke berbiçav di hişmendiya wan de çêkiriye. Herî zêde jî ji aliyê rolên civakî ve meriv dikare behsa guherînê bike. Ev takekes dema ji malê derdikevin, di heman demê de ji nav rolên jiberkirî derdikevin, ev jî dibe sedema hilşandina kodên di serê wan de. Ji vê hêlê ve zanîngeh mekaneke girîng e ji bo guherîna hişmendiya takekesan. Zanîngeh di perwerdehiya dibistanî de rawestgeha herî dawî û ya herî bi bandor e, lewra gelek cudahiyan di nava xwe de dihewîne. Takekesên ku ji vê rawestgehê derbas dibin dikarin bi awayekî rexneyî li der û dora xwe û li jiberkirinên xwe binêrin.

Sekulerbûn nîşaneya pêvajoya guherînekî ye. Ji bo têgihiştina vê pêvajoyê jî divê di navbera rabirdû û roja îroyîn de berawirdkirinek bê kirin. Bê berawirdkirin hebûna sekulerbûnê nayê fêhmkirin (Ekinci, 2022: 17). Berawirdkirina nifşên cuda, ji bo têgihiştina vê pêvajoyê rêbazeke maqûl e. Bi taybetî jî nifşên ku di heman malbatê de ji heman pêvajoyan derbas bûne. Lewra cudahiyên di navbera nifşên di malbatekî de guherîna rol û berpirsiyariyên endamên wê malbatê nîşan didin, ev jî bi xwe re guherîna têgeha malbatê tîne. Guherîna têgeha malbatê, yek ji wan nîşaneyên sekulerbûnê ye. Ango

berawirdkirina nifşan, bi xwe re ji gelek aliyan ve hebûna sekulerbûnê, kêmbûna qaîdeyên dînî, kevneşopî û baweriyên teqez derdixe der. Di hevpeyvînan de jî dema beşdaran xwe, dêyên xwe û pîrikên xwe dane ber hev û behsa cudahiyan kirine, di rastiyê de bi van berawirdkirinan ve pêvajoya guherînê û derketina sekulerbûnê jî dane nîşandin. Ji bo baştir têgihiştina vê têgehê heq heye meriv bersiva J14ê dîsa bi bîr bîne: "Ez vê ferqê dixwazim bi sembolekî ve bidim nîşandin. Wextê pîrka min de laçika pîrka min heta ber çavên wê dihat, wextê diya min de ew laçik hat binê pozê wê, li ser devê wê sekinî, wextê min de jî bi temamî ji ser çavê min rabû ev laçik" (J14, 20, Mamostetiya Polê). Ev bersiv rasterast ji me re behsa pêvajoya guherînekî dike ku di navbera sê nifşan de derbas bûye. Di vê bersivê de ji du aliyên cuda ve rêça sekulerbûnê dikare bê dîtin: Ji aliyekî ve guherîna teşeya sergirtinê derdikeve pêşberê me ku ev jî tesîra sekulerbûnê ya li ser teseturê dide nîşandin. Ji aliyekî din ve jî di edet û kevneşopiyên civakê de guherîneke eşkere derdikeve holê. Laçika spî di kevneşopiya Kurdan de wek sembolekî ye û devgirtin jî kiryareke jinên Kurd e ku xwe dispêre qaîdeyên dînî. Ji ber vê, qelsbûna hêza dîn jî li vir derdikeve pêşiya me. Wekî din ji aliyê edetan ve em ji beşdaran hîn dibin ku di zemanê berê de jin û mêran tevê hevdu xwarin nedixwarin lê îro ev edet bi temamî ji holê ranebibe jî qasê ragihandinên beşdaran gelekî kêm bûye, êdî hemî malbat bi jin û mêran ve li ser heman sifrê xwarinan dixwin. Dîsa di dawetên wan de jî guherîn hatine tesbîtkirin. Zemanê berê jin û mêr di dawetan de nediketin destê hevdu, bi hev re govend nedigerandin, heta li hin cihan mekanên wan jî ji hev hatine cudakirin. Ev jî dîsa ji ber tesîra dîn e û îro em dibînin ku kêmtir bûye ev edet. Ev çavdêriyeke ne gelemperî ye helbet, encamên li ber dest, di derheqê edetên giştî yên Kurdan de agahiyan nadin destê mirov, lê ji bo têgihiştina pêvajoya guherînê û rêçên sekulerbûnê mînakên şênber didin destê me.

## ENCAM

Civak, ji bo takekesên jin û mêr rol û berpirsiyariyan diyar dike û ji takekesan dixwaze ku li gorî van rolan di nav civakê de tevbigerin. Ev rol û berpirsiyarî, di takekesan de zayendeke ku ji ya bîyolojîk cudatir e derdixe holê: zayenda civakî. Ango ew zayenda ne xwezayî herwiha çêkirî û guherbar ku dikare bê tercihkirin an jî redkirin. Ji vê hêlê ve ji zayenda bîyolojîk vediqete. Zayenda bîyolojîk jî bereksê zayenda civakî, li der tercîha mirovan, beriya hatina dinyayê tê diyarkirin, mirov bi vê zayenda bîyolojîk ve çavên xwe li dinyayê vedike. Bi hatina dinyayê re û destpêkirina pêvajoya civakîbûnê re zayenda civakî dikeve dewrê û di hemî qadên vê pêvajoyê de bandorê li ser mirovan û cihê wan ê civakî dike. Ev xebat jî li dor çarçoveya vê têgehê hate amadekirin. Di vê xebatê de me armanc kiribû em ji perspektîfa zayenda civakî lêkolînekî li ser rewşa jinên Kurd ên di nav civaka Kurdan de bikin. Ji bo pêkanîna armancê me bi şêwaza lêkolîna kalîtatîv û bi teknîka hevpeyvînê ve xebateke sehayî bi rê bir. Di vê xebatê de me bi jinên Kurd ên xwendekarên zanîngehê re rû bi rû hevpeyvîn çêkirin, em rasterast bûne şahidên vegotinên jinên Kurd ên di derheqê jiyana wan a malbatî û civakî de. Me pirsên di derbarê malbata wan, parîkirina karên nav malê, rolên endamên malbatê û hwd de pirsên zelal pirsî. Jinan jî bi yek û yek pirsên me bersivandin. Bi van bersivan re ji bo lêkolîna me çarçoveyek çêbû û bi saya vê çarçoveyê ji bo rewşa jinên Kurd ên nav civaka Kurdan me encam bi dest xistin. Li gor encamên bidestxistî em rewşa civakî ya jinên Kurd dikarin di çend xalan de bidin nîşandin.

Ji bersivên beşdaran bi awakî zelal xuya dike ku di civaka Kurdan de, pergala pederşahiyê ji têkiliyên malbatî bigirin heta têkiliyên nav civakê, ji rolên zayendan bigirin heta tercîhên zanîngehê, ji zimanê axaftinê bigirin heta helwestên takekesan hakimê hemî qadan e. Civaka Kurdan civakeke pederşah û kurparêz e. Di nav malbatê de zarên kurîn li ser yên qîzîn re têne girtin, li gorî zarên qîzîn, yên kurîn zêdetir xwediyê mafan in, di biryar û kiryarên xwe de zêdetir azad in, zêdetir têne hezkirin û zêdebûna hejmarên kur di malbatekî de dikare bibe sedema kêfxweşiya endamên malbatê, herwiha hebûna zarên qîzîn jî dikare bibe sedema bêşansiya bavan û bextreşiya dayikan. Dîsa, parîkirina karên nav malê dikare bê gotin ku bingeha newekheviya zayendan ava kiriye di vê civakê de. Lewra bi gelemperî karên nav malê wek karên jinan hatine pejirandin, karên derveyê malê jî aîdê mêran hatine dîtin. Ango jinên Kurd zêdetir di qada taybet de, mêr jî di qadên giştî de cih girtine. Yanî bermalîbûn wek karên jinan ên xwezayî hatiye dîtin, mêr jî wek

malxweyê malê hatine pejirandin. Rolên zayendan bi vî hawî di nav malbatê de hatine kategorîzekirin û qebûlkirin. Ligel vê yekê, li gor ragihandinên beşdaran tê dîtin ku piştê xwendin ketiye nav civakê û hejmara xwendeyan zêde bûye, di van rolên zayendî de sistbûnek çêbûye, ligel vê sistbûnê newekheviya zayendî di nav malbatan de berdewam kirine.

Zayenda civakî di tercîhên pîşeyan de jî bandorê li takekesan dike û pîşeyan li gor zayendan kategorîze dike. Ji ber vê kategorîzekirinê, takekes di dema tercîhên zanîngehan de di bin bandora rolên civakî de dimînin û tercîhên xwe li gor van rolan dikin. Di vê xebatê de jî ji bo ku were têgihiştin gelo beşdarên vê xebatê jî dema tercîhan, di bin bandora van rolan de mane yan na, encama ku me bi dest xist da nîşandin ku ji nîvî zêdetir beşdaran li gorî kategorîzekirina pîşeyan tercîhên xwe dane. Pîşeya ku herî zêde hatiye tercîhkirin mamostetî, piştre jî îlahîyat bûye. Wekî din çend pîşeyên cuda hatine tercîhkirin. Hin beşdaran anîne ziman ku ji ber zayenda xwe, wan mamostetî wek pîşeya herî maqûl dîtine û vê yekê jî bi têgeha dayikbûnê re girêdane. Li vir, bi zelalî tê xuyakirin ku van beşdaran rolên ku civakê ji bo wan diyar kirine di hundirê xwe de pejirandine, mamostetî û dayikbûnê wek di rolên jinane di hişên xwe de kod kirine. Lê hin beşdaran jî xwestine beşeke din bixwînin, kêfa wan ji kîjan pîşeyê re tê wêya tercîh bikin lêbelê malbata wan ji van xwestekên wan re bûne asteng û xwestine ku keçên wan tercîhên xwe li gorî “pîşeyên jinan” bikin. Ev pîşe jî li gor malbatan dîsa mamostetî bi xwe bûye. Beşdaran her çiqas bê dilê wan be jî tercîhên xwe li gor xwestekên malbatê ango hêviyên civakî dane. Tê dîtin ku rolên civakî ne tenê ji aliyê takekesan ve herwiha ji aliyê malbata wan ve jî têne pejirandin û malbat dixwazin ku zarokên wan li gorî rolên diyarkirî tercîhên xwe yên jiyanê bikin; tercîhên zanîngehê jî yek ji wan tercîhan e. Ji beşdaran yên ku ne li gor xwesteka malbatê herwiha li gorî qebîlîyet û daxwaziyên xwe pîşe tercîh kirine jî hatine tesbîtkirin. Ev jî şîroveyeke wiha derdixe holê ku rolên zayenda civakî li ser hemî beşdaran bi heman awayî bandor nekiriye. Lêbelê di bersivên van beşdaran de jî ji aliyê der û doran ve rexne û vegotinên zextî hatine dîtin. Ango kesên ku bi van beşdaran re di heman polê de bûne gotinên wek “ev beş ne li gorî te ye, tu yê bibûya mamoste” ji beşdaran re gotine. Ev jî helwesta civakê ya li hemberî pîşeyan dide nîşandin. Li gor van encaman bi rehetî dikare bê gotin ku takekesên di vê xebatê de cih girtine, ji hêlên cuda ve di bin bandora rolên civakî de mane, bi gelemperî ev rol qebûl kirine, lê car caran bereksê rolên diyarkirî jî helwest nîşan dane.

Di vê xebatê de xaleke din a ku ji encama xebata sehayî hatiye bidestxistin, bi giştî sekulerbûna Kurdan, bi taybetî sekulerbûna jinan bûye. Di bersiv û vegotinên beşdaran de rêçên sekulerbûnê, rêçên guherîna edetan û sistbûna teqeziya norm û kevneşopiyan hatine tesbîtkirin. Ev guherîn hem di beşdaran de hem jî di endamên malbata wan de pêk hatine. Ji vê hêlê ve bi giştî meriv dikare behsa guherîneke civakî bike ku berê wê bi modernbûnê ve ye. Lêbelê di heman demê de, di vegotinên beşdaran de, li pêrgî dûrbûneke mezin a li hemberî dîn nehatiye. Beşdarên vê xebatê çiqas helwestên sekuler nîşandane ewqas yên dînî jî pê re nîşandane. Ango meriv nikare bibêje bandora dîn a li ser civakê ji holê ranebûye. Tenê meriv dikare ji aliyê qaîdeyên dînî ve behsa qelsbûnê bike, ango behsa lawaziya teqeziyê. Ji nav sedemên vê guherîna civakê, herî zêde zêdebûna perwerdeyê û derketina înternetê hatiye destnîşnakirin. Em vê encamê hem ji vegotinên beşdaran derdixin hem jî dema fikra wan a li ser guherîna rewşa jinan a civakî hate girtin, beşdar herî zêde li ser van herdu têgehan û bandora wan a civakî sekinîn. Bi vê mijarê re girêdayî, jinên di vê xebatê de cih girtine, bi gelemperî ji bo civaka Kurd û helwesta wê ya li hemberî jinan behsa guherîneke erênî kirine. Ji bo vê yekê dikare bê gotin guherîna civakekî rasterast bi guherîna rewşa jinên wê civakê re têkildar e. Di rewşa jinan de guherînên erênî, di heman demê de, di pergal û hişmendiya civakê de jî nîşaneya guherînên erênî ne. Ger em li ser civaka Kurdan mînak bidin, li gor encamên vê xebatê, em bi rehetî dikarin bibêjin di rewşa jinên Kurd de guherînên erênî pêk hatine. Hem ji aliyê bidestxistina mafan ve, hem ji aliyê xweîfadekirinê ve, hem ji aliyê rolên zayendî ve hem jî ji aliyê cihgirtina qada giştî ve. Bi heman awayî ji bo têkiliyên malbatî û parîkirina karên nav malê jî guherînên şênber hatine destnîşankirin. Jinên kurd êdî devê xwe li ber mêran nagirin, dikarin li ber mêran dengê xwe derxin, biaxivin û fikrên xwe bînin ziman. Jinên kurd êdî dikarin bi serê xwe ji mal derkevin, dikarin di karên cuda de bibin xwedî mesleg, bixwînin û ji bo xwendinê biçin bajarên dîtir. Jinên Kurd êdî zêdetir bi mêran re heman mekanî dikarin parve bikin û dikarin li ser sifra mêran bi tevê hevdu xwarinan bixwin. Ev bi tevahî di norm û edet û baweriyên Kurdan de ji hêla guherînê ve nîşaneyên şênber radixin ber çavan. Di heman demê de, ligel guherînên erênî, di newekheviya zayendan de, di zext û tehdayiyên li ser jinan de, di bandora dîn a li ser zayendan de dubarekirin û berdewamkirinek hatiye tesbîtkirin.

**ÇAVKANÎ**


Acar-Savran, G. (2013). *Beden Emek Tarih Diyalektik Bir Feminizm İçin*. İstanbul: Kanat Kitap Yayınları.

Acar-Savran, G. (2020). *Kadının Görünmeyen Emeği*. İstanbul: Yordam Kitap.

Açıkgöz S. (2010). "Toplumsal Değişim Sürecinde Kadın Dindarlığı (Adıyaman/Çelikhan Örneği)." *(Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi).* Erciyes Üniversitesi SBE.

Adak, S. (2022). "Siyaset ve Toplumsal Cinsiyet." Feryal Saygılıgil. (ed.). *Toplumsal Cinsiyet Tartışmaları*. İstanbul: Dipnot Yayınları.

Akkaş, İ. (2019). "Cinsiyet ve Toplumsal Cinsiyet Kavramları Çerçevesinde Ortaya Çıkan Toplumsal Cinsiyet Ayrımcılığı." *Ekev Akademi Dergisi*. Icoaef Özel Sayısı. 97-118.

Alakom, R. (1995). *Li Kurdistanê Hêzeke Nuh Jinên Kurd*. Stockholm: Apec Yayınları.

Asad, T. (2024). *Sekülerliğin Biçimleri Hıristiyanlık, İslamiyet ve Modernlik*. Ferit Burak Aydar (çev.). İstanbul: Metis Yayınları.

Baldemir, H. (1994). *Metropolde Kürt Kadını*. İstanbul: Nam Yayıncılık.

Bayezîdî, M. M. (2019). *Adat û Rusûmatnameê Ekradiye*. Jan Dost (ltnz.). Diyarbakır: Dara Yayınları.

Bayrak, M. (2002). *Geçmişten Günümüze Kürt Kadını*. Ankara: Özge Yayınları.

Beauvoir, S. (2010). *Kadın İkinci Cins Evlilik Çağı*. Bertan Onaran (çev.). İstanbul: Payel Yayınları.

Berghan, S. (2011). "Transfeminizm." Cinsel Yönelimler ve Queer Kuram. *Cogito Dergisi*. Sayı 65-66, 140-148.

Berktay, F. (2019). *Tek Tanrılı Dinler Karşısında Kadın Hıristiyanlıkta ve İslamiyette Kadının Statüsüne Karşılaştırmalı Bir Yaklaşım*. İstanbul: Metis Yayınları.

Blank, H. (2008). *Bekaretin El Değmemiş Tarihi*. Emek Ergün (çev.). İstanbul: İletişim Yayınları.

Butler, J. (2014). *Bela Bedenler*. Cüneyt Çakırlar, Zeynep Talay. (çev.). İstanbul: Pinhan Yayınları.

Butler, J. (2019). *Cinsiyet Belası Feminizm ve Kimliğin Altüst Edilmesi*. Başak Ertür. (çev.). İstanbul: Metis Yayınları.

Butler, J. (2020). *Çözülen Cinsiyet*. Engin B. Aksoy (çev.). İstanbul: Monokl Yayınları.

Chanter, T. (2019). *Tolumsal Cinsiyet*. Mehmet Erguvan (çev.). Ankara: Fol Yayınları.

Connell, R. W. (2019a). *Toplumsal Cinsiyet ve İktidar*. Cem Soydemir (çev.). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Connell, R. W. (2019b). *Erkeklikler*. Nagihan Konukçu (çev.). Ankara: Phoenix Yayınları.

Cordelia, F. (2020). *Toplumsal Cinsiyet Yanılsaması*. Kıvanç Tanrıyar (çev.). İstanbul: Sel Yayıncılık.

Çağlar, N. (2014). "Haberlerde Cinsiyetçilik ve Kadın Adaylar." Huriye Kuruoğlu, Bermal Aydın. (ed.). *Toplumsal Cinsiyet ve Medya*. Ankara: Detay Yayıncılık. 68-95.

Çağlayan, H. (2006). "Feminist Perspektiften Kürt Kadın Kimliği Üzerine Niteliksel Bir Araştırma." *(Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi).* Ankara Üniversitesi SBE.

Değirmenci, B. (2017). "Feminist Hukukun Ataerkil Hukuka Bakışı." Derya Altun (ed.). *Toplumsal Cinsiyet Farklı Disiplinlerden Yaklaşımlar*. Ankara: Nika Yayınevi.

Donovan, J. (2014). *Feminist Teori*. Aksu Bora, Meltem Ağduk, Fevziye Sayılan. (çev.). İstanbul: İletişim Yayınları.

Dökmen, Z. Y. (2021). *Toplumsal Cinsiyet Sosyal Psikolojik Açıklamalar*. İstanbul: Remzi Kitabevi.

Durudoğan, H. (2011). "Judith Butler ve Queer Etiği." *Cinsel Yönelimler ve Queer Kuram.* Cogito dergisi. s. 65-66. 87-98.

Ekinci, Y. (2022). *Kürt Sekülerleşmesi Kürt Solu ve Kuşakların Dönüşümü*. İstanbul: İletişim Yayınları.

Engels, F. (2021). *Ailenin Özel Mülkiyetin ve Devletin Kökeni*. Kenan Somer. (çev.). Ankara: Sol Yayınları.

Ertit, V. (2019). *Sekülerleşme Teorisi*. Ankara: Liberte Yayınları.

Fatih K. ve A. Ulusan (2016). "Kadının Toplumsal İnşasına Yönelik Kuramsal Yaklaşımlara Dair Bir Değerlendirme." *Akdeniz İletişim Dergisi*. Ankara Üniversitesi. İletişim Fakültesi. (E. T. 15.02.2023).

Federici, S. (2014). *Sıfır Noktasında Devrim Ev İşi, Yeniden Üretim ve Feminist Mücadele*. Damlanur Meral, Hilal Mertal ve Özlem Avcı (çev.). İstanbul: Otonom Yayınları.

Firestone, S. (1993). *Cinselliğin Diyalektiği*. Yurdanur Salman (çev.). İstanbul: Payel Yayınları.

Foucault, M. (2007). *Cinselliğin Tarihi*. Hülya Uğur Tanrıöver (çev.). İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Giddens, A. (2012). *Sosyoloji*. Cemal Güzel (çev.). İstanbul: Kırmızı Yayınları.

Göle, N. (2014). *Modern Mahrem Medeniyet ve Örtünme*. İstanbul: Metis Yayınları.

Göle, N. (2017). *Seküler ve Dinsel: Aşınan Sınırlar*. İstanbul: Metis Yayınları.

Güldü Ö. ve M. Ersoy. (2009). "Toplumsal Cinsiyet Rolleri ve Siyasal Tutumlar: Sosyal Psikolojik Bir Değerlendirme." *Ankara Üniversitesi SBF Dergisi*. Cilt 64, Sayı 3, 101-107.

Gündoğan, C. (2016). *Geleneğin Değersizleşmesi Kürt Hareketinin Sosyal Dinamikleri Üzerine*. İstanbul: Vate Yayınevi.

Gürhan, N. (2010). "Toplumsal Cinsiyet ve Din." Mardin Artuklu Üniversitesi, *Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*. Sayı 4, 58-80.

Hanks, E. W. (2020). *Tarihte Toplumsal Cinsiyet*. Meral Çiyan Şenerdi. (çev.). İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları.

Hartmann, H. (2020). "Marksizmle Feminizmin Mutsuz Evliliği." Gülnur Acar-Savran (hzl.). *Kadının Görünmeyen Emeği*. Gülşad Aygen. (çev.). İstanbul: Yordam Kitap. 157-198.

Helvacıoğlu, F. (1996). *Ders Kitaplarında Cinsiyetçilik 1928-1995*. İstanbul: Kaynak Yayınları.

Humm, M. (2002). *Feminist Edebiyat Eleştirisi*. Gönül Bakay (çev.). İstanbul: Say Yayınları.

İlkkaracan, P. (2018). *Müslüman Toplumlarda Kadın ve Cinsellik*. İstanbul: İlestişim Yayınları.

Kalav, A. (2012). "Namus ve Toplumsal Cinsiyet." *Mediterranean Journal of Humanities Dergisi,* Cilt 2, Sayı 2, 151-163.

Kaylı, D. Ş. (2017). "Kadın Bedeninin Annelikle İmtihanı: Toplumsal Cinsiyet Bakış Açısının Annelik Kurgularıyla İlişkisi." Derya Altun (ed.). *Toplumsal Cinsiyet Farklı Disiplinlerden Yaklaşımlar*. Ankara: Nika Yayınevi.

Keskin, F. ve A. Ulusan (2016). "Kadının Toplumsal İnşasına Yönelik Kuramsal Yaklaşımlara Dair Bir Değerlendirme." *Akdeniz İletişim Dergisi*. s. 26, 47-69. (E. T. 12.01.2023).

Kırbaşoğlu, L. ve B. Eyüp (2011). "İlköğretim Türkçe Ders Kitaplarında Ortaya Çıkan Toplumsal Cinsiyet Rolleri Üzerine Bir İnceleme." *Sosyal Bilimler Araştırmaları Dergisi*. Cilt 2, Sayı 3, 129-148.

Kökce, H. (2021). *Sekülerleşme ve Dindarlık Bağlamında Kürt Milliyetçiliği*. İstanbul: Kopernik Yayınları.

Kümbetoğlu, B. (1999). "Görünmeyen Sektörün İşçileri ve Sağlık Sorunları: Bir Uygulama Projesinin Düşündürdükleri." *Kadın Araştırmaları Dergisi*. Sayı 5, 63-74.

Lips, H. M. (2021). *Toplumsal Cinsiyet Temel Bilgiler*. Onur Orhangazi (çev.). Ankara: Ütopya Yayınları.

MacKinnon, C. A. (2020). *Feminist Bir Devlet Kuramına Doğru*. Türkan Yöney, Sabir Yücesoy. (çev.). İstanbul: Metis Yayınları.

Malinowski, B. (1989). *İlkel Toplumlarda Cinsellik ve Baskı*. H. Portakal. (çev.). İstanbul: Kabalcı Yayınevi.

Marshall, G. (1999). *Sosyoloji Sözlüğü*. Osman Akınhay, Derya Kömürcü (çev.). Ankara: Bilim ve Sanat Yayınları.

Maybek, D. ve Ö. Gelmez. (2020). "Tarihsel Kökenleri ve Görünümleriyle Toplumsal Cinsiyet Eşitsizliği." T. S. Afşar (ed.). *Toplumsal Cinsiyet Aktivizmi: Kuramdan Uygulamaya*. Ankara: Gazi Kitabevi.

Mernissi, F. (2018). "Bekaret ve Ataerki." Pınar İlkkaracan (der.). *Müslüman Toplumlarda Kadın ve Cinsellik*. İstanbul: İletişim Yayınları.

Meulenbelt, A. (1987). *Feminizm ve Sosyalizm*. Erman Demirci. (çev.). İstanbul: Yazın Yayıncılık.

Millett, K. (1987). *Cinsel Politika*. Seçkin Selvi. (çev.). İstanbul: Payel Kitabevi.

Mitchell, J. (2006). *Kadınlar En Uzun Devrim*. Gülseli İnal, Gülnur Savran, Şirin Tekeli, Feraye Tunç, Şule Torun, Yaprak Zihnioğlu. (çev.). İstanbul: Agora Kitaplığı.

Naiman, J. (1988). *Marksizm ve Feminizm İki Ayrı Kuram*. Saadet Özkal. (çev.). İstanbul: Amaç Yayınları.

Odabaş, A. ve B. Hatiboğlu. (2020). "İnsan Haklarını Temel Alan Aktivist Örgütlenme." T. S. Afşar (ed.). *Toplumsal Cinsiyet Aktivizmi: Kuramdan Uygulamaya*. Ankara: Gazi Kitabevi. 9-45.

Özkazanç, A. (2015). *Feminizm ve Queer Kuram.* Ankara: Dipnot Yayınları.

Özküralpli, İ. (2022). "Queer Teori." Feryal Saygılıgil (ed.). *Toplumsal Cinsiyet Tartışmaları*. Ankara: Dipnot Yayınları.

Pehlivan-Vargel, P. (2017). "Toplumsal Cinsiyet Bağlamında Kuramsal Yaklaşımlar." *İstanbul Ticaret Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*. Yıl 16, Sayı 31, 497-521.

Pekel, E. (2019). "Toplumsal Cinsiyet Rolleri ve Kadının Çalışma Hayatındaki Konumu." *Balkan ve Yakındoğu Sosyal Bilimler Dergisi*. Cilt 05, Sayı 01, 30-39.

Phillips, A. (1995). *Demokrasinin Cinsiyeti*. Alev Türker (çev.). İstanbul: Metis Yayınları.

Ramazanoğlu, C. (1998). *Feminizm ve Ezilmenin Çelişkileri*. Mefkure Bayatlı (çev.). İstanbul: Pencere Yayınları.

Reed, E. (2012). *Kadının Evrimi 1 Anaerkil klandan Ataerkil Aileye*. Şemsa Yeğin. (çev.). İstanbul: Payel Yayınları.

Reed, E. (2014). *Kadının Evrimi 2 Anaerkil klandan Ataerkil Aileye*. Şemsa Yeğin. (çev.). İstanbul: Payel Yayınları.

Rose, S. (2018). *Toplumsal Cinsiyet Tarihçiliği Nedir?* Ferid Burak Aydar (çev.). İstanbul: Can Yayınları.

Rowbotham, S. (1987). *Kadın Bilinci Erkek Dünyası*. Şükrü Alpagut (çev.). İstanbul: Payel Yayınları.

Sancar, S. (2009). *Erkeklik: İmkansız İktidar Ailede, Piyasada ve Sokakta Erkekler.* İstanbul: Metis Yayınları.

Saygılıgil, F. (2022). *Toplumsal Cinsiyet Tartışmaları*. Ankara: Dipnot Yayınları.

Sayılan, F. (2012). *Toplumsal Cinsiyet ve Eğitim: Olanaklar ve Sınırlar*. Ankara: Dipnot Yayınları.

Scott, J. W. (2007). *Toplumsal Cinsiyet Faydalı Bir Tarihsel Analiz Kategorisi.* Aykut Tunç Kılıç (çev.). İstanbul: Agora Kitaplığı.

Sevim, A. (2005). *Feminizm*. İstanbul: İnsan Yayınları.

Şener, G. (2022). "Medya ve Toplumsal Cinsiyet." Feryal Saygılıgil (ed.). *Toplumsal Cinsiyet Tartışmaları*. İstanbul: Dipnot Yayınları. 163-183.

Tamerk, I. S. (2013). "Anneliğe Giden Yolda." Deniz Arduman (hzl.). *Cinsiyet, Cinsel Kimlik ve Cinsellik*. İstanbul: Bilgi Üniversitesi Yayınları. 33-38.

Taylor, C. (2014). *Seküler Çağ*. Dost Körpe (çev.). İstanbul: Türkiye İş Bankası Yayınları.

Tillion, G. (2006). *Harem ve Kuzenler*. Şirin Tekeli, Nükhet Sirman (çev.). İstanbul: Metis Yayınları.

Tunç, H. (2021). *Din ve Toplumsal Cinsiyet Lise Gençliği Üzerine Bir Araştırma*. Ankara: İksad Publishing House.

Tunç, H. (2022). *Sekülerleşme Toplumsal Cinsiyet ve Beden*. Ankara: Akademisyen Kitabevi.

Turan, S. L. (2021). “Queer Teori ve Aktivist Sanat.” *International Journal of Arts & Social Studies Dergisi*. Cilt 4, Sayı 7, 158-173.

Uluocak, Ş. (2014). *Toplumsal Cinsiyet Eşitsizliği ve Kadına Yönelik Şiddet*. Ankara: Paradigma Akademi.

Urhan, B. (2013). “Kadın Emeği ve Toplumsal Cinsiyet.” Feryal Saygılıgil (ed.). *Toplumsal Cinsiyet Tartışmaları*. Ankara: Dipnot Yayınları.

Vatandaş, S. (2020). “Toplumsal Cinsiyet Rolleri ve Kalıpyargıları Bağlamında Kadının Medyada Metalaştırılması.” *Adıyaman Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi*. Yıl 13, Sayı 36, 747-784.

Wollstonecraft, M. (2020). *Kadın Haklarının Gerekçelendirilmesi*. Deniz Hakyemez (çev.). İstanbul: Türkiye İş Bankası Kültür Yayınları.

Woolf, V. (2021). *Odeyek Ji Bo Xwe*. Aynur Kaş (çev.). İstanbul: Avesta Yayınları.

Yapıcı, A. (2020). *Toplumsal Cinsiyet Din ve Kadın*. İstanbul: Çamlıca Yayınları.

Yazıcı, Ç. (2022). “Felsefede Toplumsal Cinsiyet ve Feminizm.” Feryal Saygılıgil (ed.). *Toplumsal Cinsiyet Tartışmaları*. Ankara: Dipnot Yayınları.

Yıldırım, A. ve H. Şimşek (2011). *Sosyal Bilimlerde Nitel Araştırma Yöntemleri*. İstanbul: Seçkin Yayıncılık.

## PÊVEK

### Pêvek- 1: Agahiyên di Derbarê Beşdaran de

| KOD | TEMEN | BEŞ | DÎROKA HEVPEYVÎNÊ |
|---|---|---|---|
| J1 | 24 | Matematîk | 20.02.2024 |
| J2 | 26 | Bernamekariya Kompûterê | 23.02.2024 |
| J3 | 24 | Îlahîyat | 26.02.2024 |
| J4 | 20 | Derûnnasî | 26.02.2024 |
| J5 | 23 | Mamostetiya Pêşdibistanê | 26.02.2024 |
| J6 | 26 | Tendiristî û Ewlehiya Karan | 01.03.2024 |
| J7 | 24 | Îlahîyat | 05.03.2024 |
| J8 | 24 | Îlahîyat | 05.03.2024 |
| J9 | 20 | Bîyolojî | 08.03.2024 |
| J10 | 25 | Mamostetiya Pêşdibistanê | 11.03.2024 |
| J11 | 23 | Mamostetiya Pêşdibistanê | 11.03.2024 |
| J12 | 22 | Mûzîk | 11.03.2024 |
| J13 | 24 | Dîrok | 11.03.2024 |
| J14 | 20 | Mamostetiya Polê | 17.03.2024 |
| J15 | 21 | Derûnnasî | 28.03.2024 |
| J16 | 22 | Îlahîyat | 28.03.2024 |
| J17 | 25 | Mamostetiya Tirkî | 02.04.2024 |
| J18 | 24 | Derûnnasî | 02.04.2024 |
| J19 | 25 | Civaknasî | 02.04.2024 |
| J20 | 19 | Ziman û Wêjeya Tirkî | 02.04.2024 |

**Pêvek- 2: Pirsên Hevpeyvînan (Bi Kurdî)**

**Agahdarî**

Merheba, ez Şeyma Orhan. Li Zanîngeha Mûş Alparslanê di Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de xwendekara masterê me. Em ê bi hev re li ser mijara teza min a bi navê "Zayenda Civakî û Di Civaka Kurdan De Rewşa Jinan (Wek Mînak Xwendekarên Zanîngehê Yên Jin)" hevpeyvînekî çêbikin. Pirsên ku di hevpeyvînê de ez ê ji we bipirsim bi vê mijarê re eleqedar in. Hûn di bersivandina van pirsan de azad in û hûn kêngî bixwazin em dikarin hevpeyvînê biqedînin. Ger destûra we hebe ez dixwazim dengê we qeyd bikim. Hevpeyvîna me dê ji saetekî dirêjtir nebe. Hemû gotinên we dê veşartî bimînin û ji xeynî lêkolîneran ti kes nikare bibîne. Navê we bi ti awayî di nav xebatê de nayê eşkerekirin. Beriya xebatê tiştekî hûn bibêjin hebe kerem bikin. Ger hûn amade bin em dest pê bikin.

**Pirs**

**1.** Hûn dikarin bi kurtasî behsa malbata xwe bikin?

-Ji aliyê perwerdehiyê ve rewşa dê û bavê we çawa ye?

-Di malbata we de jin û mêr xwarinê bi hev re dixwin?

-Malbata we malbateke biçûk e yan qelebalix e?

-Hûn malbata xwe wek dîndar pênase dikin yan wek modern?

-Diya we zêdetir dîndar e yan bavê we?

**2.** Di malbata we de, di navbera zarokên keç û kuran de newekheviyek heye yan na, hûn dikarin bi mînakan ve bibersivînin?

-Hûn bi brayên xwe re têne berawirdkirin?

-Di malbata we de parîkirina karan bi çi awayî ye?

-Di nav malbatê de hûn xwediyê mafê axaftinê ne? li we tê şêwirîn?

-Malbata we ji cil û bergên we, ji biryar û tercîhên we, ji heval û têkiliyên we diaxivin?

-Hûn bi serê xwe dikarin êvaran derkevin derve, yan jî derkevin rêwitiyê?

**3.** Ji ber zayenda xwe hûn bi brayên xwe û bi hevalên xwe yên mêr re pirsgirêkan dijîn? Tehakuma wan li ser we heye?

**4.** Ji ber nasnameya xwe ya zayendî heta îro we li malê, li dibistanê û li qadên din hûn leqayê pirsgirêkan hatine gelo, hûn dikarin mînakan bidin (Sixêf, heqeret, tacîz, destdirêjî, tehdayî vs)?

**5.** Xwe, diya xwe û pîrika xwe bidin ber hevdu û berawird bikin, li gorî we rewşa jinê ya di nav malê de guherînek heye, ango meriv dikare di navbera nifşan de behsa guherînekî bike?

**6.** Dema hûn li civaka xwe dinêrin ji zemanê berê heta îro gelo di rewşa jinê ya civakî de hûn guherînekî dibînin, dikarin bi mînakan ve bibersivînin?

-Hûn helwesta civakê ya li hemberî jinan û hebûna jinan a li qadên giştî çawa dinirxînin?

**7.** Di dayînên tercîhên zanîngehê de bandora nasnameya we ya zayendî çêbû?

**8.** a. (ger sergirtî be): sergirtin tercîha we bi xwe bû?

-Li gorî we jin û mêr di dîn de wekhev in gelo?

-Hûn xwe wek dîndar pênase dikin yan wek modern?

b. (ger servekirî be): servekirîbûn tercîha we bi xwe bû gelo?

-Li gorî we jin û mêr di dîn de wekhev in gelo?

-Hûn xwe wek dîndar pênase dikin yan wek modern?

**9.** Di teşegirtina nasnameya we ya zayendî de çanda Kurdî xwediyê bandoreke çawa ye?

-Edetên Kurdî bandoreke çawa li ser we hiştine?

-Di dawetên we de jin û mêr di nav hev de ne?

-Di dawetan de, dema govendê hûn dikevin destê mêran?

**10.** Hûn têkiliyên jin û mêran, ji aliyê flortê û têkiliya zayendî ve çawa dinirxînin?

**Pêvek- 3: Pirsên Hevpeyvînan (Bi Tirkî)**

**Bilgilendirme**

Merhaba, ben Şeyma Orhan. Muş Alparslan Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı Anabilim Dalı'nda yüksek lisans öğrencisiyim. Sizinle "Toplumsal Cinsiyet ve Kürt Toplumunda Kadın (Üniversiteli Kadın Öğrenciler Örneği)" başlıklı çalışmam için görüşme gerçekleştireceğiz. Görüşme sırasında size soracağım sorular bu tez başlığı çerçevesinde olacaklar. Sorulardan istediğinizi cevaplayabilir, cevaplamak istemediğinizi ise boş bırakabilirsiniz, aynı zamanda siz istediğinizde görüşmeyi sonlandırabiliriz. İzniniz olursa görüşmeleri kayıt altına almak istiyorum. Görüşmemiz bir saatten fazla sürmeyecektir. Görüşme esnasında söylediğiniz her şey gizli kalacaktır, araştırmacılar dışında kimseyle paylaşılmayacaktır. İsminiz çalışma içerisinde hiçbir şekilde belirtilmeyecektir. Görüşmeye başlamadan önce söylemek veya sormak istediğiniz bir şey varsa buyrun lütfen. Hazırsanız Başlayalım.

**Sorular**

**1.** Nasıl bir aile yapısına sahip olduğunuzdan kısaca bahseder misiniz?

-Anne ve babanızın eğitim durumu nedir?

-Ailenizde kadınlar ve erkekler aynı sofrada mı yemek yerler?

-Çekirdek aile misiniz, geniş aile mi?

-Ailenizi dindar olarak mı tanımlarsınız, modern olarak mı?

-Anneniz mi daha dindar yoksa babanız mı?

**2.** Aileniz içinde kız ve erkek çocuklara karşı tutum ve davranışlarda bir ayrımcılık var mıdır, örnek verebilir misiniz?

-Erkek kardeşiniz/kardeşlerinizle kıyaslanıyor musunuz?

-Ailenizde iş bölümü nasıldır?

-Aile içinde söz hakkına sahip misiniz, fikriniz alınır mı?

-Ev halkı giyim kuşamınıza, tercihlerinize, arkadaş ve insan ilişkilerinize müdahale etmiş mi?  ediyor mu?

-Tek başınıza akşam dışarı çıkabiliyor musunuz, ya da seyahat edebiliyor musunuz?

**3.** Erkek kardeşiniz/kardeşlerinizle ve erkek arkadaşınız/arkadaşlarınızla cinsiyetinizden dolayı sorunlar yaşadınız mı/ yaşıyor musunuz? Onların sizin üzerinizde bir tahakkümleri olduğunu düşünüyor musunuz?

**4.** Kadın kimliğinizden dolayı bugüne kadar evde, okulda ve diğer çevrelerde sorunlarla karşılaştınız mı, örnek verebilir misiniz? (küfür, hakaret, taciz, tecavüz, şiddet vs.)

**5.** Kendinizi, annenizi ve anneanne/babaannenizi kıyasladığınızda kadının aile içindeki konumunda herhangi bir değişiklik gözlemliyor musunuz, yani kuşaklar arasında bir değişimden söz edilebilir mi?

**6.** İçinde bulunduğunuz topluma baktığınızda geçmişten günümüze kadının toplum içindeki konumunda bir değişiklik gözlemliyor musunuz, örnek verebilir misiniz?

-İçinde bulunduğunuz toplumun kadınlara karşı tutumunu ve kadınların kamusal alanda görünmelerini nasıl değerlendiriyorsunuz?

**7.** Üniversite tercihi yapmanızda kadın kimliğiniz etkili oldu mu?

-Sizce kadın ve erkeklerin yapacağı meslekler farklı mıdır?

**8.** a. (başörtülü ise): başörtü takmak kendi tercihiniz miydi?

-Kadının dindeki yeri hakkında ne düşünüyorsunuz, kadın ve erkek dine göre eşitler mi sizce?

-Kendinizi dindar olarak mı tanımlarsınız, modern olarak mı?

b. (başörtülü değilse): başörtü takmamak kendi tercihiniz miydi?

-Kadının dindeki yeri hakkında ne düşünüyorsunuz, kadın ve erkek dine göre eşitler mi sizce?

-Kendinizi dindar olarak mı tanımlarsınız, modern olarak mı?

**9.** Kadın kimliğinizin Kürt kültürel ortamında şekillenmesi bağlamında neler söylemek istersiniz?

-Kürt geleneklerinin üzerinizdeki etkisi nedir?

-Aile düğünleriniz kadın erkek karışık mı yoksa ayrı mı yapılıyor?

-Düğünlerde erkeklerle el ele halay çeker misiniz?

**10.** Evlilik dışı kadın erkek ilişkilerini, flört ve cinsellik bağlamında, nasıl yorumluyorsunuz?

**Evrak Tarih ve Sayısı: 06.02.2024-129956**

**T.C.**
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**
**BİLİMSEL ARAŞTIRMA VE YAYIN ETİĞİ KURULU**

| Toplantı Tarihi: 06.02.2024 | Toplantı Sayısı: 4 | Karar Sayısı: 54 |
|---|---|---|

Bilimsel Araştırma ve Yayın Etiği Kurulu, Kurul Başkanı Prof. Dr. Ekrem ALMAZ başkanlığında toplanarak aşağıdaki kararları almıştır.

**KARAR-30:** Sosyal Bilimler Enstitüsü Müdürlüğünün 26.12.2023 tarihli ve 123293 sayılı yazısı okundu ve ekleri incelendi.

Yapılan incelemeler sonucunda; Üniversitemiz Sosyal Bilimler Enstitüsü danışmanlığı Dr. Öğr. Üyesi İkram FİLİZ tarafından yürütülen Kürt Dili ve Kültürü Ana Bilim Dalı tezli yüksek lisans öğrencisi Şeyma ORHAN'ın sorumlu araştırmacı olduğu "Toplumsal Cinsiyet ve Kürt Toplumunda Kadın (Üniversiteli Kadın Öğrenciler Derneği)" konulu proje çalışması Bilimsel Araştırma ve Yayın Etiği Kurulu tarafından uygun görülmüş olup, durumun Sosyal Bilimler Enstitüsü Müdürlüğüne bildirilmesine,

Oy birliği ile karar verildi.

**BAŞKAN**

(e-İmzalıdır)
**Prof. Dr. Ekrem ALMAZ**
**Kurul Başkanı**

| | | |
|---|---|---|
| **ÜYE**<br>(e-İmzalıdır)<br>**Doç. Dr. Canan DEMİR YILDIZ**<br>**Eğitim Fakültesi Öğr. Üyesi** | **ÜYE**<br>(e-İmzalıdır)<br>**Doç. Dr. Ramazan Şamil TATIK**<br>**Eğitim Fakültesi Öğr. Üyesi** | **ÜYE**<br>(İzinli)<br>**Doç. Dr. Muhammed Fatih BİLİCİ**<br>**Spor Bilimleri Fakültesi Öğr. Üyesi** |
| **ÜYE**<br>(e-İmzalıdır)<br>**Dr. Öğr. Üyesi Yusuf AYDIN**<br>**İslami İlimler Fakültesi Öğr. Üyesi** | **ÜYE**<br>(e-İmzalıdır)<br>**Dr. Öğr. Üyesi Necmettin ÇİFTCİ**<br>**Sağlık Hizmetleri MYO Öğr. Üyesi** | **ÜYE**<br>(e-İmzalıdır)<br>**Dr. Öğr. Üyesi Ayşegül KILIÇLI**<br>**Sağlık Bilimleri Fakültesi Öğr. Üyesi** |
| **ÜYE**<br>(e-İmzalıdır)<br>**Dr. Öğr. Üyesi Gökhan DEMİREL**<br>**İletişim Fakültesi Öğr. Üyesi** | **ÜYE**<br>(e-İmzalıdır)<br>**Dr. Öğr. Üyesi Gözde YETİM**<br>**Spor Bilimleri Fakültesi Öğr. Üyesi** | |

1 / 1

Bu belge, güvenli elektronik imza ile imzalanmıştır.
Evrak sorgulaması https://ebys.alparslan.edu.tr/enVision/Dogrula/B55B4T970C adresinden yapılabilir.

**Evrak Tarih ve Sayısı: 06.02.2024-129956**

**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**

**BİLİMSEL ARAŞTIRMA VE YAYIN ETİK KURULU DEĞERLENDİRME FORMU**

| | |
|---|---|
| **Araştırmanın Başlığı:** | "Toplumsal Cinsiyet ve Kürt Toplumunda Kadın (Üniversiteli Kadın Öğrenciler Derneği)" adlı çalışma. |
| **Başvuru Formunun Etik Kurula geldiği tarih:** | 26.12.2023 |
| **Başvuru Formunun Etik Kurulda incelendiği tarih:** | 06.02.2024 |
| **Karar tarihi** | 06.02.2024 |

**SONUÇ**

| | |
|---|---|
| 1. | ■ Kabul |
| 2. | ☐ Düzeltme gereklidir:<br>Etik sorun olabilecek sorular/maddeler, süreçler ya da unsurlar bulunmaktadır. Açıklama: |
| 3. | ☐ Red<br>Gerekçe, Görüş, Tavsiye ve Açıklamalar: |

Başvuru dosyasının incelenmesinde hazır bulunan ve araştırmayla doğrudan veya dolaylı olarak ilişkisi bulunmayan Etik Kurul başkan ve üyelerinin ad soyad ve imzaları.

Başkan
**(e-imzalıdır)**
Prof. Dr. Ekrem ALMAZ

Üye
**(e-imzalıdır)**
Doç. Dr. Canan DEMİR YILDIZ

Üye
**(e-imzalıdır)**
Doç. Dr. Ramazan Şamil TATIK

Üye
**(İzinli)**
Doç. Dr. Muhammed Fatih BİLİCİ

Üye
**(e-imzalıdır)**
Dr. Öğr. Üyesi Yusuf AYDIN

Üye
**(e-imzalıdır)**
Dr. Öğr. Üyesi Necmettin ÇİFTCİ

Üye
**(e-imzalıdır)**
Dr. Öğr. Üyesi Ayşegül KILIÇLI

Üye
**(e-imzalıdır)**
Dr. Öğr. Üyesi Gökhan DEMİREL

Üye
**(e-imzalıdır)**
Dr. Öğr. Üyesi Gözde YETİM

Bu belge, güvenli elektronik imza ile imzalanmıştır.
Evrak sorgulaması https://ebys.alparslan.edu.tr/enVision/Dogrula/BS5B4T970C adresinden yapılabilir.